Çîrokek Bê Nav

TÎRÊJ
Azad GARZAN

Ev pirtûk li ser navê Keç û Xort'ên Kurd yên ku di têkoşîna azadiya gelê Kurd de jiyana xwe ji dest dane re hatiye diyarî kirin.

Di vî karê binirx de alîkariya gelek hevalan gihîşt min. Hem di destpêka karê rojnamevanî û nivîskarî de, hem jî di dema nivîsandina vê pirtûkê de. Bi taybetî Rêşad Sorgul rojnamevan, nivîskar û rewşenbîrê Kurd ji destpêka vî karî ve ji min re bû alîkar. Ez dikarim bêjim ev rêzdar mamosteyê min yê xwendin û nivîsandinê ya Kurdî ye. Ez ti carî nikarim di berdêla keda wî de tiştek bikim. Ji ber vê yekê ez hêja û bi kêfxweşî di vê pirtûkê de nav û alîkariya wî tînim ziman.
Ji aliyê din ve rêzdar Abdulkerîm Aydin jî ji ber alîkarî û desteka wî sipas dikim. Rêzdar Aydin, di redekteya vê pirtûkê de xwedî kedeke hêja ye. Ez navê vî rêzdarî jî bi rumet û şanazî tînim zimên.
Hevalên ku di vî karî de alîkariya wan gihîşte min, ji dil û can wan sipas dikim.

Çend têbînî li ser rastiya nivîskar

Lêgerîna min a bênav û bêdawî, her roj li ber min disekinî û xwe li min dipêça. Rêwîtiya tijî hêvî û di heman wextê de, ji hêviyê bêpar, li dora min kom dibû.
Sal û mehên min di bin lêgerînan de derbas dibûn. Dem û wext li dora min diçûn û dihatin. Dilê min ji her demî zêdetir û xurttir diavêt. Ez li çi digeriyam? Daxwaziya min çi

bû? Ez kesekî isyankar bûm yan na? Ez kesekî bêaqil bûm, yan na. Ya rast, ez çi kes bûm, li ser rûyê cîhanê? Ez li jiyaneke çawa digeriyam û daxwaziyên min çi bûn. Ez li hevaltiyeke çawa digeriyam? Çima ez ji tevahiya hevalên xwe dûr ketibûm? Ez li jiyan û hevaltiyeke çawa digeriyam? Ev jiyan û hevaltî li cihekî hatibû dîtin, an na?
Jiyana ku ez lê digeriyam, ne diyar û ne xuya bû. Çima min li gor xwe hevaltiyeke baş nedidît? Hevaltiya ku min dixwest hevaltiyeke çawa bû? Min ev pirs ji xwe dikirin. Pirseke din ku di serê min de bû, axa welêt û nasnameya min bû. Welatê min li kû derê bû û navê welatê min çi bû?
Gelo, li ser axa welatê min çi serhatî qewimîbûn? Nasnameya min hebû yan na? Hebûya çi bû û li ser nasnameyê nijada min çi hatibû nivîsîn? Ez ji çi qewmî bûm? Min ji xwe pirs dikir. Ev pirsên ku min ji xwe dikirin her roj zêde dibûn. Rêwîtiya min ya bi salan ji bo çi bû û ez li pey çi digeriyam ne diyar bû.
Min carna ji xwe wiha dipirsî: Gelo, ez ji kî direvim? Eger navê vê rev bûya ez ji kî û çima direviyam? Ez ji evîndaran direviyam, ji malbatê, yan ji sîstema ku mirov ji cewherê mirovahiyê dûr dixist bû.
Rêwîtiya min ya ku hem bi fîzîkî û hem jî bi fîkrî dest pê kir bi salane didome. Ez nizanim wê heya kengê dewam bike. Ezê rojekê ji vê rê derkevim an wê rê bi dawî bibe? Ez nizanim.
Mirov dikare li van xalan hê jî zêde bike, rêya dûr û dirêj rewa bike, êş û keseran, derd û kulan li van xalan zêde bike. Mirov dikare van hevokan, li ber hev yek bi yek rêz bike. Lê rastiyek hebû ku ew jî ev e, û nayê înkarkirin: Ez direviyam. Ji kî û ji bo çi? Ev pirs hê jî di serê min de, li benda bersivan nin.
Jiyana koçberî û belengazî ez ji bo rêyek nû amade dikirim. Ez li jiyaneke bi rûmet û paqij digeriyam. Lê mixabin şertên heyîn destûr nedidan vê yekê. Di jiyana min de ji bo dildariyeke weke dildariya Mem û Zîn, Leyla û Mecnûn destûr nedihat dayîn.
Li welatê min evîndarî bûbû kul û keder, kuştin û çavnebarî. Li şûna hezkirin û dildariyê tovê êş û janê hatibûn reşandin. Di bin navê hezkirinê de kuştin pêk dihat. Jiyana herî gemar weke jiyana herî birûmet dihat dîtin.
Minê ev jiyan ji xwe re çawa qebûl bikira. Diya min tim digiriya; dapîra min jî wisa bû. Ji bo çi jinên Kurd ew çend zû digiriyan? Tevî van ji bo min pirsên girîng bûn û ji hişê min dernediketin. Ji destpêka rêwîtiya xwe û heya niha ez li benda bersiva van pirsan im.
Rêwîtiya min a destpêkê di temenekî piçûk de dest pê kir. Di sala 1982an de, ez pênç an jî şeş salî bûm, rêwîtiya min ya dûr û dirêj ku heya îro dewam dike dest pê kir. Rêwîtiya yekem ji gund ber bi Giresîra ve bû. -Navçeya Êlihê-
Ji Giresîra, Êlih û ji wir jî heya Bajarên Tirkiyê Manîsayê dewam kir. Vê qedera reş ji Êlihê ber bi Manîsa yê ve, bi tirêna reş, bi sê roj û sê şevan dest pê kiribû. Bilêvkirina sê roj û sê şevan hêsan e. Lê kesê ku nejî nizane ev qeder çawa derbas dibû. Di vê rêya dûr de tevî malbatê em li ser hev ketibûn vagoneke tirenê.
Ev tirên di gelekî gund, bajar û di ber newalan re de derbas dibû. Li gelekî rawestgehan radiwestiya. Li her rawestgehê min li navên bajaran dinêrî. Ez şaş bûbûm, min li derdora xwe dinêrî. Li welatê xerîbiyê li bajarên mezin, wê çi bihata serê me ne diyar bû.
Ez libenda Manîsayê bûm, ka Manîsa bajarek çawa ye? Bi vî halê penaberî û belengaziyê ku ji me re mafê jiyanê nehatibû naskirin, ez li benda cihekî çawa bûm? Di vê rêwîtiyê de bi temenê piçûk ez gelek bi halê xwe û malbata xwe diêşiyam. Saet bi saet, gav bi gav ez ji welatê bav û kalan dûr dibûm. Tirêna reş jî weke min ji dil diqîriya. Tirên çixwas di bin çiyê de derbas dibû û bi jor ve hildikişiya, ji bedena kûr diqîriya.

Fîkîna tirênê ya dijwar, ji bêdengiya min re bersiva herî baş bû. Tirên bi dengê dijwar diqîriya û ji bo min digiriya. Bilez diçû û ez ji warê xwe dûr diketim...
Digel ku ez bi salan li Manîsayê mam jî, min bersiva pirsên xwe nedît. Ez neçar mam ku li cihekî din li bersiva pirsên xwe bigerim. Ez li gelekî cihan geriyam, lê min nedît. Lewre ez ber bi Stenbolê ve ketim ser rê...
Tevahiya van pirsan di rojekî rêwîtiya min de, ya ber bi Stenbolê ve, yek bi yek hatin bîra min. Ev rêwîtî ji min re bûbû lêpirsîn û encam. Rêya min dîsa ketibû bajarekî mezin. Di rêwîtiya xwe de ez gelekî difikirîm, lewre ez careke din ji welatê xwe dûr diketim. Di vê rêwîtiya min de ku bi salan dewam kir, gava ez ji metrepolên Tirkiyê ber bi welêt ve dihatim cîhan dibû ya min. Lê gava ku ez dîsa neçarî vegera bajarên Tirkiyê dibûm ev jiyana ha ji min dihat standin.
Ez dîsa li ser rêya bajarê Tirkan bûm. Ez li çi digeriyam û daxwaziya min çi bû ne diyar bû. Minê daxwaziya xwe li bajarê mezin li Stenbolê bi dest bixista yan na? Ji ber vê qedera reş, dilê min bi halê min dişewitî. Ji bo çi min nikariya ez li ser axa xwe bijîm? Ez bi hesreteke xurt vedigeriyam welêt, lê li welat tiştekî ku ez bidama rawestandin tine bû. Li welêt ne kar ne jî aramî hebû. Her roj mirov dihatin kuştin. Piştî çend hefteyan ku ez li welêt di nava xizmên xwe de dimam, careke din ez mecbûrî vegerê dibûm. Min careke din bê daxwazî berê xwe dida welatê xerîbiyê. Min careke din xwe ji bo şevên bêxew re amade dikir.

## Destpêk

Ev pirtûk ji serhatiyên şervanên azadiyê pêk tê. Ji bûyerên tijî êş û rastiya me Kurdan hatiye nivîsandin. Ev bûyerên behsa wan tê kirin, li herêma Amedê qewimîne. Ev pirtûk êşên veşartî dertîne holê û rastiya şer eşkere dike. Xweşikbûn û evîndariya li ser axa welêt nîşan dide. Evîndariya kesên li welatê xerîbiyê bûyîn penaber, eşkere dike. Her wisa ev pirtûk nameya wan kesan e, ku xwe ji bo gelê xwe feda kirin e. Ev pirtûk ji bo wan kesan hat nivîsandin. Armanca vê pirtûkê ya sereke ew e, ku buyerên li çiyayên Kurdistanê hatîn jiyîn neyên jibîrkirin. Min berê, di warê nivîskarî û rojnamevaniyê de kar nekiribû. Şert û mercan derstûr nedabûn ku ez karekî wiha pêk bînim. Her çiqas min bi amatorî helbest, bîranîn, rojgirtin û hin awazên kilaman nivisandibin jî, ev ji warê amatorî derneketibûn. Ji bilî van hin gohdar ji hin sîteyên înternetê re nivîsandin.
Li ser şoreşa azadiya gelê Kûrd, ya PKK'ê ku li cîhanê deng veda, gelekî tişt hatin gotin û hê jî tên gotin. Lê di warê çand, wêje, huner, çîrok û bîranînan de di nav gelê Kurd de kêm tişt hatibûn nivîsîn. Bi taybetî bi zimanê Kurdî têkoşîna PKK'ê kêm hatibû nivîsandin. Ev yek kêmasiyek mezin bû. Ji bo pêşketina ziman û wêjeya Kurdî xebata nivîsandinê lazim bû. Di serî de pêwîst bû kesên ku berpirsê vî karî ne û di nava vê şoreşê de cih girtine, dest biavêtina vî karî.
Piştî ku min li Brûkselê di çapemeniya Kurd de dest bi karê rojnamevaniyê kir, şertên heyîn ez neçar kirim ku di vî warî de xebatekî bimeşînim. Di karê çapemeniyê de şert û mercên heyîn derfet didan min. Min xwest ez bîranînên kesên ku di têkoşîna azadiyê de

xwe feda kirîn, bi awayekî wêjeyî binîvisim. Serhatî û têkoşîna li welêt, ez gav bi gav ber bi vî karî ve anîm. Min jî weke kesekî di nava têkoşîna azadiya gelê Kurd de, cihê xwe girt û mîrateya şehîdan ji xwe re kir armanc. Min kareke wiha li ser milên xwe wezîfe dît. Ji bo vê yekê min xwest bi vê pirtûkê wezîfeyeke piçûk be jî, ji bo kesên xwe feda kirîn, wezîfeya xwe bi cih bînim. Û di vê pirtûkê de bîranîna van kesan û tiştên ku jiyan e binivîsim.
Her wisa min xwest ez bi vê pirtûkê ji bo çanda gelê xwe dest bi xebateke wiha bikim.

Ev pirtûk ji kesên ku di têkoşîna azadiya gelê Kurd de jiyana xwe ji dest dan re, hatiye dîyarîkirin.

## Timoq

Jiyana li bajarên Tirkiyê her kes dizane çawa ye, ne tam û ne jî xweşî tê de tine ye. Jiyan ji rastiya xwe pir dûr e. Tim bi êş û jan derbas dibe. Ne daxwaziyên mirovan bi dawî dibin ne jî pêk tên. Her ku daxwaziyên mirovan zêde dibin, mirov bi ser rastiya xwe de vedigere.
Rêwîtiya min a dûr û dirêj, ji gundê Timoq dest pê kir û li metrepolên Tirkiyê dewam kir. Ji aliyekî ve ez neçarî jiyana welatê xerîbiyê bûm, ji aliyê din ve jî hêviya vegerê di dilê min de bîr vedabû. Ev bîr her ku diçû kur dibû. Av tije bûbû û di ser de diherikî. Hêviyên vegerê, vegera gund û çiyayan li cem min kom bûbûn.
Gundê me Timoq di nava du çiyayên bilind de hatibû avakirin. Li aliyekî gund çiyayê Helqîs û ji aliyê din ve jî çiyayê Mereto hebû. Ev her dû çiyayên bi nav û deng gundê me dorpêç dikirin. Her du çiya siha xwe didan ser gund. Ava ku ji van çiyayan dihat, di ber gundê me de derbas dibû. Li derdorên mala me zevî hebûn. Hewşa me jî mezin bû. Di hewşê de tijî mêwe hebûn, bi taybetî pîvaz û silq pir bûn. Gotina ku dibêjin Xerzî pir pîvazan dixwin rast e. Mala me raserî malan, li qûntara çiyê bû. Ji ciheke wisa xweş rêwîtiya min dest pê dikir.
Ez hê piçûk bûm, rojên min di nav zarokan de bi lîstikê derbas dibûn. Bi şev mezinên me ji mere çîrok digotin. Me şevên dirêj wisa derbas dikirin. Bi roj jî em li ber newal, kanî, çiya û li ser rê dilîstin. Ji wê dema zaroktiyê tişta ku tê bîra min, şerên gund in. Di gund de her roj şer hebû. Carna jî eskerên qereqola nêzî me diavêtin ser gund, tevahiya kesên li gund li meydanê kom dikirin û êşkence li wan dikirin. Qet ji bîra min naçe, rojekê di navbera gundiyan de şer çêbû, li ser vê yekê eskeran tevahiya niştecihên gund birin qereqolê. Li qereqolê li wan gelekî êşkence kirin. Li gor axaftinan, her cure êşkence li wan kiribûn. Di nav van kesan de bavê min Seyîtxan, kalê min Evdirrehîm û apê bavê min Mihyedîn jî hebûn.
Jiyana li gund bi vî awayî derbas dibû. Ji aliyek ve dijminiya nav gundiyan, ji aliyê din ve jî dijminê mezin.
Di temenekî piçûk de rêwîtiya dûr û dirêj dihat û li ber min radiwestiya. Hayê min ji ti tiştî tine bû, ne ji rêwîtiya dûr û nejî ji koçberiyê. Demsal havîn bû; carna baran dibariya û

carna jî tav derdiket. Carna jî tav û baran bi hev re bi ser me de digirtin. Di rojeke wisa de ku baran hûr hûr dibariya, ez di nav hevalên xwe de dilîstim. Em li ser lîstikê germ bûbûn. Di rojeke wiha, di demeke wiha bi liv û tevger de dengê diya min ber bi guhên min ket. Diya min bang li min dikir:
"Azad, Azad! Kûrê min, tu li kû yî, ka were!"
Ez bi bazdan hatim cem. Min lîstika xwe di nîvî de hişt. Min ji hevalên xwe re got:
"Diya min bang li min dike, ezê biçim; li benda min bin, ezê vegerim."
Li gor tê hişê min ev veqetîna min a yekem bû. Ez yekem car wê rojê ji hevalên xwe veqetiyam. Piştî veqetînê mixabin careke din ez venegeriyam cem hevalan. Gava ez gihîştim malê, min dît ku tiştên navmalê tev li ser pişta hespan hatine barkirin. Tiştên malê tev hatibûn kom kirin û mal vala mabû. Dema min mal di wî halî de dît, ez yekser kelegirî bûm. Mala ku cihê xewn û xeyalên min bû, vala bûbû. Ne li erdê merş hebûn, ne jî li ber paceyan perde mabûn.
Ev barkirin û çûyîn, dişibiya veqetînek bi êş û dirêj. Tiştên navmalê bi tevahî hatibûn komkirin û mal vala mabû. Vê valahiyê ez ditirsandim. Piştî ku tiştên nava malê li hespan hatin barkirin, em ketin ser rêya navçeya Batmanê Giresîra. Ev rêwîtiya min ya yekemîn bû. Ev rêwîtiya min ya despêkê bû ku ji ser axa bav û kalan dest pê dikir.
Ev rêwîtiya ku wê ez û malbat ji ser bingehê bihejanda, dest pê dikir. Baran hûr hûr dibariya û me berê xwe da rêya dûr. Li pêşiya me çiyayên bilind û asê hebûn. Ez bi temenekî piçûk, bi tirs ketim rê û bi çiyayên Helqîs û Mereto ve hilkişiyam. Dema ez di van çiyayên bilind de hildikişiyam, ez kelegirî dibûm û min ev soz dida xwe:
"Ezê rojekê vegerim, ezê rojek vegerim."Belkî bi tenê belkî bi malbatê re”.
Min soza vegerê dabû hevalên xwe. Lê mixabin ez careke din venegeriyam. Ez wê demê pir fikirîm. Ji min re dema xatirxwestinê nehatibû hiştin. Yan jî min nedixwest ez vegerim û ji hevalên xwe xatir bixwazim. Wê rojê xatirxwestin li min gelek zor û zehmet hat. Ji wê rojê vir ve, ez diçûn û hatinên xwe de, dema ji hin kes, an ji hevalan dûr dikevim zû bi zû xatir naxwazim. Wê roja ku ez ji gund û hevalên xwe gav bi gav dûr ketim, li gund vedigeriyam û bi çavên şil, min li wan dinêriya. Cihê ku mirov lê tê dinê, - eger ev der cihê bav û kalan be- dema mirov jê vediqete gelekî zor e. Ne tenê çav, dil û beden jî dikevin nav keserê. Çavan rondik dibarandin, dil dişewitî û beden dikeliya.
Rêwîtiya ku ji gund dest pê kir, ez di gelekî zehmetiyan de derbas kirim. Derdorên gund, zevî û rûbarên ku ez bi hevalên xwe re gelekî caran diketimê, li ber çavên min weke şerîta fîlman diçû û dihatin.
Darên goz yên ku li ber ava robaran bilind dibûn û darên spîndar yên bejinbilind, gelo, minê careke din ew bidîtan? Minê çareke din li ber newalê, li bin darê goz kom bikiran? Hemû li ber çavên min dibûn wêneyên zîndî û di paşila min de kom dibûn. Ev xeyal dibûn çîrok û di mejiyê min de bi cih dibûn.
Penaberiya min ji gund dest pê kir û roj bi roj ez dûr dikirim. Di vê rêwîtiya dûr de barên giran li min bar dibûn. Li temenê min salên bi êş zêdê dibûn û li eniya min xetên derdên giran vedibûn. Her ku min ji dûr ve li çiya û newalan dinêrî, çavên min kûr dibûn û tijî rondik dibûn. Penaberiya me dest pê kiribû, em geh li gundên ser rê heh li çolê diman. Heya ku gund û çiya ji ber çavê me wenda bûn.
Dema her tişt ji ber çavê min wenda bûn, wek ez bikevin nav cîhanek din.

Giresîra

Piştî rêwîtiya me ya çend rojan em gihîştin navçeya Giresîra ya Batmanê. Navçe ji bo me cihekî gelek mezin bû. Bi sedan mal tê ne hebûn, tev jî avahiyên bilind bûn. Ji aliyê din ve yekemîn car min maşîne didîtin. Li gund tenê hesp, ker û dewar hebûn. Em li Giresîra ji her tiştî re xerîb bûn. Em li ser axa welatê xwe bûbûn penaber. Em bi tiştên navmalê hatibûn navçeyê. Ji aliyê aborî ve malbata me gelekî xizan bû. Penaberiyê herî zêde bandora nebaş li me zarokan dikir. Em ji gund veqetiyabûn, navçe mezin bû û nêzî bajêr bû, lê tam nedida me. Li Giresîra me ji xwe re malek kirê kir û em tê de bi cih bûn. Bavê min li der ve kar dikir û diya min jî karê nav malê dikir. Havînê jî me titun diçand û debara xwe dikir. Em zarok hê piçûk bûn, ji ber vê yekê jî me kar nedikir. Carna diya min hêk didan me, me dibir difirotin. Karekî din ku me dikir hebû. Roja înê gel diçû goristanê û ji bo xêra miriyan tişt belav dikirin. Em zarok jî em her roja înê diçûn goristanê me ji xwe re piskûvît û porteqal kom dikirin. Di nav heftiyê de roja înê ji bo me zarokan bi wate bû. Ev roj ji bo me wek cejnê bû. Ji ber ku di wê rojê de me têra xwe luqim, biskuvît û porteqal kom dikirin.
Ji derveyî roja înê karekî din jî hebû ku em kêf xweş dikirin. Kesên li gund û navçeyên Kurdistanê mabe, baş dizane ku çiqas ker pir in. Li Giresîra bêndereke mezin hebû weke meydana topê ya li bajaran bû. Li vê meydanê bi sedan ker hebûn û bê xwedî bûn. Li navçeyê ciwanên ku karên wan tine bûn, bi roj dihatin vê meydanê li keran siwar dibûn. Ez jî weke hevalên xwe bi roj diçûm meydana keran û li keran siwar dibûm. Carna hin ker hebûn nedihiştin ku em li wan siwar bibin û direviyan. Em li pey wan diketin û wan baz didan. Ew her çiqas weke gule direviyan jî me dev ji wan bernedida û em li pey wan diketin.
Jiyana min ya bê rawestan bi tevî leza xwe dewam dikir. Dîsa ev rêwîtî ji min nedigeriya. Bayê Başûr li min dixist, min nikariya ez xwe li ber bigirim. Ev qedera min, ya ku li ser axa bav û kalan cih nedida min, dîsa rê nîşanî min dida. Vê carê rêwîtiyê ji Giresîra ber bi bajarê mezin Êlihê ve dest pê kir. Jiyana ku li gund û navçeyê derbas bû, niha jî xwe bê dil, ji bo çûna bajarên mezin amade dikir. Li bajarên mezin minê çi bi dest bixista ne diyar bû. Lê minê paşê baş fêm bikira ku veqetîna ji cih û war çiqas zehmet e û li ser mirovan bandorê dike. Her gava ku ez ji cih û warê xwe dûr dibûm ewqas têsîr li min dikir.
Ez hê baş fêrî Giresîra nebûbûm û min bandora gund ji ser xwe neavêtibû, vê carê jî ezê ji Giresîra veqetiyama. Veqetîna min ya ji gund û Giresîra psîkolojiya min xira kiribû. Lê tim di dilê min de vegera gund hebû. Ev çend salên ku ji gund dûr li Giresîra derbas bûn, li min ewqas giran hat, hê jî di bîra min de ye. Li navçeyê rewşa me her ku diçû xirab dibû. Ji ber vê yekê jî bavê min digot emê biçin bajarên mezin ku pere û her tişt lê pir in.

Êlih

Şeveke tarî kamyoneke piçûk hat û li ber deriyê mala me sekinî. Baran weke ji devê kaniyê biherike dibariya. Pir balkêş bû roja em ji gund derketin jî baran dibariya. Me careke din tevahiya tiştên xwe bar kirin û em dîsa bûn rêwî. Piştî ku me tiştên xwe li kamyonê bar kirin, em jî lê siwar bûn. Wê rojê em li ser rêya sereke ya bajêr rêwî bûn. Her rêya ku em tê de diçûn, em gav bi gav ji nas û xizmên xwe dûr diketin. Ji gund û çiya ber bi navçe û bajarên mezin ve rê dirêj dibû. Ji ber ku vê carê em bi şev ketibûn ser rê, ti kesî em nedîtin. Bi vî awayî ez ji xatirxwestinê jî xilas bûm. Dema em gihiştin Êlihê hêjî baranê lê dikir. Kamyona ku em tê de bûn, di rêyên çal û kort de, bi teqerekê diçû. Li Êlihê em çûn mala Meta min Refîqe. Li bajêr bi tenê xizmekî me hebû, ew jî

mala metamin bû. Heya me ji xwe re heqê rê peyda bikira, emê li mala meta min bimana. Mala zavayê me Cemal jimara wan bixwe jî zêde bû. Em jî hatin cem wan vê carê jimara wan gelek zêde bû. Cemal jî weke me bi salan berî hingê ji gund hatibû Êlihê. Bavê min ji bo ku peran amade bike dixebitî. Em ji tirsan denediketin derve. Xire xira wesaîtan û avahiyên mezin em tirsandibûn.
Rojekê diya min got, her tişt temam e, emê di demeke kin de ji vir biçin. Bavê min ji bo rê pere dîtibûn, belkî jî deyn kiribûn, lê hayê me jê tine bû. Me careke din tiştên xwe yên navmalê li hev pêçan. Rêwîtiya me her dem cûda bû. Vê carê me tiştên xwe ne li gor rêwîtiya nêz, li gor rêwîtiyeke dûr ya bêveger amade kirin. Ev rêwîtî wê bi trênê pêk bihata. Gulokên nivînên me gelek mezin bûn. Eşyayên me gelek bûn; nîqaşê dest pê kir, em tiştan tevan bibin an na? Li gor hinekan me tişt tev bi xwe re bibiran baştir bû. Li gor hineke din, ji xwe me nikariya em tiştan tevan bi xwe re bibin. Ya baş ew bû ku me tiştên giran û zêde li cem nasan bihiştan. Li cem me dolab, sindoq, nivîn û merş hebûn. Me nikariya em van tevan bi xwe re bibin. Me tiştên xwe yên zêde ku me nikariya em bi xwe re bibin, li cem mala meta min Refîqe hiştin. Gelekî merş, sindoqa diya min ya bûkaniyê, doşek û lihêf me li mala wan hiştin. Diya min bi tiştên xwe gelekî diêşiya. Herî zêde jî li ber singoqa xwe ya bûkaniyê diket. Lê çara me tine bû, an meyê tiştên xwe li kesên xizan belav bikiran, an jî bi emanet li malekê bihiştan.
Piştî ku me mijara tiştan çareser kir, em li benda tirêna reş rawestiyan. Ji bo tirêna reş bihata û konê me rakira, em çûn îstasyona tirênê. Li îstasyonê em ne bi tenê bûn, bi hezaran kesên weke me hebûn. Ew jî weke me, li ser rêya xerîbiyê bûn. Ne dilê me tenê diêşiya, dilê bi hezaran kesan ji heman cihê, li ser rêya xerîbiyê dişewîtî. Tirêna reş ku bi hezaran kes bi xerîbiyê ve biribûn, hat û li ber me sekinî. Berî bigihîje cem me fêkîniyeke bilind da. Fêkîniya wê banga hatinê bû. Bi hatina tirêna şer re, em pir kêfxweş bûn. Ji me kirî wê keserên me bi dawî bibin û emê ji vî halê ne baş rizgar bibin. Me tiştên xwe li vagona tirênê bar kirin û xwe teslîmî rêwîtiyê kir. Li dawiya tirênê vagonên tiştan hebûn. Ev vagon ji bo doşek, dolab û tiştên din bûn. Piştî ku me tiştên xwe bar kirin, em jî çûn vagona ku emê lê bimana. Ez hê biçûk bûm lê xatirxwestina mezinan û girîna wan kir ku ez jî bigrîm. Diya min dapîra min û meta min bi ser hev de giriyan. Zilam dilê xwe dişidandin, lê ji dilê wan jî agir derdibû. Êşek wisa bû ku nedihat veşartin. Çiqas pêşî lê bihata girtin jî ji ciheke din derdibû. Wê rojê îstesyona trêna Batmanê ji mere mabû. Em têra xwe giriyan.

Rêwîtiya sê roj û sê şevan ya ber bi bajarê Manîsayê ve.

Bi zor û zehmet me xatir xwest û em li trênê siwar bûn. Rêwîtiya me rêwîtiyeke sê roj û sê şevan bû. Em li bendê bûn ka tirên wê me bi kû ve bibe? Yekemîn car bû ez li trênê siwar dibûm û bi rêyek dûr ve diçûm. Ji bilî bavê min ji mala me ti kes bi bajarê mezin ve neçûbû. Li Kurdistanê zilam ji bo eskeriyê bikin diçûn bajarên mezin. Jin ji xwe ji gundekî heya gundekî din nikariyan biçin.
Em li ser rêya metrepolên Tirkiyê bûn. Ber bi bajarên Tirkiyê ve roj û hefte li pêşiya me bûn. Rêwîtiya me ya ji Batmanê heya bajarên Tirkiyê, sê roj û sê şevan wê dewam bikira. Di vê rêwîtiya dirêj de meyê gelekî cih bidîtan. Her wiha me penaberî û koçberî jî tam dikir. Me rewşa kesên bûyin penaber û salên xwe di van rêyan de derbas kirîn didîtin. Tirêna reş, geh em di ber çeman, geh di ber newal û robaran de derbas dikirin. Dema tirên di bin çiyayan de derbas dibû, bi carekê nava tirênê tarî dibû.

Her roj em digihîştin herêmekî û me bajarek didît. Navên bajaran, xanî, avahiyên bilind û kargehan gelekî bala me dikişandin. Her ku me bajarên mezin didîtin, hêviyên me yên li ser paşrojê zêde dibûn. Di vê rêwîtiyê de tişta pir eşkere, di penaberiyê de her tişt zû dihat fêmkirin. însan yan xwe nas dikirin, yan jî xwe wenda dikirin. Ji axa welat, çand û zimanê xwe dûr diketin. Belkî ji ber vê fikarê bû, di nav malbatê de, em zû bi zû bi Tirkî nediaxivîn.
Piştî sê rojan, tirêna reş em li îstasyoneke vala danîn û çû. Weke roja despêkê çawa bi qîrîn hat û em anîn, wisa jî li fêkîniyê da û em danîn. Îstasyona ku em lê danîn kesek tine bû. Min dikir nedikir navê vê derê di hişê min de nedima.
Turgutlu, ev nav ne weke yên Kurdistanê bû. Em nêzî heftiyekê li îstasyonê di bin avahiyeke mezin de ku jê re "langara tirênê" dihat gotin, de man. Li vî bajarî me ti kes nas nedikir. Ji ber vê yekê jî heya kesekî xwedanxêr bihata alîkariya me, emê li wir bimana. Li Turgutlu Kurd gelekî bûn, ev Kurd ji zûh ve hatibûn wir. Li herêma Egeyê havînê her roj qifleya însanan dihatin kar. Kesên ku nasên wan tinebûn, bi rojan li wir diman. Ji ber vê yekê Kurdan her roj heya ber vê îstasyonê dihatin. Weke hinek ji wan re bêjin; wê îro hin kes bên.
Rojekê danê sibê me dît ku bavê min li der ve bi hin kesan re diaxive. Kincên wan jî wek yê me bûn. Di axaftinê de jî baş lihev dikirin. Paşê em fêr bûn ku ew jî bi salan berî hingê weke me di vê îstasyonê de derbas bûne. Niha tev xwedî mal û milk bûn. Bi alîkariya van xwedanxêran, em ji wê îstasyona tirênê xilas bûn. Bi alîkariya wan me ji xwe re malek kirê kir. Navê xwediyê malê Qahwecî bû. Qata yekemîn qahwexane bû, em jî li qata serî diman. Ji ber vê yekê ji xwediyê xaniyê me re digotin qahwecî. Di warê aboriyê de halê me nexweş bû. Kar tine bû û me nekariya kirêya xanî bidin.
Piştî demekê em ji Turgutluyê çûn gundê Manîsa Harmandaliyê. Harmandali gundek xweş bû û biçûk bû. Li herêmê karê çandiniyê pir bû. Li wir di demeke kin de, me dest bi kar kir. Dibistana seretayî me li nav zarokên Tirk xwend. Di nav çandek cûda, zimanek cûda û welatek cûda de em roj bi roj digevizîn. Ya baş ew bû li cem me Kurd hebûn. Me bi hev re kar dikir û em bi hev re diçûn kar.
Ji Harmandaliyê em vê carê çûn Salîhlîyê. Ji Salîhlîyê jî em çûn Tîntîn Mehellesî ku cihê Kurdan bû. Dema em çûn wê derê çend malên Kurdan hebûn. Piştî çend salan ev der bû belediye û paşî jî bû navçe. Her roj bi dehan Kurd dihatin wir. Ji wê derê jî em çûn belediya Sardes ‘Sart’ ku cihek dîrokî ye.
Li metrepolên Tirkiyê li gund û bajaran me salên zehmet derbas kirin. Li metropolên Tikiyê ne meh û ne jî salan jiyana rast nîşanî min nedidan. Zaroktiya min bi veteqîn û dûrketinê derbas dibû. Li gor berê her sal halê me hinekî baştir dibû, lê hin tiştên kêm hebûn. Ti tiştî nikariya vê valahiyê tijî bike. Ev tiştên ku ne bi dest dihatin, girtin û ne jî dihatin dîtin, roj bi roj ez ber bi çîrokeke ne diyar ve dibirim. Di warê ziman, nasname û çand de min xwe ji Tirkan cûda didît. Ew digotin em yek gelin, lê min bi têgihiştina ji vê têza sivik bawer nedikir. Her tiştê me cûda bûn.

Vegera ber bi Kurdistanê ve

Li metropolên Tirkiyê jiyana min di nava lêgerînan de derbas dibû. Ez di nava lêgerîneke ne diyar de bûm. Vê lêgerînê roj û mehên min, sal û temenê min ji destê min digirtin. Her roj ez hinekî nêzî rêya veqetînê dibûm. Li bajarên Tirkiyê min salên dirêj derbas kirin. Li pêşiya min biryardayinek rast hebû. Min biryara xwe dabû, ezê vegeriyam welêt. Ezê bi ser rastiya xwe de, vegeriyam. Bi vê vegerê birînên min yên salan yek bi yek dihatin

dermankirin. Ez bi daxwaza vegerê ji warê bav û kalên xwe veqetiyabûm. Di dilê min de birîna evîneke kûr vebûbû. Her kû diçû, ev birîn kûr dibû û ez weke birîndarê li benda evîndara xwe dinaliyam. Ez weke penaberekî ji welat derketim û weke kesekî xwedî raman vegeriyam. Salên min ku bi evîna welat derbas bûbûn, di dawiyê de ez bi ser rastiyê ve vegerandim. Evîna min ya welat, dem û dewran, sal û zeman derbas kiribûn. Derd û kul li xwe bar kiribûn. Ji çavên evîna min rondik dibariyan; xêliya li ser rûyê wê ji xwînê nedihat dîtin. Evîna min bi jan bû; dilbikul bû û hesret li xwe pêçabû. Di bin dijwariya dagîrkerên hov de hatibû hiştin. Rondikên çavan axa welatê min av didan. Ji ber ku min ew bê dem û bi tenê hiştibû, min xwe weke kesekî sûçdar didît.
Dema ez ji welatê dûr, welatê xerîbiyê vegeriyam, welatê bav û kalan ji min aciz nebû û hatina min pejirand. Bi tevî xweşikbûna xwe welatê bav û kalan hatina min pêşwazî kir. Kaniyên welêt ji bo vegera min sipas dikirin û diherikîn. Çiyayên bilind çiyayên bê sînor silav didan min û şervantiya min. Mala Eliyê Unis li ser zinaran li min dinêrtîn. Bi hatina min gelek kêfxweş bûn û ez ji dil pêşwazî kirim. Destûra bê sînor ji bo min hatibû dayîn. Êdî ez jî yek ji wan kesan bûm ku ji bo azadiya gelê xwe şer dikirin. Ez jî ji bo azadî û serxwebûna gelê xwe ketibûm rêyek dûr. Di nava çîroka ku şîroveya wê nehatibû kirin. Li gor ku bav û kalên min digotin; ne destpêka vê çîrokê hebû û ne jî dawiya wê. Ez roj bi roj nêzî vê çîrokê dibûm û bi kûrahiya wê ve diçûm. Min nizaniya di nav vê çîrokê de çi heye. Deriyên wê yên weke xaçepirsê li ber çavê min bûn. Lê ezê biketima nav û li bersiva pirsên xwe bigeriyam.
Ez ber bi Mala Eliyê Unis ve diçûm. Dibûm mêvanê mala wan. Av û nan didan min. Min jî di nav rêza şergeran de cihê xwe digirt. Wek kesek ji wan bim. Ji min re behsa raperîna xwe ya demdirêj dikirin. Raperîna Mala Eliyê Unis hêz dida min û ez dikirim zêrevanê vê axê. Kalê min di zaroktiya min de behsa vê raperînê dikir. Li ser raperînê wiha digot:
"Zarokên Mala Eliyê Unis li hemberê Roma Reş bi salan şer kiribûn, di çiyayên bilind, çiyayên Helqîs û Mereto de berxwedana herî birûmet nîşan dabûn. Bi zar û zêçên xwe ve çûbûn çiyê."
Kalê min axaftina xwe bi kelegirî û bi zorê bi hev ve girê dida û wiha di got:
"Lê mixabin li hemberê bêbextiya hin eşîran û hevnegirtina Kurdan ev raperîn jî têkçû. Piştî ku raperîn têkçû Roma Reş gund û çiya da ber top û hewanan. Bi sedan kes di çiyayên bilind û di ber kuçan de perîşan bûn."
Bayê vê qederê her dem ji cihekî ve dihat û daf li min didan. Li hemberê vê bayê, ez gav bi gav bi ser rastiya xwe de diçûm. Rastiya ku ez jê hatibûm dûrkirin û ez li gund û bajaran gerandibûm, ez anîm ser bingehê berê danîm. Bayê qederê piştî salên bi eş û şewat berê min da welêt. Ji bo min jiyaneke nû dest pê dikir. Ji aliyekî ve dîsa veqetandin hebû, lê ji aliyê din ve ev yek wê bibûya destpêkeke nû. Min biryara xwe da: Ezê vegeriyam ser rastiya xwe. Ango ezê vegeriyam welêt. Ez dîsa ketim ser rê; rêya birûmet û dûr; rêya ku dawiya wê ne diyar bû. Min baş dizaniya di vê rê de her tişt heye. Êş, mirin û birîndarbûn. Rêwîtiya min ya ji gund heya vir pêvajoyek bû. Ji vir û şûn de li pêşiya min pêvajoyeke nû hebû.

Herêma Amed (Golav) Sason

Rojek ber bi nîvro hayê ti kesî ji min tine bû. Ber bi rawestgeha otobusan a Stenbolê ve çûm. Hevalek li cem min bû, cihê min û rêwîtiya min ji min re got û serkeftin xwest. Dema me ji hev re serkeftin xwest, yekemîn car bû min bi Kurdek re heman hîs jiya.

Heman armanc û heman hîs, di bedena me de digeriya. Ez bi tena serê xwe li otobusê siwar bûm û ketim ser rê. Heya ku otobus ji nav bajêr derket, hevalên min û malbata min di hişê min de bûn. Yek bi yek min hevalên xwe bê xatir diterikandin. Ev jiyana ku ez jê direviyam, ji nav bedena min çîzînî dida der. Min nikariya ez xwe bixapînim û li jiyanek rast bigerim. Min baş dizaniya ku jiyana rast û bi rumet, bi xebat û berdêlê dihat bi dest xistin. Ji bo vê yekê jî minê berdêl bidaya. Lê pêşiya min jiyanek nû hebû. Ev jiyana nû û pîroz hêz dida min. Di vê rêwîtiya ku weke qederê bû û ez careke din vediqetiyam. Vê carê minê rêya xwe diyar bikira. Min wisa kir û piştî salên dirêj rêya xwe diyar kir. Heya Amdê ez hatim. Amed ji bo her kesî cihekî pîroz bû, bê guman ji bo min jî wisa bû. Bi hatina Amedê re ez pir kêfxweş bûm. Ji bo min ferq di navbera herêman de tine bû. Lê dema ku hevalan ji min pirs kirin, bi yek dengî min got,
Ez dixwazim biçim Amedê.
Bi vê biryarê re ez ketim nava vê çîrokê. Ez bi dilekî şikestî ji Kurdistanê çûbûm xerîbiyê, lê bi kêfxweşî vegeriyam. Yekîneya yekemîn ya gerîla ku min dît, yekîneya Sason (Golav) bû. Yekemîn car bû min komek gerîla bidîtan. Nîvê rojê heval hatin û xêrhatina me kirin. Dema heval hatin cem me min hevalekî xwe yê ji Stenbolê dît. Her wiha çend kesên ji gundê xwe jî. Min qet bawer nedikir ku ezê li çiyayê Kurdistanê hevalên xwe yên nas bibînim. Bi dîtina hevalên xwe, ez pir kêfxweş bûm. Hevalê min jî weke min ji Stenbolê tevlî nav refên gerîla bûbû. Li Stenbolê mala me di heman taxê de bû. Ew jî weke min dev ji bajarê mezin berda bû û ketibû vê rêyê. Dîtina wî hevalî wek ava bi ser erdê ziwa de bê bû. Ez rastiyê bêjim, heya ku min hevalê xwe dît, li ser min giraniya xerîbiyê hebû. Min xwe xerîb dihesiband, weke ez hatibim welatekî din. Lê piştî ku min ev hevalê xwe dît, tevî giraniya li ser min çû û ez pir rehet bûm.
Di heman yekîneyê de min çend gundiyên xwe jî dîtin. Van hevalan ji min pirs kirin;
"Tu ji kû derê yî? Navê gundê te çiye"?
"Ez ji Batmanê ji gundê Timoq im, lê ev demeke dirêj e me koçî bajarên Tirkiye Manîsayê kiriye":
Li ser axaftinên min van hevalan wiha gotin:
"Em jî ji Timoq in. Careke din tu bixêr hatî welatê xwe":
Piştî me pirsa hev kir û me hev baş nas kir, hinekî din jî ez rehet bûm û min ji wan hêz girt. Ji ber ku min di yekemîn gava xwe de ev heval dîtin, ez pir kêfxweş bûm. Min qet bawer nedikir ku ezê li çiyayên Kurdistanê hevalên xwe yên berê û gundiyên xwe bibînim. Ez demekê li herêma Sasonê mam û paşê ji bo perwerdeyê çûm biryargehê.

## Geliyê Kûviyan

Biryargeha Amedê li Geliyê Kûviyan bû. Piştî ku em di hin herêmên Amedê re derbas bûn, li Geliyê Kûviyan me dest bi perwerdeyê kir. Li Geliyê Kûviyan hem hêzên biryargehê û hem jî yekîneya şervanên nû hebûn. Geliyê Kûviyan di nav çiyayên bilind de bû. Gelî pir kûr bû û ji hêzên dijmin dûr bû. Hem qereqolên dijmin dûr bûn, hem jî ev der ji bo operasyonan cihek asê bû. Geliyê Kûviyan bi tevahî daristan û zinar bûn. Li ber Ava Sarmê me dest bi perwerdeyê kir. Jimara me hevalên nû hindik bû, ez ne şaş bim em 5 hevalên xort, 2 hevalên jin bûn.Têkoşîneke pîroz li pêşiya me hevalên nû bû, çi ji destê me bihata meyê bikira. Perwerdeya me ji du beşan pêk dihat. Siyasî û leşkerî. Di geliyek kûr û fireh de, weke zarokên ji dayikbûyî me dest bi jiyaneke nû dikir. Ez dikarim bêjim ev perwerdeya yekemîn, ji bo min gelekî baş derbas bû. Em komek heval me bi

hev re perwerde dît. Her wiha hevalên xwedî tecrûbe li cem me bûn. Hevalên ku bi salan di nava şer de mabûn tecrûbeya xwe bi me re par ve dikirin.
Di dema perwerdeyê de gelekî caran operasyon jî çêdibûn. Dema operasyon çêdibûn, em jî weke tevî hevalan diketin nava operasyonê. Şer, birçîbûn, seqem û şevên bêxew pir bûn. Em şervanên nû, me di rojên wisa de gelekî zehmetî dikişandin. Dema operasyon çêdibûn tiştên herî zêde ku em diêşandin, meş bû. Di wan rojan de carna bi rojan, carna jî bi hefteyan em di nav operasyonên leşkerî de dimeşiyan. Di van operasyonan de em gelekî car tî û birçî diman. Di perwerdeyê de me roj û meh li dû xwe hiştin.
Li gelî xwarin û pêxwarina me gelekî kêm bû. Me bingeha jiyaneke nû ava dikir. Di perwerdeya leşkerî de, carna me sêv û tû kom dikirin, carna jî em diçûn masiyan. Di vê perwerdeyê de bîranînên min yên gelekî balkêş hene, ku qet ji bîra min naçin. Hevalên ku me bi hev re perwerde dîtî, bi giştî şehît ketin. Her çiqas mirov bêje ez ji perwerdeyê re ne xerîb im jî, lê paşê derdikeve holê ku di jiyana mirovan de cihekî cuda digire.
Piştî salên dûr û dirêj min baş fêm kir, ku perwerdeya pêşî ku ji min re sivik dihat, çiqas giran e. Perwerdeya tevgerê li ser kaxiz û bi axaftinê diyar nabe. Perwerde roj bi roj di nava jiyanê de derdikeve holê. Kesê ji perwerdeyê baş fêm bike li hemberê dijwariya dijmin û xwezayê li ber xwe dide. Yên perwerdeyê li gor xwe fêm bikin, di rewşên ne baş de, an qut dibin, an jî di şer de dibin qurbana bûyerên şer. Li Geliyê Kûviyan me dest bi perwerdeya xwe ya destpêkê kiribû. Perwerdeya me di mehên havinê de di bin siya daran de pêk dihat. Di bin siya daran de perwerde ne zor, ne jî zehmet bû. Ji aliyekî ve darên bilind, li ser me bejna xwe ba didan, ji aliyê din ve jî ava gelî li ber me weke melodiya mûzîkê diherikî. Em diçûn me ji daran tû û sêv kom dikirin. Di ava gelî de, masiyên mezin û bitam hebûn. Ji bo girtina masiyan me carna mayîn, carna jî bombe bikar dianîn.
Perwerdeya siyasî danê sibê dema dinya bêdeng bûya me didît. Ya leşkerî jî danê êvarê dema tirs û fikarên me li ser operasyonan tine bûna, pêk dihat. Em diçûn meydaneke fireh me dest bi perwerdeya leşkerî dikir. Ji wê demê tişta di mejiyê min de mayî, perwerdeya me ya leşkerî ye. Di perwerdeya leşkerî de carna tetbîqatên rastî jî pêk dihatin. Gelekî caran me guleyên rastî bikar dianîn. Em carna birîndar jî dibûn. Ji çengên xwe, yan ji ji devereke din em birîndar dibûn. Ya rastî, ez di perwerdeya leşkerî de jêhatî bûm. Her roj hevalek dihat û perwerdeya me dida. êdî roj bi roj perwerdeya me ber bi dawiyê ve diçû. Hem siyasî û hem jî leşkerî, me xwe rêkûpêk kiribû. Li biryargehê gelekî heval hebûn. Çûnûhatina hevalan, ji me hevalên nû re bûbû barek giran. Her roj heval dihatin biryargehê û diçûn. Êdî wextê me jî hatibû, me dixwest em jî bifirin. Dema firîna me jî hatibû, lê bi vê firînê re meyê yekemîn car veqetîn jî tam bikira. Emê bi herêmên şer ve biçûna. Roja ku ji bo me wateya wê gelekî zêde bû, hat û li ber me sekinî. Weke em çavên xwe bigrin û vekin, meh derbas bûbûn û perwerdeya me bi dawî bûbû.
Me perwerdeya xwe bidawî kir û xwe ji çûna yekîneyan re amade kir. Yekîneyên nû li ber çavên me xuya dikirin. Hevalên nû û yekîneyên nû li ber çavên me diçûn û dihatin. Yekîne û hevalên di wan yekîneyan de li ber çavên me hevalên nû, dûr û dirêj dibûn. Em li benda agahiya baş bûn ku wê ji me re bihata dayîn. Emê biçûna kîjan herêmê? Ev hevoka bi mucîze wê kengê ji me re bihata gotin? Hevalên li cem min, ji berê ve ji xwe re her yekî herêmek hilbijartibû. Her hevalî yekîneyek li gor dilê xwe kifş kiribû. Bê guman di dilê min de jî cihek hebû. Ji ber ku em hê nû bûn, min xwe ji bo pêşniyarê re mafdar nedidît. Dema ez nû tevlî gerîla bûm, demekê li yekîneya Sason (Golav) ê mam. Di wê dema ku ez di wê yekîneyê de mam, ez bi vê yekîneyê ve hatim girêdan. Ev der

yekîneya min ya yekmîn bû ku min heval lê didîtin. Ji aliyê din ve, hem hevalên nas li vê derê hebûn û hem jî ev der nêzî gundê me bû.
Belavbûn!
Vê peyvê li ser jiyana min tevî bandoreke giran hiştiye. Vê peyvê ji bo min, bi xwe re tiştên gelekî girîng anîn. Carna dibû xweşî bi xwe re cihên cuda dianîn. Carna jî dibû veqetîn û dûrketina ji hevalan. Ev peyv ji bo min weke peyvên An û Zemanê hem bi xweşî hem jî bi êş bû. Ev her du têgîn tim diguherîn û qet di şûna xwe de nedisekinîn. Veqetina ku ji bo me tijî êş û jan bû, li benda min bû. Di demeke wiha de kesek naxwaze ji nas û hevalên xwe veqete. Lê di nav şoreşê de ev ne wisa ye, şoreş veqetînê berûvacî dike. Di şoreşê de veqetîn dibe destpêk,dibe naskirina hevalên nû û herêmên nû. Belavbûna yekmîn ji bo min gelekî bi wate bû. Heya îro jî ez wî roja ku yekemîn car ji hevalan veqetiyam, ji bîr nakim.
Demsal havîn bû, wê belavbûna me çêbûya. Wê rojê dinya germ bû, pelên daran vebûbûn. Her pelekî bi cihekî ve dihejiya. Ava gelî li ber me gurgura wê bû diherikiya. Weke melodiya mûzîkê li ber çîroka me digeriya. Herikîna avê bang li min dikir û wiha digot: "Were, were, ezê te bi rêwîtiya dûr ve bibim." Di nuqteyê de liv û tevgereke weke bagerê hebû. Her hevalek bi cihekî ve baz dida û ji bo rêwîtiyê amadekarî dikir. Li meydana îştimayê, ku gelekî fireh bû,ji hevalan rêzeke dirêj çêbûbû. Yek bi yek heval diçûn û cihê xwe di nava rêzê de digirtin. Cihê mangeyên me vala û bê deng mabûn. Cihên ku berê bi hevalan tijî û weke gundekî bideng bûn, niha vala û pir bê deng bûn. Weke gundekî ji cihê xwe rabe, valahiyek ketibû nava nuqteyê. Yek bi yek heval ji bo di rêzê de cih bigirin, ber bi meydana îştimayê ve diçûn. Em jî kesên ji vê rêzê bûn, em jî çûn û me cihê xwe di nava vê rêzê de girt. Yekemîn car bû em hevalên nû me di nava rêzeke wiha dirêj de cih digirt. Piştî ku hevala tevan amadekriyên xwe qedandin, hatin û ketin rêzê. Li ser me bêdengiyeke mezin hebû. Qada îştîmayê ji bo min weke merasima cenazeyan bû. Çavên me tevan li hev û li rêzê bû. Kî hatiye û li kû ye? Me mêze dikir. Bê guman em hevalên nû, em li cem hev bûn. Weke kesên ku bi hev re hatibin û dîsa bi hev re biçin, em li cem hev ketin rêzê.
Fermandarê biryargehê ji bo axaftinê hat û li pêşberî me sekinî. Em heval tev di rêzê de amade bûn.
Fermandar weke baz bi lez derket pêşberî me û li pêşiya me tevan axaftinek kir. Fermandar di axaftina xwe de bi giranî hişyarî dan. Li ser çalakî û girîngiya pêvajoyê sekinî. Di axaftina fermandar de hişyariyên dayikan, yên ji bo zarokan hebûn. Weke dayika ji zarokên xwe veqete, di bin awirên giran de em ji kûr ve hişyar kirin. Çav û ziman wê rojê ji hev dûr bûn. Di wê demê de her hevalek di nava hêstên giran de bû. Dilên me kûr dinaliyan, lê em mecbûr bûn. Axaftina Fermandar hem di dilê me de hêrseke dijwar vekir, hem jî hişyariyên wî ji me re bûn mînak. Me ji çûyinê re deqîqe dijmartin.
Di axaftinên fermandar de ji bo me hevalên nû hişyariyên girîng hebûn. Fermandar di axaftina xwe de wiha digot:
"Ji bo we hevalên nû pêvajoyeke nû dest pê dike. Hûnê biçin yekîneyên xwe, xwe ji rojên giran û serkeftî re amade bikin."
Hişyariyên ku ji me re hatîn dayîn, weke roja despêkê hê jî di mêjiyê min de mane. Em di rêzê de amade û li benda diyarkirina yekîneyên xwe bûn. Piştî ku fermandar axaftina xwe bi dawî kir, xwendina navên hevalan yek bi yek dest pê kir. Hevalên navên wan dihatin gotin û yekîneyên wan diyar dibûn, ji rêzê derdiketin diçûn û li cihekî pêş disekinîn. Rêza ji bo min bi qedir û qîmet bû, hat û li ber me hevalên nû sekinî.

Dr. Elî berpirsiyarê eyaleta Amedê bû, yek bi yek ji me hevalên nû pirs kir;
"Pêşniyara we heye"an, na?
Hevalên li cem min, her yekî tiştek got û pêşniyara xwe kir.
Mehsûm di pêşniyara xwe de wiha got:
"Ez dixwazim biçim Batmanê û di nav gel de xebatê bikim"
Mazlûm jî di axaftina xwe de wiha got:
"Ez cihekî pêşniyar nakim, ji bo min her cih yek e."
Mezlûm û Mehsûm kûrxaltiyên hev bûn, bi hev re tevlî refên gerîla bûbûn. Her duyan jî dev ji xwendina xwe berdabûn û tevlî nav refên gerîla bûbûn. Di belavbûnê de her yek çû herêmeke Amedê.
Dr. Elî hat li ber min sekinî û wiha got:
"Azad, tu kîjan herêmê dixwazî, di dilê te de cihek heye"?
Min dizaniya ji berê ve cih hatine diyarkirin, lê dîsa jî min bersiva wî da:
"Na, di serê min de cihek tine, ji bo min şert û merc ferq nakin, li kîjan herêmê şert û mercên gerîlatiyê zehmet bin ez dixwazim biçim wê herêmê".
Dr. Elî li ser axaftina min, hinekî li min mêze kir.... "diyar e tu ji xwe bawerî, tu ji bo her derê amade yî"?
"Erê".
"Tu ewqasî ji xwe bawerî"?
"Erê, ez ji bo her derê amade me":
Ev saeta ku ez tê de bûm, di rêwîtiya min ya dûr û dirêj de wê rûpeleke nû vekira. Di vê qederê de ez di nav çîrokekê de diçûm. Ev rêwîtî wê ez li çiyayên Kurdistanê, roj bi roj û herêm bi herêm bigerandam. Çiyayên Xerza, çiyayên Amedê di bîra min de bûn. Ezê nêzî gundê xwe bibûma. Piştî salên dirêj minê dengê ava gundê xwe bibihîsta. Piştî salên dirêj minê li gundê xwe di nav ava newalê de guhdarî dengê çûk û beqan bikira. Ezê li çiyayê Xerza bibûma mêvanê bê dawî. Di van çiyayan de minê meh û sal bijmartan û hevalên nû nas bikiran. Min di rêwîtiya xwe ya dûr û dirêj de dest bi rûpeleke nû dikir. Ez li bendê bûm ka ji bo min di vî rûpelî de wê çi bihata nivîsandin. Wer xuya dikir ku wê vê rêwîtiyê ez di rêyên gelekî zehmet re derbas bikiram. Li ser axa mayinkirî, li ser zinarên bilind ezê bi ketama nav lêgerîna xwe ya ne diyar û wenda. Belkî di nav pora min ya reş de mûyên sipî tijî bibûna. Belkî li ser eniya min xêza kul û derdan vebûya. Lê ez ji her demê zêdetir û ji her rojê bi biryartir bûm.
Dr. Elî ji bo min hê tiştek negotibû. Hat li ber min sekinî û wiha got:
"Azad, emê te bişînin herêma Şehîd Remzî. Baş e, tu çawa dibînî"?
Şehîd Remzî yekîneya Licê bû. Ev herêm herî zêde nêzî Licê bû. Şehîd Remzî di navbera Qulp, Licê, Çewlik û Amedê de bû. Ji aliyekî ve jî digihîşt herêma (Golav) Sasonê. Em hevalên nû ji hev belav bûn. Her yek ji me, em bi cihekî ve çûn. Ez bi tenê diçûm yekîneya Şehîd Remzî.
Taximeke heval ji bo herêma Şehîd Kendal hatibûn destnîşankirin. Ji ber ku rêya herêma Şehîd Kendal di Şehîd Remzî re derbas dibû, ezê bi taxima Şehîd Kendal re heya yekîneya Licê biçûma. Min ya di dilê xwe de negotibû; lê ez ne li benda vê biryarê bûm. Min dixwest ez biçim herêma Şehîd Kendal, an jî (Golav) Sasonê. Ya di di lê min de ev bû. Lê ez ne li dijî vê biryarê bûm jî. Min ya di dilê xwe de careke din ji Dr. Elî re diyar kir:
Ji bo min ne pirsgirêk e, ez ji her cihî re amade me.

Piştî ku yekîneyên me û rêwîtiya me diyar bû, em ketin rê û ber bi herêma Şehîd Remzî ve meşiyan. Heya em gihîştin herêma Şehîd Remzî min çend caran ji hevalên ku diçûn Şehîd Kendal daxwazî kir:
"Min jî bi xwe re bibin Şehîd Kendal, ez dixwazim bi we re bêm".
Lê mixabin daxwaziya min nehat qebûlkirin. Ez ji bo yekîneya Licê diçûm û hevalên din jî diçûn Şehîd Kendal. Hevalê Mahsum jî diçû Şehîd Kendal. Di meşê de min çend caran, daxwaziya xwe ya Şehîd Kendal dubare kir, lê fêde nekir. Bi vî awayî em heya herêma şehîd Remzê hatin.

Şehîd Remzî

Em hatin herêma Şehîd Remzî li nuqteya Qurmikê gihîştin cem hevalan. Hevalên yekîneya Şehîd Remzî tev ji min re xerîb bûn. Dema em gihîştin yekîneyê, min careke din ji berpirsiyarê hevalên kû diçûn Şehîd Kendal Demhat xwest ku min jî bi xwe re bibin. Demhat bersiveke wiha da:
"Nabe hevalê Azad nabe, belavbûna te ji bo vir hatiye çêkirin, em nikarin bi serê xwe te bibin Şehîd Kendal. Li vir bimîne hinek tecrube bigre paşê emê te bibin Şehîd Kendal."
Min serê xwe xist ber xwe û li şûna xwe mam. Şehîd Kendal ji min re bûbû evînek, evîna bê derman. Ez li benda dermanê birîna xwe bûm. Lê derman gelekî dûr û zehmet bû. Ezê çawa bigihîştam wê? Ez bi taxima Şehîd Kendal re heya herêma Şehîd Remzî hatim û li wir mam.Herêma Şehîd Kendal herêmeke şert û mercên wê zor bûn; çiya lê kêm bûn, piranî ji deşt û zozanan pêk dihat. Ez jî ji piratîka gerîla re nû bûm, ji ber wê yekê, hevalan ez bi xwere nebirim.
Danê êvarê ji bo hevalên diçûn, torenek hat çêkirin.Hevalan ez li yekîneya Şehîd Remzî hiştim û çûn. Min ji Mahsum xatir xwest û bi rê kir. Dema toren çêdibû û heval diçûn, bûyereke qet nebaş rûda. Dema em ji biryargehê ketîn rê, fermandarê biryargehê çeka hevalek girtî xwestibû bidin min. Lê ji ber ku ez wê rojê li serê çiyayê Kel Tepe-Çiyayê Rut-di nobetê de bûm haya min jê tine bû. Çek danîbûn cem Şiyarê Dêrxustê. Lê haya min jê tine bû. Piştî em gihiştin yekîneya Licê hevalan ji min re rastî gotin. Min çek rakir û got, ez nadim ti kesî. Ez hê nû bûm, çeka ku ji bo min hatî veqedandin sivik û gelekî xweşik bû. Hevalan çend caran ji min xwestin, lê min neda. Ew wisa fikirîbûn ku dema heval bikevin ser rê, ezê çekê bidim wan. Berî îştimayê fermandarê taximê hevalê Kawa çek ji min xwest. Lê min got ez nadim. Li ser vê yekê pir aciz bu û bi min re hêrs bû. Li ser vê hêrsê ez şaş bûm û di cihê xwe de mam. Min çek da û ez ber bi mangeyê ve çûm. Ji çavên min bêyî destûra min êstir dibariyan. Di wê bûyerê de ez gelek aciz bûm. Min qet bawernedikir ku di nav partiyê de tiştên wise hebin.
Fermandarê mangeyê Aşît, nîqaşa di navbera min û Kawa de dît. Ji bo min haş bike hat cem min. Dema Aşît hat cem min ruyê min sor bûbûn û çavê min li ber giriya bûn. Bi rastî hatina Aşît ji bo min gelekî baş bû. Bi bûyereke wiha min dest bi pratîkekê dikir. Li herêma Şehîd Kendal bi giştî taximek hevalên xort diman. Ji ber şert û marcan hevalên jin nikariyan li vê herêmê bimînin. Ez wê roja ku ji hevalan veqetiyam gelek êşiyam û şikestim. Li herêma Şehîd Remzî li pêşiya min salên dirêj û hevaltiya pîroz hebû. Min ji xwe re di nav hevalên vê yekîneyê de cihekî baş çêkir. Ji bo vê yekê min gelekî hewil da. Hevalên baş li yekîneyê hebûn, min hevalên weke qehremanan li herêmê nas kirin. Weke hevalê Faîq, Celal, Şiyar, Mahir, Tîrêj û hevala Rozerîn, Binevş û gelekî hevalên din. Min bi van hevalan re hevaltiyeke baş da destpêkirin. Ji ber ku li yekîneyê hevalên baş hebûn, min zehmetî nekişand. Bi her hevalekî re bîranîneke min ku qet ji bîra min

naçe, çêbû. Li vê yekîneyê min dest bi jiyaneke nû dikir, heval jî ji min re dibûn alîkar. Her hevalekî yekîneyê bandor li min dikir. Ez ji her hevalî fêrî tiştekî dibûm. Hevalê Faîq bandora hevaltiya çalakger û xebatkar, li ser min dihişt. Di şexsiyeta xwe de, mînaka milîtantiya PKK'ê bû. Hevala Rozerîn û Binevş jî rêhevaltiya rast ya jinê, ya di nav paritêyê de nîşanî min dan. Bi şexsiyeta van hevalan min cihê jinê yê di nav partiyê de nas kir.
Cihê hevalê Tîrêj ji bo min gelekî cuda bû. Hevalek dilpak rûken û karker bû. Gelek bîranînên me bi hev re çêbûn, ev bîranîn hê jî di bîra min de ne. Min di piratîka yekîneya Şehîd Remzî de, bi hevalên yekîneyê re hevaltiyeke baş dabû destpêkirin. Lê hevaltiya min û Tîrêj gelek balkêş û jîndar e û heya niha jî germ e.Hevaltiya me xwedî bîranînên girîng û watedar e. Em bi hev re di nava operasyonan de gelek caran, birçî û tî man. Çend caran em bi hev re di nav operasyonan de ji hevalan qût bûn. Gelek bûyerên wiha yên ku ji wê demê ve mayin, hene. Gelekî aliyê Tîrêj yê nayên jibîr kirin hebûn. Lê aliyek wî yê baş jî ew bû ku, qet nedixeyidî û ti caran aciz nedibû. Hun jê bixeyidîna jî, ew ji we nedixeyidî. Tim rûken bû û yarî dikirin. Qet moralê xwe xira nedikir. Hevaltiya ku min di jiyana malê de nedîtibû, li nav refên gerîla roj bi roj min bi dest dixist.
Xewnên min di nav refên gerîla de zîndî bûbûn.
Lê belê ev hevalên ku ez behsa wan dikim, roj hat, yek bi yek ji herêma Şehîd Remzî veqetiyan. Hinek ji wan şehîd ketin, hinek jiwan jî bi herêmên cuda ve çûn. Tîrêj çû Şehîd Kendal, Rozerîn çû Gencê û hevalên din jî her yek bi cihekî ve çû. Piştî ku hevalên nas ji herêmê çûn, ez, Faîq, Celal û hin hevalên din, em di yekîneya Şehîd Remzî de man. Hevalên nû kom bi kom dihatin yekîneya me.Hevalên nû cihê hevalên ku diçûn tijî dikirin. Me tecrûbeya xwe roj bi roj bi van hevalan re par dikir. Êdî ez jî li herêma Şehîd Remzî, di kar, xebat û naskirina herêmê de xwedî tecrûbe bûm. Meh û salên min bi vî awayî di navbera herêmên Şehîd Remzî, Apê Mûsa, Akdax, Genc û Sasonê de derbas dibûn. Ji Licê heya Gencê, ji Amedê heya Farqînê û ji Sasonê heya Batmanê em diçûn.
Rojekê biryargehê bang li yekîneya me kir, em ketin ser rê û çûn biryargehê. Li gor min ji bangê fêm kirî, wê di nav yekîneyê de guhertina cih çêbûya. Lê ji bo ku mirov di karê xwe de kûr bibe, herêmên cuda bibîne û hevalên nû nas bike, belavbûna di nav herêman de pêwîst e. Li herêmên Bakûrê Kurdistanê her roj operasyon dihatin lidarxistin. Me carna bi mehan carna jî bi salan hev nedidît. Dilê me bi hesreta dîtina hevalan dişewitî. Di rojeke wiha de biryargehê bang li yekîneya me kir. Weke her carê gava bang li me dihat kirin, em diçûn. Dema ku em diçûn jî me gelekî heval didîtin. Civîn dihatin lidarxistin û talîmat dihatin xwendin. Hindik be jî vê em serwext dikirin.
Li ser bangê em ketin ser rê û ber bi biryargehê ve meşiyan. Ji ber ku meyê gelekî heval bidîtan, em pir kêfxweş bûn. Careke din me çiya û zozan derbas kirin. Li çiyayê Hîndîv em li binê daran rûniştin. Bi dilgerimî ez ketim xewjînan. Di dilê min de hestek hebû; an ezê biçûma herêmeke din, an jî wê hin hevalên din bihatan yekîneya me. Hevalên ku me bi mehan hev nedîtibû, em li benda hevdîtina wan bûn. Berdestê sibê em gihîştin ber nobedarê biryargehê. Nobedar bi dilekî kêfxweş yek bi yek silav da hevalan. Wê şeva tarî dema me nobedarê biryargehê dît, çawa ku me bi carekê heval tev dîtibin, em dilgerm bûn. Dema em gihîştin cem hevalan berdestê şeveqê bû. Dem dema operasyonan bû. Ji bo bêhnvedanê hevalan em li cihekî bi cih kirin. Em ji rêya dûr dihatin û gelek westiyabûn. Piştî çend saetan ku me bêhna xwe veda, dinya ronî bû û em rabûn.

Liv û tevgera operasyonê xûya nedikir. Hevalan ji me re pêxwarina pêwîst anîn, me taştêya xwe xwar. Piştî taştê çend saet derbas bûn, liv û tevgera hevalan her ku diçû zêde dibû. Ji bo çûna cem hevalan, me ji berpirsiyarê mangeyan destûr xwest. Em rabûn, ketin nava dar û beran li hevalên nas geriyan. Her kes li hevalên xwe yên nas digeriya. Yên ku bi meh û salan hev nedîtîn.
Piştî me heval dîtin, wê rojê me têra xwe derd û kul bi hev re parve kirin. Piştî nîvro êdî me xwe ji civînê re amade kir. Me ûsila biryargehê dizaniya; me ling biavêta biryargehê, an perwerde hebû, an jî wezîfeyek çêdibû. Lê bi rastî perwerdeya biryargehê ji bo me gelek baş bû. Li biryargehê ji bo yekîneya me civîn hat lidarxistin. Ji ber ku zivistanê di yekîneya me de, pirsgirêk derketibûn, di civînê de min fêm kir ku wê yekîneya me belav bibe. Ji bo çareserkirina pirsgirêkan, berpirsiyarê biryargehê Dr. Elî û Hêvîdar - berpirsiyara PJA'yê ya şaxê Amedê, şehîd ketiye- hatibûn cem me. Ji ber ku pirsgirêk zivistanê derketibûn, şert û mercên zivistanê derfet nedidan ku pirsgirêk çareser bibin. Wê zivistanê berf gelek bariyabû, me nikariya em derkevin der ve. Di demeke wiha de me nikariya em hevalan ji cihê zivistanê bişînin cihekî din. Li çiyan zivistanan heval zêde nedigeriyan. Di navbera yekîneyan de çûn û hatin gelekî kêm bû. Ji ber van şertên min gotin, çareseriya pirsgirêkên me ji bo biharê hatibûn talok kirin.
Bi vê civîna me ya li biryargergehê, wê pirsgirêkên taloqkirî bihatan çareserkirin. Piştî civînê em di nav nuqteyê de belav bûn. Em dîsa ber bi kûrahiya bîranînên berê ve çûn. Em her yekî çûn cem hevalên xwe û me bîranînên xwe ji hev re gotin. Ez bi bîranînên borî ve çûm.
Meh û sal, li ber çavên min derbas dibûn. Min dizaniya belavbûn li pêşiya me ye. Li biryargehê dema em dihatin cem hev, axaftinên me yên sereke li ser hevalên şehîd bûn. Hevalên ku bê xatir em hiştibûn û çûbûn. Li biryargehê ne mumkin e ku mirov bêhna xwe vede, kar û bar qet naqedin. Piştî çend rojan me karê xwe bi dawî kir. Ji me re rêwîtiyê xuya kir. Dîsa li pêşiya me veqetîn hebû. Weke her carî belavbûn ket rojeva me. Di nava gerîla de her kombûn belavbûn e. Her belavbûn jî di heman wextî de veqetîn û destpêkeke nû ye.
Her xweşî bi xwe re êş û janê tîne, her êş û jan jî bi xwe re rojên xweş û serfiraz tînin. Li pêşiya me rêyeke wiha hebû, meyê careke din ji hevalan xatir bixwestan. Wan jî weke yekîneyên berê em bi rê bikiran.
Weke kesên ku êdî qet hev nebînin meyê ji hev xatir bixwestan û hev hembêz bikira. Weke kesên, ku wê bi serkeftinan vegerin, hevalan emê bişandan.
Emê ji biryargehê, weke kesên barên wan giran bilez biçûna û weke kesên bi hêviya serfiraziyê, ji biryargehê dûr biketan. Ji aliyekî ve ev belavbûn ji bo min baş bû, ji aliyê din ve, ez bi vê belavbûnê re xemgîn dibûm. Laşê min sivik dibû û xwîna min dikeliya. Bi vê belavbûnê re careke din ezê ji hevalên ku em bi salan bi hev re mabûn, veqetiyam. Me bi hev re xebata rûmetê meşandibû. Bîranînên me, ez bi hin hevalan ve wisa dabûm girêdan ku, ezê bi zorê ji wan veqetiyam.
Belkî hûn dixwazin fêr bibin, ka ev heval kî ne, ji bo min xwedî cihek çawa ne? Min ji we re behsa salên dûr û dirêj û hin hevalan kiribû. Sal ji xwe her tim derbas dibin, ti kes nikare pêşî lê bigire. Lê ez dixwazim vê yekê bêjim; serhatiyên me yên li herêma Amedê qet ji bîra min naçin. Hûnê bêjin ev serhatî çi ne? Bîranînên kîjan hevalan in? Bîranînên ez behsa wan dikim yên wan hevalan in ku çûn çalakiyê û careke din venegeriyan.
Ezê behsa hevala Binevş û Rozerîn bikim. Ev her du heval, du keçên Kurd yên çeleng bûn. Piştî çalakiyên fedayane di pratîka herêma Amedê de cihên xwe di nav rêza qehremanên çeleng de girtin. Ezê ji we re kurte çîroka van hevalên çeleng bêjim.

Binevş

Dema ez hê nû tevlî nav refên gerîla bûyîm, li Geliyê Kûviyan, me perwerede didît. Li biryargehê gelek heval hebûn. Hevala Binevş jî wê demê li wir bû. Lê li erdê dirêjkirî, birîndar bû. Bi halê Binevş ez gelek dêşiyam. Em hê nû hatibûn çiyê, em xurt û li ser xwe bûn. Lê Binevş birîndar û bi alîkariya hevalan li ser linga dima. Di çalakiyekê de birîndar bûbû. Li Amedê rojekê operasyoneke berfireh derketibû. Di vê operasyonê de dijmin komek heval dixe kemînê. Hevala Binevş jî di nav vê komê de ye.
Ji bo hevalên di kemînê de, komeke heval hewl di din ku rêyekê vekin. Bi vî awayî bi ser çeperên dijmin de diçin. Bi vê hewldana hevalan yekîneyek heval ji kemîna dijmin rizgar dibe. Wê rojê dijmin çekê giran bi kar tîne. Hevala Binevş xwe û hevalên xwe ji wê kemînê xilas dike. Lê belê hevala Binevş giran birîndar dibe. Dema me perwerde didît, Binevş dihat dermankirin. Birîndar û li erdê bû. Hevaleke ciwan bû, bejna wê dirêj weke şitla rîhanê bû. Çavên wê weke ava behrê şîn dikir û diberiqîn...
Çavên hêşîn wek belga darên biharê bûn. Hê li biryargehê vê hevalê bala min kişandibû. Çend caran em rastî hev hatibûn û em bi hev re axivîbûn. Hevalên li biryargehê li me hevalên nû temaşe dikirin; ka kîjan heval di kîjan warî de jêhatî ye. Di wê dema ku me perwerdeya xwe bi dawî dikir, roj bi roj, hevala Binevş jî bi ezmekê xurt baş dibû û dimeşiya. Êdî ne li erdê raketî bû, digeriya û kar dikir. Her wiha pêşniyar jî kir ku biçe pratîkê. Piştî me perwerdeya xwe qedand, em çûn yekîneyan. Bi çûna me re ew jî çû yekîneya Gencê. Piştî wê rojê min û wê me çend carên din jî hev li biryargehê û li cihên din dît.
Rojekê em dîsa li biryargehê bûn. Me karê xwe qedand em ji biryargehê vedigeriyan. Lê vê carê bi me re hevala çeleng û bedew jî hebû. Di vegerê de, bi me re hatibû. Me nizaniya ji bo çi bi me re tê yekîneya me. Ji xwe pirseke wiha ne di cih de bû. Bi vî awayî em heya yekîneya xwe hatin. Li herêma me operasyon li ser hev dihatin lidarxistin. Pêwîst bû em li herêmê çend çalakiyan li dar bixin. Bi vî awayî meyê pêşî li operasyonên dijmin bigirta. Me xwe ji bo çalakiyekê re amade dikir. Li gor planê, emê biçûna li ser rêya Amed û Gencê, meyê hem kemîn daniya û hem jî çalakiya mayinê pêk bianiya. Me xwe amade kir emê ji yekîneyê ber bi cihê çalakiyê ve bi çûna. Hefteyek an jî du hefte emê ji yekîneyê dûr bimana. Ji ber ku emê biçûna çalakiyê em heval tev kêfxweş bûn. Em ji çûnê re amade bûn. Hevalên yekîneyê ji bo me toren amade kiribûn. Yek bi yek me ji hevalan xatir xwestin û em çûn. Piştî em ji nav nuqteyê derketin û bi qasî sed mitran meşiyan, hevala Binevş li ber çavê me ket. Weke eqîdeke serbilind bi tena serê xwe li ser rê, li benda me bû. Ji nuqteyê nêzîkî sed mitran dûr, bi tenê li benda me bû. Me qet tişteke wiha nedîtibû. Di demên wiha de heval tev li cihekî kom dibûn û hevalên diçûn bi rê dikirin. Lê vê carê hevaleke bi serê xwe li ser rê li benda me bû. Dema em gihîştin cem, yek bi yek em bi rê kirin. Ew xatir xwestin li me giran hatibû. Wê rojê min di dilê xwe de wiha got:
Ev heval çima bi tenê me bi rê dike? Çima ne li cem hevalan, li vir? Di serê me de guman hebûn. Diyar bû rêwiyê rêya rastîn ne em bûn, ew bû.
Binevş biryara xwe dabû, wê nikariya li hemberî komployan bêdeng bimîne. Çavên şîn weke ava behrê kûr bûbûn û di nava xwe de tîrêjên rojê didan ser me. Tîrêjên çavên wê em digirtin nava xwe, bi kûrahiya jiyaneke ne diyar ve dibirin. Em bi nav çîrokeke dirêj û bê dawî ve dibirin. Me nikariya ji wê têsîrê xwe bidin alî û rizgar bikin. Ew gav, ew dem, weke bizota agir di bedena me de cih vedida. Em ji dilê xwe birîndar bûn, birîna me hem

diêşiya û hem jî xwîn diherikî. Ji bo başkirina birînê ne derman hebû û ne jî wext. Ev hevdîtina me ya dawiyê bû. Êdî meyê hev nedîta. Ev hevala çavşîn û bejin bilind wê bi rêya dûr ve biçûya û nehata. Her wiha hevalên dawiyê yên ku Binevş didîtan em bûn. Piştî vê hevdîtinê ne meyê ew bidîta, û ne jî ewê kesekî din bidîta. Ji bo wê em hevalên dawiyê bûn.
Ev hevdîtin ji her du aliyan re jî pir zor bû. Bê guman êşa Binevşê ji ya me tevan dijwartir bû. Biryareke rast û ewçend jî zehmet dabû. Di şertên dijwar de, weke çelengekê derketibû pêş û biryara ceribandina rêya azadiyê dabû. Xwe ji hevdîtina pakrewan û çelengan re ama dikir. Di nava çend rojan de jiyana xwe tev, zaroktî, dê û bavê xwe bi bîr anîbû. Salên xwe yên di nav partiyê de û hevalanên xwe tev di ber çavan de derbas kiribûn. Bê guman Binevşê qanûna jiyanê diceriband. Di vê ceribandinê de li hemberî komployan û xiyanetê isyan dikir. Serî hildida. Ev çi qanûn bû, ev çi xweza bû!....Nayên zanîn û nayên naskirin.
Me xatirê xwe xwest û em bi dilê şikestî ji cem Binevşê dûr ketin. Em ketin ser rê ber bi Çiyayê Cum-Cum Tepesî- ve meşiyan. Me ji çalakiyeke mezin re amadekarî dikirin. Bi ser çûna me de sê roj derbas bûn. Me lez dabû xebata çalakiya xwe. Ji bo çalakiya me baş derbas bibe, me xebata xwe di şertên xeter û zehmet de pêk dianîn. Cihê ku meyê çalakî lê pêk bianiya, li ser rêya Amedê bû. Rê ji Amedê dihat û li cihekî dibû dû rê. Rêyek ber bi Licê û Qulpê ve, rêya din jî bi aliyê Gênc û Çewlikê ve diçû. Li cihê ku rê ji ya Licê vediqetiya û bi aliyê Gêncê ve diçû, meyê li wir çalakiya mayinê pêk bianiya. Cihê çalakiyê li deştê li ser rê bû. Em carna li çiyayên bilind diman, carna jî, ji bo em karê xwe bi lez bikin, em li herêma Şêlima li nêzî rê, di deştê de di nav gezikan de diman. Herêma Şêlima li deştê bû, ji bo em zû biçin cihê çalakiyê û karê xwe bikin, cihek pir baş bû. Lê eger dijmin em bidîtan, xilasiya me qet tine bû. Hayê me ji xeterê tine bû, tişta ku em li ser disekinîn xebata me bû.
Rojekê danê êvarê em ji cihê xebatê vedigeriyan. Em bi çiyayê bilind ve diçûn. Ji bo em şeva xwe derbas bikin emê biçûna serê çiyayên bilind. Di dema meşê de dema nûçeyên radyoya BBC'î bû. Nûçeyên êvarê dihatin dayîn. Radyo bi Hevalê Kawa re bû û guhdarî dikir. Dema nûçe dest pê kirin, me xwe nêzî hev kir û guhdarî radyoyê kir. Nûçeya yekemîn li ser me bû. Dema nûçeya li ser me hat dayîn, me gohên xwe kûr vekirin û gohdarî nûçeyan kir. Di nûçeyê de wiha dihat gotin:
"Li navçeya Licê ya Amedê gerîlayek yê PKK'ê çalakiya fedayane pêk anî. Gelekî esker birîndar bûne."
Em li cihên xwe sekinîn û me li hev mêze kir. Em ketin nava pirs û lêpirsînê? Kê ev çalakî pêkanîbû? Kesê çalakî pêk anî kîjan heval bû? Ya din,ev nûçe rast bû,yan na, ne diyar bû. Em ketin nava pirsên kûr, me di deqîqeyê de bi dehan pirs ji xwe kirin. Çalakî li herêma Şehîd Remzî pêk hatibû. Ev herêma me bû. Lê haya me ji vê çalakiyê tine bû. Ji yekîneya me kesek neçûbû çalakiyê. Em hevalên xort me li ser vê mijarê, serê xwe êşand û em li pey ketin.

Li vir fotoya Binevş
Nav -Husniye Oruç
Kod- Binevş
Tevlîbûn-1993
Şehadet- 02. 12. 1998
Cih-navçeya Amed Licê
Şêwe-Çalakiya Feyadane a bombeyî

Me berê jî nûçeyên wiha bihîstibûn, em ji bo vê çalakiyê ne xerîb bûn. Lê me nizaniya hevalê çalakî pêk anî kê ye? Piştî ku em li pey mijarê ketin, me dît ku hevalên jin gelekî xemgîn bûne û ti pirsan nakin.
Hevalên jin ne pirs dikirin û ne jî tiştek digotin. Bêdengî û xemgîniya wan, li ser kesê çalakî pêk anî gumanên me zêde kirin. Me ji hevalên jin xwest ku xemgîniya xwe ji me re jî bêjin. Hevala ku çalakî pêk anî nas dikirin an na? Despêkê kesekê ji wan nexwest tiştekî bêje, lê paşê helwesta xwe guhertin. Hevala Rozerîn dema xemgîniya me ya ji ber bûyerê dît, çend gavan bi aliyê me ve hat û dest bi axaftinê kir:
"Hevala ku çalakî pêk anî hevaleke nas e, hevala Binevş e....
Rozerîn mijar bi çend gotinên kin anî ziman. Gava me navê Binevşê bihîst di nav bedena me de birînek kûr vebû û êşeke giran û dijwar di nav de geriya. Bersiva hevala Rozerîn bersivên pirsên me tev dan. Lê di serê me de bi hezaran pirsên nediyar bi cih kirin. Me ne dikarî em li ser mijarê tiştekî bêjin û ne jî êşa xwe bidin rawestandin. Pirsên ku di serê me de çêbûyîn jî ketin nav valahiyên kûr û dûr. Wê demê me baş fêm kir ka Binevşê çima wê rojê bi tenê em bi rê kiribûn. Me sedema tîrêjên çavên wê baş fêm nekiribûn. Me piştî rojan tenêtiya wê ya di nav mangeyekê de û xwefedakirina wê fêm kir. Wêneyên ku hatibûn girtin û teyba ku ji bo axaftina wî ya dawî anîbûn. Ji ber ku haya me ji mijarê tine bû me xwe sûcdar hîs dikir.
Li hemberî serokê gelê Kurd Abdullah Ocalan komplo tim pêk dihatin. Li ser têkoşîna rizgariya gelê Kurd konseptên îmhaker dihatin meşandin. Çalakger û canfîda li hemberî van polîtîkayan nikariyan bêdeng bimînin. Hevala Binevş jî yek ji van kesan bû û li hemberî van polîtîkayan bêdeng nemabû. Wê bi xwe ji bo çalakiyeke wiha pêşniyara xwe kiribû. Piştî demekê cihê çalakiyê navenda Licê hatibû diyarkirin. Binevş li yekîneya Gêncê dima, lê piştî ku cihê çalakiyê Licê hat diyarkirin û yekîneya me nêzî Licê bû hat cem me.
Li yekîneya me, xwe ji çalakiyê re amade kir.
Bombe û teqemenî li xwe pêçabûn û çûbû nava Licê. Bi nasnama kesekê heya nava Licê çûbû. Di nava bajêr de dikanek hebû, leşkeran tim tiştên xwe ji wê derê dikirîn. Hatina wan û saeta wan diyar bûn. Me berî çalakiyê saeta çalakiyê û cihê wesaîtên leşkerî ku disekinîn kifş kiribûn. Di saetên nîvro de leşker bi wesaîtan dihatin û ji bo tiştan bikirin li ber dikanê disekinîn. Esker ji bo kirîna tiştan diketin nava dikanê. Hevala Bineş ji bo çalakiyê xwe li ber dikanê amade kiribû.
Dem disekine û saet disekinin. Belkî wê demê her tişt disekine, lê kes nizane. Belkî çivîkên li ezmanan jî di wê demê de nafirin, lê kes nabîne. Di wê navçeya ku her tişt di bin dagirkeriyê de ye, mirov bi fikar"in û ditirsin.
Dem nîvro ye, wesaîta leşkeran tê û li ber dikanê disekine. Binevş ji bo cara dawî li çiyayê jor Çiyayê Qurmikê dinêre. Li çiyayê Licê ku weke sûrekî li dor navçeyê hatiye pêçan. Dema li çiya mêze dike, yek bi yek heval têne bîra wê. Rêhevalên rêya dûr. Rêhevalên rêya azadiyê û serokatî........serokatî dibe wêneyek û li ber çavên wê disekinin. Sal têne bîra wê, salên dirêj, salên ku bi zor û zehmetî derbas kirîn. Salên ku bi dehan heval bi xwe re birîn. Ji bo cara dawî malbata xwe bi bîr tîne. Belkî di vê demê de, ne dema wê ye, lê ji bo cara dawî, malbata xwe ku bi salan e nedîtiye xeyal dike. Birayên wê, bavê wê û dayika wê ya histu xwar tên ber çavên wê. Dema zaroktiya wê ku li ser çonga diya xwe bû tê bîra wê. Dema ku xame bû û ji mal bê bersiv derketî hat bîra

wê. Ev her sê dem, zaroktî veqetîna ji mal û ev dema ku tê de çi demên dijwar bûn. Zaroktî, ciwantî û rêwîtiya dawî. Jiyana gerîlatî ku ji wê re bûbû jiyana rast li vir bidawî dibû.
Bê destûr ji çavên wê êstir dibarîn ser erdê. Serê xwe radike û li ezmên dinêre. Roj bilind bûye hatiye li ser wê sekiniye. Tîrêjên wê didin nava çavên wê. Di vê demê de dibîne ku du wesaîtên leşkerî ber bi dikanê ve diçin. Di dilê xwe de dibêje dema wesaît bisekinin ezê di nav wan de baz bidim û çalakiya xwe pêk bînim. Wesaîtên leşkerî tên, li ber dikanê disekinin û esker jê peya dibin. Binevş berî ku bombeyên li ser xwe biteqîne, li ser hev siloganan diqîre. Dengê Bijî Serok Apo....bijî Serok Apo....bijî Kurdistan bilind dibe. Bi dengê sloganan re ji nav eskeran dengê teqînek dijwar bilind dibe.
Gelê navçeyê di cihê xwe de şaş dimînin. Paşê fêr dibin ku kesekê çalakiya fedayane pêk aniye.
Di wê pêvajoyê de, çalakiya Binevşê di dilê dijmin de birîneke kûr vekiribû. Li cihekî weke Licê, şandina milîtanan û pêkanîna çalakiyên wiha, têra xwe dijmin tirsandibû. Li gor agahiya ku me paşê ji gundiyan girtin, di wê çalakiyê de gelekî leşker hatibûn kuştin. Hevala Rozerîn li ser çalakiyê, em bi awayekî baş serwext kirin. Piştî me mijar fêm kir, em ketin nava xewjînên kûr û giran....
Her kesî di nava xwe de lêpirsîn dabû destpêkirin û ji xwe re wiha got"
"Hevala Binevş he! Hevala Binevş....xwezî me zanibûya wê biçe.

Hevala canfîda di rêya çûn û nehatinê de ji me re tiştek negotibû. Ji me re bigota ez diçim û venagerim, meyê ji dil hebêz bikira. Meyê êşa xwe bi hev re par bikira. Binevşê ji ber çavên me çû, lê me nizaniya, bi kû ve diçe. Cihê wê li cem min wiha bû. Ji roja despêkê heya roja dawiyê, ji bo min hevaleke xwediyê xeta azadiyê ya jinê û rêhevala serokatiyê bû. Hevala canfîda ji cem me çû û careke din venegeriya. Ji çekên me, bombe û teqemenî li xwe pêçan û çalakiya xwe pêk anî. Hevala Binevş bi rêwîtiya dûr ve çû, çû........
Ji bo bîranînê çend wêne û di kasetekê de dengê wê ma. Tenê çend wêneyên wê man ku her kesî dixwest. Di kasetekê de dengê wê ma ku ti kesî nikariya li ser xwe bigerîne.

Rozerîn.

Hevaleke din ku ez dixwazim basa wê bikim, hevala Rozerîn e. Cihê hevala Rozerîn jî li cem min weke yê Binevşê bû. Hevala Rozerîn berî ez biçim yekîneya Şehîd Remzî, ew li wê derê bû. Ez hê nû hatibûm yekîneyê, dema ez di ber mangeya hevalên jin de derbas bûm, hevala Rozerîn ji min pirseke wiha kir:
"Hevalê Azad tuyê li yekîneya me bimînî, yan biçî?"
Min bi xemsarî bersiva wê da:
"Eger heval min bi xwe re bibin, ez dixwazim biçim herêma Şehîd Kendal, lê eger min bi xwe re nebin ezê neçar li vir bimînim." Hevaltiya min û Rozerînê di yekîneyê de, bi van peyvên paqij dest pê kir û heya dawiyê jî bi vî rengî dewam kir. Rozerîn hevaleke bi aqil û jêhatî bû. Sernerm bû, mêjiyek wê ku zû fêm dikir hebû. Tim xwe perwerde dikir. Di demeke kin de bûbû berpirsiyarê hevalên jin. Kareke giran li kû hebûya baz dida û dikir. Di nav yekîneya me de, yek ji hevalên jin bû ku bi her kesî re di nav danûstanedinên baş de bû. Taybetmendiyeke wê hebû, bi xeta serokatiyê û pîvanên partiyê ve pir girêdayî bû. Qet fikarên şexsî nedikirin, di civînan de radibû pirsgirêk çawa dîtine dianîn ziman.

Di perwerdeyê de jî bi zimanekî vekirî diaxivî. Qet ji bîra min naçe; rojekê ez bûm şahîdê fedekariya wê.
Em komek heval diçûn çalakiyê. Bi me re topa hewanê hebû. Topa hewanê ya neteqayî me kiribû mayin. Hem topa hewanê gelekî giran bû, hem jî rêya me dûr bû. Di serê rêwîtiyê de, Rozerînê hewan rakir û em meşiyan. Piştî demekê ku min dît westiyaye, min jê rê got, ka bide, hinekî ez hilgirim. Lê neda min, got, na ez hê ne westiyame, tu li me miqate be. Min kir û ne kir, neda min. Bi vî awayî piştî ku em gelek meşiyan em ji bo bêhnvedanê runiştin û bi vî awayî me bar jê sitend.
Rojekê dîsa em çûn gundekî, meyê ji xwe re hin tişt bianiyan. Dema em ketin nava gund, em çûn malekê me nan xwar. Piştî me nan xwar xwediyê malê ji me re got kesek nobetê digire an na. Me got erê hevalek li der ve ye. Piştî me nanê xwe xwar, ez çûm da ku nobedar were nan bixwe.
"Hevala Rozerîn, biçe nan bixwe û çayekê vexwe."
"Na ez naçim hundir."
"Çima tu naçî nan naxwî? Biçe tiştek nabe, ezê nobetê bigrim."
"Na, min sond xwariye; divê ez ne li malekê, ne jî li ser avê, neyêm girtin. Ji ber vê yekê jî ez nakevim malê û nan naxwim. Ji min re hinek nan û penîr bixin nav paçekî bînin ezê di rê de bixwim."
Bi vî awayî me jê re hinek nan anî û em ji gund derketin. Dema em ji gund derketin û bi çiyê ve hildikişiyan, nanê xwe bi kêfxweşiyeke mezin dixwar.
Li nêzî yekîneya me navçe û bajar hebûn. Ji yekîneyê heval diçûn û hevalên nû dihatin. Rojekê ji biryargehê notek hat yekîneya me. Berpirsiyarê PJA"yê ya Amedê bang li taxima hevalên jin kir. Hevalên jin li ser bangê, lêxistin û çûn biryargehê. Piştî ku li biryargehê karê xwe qedandin careke din vegeriyan. Hevalên jin hatin, lê hevala Rozerîn ne di nav wan de bû. Min çavên xwe lê gerandin, lê ew nedixuya. Min ji hevala Jiyan wê pirsî: Rozerîn li kû ye, çima nehat.
"Ew çû herêmeke din, rêveberiya PJA"yê ji bo herêmeke din ew wezîfedar kir."
Hevala Rozerîn jî weke hevalên din bê xatir çûbû. Ne xatirek xwest û ne jî got ez diçim.Ji hevalên ku em bi salan bi hev re mabûn, ne xatir xwestinek, ne jî agahiyek da. Bi ser çûna wê ya bê xatir re meh derbas bûn. Min di dilê xwe de veqetînek din ya bê xatir bi cih kir. Minê ji bo demekê hedana xwe bianiya. Lê paşê wê birîna giran û kûr der bibûya.
Li vir foto
Kod-Rozerîn
Cih-Mêrdîn
Şêweyê çalakiyê-li Elezîz avêtina ser qahwexaneya kontrayan
Sal-1999-

Em dîsa li ber radyoyê bûn. Weke her carê me guhdarî nûçeyan dikir. Tiştên ku qet nediguherîn û weke berê diman, belkî jî nûçe bûn. Tim nûçeyên bi êş didan, êşa ku em mecbûrî wan bûn. Me agahiyên xwe bi giştî ji nûçeyên radyoyê digirtin. Sal diçûn, heval diçûn her tişt diguherî, lê em dîsa li ber radyoyê bûn. Radyoya ku xwedî agahiyên baş û nebaş bû. Vê carê jî radyoyê, rêwîtiya Rozerînê ji me re ragihand. Di nûçeya radyoyê de wiha dihat gotin:
"Li Elezîzê tîmek gerîlayê PKK"ê ket nav bajêr û qahwexaneya tîmên taybet dan ber guleyan."
Me ji hev re pesnên vê çalakiyê dan û wiha got:

"Bila dijmin bibîne em çawa heya nava bajaran jî diçin û li wan dixin." Em bi çalakiyê serbilind bûn. Lê hê encamên çalakiyê nehatibûn dayîn. Di nav tîma ku ketibûn bajêr de, Rozerîn jî hebû. Heval ji bo çalakiyekê çûbûn Elezîzê û di nava bajêr de çalakiyek baş pêk anîbûn. Tîma gerîlayan bi moraleke mezin dikevin nava bajêr û qehwexaneya tîmên taybet û qontrayan didin ber guleyan. Çalakiyê baş dest pê kiribû, lê dawiya wê ne diyar bû. Piştî ku ji nava bajêr dengê şer bilind dibe, dor li hevalan tê girtin. Heval dixwazin ji bajêr derkevin. Lê ji çar aliyan ve hatine dorpêçkirin.
Bi sedan tîmên taybet û kontrayên dewletê tên û dor li wan digirin. Heval bi kîjan taxê ve diçin tên astengkirin. Li deriyê kîjan malê dixin derî girtî ne. Heval di dilê xwe de dibêjin, Xweda, ma tevî bajêr bûye dijminê me. Ji bo heval rizgar bibin kesek ne rê nîşanî wan dide, ne jî derî li wan vedike. Hevala Rozerîn û hevalên din di nav taxên Xarpêtê de, ji aliyê tîm û kontrayan ve tên şehîdkirin. Heval li wê derê dibin rêhevalên karwanê şehîdên azadiyê.
Ez û hevala Rozerîn, em carna li ser tiştên piçûk ji hev dixeyidîn. Lê me ji hevalên din zaftir li hev dikir û me ji hev fêm dikir. Hevala Rozerîn bejin dirêj bû, bejna wê weke şitla rîhanê bû. Çavên wê kesper bûn. Di nav hevalên gerîla de min kêm hevalên jin weke wê bi pora dirêj dîtin. Dema ku keziyên xwe berdidan bi şûn ve li behniyên wê diketin. Ew keziyên dirêj mirov dibirin dema gundan. Bê destûr mirov dibû dildarê wan keziyan. Di şexsiyeta Rozerînê de keçên li ser kaniya avê yên xwedî esil dihatin bîra min. Bukên di nav xêliyê de û destên hinekirî. Keçên me ji van gişan bêpar bûn. Hevala kedkar û canfeda, ew jî weke Binevşê bi rêya dawî ve çû. Ew jî weke Binevşê, ji cem me, bê xatir çû. Bi çûna van hevalan, ez zahf êşiyabûm. Her wiha bi çalakiya wan ya fedayane jî ez bi wan serfiraz bûm. Ji ber bîranîna van hevalan ez li herêma Şehîd Remzî hatibûm girêdan. Ev herêm ji bo min xwedî wateyeke giran bû. Ji aliyekî ve bîranêna hevalên şehîd hebûn, ji aliyê din ve jî hevalên mayîn hebûn.  Di vê rêwîtiya dûr û dirêj de, dîsa wextê veqetînê hatibû. Dîsa torena ku li min giran dihat û ez mecbûr dibûm tevlî bibim, li pêşiya min bû. Emê ber bi herêmên nûve biçûna. Meyê cihên cuda û hevalên nû nas bikiran. Ji bo belavbûnê çi tê gotin bila bê gotin, navê belavbûnê giran e. Tijî kul û keser e. Veqetîn zor e, çûyîn heye û carna veger tine ye. Dawiyê dema ku mirov tê û hevalan nebîne, ev ya herî dijwar e. Gava mirov tê û heval nayên û nikarin werin, mirov careke din ji cîhanê sar dibe. û careke din ji cîhanê nefret dike. Piştî evqas bîranîn ku min bi we re par ve kirin, dema belavbûnê jî hat. Hevalên ku wê biçûna, navên wan û yekîneyên wan hatin diyarkirin. Berî nav werin diyarkirin ez ketim nava lêpirsînê. Ez ketim nav hevalan û li agahiyên derbarê xwe de geriyam. Li gor agahiyên min girtin, ez jî tê de, em mangeyeke heval ji bo Şehîd Kendal hatibûn kifşkirin. Gava min navê Şehîd Kendal bihîst, hindik ma ez ji cihê xwe bifirim. Bi vê biryarê ez gelek kêfxweş bûm. Şehîd Kendal, di dilê min de bûbû axîn û keder. Ez nizanim ji ber ku ev herêm nêzî gundê me bû an na. Ez dema nû tevlî gerîla bûm, ez hatim yekîneya Sasonê (Golav). Li Sasonê ji bo rêzan werin û em biçin biryargehê em demekê li wir mabûn. Operasyon li ser hev dihatin lidarxistin, me nikariya em derbasî biryargehê bibin. Her wiha min li yekîneya Sasonê hevalekî xwe yê ji Stenbolê hatî jî dîtibû. Em ji rêya dûr hatibûn, li nuqteya Herhendê em gihîştin cem hevalan. Min ji çiyayên Sasonê, li ser çiyayên bilind têra xwe lembeyên bajêr û navçeyan temaşe kirin. Şehîd Kendal nêzî gelekî cihî bû, ji aliyekî ve Licê, Qulp û Farqîn, ji alê din ve jî deşta Êlihê hebû. Ez ketibûm nava cihekî ku min li kû derê binêriya nasên min dihatin bîra min. Vê yekê hêz dida min ku ez xebata xwe xurtir bikim. Di vê navberê de torena belavbûnê amade bû, heval li benda me bûn. Piştî salan dîsa di heman nuqteyê de belavbûna min çêdibû. Dîsa belavbûn, dîsa veqetîn hebû...

Dîsa cihên nû û hevalên nû li benda min bûn. Hevalên biçûna Şehîd Kendal, amade bûn. Vê carê ez jî di vê mangeyê de bûm. Me yek bi yek xatir ji tevî hevalan xwestin. Li pêşiya tevî hevalan me soz da ku emê li Şehîd Kendal serkeftinê bi dest bixin; Wê soza me pratîka me be.
Bi van hevokan re her kesî di bin awirên çavan de, li me mêze dikir. Hevalan wateyên giran ji çavan didan ser me. Em ji ber wan awir û tîrêjên çavan hêdî hêdî dûr ketin.
Me berê xwe da rêya dûr, çiyayên bilind û kaş...
Me xwe ji bo meşa çend rojan amade kir. Em mangeyek heval ji bo herêma Şehîd Kendal hatin wezîfedar kirin. Vê carê ez jî di nav vê mangeyê de bûm. Ji ber ku diçûm Şehîd Kendal, ez pir kêfxweş bûm. Em mangeyek heval bi herêma Şehîd Kendal ve ketin rê û meşiyan. Rêya me dûr bû, emê ji Geliyê Kûviyan biçûna şehîd Remzî, ji wir jî di deşta Licê de derbasî herêma Şehîd Kendal bibûna.
Sal derbas bûbûn, dem guherîbû, lê daxwaziya min weke roja berê bû. Piştî meşa dû şevan, emê ji deşta Licê derbas bibûna û emê bigihîştan Şehîd Kendal. Me dest bi meşa xwe kir. Êdî ti kesî nikariya, min bide sekinandin. Biryar hatibû girtin û em ketibûn rê. Her gav û her saet min ji xwe re wiha digot: Em paş ve venegerin? Her ku em di deşt û zozanan de derbas dibûn min soz dida xwe. Min soz dida hevalên ku ev rê ji bo me vekiribûn. Em bi kêfxweşî ketin rêya Şehîd Kendal. Ji herêmên ku em tê re derbas dibûn tevahiya hevalan ji me re serkeftin dixwestin.
Em bi çiyayên Geliyê Kûviyan ve -ku nayên pîvan- hilkişiyan. Di çiyayê Kel Tepe,(Çiyayê Lîs) Mezra Miho, Goma Elî û Girê Sor de em derbas bûn. Dema em derketin serê çiyayê Bloka tevî herêmê li ber çavên me bû. Çemê Bloka, Çemê Xizxunûs, Piranzê, dolên Hesen Deyer, Karat û yên din. Ava Karat û Elîmîran li ber çavên me bûn. Piştî hilkişîna ewqas çiyayên bilind dema daketinê bû. Vê carê jî emê ji çiyayên bilind berjêr bimeşiyan. Bi vê meşa berjêr, êdî em diketin herêmeke din. Piştî em ji çiya berjêr meşiyan, em ketin herêma Şehîd Remzî. Şehîd Remzî herêma min ya berê bû. Ez berê li vê herêmê mabûm. Dema em ketin herêmê, hevalan rêzanî dan min. Li vê herêmê min sal û meh jimartibûn. Di van rêyan de bi hevalê Tîrêj û Faîq re em çend caran çûbûn û hatibûn. Ber bi gundê Hindîvê ez ketim xewjîna dîrokê. Em ber bi yekîneya min ya berê ve diçûn. Em gelek westiyabûn, hevalan ji min pirs kirin: "Em li kû dikarin bêhna xwe vedin, cihek wisa heye?
Ji ber ku em gelekî meşiyabûn lazim bû me li cihekî bêhna xwe veda. Min ji hevalan re got, belê li pêşiya me di dolê de gundê Hindîv heye, em dikarin li wir bêhna xwe vedin. Gundê Hindîvê gelek mezin bû, tiştên ku me bixwestan tê de hebûn. Gund li cihekî pir xweş hatibû avakirin. Mixabin ev gund jî weke gundên din yên Kurdistanê ji aliyê artêşa Tirk ve hatibû valakirin. Gund hatibû valakirin, lê dîsa jî tevî xweşikiya wî li ser bû. Gundê Hindîv di qûntara çiyayê bilind de hatibû avakirin û ber bi deştê ve dirêj dibû. Di nav gund de robarek diherikî. Ava robar ji çiyayê bilind dihat. Dema em dihatin ber vî robarî me dixwest em bi saetan lê mêze bikin. Em gelekî caran dihatin û di vî gundî re derbas dibûn. Gundê Hindîv yek ji cihê rawestgeha me bû. Ji bo em di ser ava robarî re derderbas bibin me gelekî zehmetî dikşandin. Gava em digihîştin vir me têra xwe bêhn vedida. Di gund de kes nemabû, lê her tiştê xwarinê hebû. Ji avê bigirin heya sêv, tirî, zerdelî, tû û gelekî tiştên din yên xwarinê hebûn. Her wiha di nav gund de gelekî baxçe jî hebûn. Ji bo bêhnvedanê em li ber ava robarê rûniştin. Dengê avê dikir gurgur û diherikî....
Dengê beqan di ber dengê avê re dihat bihîstin. Li wê derê her tişt bi tenê hatibû hiştin. Mirov bi tenê bûn, dar bi tenê bûn, sewal bi tenê mabûn. Lawir ji ber tenêtiyê reviyabûn.

Sal û meh bêyî mirovan derbas dibûn. Av bi tenê di nav êşeke giran de diherikî. Tenêbûna vî gundî, em gelekî dêşandin.
Min ji xwe pirs dikir; ez çend caran di vir re derbas bûbûm. Bi kî re û kengê? Dem çi bû û hewa çawa bû? Havîn bû an zivistan. Dema ez dihatim û di vî gundî re derbas dibûm, ez diketim xewjînê û bi rojên borî ve diçûm. Ev der ji min re weke cihê bîranîna dîrokê bû. Her tişt li vir zîndî bû û xwe dubare dikir. Êş zîndî bûn, xweşî zîndî bûn. Li vir giraniyeke pir mezin hebû, lê ez nizanim ji ber çi bû. Tim zeman dihat bîra min... zeman çawa derbas dibû... min ji xwe pirs dikir!
Min ji xwe pirs dikir; zeman çiqas dijwar bû... qet li şûna xwe nedima. Li vê herêmê me çi dîtibû û çi kişandibû?... Di van deran de çend heval hatibûn û derbas bûbûn?Çend hevalan li bin siya van daran kilam gotibûn. Çend heval di binê wan zinaran de veşartî bûn; Çend heval ji bo serkeftinê li benda me bûn? Me xwe dabû ber bareke giran. Herêma Şehîd Remzî li ber çavên min bû û ez bi kûrahiya rojên borî ve diçûm. Bîranînên dûr dihatin bîra min. Yek bi yek wêneyên hevalên ku me bi hev re salan derbas kiribû, di ber çavên min re derbas dibûn. Wêneyên Tîrêj, Faîq, Celal, Binevş û Rozerînê dihatin ber çavên min. Min qet ji veqetandinê hes nedikir. Lê ji çûnê min gelekî hes dikir. Daxwaziya gerê bi min re gelekî zêde bû. Min dixwest ez her roj biçim cihekî. Niha jî ez ji vê herêma ku ji min re bûbû cih û war vediqetiyam. Ezê ji cihê xwedî bîranînan veqetiyam. Em careke din ketin rê û bi aliyê Qurmikê ve meşiyan. Hevalên Qurmikê li benda me bûn. Emê şevekê li cem wan bimana û derbasî Şehîd Kendal bibûna.
Berdestê şeveqê em gihîştin çiyayê Qurmikê ku li pişta Licê bû. Em wê rojê bûn mêvanê hevalan. Ev der yekîneya min ya berê bû, min ev der bi giştî nas dikirin. Wê rojê em têra xwe axivîn. Danê êvarê me xwe ji bo rê amade kir. Hevalên min yên berê di xebata me ya nû de ji me re serkeftin xwestin. Careke din veqetîn ket rojeva me. Ez vê carê jî ji hevalên xwe yên berê û herêma xwe ya berê dûr ketim.

Şehîd Kendal

Deşteke dûr û dirêj li pêşiya me bû. Em ketin ser rê û meşiyan. Deşta Licê deşta zor û zehmet, li benda me bû. Ez ji çiyayê Qurmikê bi hêviya rojên serkeftî veqetiyam. Li çiyayê Qurmikê min sal derbas kiribûn, bi sedan heval hatibûn û di van nuqteyan de derbas bûbûn. Çiyayê Qurmikê bi ser Licê ve bilind dibû. Ji aliyê deştê ve Licê, gund û bajar hebûn, ji aliyê çiyê ve jî noqteyên me hebûn. Ji Şehîd Remzî heya Şehîd Kendal, emê du şevan bimeşiyan. Deşt rût û vala bû. Rêyek ne dirêj bû, lê ji ber ku cihên parastgeh lê tine bûn, me du rojan gelek zehmetî kişand. Pêwîst bû di nava du rojan de em rêya xwe biqedînin. Li ser rêya me çend cihên kemînê jî hebûn. Piştî ku em ji cihên kemînan derbas bûn, em ketin deşteke fireh û dirêj. Em ketin deşta Licê û me lez da meşa xwe. Di vê meşa dirêj de em pir kêfxweş bûn. Tevî hevalan em emsalê hev bûn, me zimanê hev fêm dikir. Di nav me de talîmat dayin kêm bû, çi pêwîst bûya, me ji ber xwe ve dikir. Di vê meşê de çend tiştên balkêş hene, ez dixwazim bêjim;
ya yekê, em rojekê ji ber neçariyê, di nîvê deştê de man. Ya balkêş jî ew e ku cihê em lê diman ne ciheke ewqasî girtî bû. Di nava deştê de ciheke weke bênderê hebû, bi roj sewal lê mexel dihatin. Em ji neçariyê bi roj heya êvarê li cihê sewalan man. Me xwe di bin çend gezên biçûk de heya êvarê veşart. Li ber tava havînê, saet derbas nebibûn. Bi roj dewar bi ser me de hatin, dikirin oreor. Lê me dengê xwe nekir.Me xwe li ser erdê dirêj kir û heya êvarê em di cihê xwe de bêdeng man. Bi vî rengî, me roja xwe ya

yekemîn di bin gezan de bê av û bê nan derbas kir. Nîvê rojê hewa pir germ bû, laşê me dixuriya. Me xwe li erdê digevizand. Germa tava wê rojê li ser me kom dibû. Me digot, qey di vê rojê de tevî azadiya me ji destê me hatiye girtin. Me digot, qey çek û rextên me ji me girtine û em li nîvê deştê mane. Me wê rojê nikariya, em ti liv û tevgerê bikin. Di rojên wiha de ji bo bibe êvar, me li ser hev hêvî dikirin. Di rojên wiha zor û zehmet de, em gelekî caran ji wan rojên dirêj aciz dibûn. Piştî ew çend berxwedan, hêdî hêdî roj diçû ava. Tarîtiyê desthilatdariya xwe li ser rojê eşkere dikir. Ji aliyekî ve şeva tarî bi ser me de dihat, ji aliyê din ve me xwe ji rêwîtiyê re amade dikir. Em vê carê jî ji rojên ku em dîl digirtin azad dibûn. Weke kesê bi salan di zindanê de mabin û bi carekê bigihîjin azadiya xwe, em wisa kêfxweş bûn. Em ji roja ronî, xilas dibûn û diketin şeva tarî. Şev ji bo me dema meş û xebatê bû. Şev ji bo me dema azadiyê bû. Me tiştên xwe girê dan û em ketin ser rê. Yek bi yek em ji bin gezikan derketin û ketin ser rêya xwe.
Li pêşiya me bi meşê şevek rê mabû. Em şevekê rê hatibûn û hê jî şeveke din emê bimeşiyan. Di şevekê de meyê xwe bigihanda cem hevalan. Êdî tirsa me nema bû, eger kemîn an jî operasyon tine bûna, di şevekê de meyê xwe biavêta Şehîd Kendal. Di vê meşê de li pêşiya me tişteke din ya balkêş jî hebû. Em li ser rêya xwe carna di nava hinek gund de derbas dibûn, me xwarina xwe digirt. Piştî ku me ji xwe re pêxwarin digirt, li ser rewşa leşkerên Tirk me agahî digirt û em diçûn. Piştî em ji gund derketin em nêzî zeviyên zebeşa bûn. Em ketin nav zebeşan, me hem xwar û hem jî ji bo rê her yekî me hebek hilgirt. Zeviyek ya nasê hevalekî me Rojhat bû. Rojhat digot, zeviyek ji van ya malbata min e. Demeke dirêj bû ku me zebeş nexwaribûn. Zebeşên Amedê binav û deng in.
Şev tarî nîvê şevê bû. Di deştek fireh de em ji her kesî dûr bûn. Gund dûr bûn, çiya dûr bûn. Em bi tenê li nîvê deştê di nav tarîtiya şevê de bûn. Me li ber xwe zebeş kom kiribûn.
Piştî ku me tîna xwe bi zebeşan şkand û me têra xwe xwar, em ketin ser rê. Wextê me kêm bû, di vê şevê de emê heya şefeqê bimeşiyan û emê bigihîştan herêma Şehîd Kendal. Gav bi gav em ber bi herêmê ve diçûn. Her ku em nêzî hevalan dibûn heyecana me jî zêde dibû. Li Şehîd Kendal hin hevalên ku me ji berê ve hev nas dikir jî hebûn. Ji aliyê din ve heyecana dîtina herêma nû jî bi min re hebû. Dem hêdî hêdî dibû şeveq. Berdestê şeveqê em ketin nava herêma Şehîd Kendal. Hevalan moral dan me û gotin, em ketin nav herêma Şehîd Kendal. Bi ketina nav herêmê, weke careke din bême dinê, ez kêfxweş bûm. Hevalên ku herêm nas dikirin, derdor nîşanî me didan. Berdestê şeveqê êdî dinya ronî bû. Em nêzî cihekî rast bûn, me ji hevalê ku herêm nas dikir pirs kir; em kengê digihîjin cem hevalan. Dinya ronî dibû, em aciz bûn. Piştî ku em aciz bûn û me careke din pirs kir. Rêzanê me got, em hatin, ha... ev dera ku hûn dibînin nuqteya hevalan e. Em şaş bûn, me got, li vê rastê û nuqte? Ma heval dîn in?
Em hatin li cihek ser rê sekinîn. Rêzanê me wiha got: Ha ev der nuqteya hevalan e, de keremkin, em biçin hundir, lê pêşî em li dora xwe mêze bikin, bila ti kes me nebîne ku em dikevin nuqteyê.
Em heya ser nuqteya hevalan hatin, lê me hê jî bawer nedikir ku ev der nuqte ye û heval niha li virin. Tirs ket nav dilê min. Li vê deşta rût û nuqte? Piştî em gihîştin cem nuqteyê em bi binê zinaran ve çûn. Dema em ketin nav nuqteyê me mêze kir ku çi ciheke xweş e. Du rê dihatin û di ber nuqteyê de derbas dibûn. Nuqte di bin çiyayekî bilind de bû. Ava newalê ber bi rê dihat û paşê li ciheke teng diket binê çiyê. Nuqteya hevalan di binê zinarên mezin de bû. Av dihat û di nava nuqteyê de derbas dibû. Tişta herî balkêş jî

navê nuqteyê bû. Hevalan navê vir kiribûn Nuqteya Qahweyê. Bi gotina hevalan em li nuqteya Qehweyê gihîşin cem hevalan.
Dema em gihîştin cem hevalan danê şeveqê bû. Hevalan yek bi yek bixêrhatina me kirin. Li vê derê hevalên min yên berê jî hebûn. Tîrêj û Çekdar li vir bûn. Despêkê me hinekî halê hev pirs kir û em hinekî keniyan. Nuqteya Qahwê ji hundir ve gelek xweş bû. Lê ji şer re qet ne baş bû. Min ji Çekdar pirs kir:
"Eger dijmin bi me bihese, wê rewşa me çawa bibe, di vir de em dikarin li ber xwe bidin û şer bikin?"
"Azad, ev der ne weke herêmên din e, ev der Şehîd Kendal e. Li vir nuqte piranî wisa ne, çiya û darisanên gur li vir nînin. Li vê nuqteyê û li tevahiya herêmê rêzik û pîvanên me hene."
Nuqteya Qahwê gelek kevin bû. Di noktê de bêhna kevinbûnê dihat, bêhna hevalên ku di van deran de bi ked û xebatê hatibûn û derbas bûbûn. Rûpelên rojname û pirtûkên kevin hebûn. Di vê nuqteyê de ji bo şer plan hatibûn çêkirin. Birîndar anîbûn û li vir derman kiribûn. Li ber taveheyvê li ser zinaran, li ser pilana şer çi gûftûgoyên germ hatibûn kirin. Ev nuqte hem destpêka herêmê bû, hem jî di navbera tevî nuqteyên herêmê de bû. Ji kû ve hatin hebûya rê dihat û li ber nuqteya Qahwê bi dawî dibû. Herêma Şehîd Kendal bi giştî ji deştê pêk dihat. Li deştê kêmbûna avê jî pirsgirêka bingehîn bû. Lê li vê noqtê berovacî bû. Di nava nuqteyê de ava robarekî diherikî. Me hem ji bo xwarinê û hem jî ji bo paqijiya xwe av bi kar dianî.
Ez, Tîrêj û Çekdar em berê li herêma Şehîd Remzî bi hev re bûn. Pêşî hevalê Çekdar paşê jî Tîrêj hatibû Şehîd Kendal. Hevalên herêmê ji berê ve li benda me bûn. Hevalan ji bo me amadekarî kiribûn. Ji ber ku em ji rêya dûr dihatin, nan û ça amade kiribûn. Li vê herêmê hevalan nikariyan zêde bimînin. Pîvanên gerîlatiyê pêwîst bû yek bi yek pêk bên. Pîvan û şertên gerîlatiya vir pir zehmet bûn. Ji ber van şert û mercan her kes nedihat vê herêmê. Hevalên di hatin jî di nava demeke kurt de diketin şer û şehîd diketin.Ji aliyê din ve hevalên jin li vir tine bûn. Yek ji herêmên ku hevalên jin lê nediman ev der bû. Ji ber ku hem ji aliyê coxrafya û hem jî ji aliyê zexta dijmin ve bi tenê taximeke hevalên xort li vir dima.
Hevalên berî me jî di demeke kin de wendahî dabûn. Ji ber van taybetmendiyên herêmê, jimarek kêm û yên pir bi dîqat dihatin vir. Şehîd Kendal herêmeke teng û dijwar bû. Derdor bi tevahî girtî bû, çiya û zinar kêm bûn. Bi tevahî ji deştê pêk di hat. Dora vê herêma teng û dijwar, ji aliyê cerdevan û dijmin ve hatibû pêçan. Li cihê herî baş eger em biketan şer, meyê wendahî bidan. Ev ji pratîka berê jî hatibû piştrastkirin. Min hevalên ku berî me hatibûn herêmê dîtibûn; Xwendevan, Dijwar, Palo, Mahsûm û yên din. Me bi destê xwe ew ji bo herêmê rêkiribûn. Bi serfiraziyeke mizin, hatibûn herêmê. Wê rojê dîsa weke her carê, dema veqetandinê hatibû. Piştî civînê belavbûn çêbûbû û taximeke heval ji bo Şehîd Kendal hatibû hilbijartin. Tevî hevalên ku hatibûn hilbijartin hevalên xwedî tecrûbe bûn. Wê rojê jî soza serkeftinê hatibû dayîn. Dîsa di bin awirên çavan de, gelekî wate hatibû veşartin û rêwî hatibûn rêkirin. Ew ne yên destpê bûn û ne jî yên dawiyê bûn. Wext hatibû û hevalan yek bi yek xatir xwestibûn. Hevalên bijartî bi kêf û moral ketibûn ser rêya vê herêmê. Piştî heval çûn herêma xwe, em ji wan li benda çalakiyan bûn. Zêde dem derbas nebûbû, lê dîsa jî ji bo Şehît Kendal dema herî kurt demeke dirêj bû. Rojekê ez û hevalekî ji bo mûxaberê em derketin ser çiyayê Kel Tepe (Çiyayê Lîs) me ji bo biryargehê agahiyên li herêman werdigirt. Dema me mûxabere dikir, agahiya xirab ya derheqê hevalên Şehîd Kendal de me wergirt. Ji Şehîd Kendal agir û dûman bilind dibû. Paşê li gor agahiyên ku me standin piştî ku heval digihîjin

herêmê di demeke kurt de dikevin şer û tevî taximekî heval şehîd dikevin. Dema me muxabere dikir û agahî digirt, dûmana şewatê li ber çavên me bilind dibû. Agir ketibû deşt û zozanên Şehîd Kendal û bê navber dişewitî. Agir hatibû heya gundê Rehşanê û derbasî deşta Licê bûbû. Ne tenê deşt û çiya dişewitîn, 12 heval jî di nav agirê dijmin de dişewitîn. Tevî hevalên herêmê, di nava agir de mabûn. Ti kesî nikariya dest bide wan û biçe alîkariya wan. Agir li ber çavên min bi zindî pêdiket. Lê belê tiştek ji destê min nedihat. Dengê hevalan dihat guhên min, hevalê Mahsûm gazî dikir; dikir qîrîn û nalîn. Lê ne ez û ne jî yekî din me nikariya em alîkariya wan bikin. Di navbera me de deşta fireh û çiyayên bilind hebûn. Di navbera me de biryargehên leşkerî hebûn, qereqolên têlkirî û dor çeper hebûn. Eger di navbera me de çiyayek hebûya û rêya bi rojan bûya, emê biçûna û meyê ew xilas bikiran. Lê mixabin û sed car mixabin me nikariya em tiştek jî bikin. Ti tişt ji destê me nedihat. Xwînxwarê talanker bi top û tangan ketibûn nav axa pîroz, dişewitandin û talan dikirin. Ji talanê têr nedibûn vê carê dişewitandin. Dişewitandin, deşt û daristanên me, dişewitandin gund û zeviyên me. Li hemberî vê zilmê, li hemberî vê hovîtiyê wijdan li kû dima. Ne wijdan û ne jî însaniyet hebû.
Ji xwedê neditirsiyan û ji pêxember şerm nedikirin. Dişewitandin dar, dişewitandin deşt û zozanên me, li ber çavên serê me. Min wê rojê wisa li agir temaşe dikir, heya ku Qereqola nêzî me ya Bawerdê topên hewayê bi ser me de barandin. Di wê kêliya ku dilê me dişewitî û bedena me perçe dibû, dijmin dev ji me bernedida. Bi ser me de topên hewanê dibarandin. Yek, du û sê, em mecbûr man ji Kel Tepe(Çiyayê Lîs) xwe berjêr berdin. Min nedixwest ji çiya biçim. Min dixwest ez biçim alîkariya hevalên xwe. Mahsûm hê nû bû, bedena min diheliya, lê ji destê min tiştek nedihat. Ez û Mahsûm em di perwerdeyê de bi hev re bûn. Me bi hev re rojên gelekî xweş derbas kiribûn. Mahsûm xwendekarê Zanîngehê bû, dev ji xwendina zanîngehê berdabû û tevlî refên gerîla bûbû. Di pêşniyara xwe de dixwest biçe xebata nav gel bike. Ew çend meh bûn ku hatibû herêma Şehîd Kendal. Bi hatinê re piştî demekê şehîd ketibû. Em di perwerdeya destpêkê de bi hev re bûn. Me bi hev re mehan derbas kiribûn. Piştî perwerdeyê her yek ji me cihek xwestibû. Me ji hev re pesnên xwe didan, ka wê kî di demeke kurt de serkeftinê bi dest bixe. Mahsûm li ber çavên min diqîriya, wêneyê wî di nava agir de ji ber çavên min bi ezmên ve bilind dibû. Yek, du, sê û çar. Hem rê dirêj bû û hem jî şert û mercan derfet nedidan ku ez biçim û alîkariya wan bikim. Ji ber dengê hewanên ku li ber me diketin, em mecbûr man ji ser çiyê berjêr biçin. Dengê muhabereya me hatibû bihîstin. Qereqola Bawerdê dest bi avêtina topên hewanê kiribû. Heya topa hewanê hat û li ber min ket, ez di xewjînê de bûm. Bi topa hewanê re ku hat û li ber min ket ez ji xewjîna dûr vecêniqîm û şiyar bûm. Em ji neçariyê ji çiya berjêr bûn, lê bi ser me de hê jî topên hewanê dihatin avêtin. Dema em hatin jêr, me rewş ji hevalan re got.
Wateya Şehîd Kendal ji bo min ewqasî zêde bû û roj bi roj zêdetir dibû. Lê îro ez li vê herêmê bûm. Lazimbû me heyfa tevî hevalên xwe bistanda. Li herêmê hin hevalên ku min ji berê ve nas dikirin hebûn. Ev ji bo min kêfxweşiyeke din bû. Minê bi saya van hevalan herêm zû nas bikira. Ev herêm ji herêmên hundir yên eyaletê dûr bû. Carna bi mehan carna jî bi salan me heval nedidîtin. Hatin û çûna ji herêma me gelekî kêm bû. Dema em ji bo xebatekê biçûna herêmên hundir, yan jî em biçûna biryargehê û me heval bidîtan me ev yek ji bo xwe kêfxweşiyeke gelekî mezin dihesiband. Min li rewşa nuqteyê mêze dikir. Ser nuqteyê bi zinaran hatibû girtin. Di nav nuqteyê de ava newalê derbas dibû. Heya kesek nehata ser nuqteyê cihê me nedidît. Roja em gihîştin cem hevalan heya êvarê em bi hev re axivîn. Sal û meh derbas bûbûn. Gelekî tişt guherîbûn, lê tiştên di dilê me de weke berê bûn. Germahiya hevaltiya me hê jî bi me re bû. Piştî

salan min careke din hevalê Tîrêj dît. Hevalê Tîrêj dîsa weke berê rûken, dilpak û xwedî ruhê rêhevaltiyê bû. Di her karî de li pêş bû. Tim dikeniya û henek dikirin. Em ketin nav pirs û bersivan, çi di dilê me de hebû me bi hev re par ve kir. Ev hevdîtina me di heman wextê de dihat wateya pêçandina birînên kûr yên salên dirêj.
Me li ser herêmê pirs kirin û hevalan jî bersiv dan. Pirsên hevalan yên li ser herêma Şehîd Remzî û eyaletê hebûn, me jî bersiva pirsên wan didan. Kî çûye kû, li kîjan herêmê kîjan heval heye? Weke van. Piştî ku me ji hev re tiştên dilên xwe rewa kirin. Em hatin ser mijara xwe. Ji bo herêmê planên me hebûn. Em bi hin projeyan hatibûn vê herêmê. Pêwîst bû em destpêkê çalakiyekê pêk bînin. Ya rastî em ji bo çalakiyan hatibûn herêma Şehîd Kendal. Hevalên berî me di şerekê de şehîd ketibûn. Dijmin li herêmê li gor xwe tevdigeriya. Lazim bû em liv û tevgera wan teng bikin. Ji aliyê din ve li herêmê bûyerên qirêj jî derketibûn. Dijmin li herêmê bazirganiya jinan dabû destpêkirin. Bi vî awayî li herêmê bûyerên kirêt zêde bûbûn. Pêwîst bû me mudaxale bikira. Ji biryargehê li ser vî esasî em hatibûn wezîfedar kirin. Hevalên ku dihatin herêmê di demeke kurt de diketin şer û wendahî didan. Hevalên herêmê ev hesasiyet bi taybetî bi bîra me xistin. Ji bo em biçin û di demeke kurt de çalakiyekê pêk bînin, biryargehê em şandin. Me mijara hatina xwe ji hevalên li herêmê re jî got. Heval li ser hatina me serwext bûn. Piştî em çendekî li nuqteya Qahweyê man û me bêhna xwe veda, pêwîst bû em biçin cihekî baştir. Heya me li ser çalakiyê amadekariyên xwe bikiran û herêm baş nas bikira, ji me re hinek dem lazim bû. Ji bo vê yekê jî ji me re nuqteyeke din lazim bû. Ji bo cih guhertinê me planek çêkir. Me ji hevalan re got, em biçin nuqteyeke din. Careke din em li ser plana rêwîtiyê rawestiyan. Jimara me zêde bûbû. Pêwîst bû me ji xwe re ciheke din bidîta. Li nuqteya Qahweyê mangeyek heval dikariyan bimînin. Bi hatina me re jimara me bûbû taximek. Li herêmê ji berê ve mangeyek heval hebûn, bi hatina me re jimara me bû 12 kes. Ji ber vê yekê em ketin ser rêya nuqteyeke din. Em wê şevê ketin ser rê û ber bi nokta nû ve meşiyan. Rêya me dûr bû, heya danê şeveqê em bê rawestan bimeşiyan, emê bigihîştan nuqteyê. Li ser rêya me zexîreyê ku hevalan ji berê ve binax kirîn hebû. Meyê ji wê derê ji xwe re zexîre bigirta. Rêzanê me ket pêşiya me, em jî ketin pey û meşiyan.
Em pir şiyar bûn, me ne gelaş-çop-diavêt û ne jî rêç derdixist. Ez dikarim bi rihetî bêjim, gerîlatiya Şehîd Kendal li eyaleta Amedê, ya herî zehmet bû. Ez li herêmên din yên Amedê jî mabûm, lê pîvan û qaîdeyên Şehîd Kendal cuda bûn. Gerîlatiya esas li vê derê bû. Li vir em her tim bi şer re rû bi rû diman. Şerê li vir jî ne weke şerê li herêmên din bû. Li vir şer wendahî bû. Şerê bê însîyatîf ji xwe wendahiya rasterast bû. Rêzanê me di meşê de bi hişyariyan ji me re pêşengî dikir. Li cihê ku pêwîst bidîta ji me re digot, û em hişyar dikirin. Di vê meşa bi hişyariyan min li ezmên mêze kir. Cihê meşa me deşt bû, em di deşteke vala de dimeşiyan. Ne dar û ne jî çiyayek hebû. Di wê şeva tarî de piştî meşeke dirêj, em gihîştin ber cihê zexîreyên binaxkirî. Piştî em gihîştin cihê zexîreyê, vê carê me dest bi lêgerîna zexîreyê kir. Hevalên ku zexîre veşartîn, hinek ji wan şehîd ketibûn, hinek jî çûbûn herêmên din. Hevalên amade jî li gor gotinan dest bi lêgerînê kirin. Ji aliyê din ve li gerîla tiştên ku kesek veşêre keseke din nikare bibîne?
Heya neyê serê mirovan baş nayê zanîn. Ji bo mijar baş were fêmkirin ez dixwazim mînakekê, ji bîranînên xwe bidim. Dema ez li yekîneya Şehîd Remzî bûm, em ji bo wezîfeyekê çûbûn Gêncê û hefteyekê ji havalan qut bûbûn. Em ketin nava operasyonê û me nikariya em vegerin. Piştî operasyon bi dawî bû û esker vekişiyan, em jî vegeriyan cihê ku em jê veqetiyabûn. Lê vê carê heval ne li wir bûn. Li herêma ku em bi salan li wir

mabûn me hevalên xwe nedîtin. Em hefteyekê ji hevalan qût bûn û di nava operasyonê de mabûn. Hevalên yekîneyê ji bo me gotibûn" An şehîd ketine an jî ketine destê dijmin" Piştî lêgerîneke dirêj ku me hevalên biryargehê nedîtin, me hêviya xwe ji wan qut kir. Em ketin ser rêya yekêneya xwe Şehîd Remzî, em ketin rê û hatin herêma xwe. Lê mixabin li wir jî me hevalan nedîtin. Nuqte bi nuqte em ketin ser rêça wan û li wan geriyan. Em çiqas li wan geriyan jî me ti kesî nedît. Em çûn gundê nêzî me Baravê û me pirsa hevalan kir. Me dizaniya heval ji bo pêdiviyên xwe wê werin gund. Li Baravê me hevalek weke xwe ku ew jî wenda bûbû dît. Dema em li herêma Gencê bûn li herêma Licê operesyoneke berfireh çêbûbû. Ev heval jî ji hevalan qut bûbû. Bi vî hevalî re jimara me bû çar. Em bûbûn mangeyeke heval. Me ji gund lêxist û em ber li çiyayê Qurmikê ve çûn. Em ketin rê û hatin nuqteya Qurmikê. Wê şevê me têra xwe pirs kirin û em bi hev re axivîn. Roja din em rabûn û yek bi yek li nuqteyan li hevalên yekîneyê geriyan. Di vê navberê de dema em aciz dibûn me wiha digot:
"Em hevalan nebînin jî ne pirsgirêk e, ji xwe jimara me mangeyek e, em jî mangeyeke hêza serbixwe ne. Bi vî awayî jî em dikarin şer bikin. Bila heval werin û me bibînin. Me herêm nas dikir, gundiyên nêz jî me nas dikirin. Pirsgirêka me ya zexîreyê jî tine bû. Emê wisa biman heya ku hevalan em bidîtan. Em ketin rê û çûn nuqteyeke din. Bi vî awayî nuqteya ku me lê mêze nekirî nedima. Li herêma Şehîd Remzî nuqteyeke me hebû navê wê nukteya Berazan bû. (Domuz Noktasi) Her çar aliyên wê çiya û daristan bûn. Nuqte di qûntara çiyayê Hêdîkê de bû. Her wiha beraz jî li wir gelekî bûn. Ev nuqte ji bo veşartina zexîreyan pir baş bû. Ji xwe navê nuqteyê ji ber ax û veşartina zexîreyê dihat. Axa vê nuqteyê nerm bû û nêzî gelekî aliyan bû. Hevalan çend caran li vê nuqteyê zexîre veşartibûn. Dema ji bo derxistinê tên, mêze dikin ku tevî zexîre li hawîrdor hatiye belavkirin. Ji ber ku vê bûyerê çend caran xwe dubare kiribû, hevalan navê nuqteyê kiribûn nuqteya Berazan.
Em çûn nuqteya Berazan me mêze kir kesek li vê nuqteyê jî nîne. Li vir ne heval û ne jî kesek hebû. Her wiha ev nuqteya dawî bû li herêmê ku me dizaniya. Nuqteyên din nemabûn. Şeveqê me dest bi lêgerîna hevalan kir heya ku ro çû ava me kesî nedît. Em gelek westiyan, pêwîst bû me bêhna xwe veda. Hevalê Kawa got, em îşev li vir bimînin, sibê emê tiştekî bifikirin.
Me got baş e. Em çûn cihê mangeyekê û em li wir runiştin. Me amadekariyên şevê kirin. Em bûbûn mangeyek hêza serbixwe. Ev me kêfxweş dikir. Me ji xwe re dar kom kirin û agir vêxist. Me ça jî danî ser agir. Piştî me nanê xwe xwar, em ketin nîqaşê. Di şevên wisa de axaftin jî gelek xweş e. Şev dirêj bûn û em jî aciz bûn. Ji aliyekî ve Tîrêj ji aliyê din ve Kawa dest bi nîqaşê kirin. Axaftina Tîrêj sade, kin û balkêş bû. Di axaftinê de ti car pesnên xwe nedidan. Mirov ji axaftina wî qet aciz nedibû. Li cem wî rast rast bû, şaş jî şaş bû. Lê Kawa ne wisa bû. Ew bi salan li herêma Zaxros mabû. Şexsiyeta Zaxros li ser têsîreke xurt kiribû. Ji ber ku ji Farqînê bû jî, van her du taybetiyan serhişkî pê re çêkiribûn. Piraniya axaftinên wî li ser pesindayîn û rexneyên tund bûn. Di axaftinên xwe de mirov zû dişkandin û guhdarî ti kesî nedikir. Bi temen jî di nav wan de ez temen biçûk bûm. Herî kêm ez deh salan ji wan piçûktir bûm. Ji ber vê yekê jî mafê axaftina min kêm bû. Ez jî dernediketim derveyî sînorê axaftina xwe. Bi ken û henekan me şeva xwe bi dawî kir. Agirê me jî tefiyabû û çaya me qediyabû. Dem dema razanê bû û em gelek westiyabûn.
Di şeva tarî de li ber stêrkan me xwe dirêj kir û em razan. Em bi vî awayî raketin. Berdestê şeveqê ez hê di xew de bûm. Bi carekî dengê hevalên jin hat guhên min. Tîrêj bang li me dikir: Rabin heval, rabin heval hatin.....

Tîrêj nobedar bû, dema heval hatin em ji xewê jiyar kirin. Şev bi dawî bibû û careke din roj bi ser me de hatibû. Ji ber ku karê me tine bû, danê şeveqê em hinekî zêde razan. Bi tenê nobedarê me Tîrêj şiyar mabû. Ez di xew de bûm, bi dengê hevalan yê bi ken û bi qîreqîr ji xew şiyar bûm. Dema min serê xwe bilind kir, rojê ji ezmên li nav çavên min dixist. Ji erdê şil û qeşa dûman bilind dibû. Destekî min di ber min de bû, destê din jî li ber çavê min bû. Min destê xwe da ber çavên xwe da ku ez hevalan bibînim. Rojê tevî şewqa xwe dabû ser min. Dema ez rabûm ser xwe, min dît ku hevala Rozerîn, Koçer û du hevalên din hatine cem me. Piştî ku me heval dîtin, em gelekî şad bûn. Hevalên yekîneyê piştî ku ji me deng derneketibû tim cihê xwe guhertibûn û nuqteyên nû kifş kiribûn. Li pişt nuqteya Berazan ku em lê bûn, heval nuqteyeke nû dîtibûn. Wê şeva ku em hatibûn wir ew jî li wir bûn. Heval bi hatina me hesiyabûn, bi şev agirê me dîtibûn, lê ji ber digotin belkî dijmin bin, heya danê sibê bêdeng di cihê xwe de mabûn. Piştî ku dinya ronî bû, heval hatin û em dîtin. Dema me heval dîtin, li ser ruyê me ken û di dilê me de gul vebûn. Me nekarî em xwe li cihê xwe ragirin. Em ketin rê û bi aliyê hevalan ve çûn. Dema em gihiştin cem hevalan, hindik mabû ji kêfxweşiyê heval êrişî me bikin. Hem hevalên jin û hem jî hevalên xort bi hatina me gelekî kêfxweş bûbûn. Hevala Rozerîn li vir axaftinek kir.
"Hevalê azad, me gelekî bêriya we kiribû, hûn li kû man ewqas roj:"
Li ser axaftina Rozerînê min yariyeke wiha kir; hevalê jin jî bêriya me kirine, an bi tenê hevalên xort?
"Hevalê azad bi rastî me tevahiya hevalan bêriya we kiribû, li ser rewşa we fikarên me hebûn û em di nav gumanan de bûn, baş bû ku hûn hatin."
Wê rojê rêhevaltiya PKK'ê ya germ xwe nîşan dida. Di wê demê de himêzkirina ku ji bo hin kesan bû, perçe dibû û li her kesî belav dibû.
Acizî, xeyidandin û her tiştên dijwar û şexsî wê demê winda dibûn.
Gelekî mînakên wisa hene ku ji bo gotinê dem digire û mirov nikare bîne zimên. Gerîla bi xwe jî baş nizane, lê dema ku bijî ferq dike.
Mijara zexîreyê jî wisa bû. Ji bo em zexîre bibînin em gelekî geriyan. Piştî lêgerîneke baş herî dawiyê me dît. Me li gor çend rojan ji xwe re zexîre girt. Ji bo zexîre winda nebe, me nîşanek li dorê danî. Em careke din ketin ser rêya xwe û meşiyan. Li pêşiya me dîsa deşteke dirêj hebû. Me lez da xwe ji bo berî ku roj derkeve em deştê biqedînin. Li vê deştê gelekî caran heval danê şeveqê ketibûn şer û wendahî dabûn. Em di vê rêwîtiya xwe de, di ber gundên cerdevanan de derbas bûn. Li herêma Şehîd Kendal cerdevanên har hebûn. Li ber banga şeveqê me xwe avêt cihên saxlem. Em di çiyayên bilind de derbas bûn û hatin nuqteyekê. Piştî ku em derbasî cihên saxlem bûn, êdî tirs û fikarên me neman. Me dikariya em li van deran bi saetan şer bikin. Bi ser çiyayên bilind ê Şehîd Kendal de em derbasî ber Pira Malabadê bûn.
Em hatin ber Pirê bi cih bûn. Li cihê em lê diman çiya tine bûn. Bi tenê nuqteyên hevalan yên kevin hebûn. Danê şeveqê me li dor xwe mêze kir ka em heya kû derê hatine. Li ber me deryayeke mezin xuha dikir. Aveke fireh û kûr xuya dikir. Paşê em fêr bûn ku ev av ne derya ye, Bendava Malabadê ye. Ber bi nîvro ve dinya her ku diçû germ dibû. Di bin gezikan de rewşa me ne baş bû. Em li wir ji bo amadekariya çalakiyê bi cih bûn. Me cihê xwe saxlem kiribû, vê carê dora pîlana çalakiyê bû. Em li ser daxwaziya fermana biryargehê hatibîn Şehîd Kendal. Me li vir amadekariya çalakiyê kir. Plana me ya çalakiyê ji berê ve amade bû. Xetên wê yên sereke eşkere bûn, lê gelekî aliyên wê di nav demê de wê temam bibûna. Li gor agahiyên me stendîn, li gund û navçeya Farqînê ya Amedê dijmin planên kirêt li ser gel pêk dianiyan. Li navçeya Farqînê ya Amedê, berê

tovê Hîzbûllahê hatibû avêtin û li hemberî welatparêzan hatibûn bikaranîn. Bi sazkirina rêxistina Hîzbûllahê re li Kurdistana bakûr bi hezaran kes hatibûn kuştin. Lê belê piştî ku kar û barê Hîzbullahê eşkere bûn, dev ji kuştina mirovan berdan.Vê carê jî li heman cihî dijminê bê dîn û bê îman dest avêtibû firotina keç û jinan. Bi vî awayî civaka Kurd xira dikirin.
Li gor agahiyên ji me re hatîn li navenda Farqînê hin Kurd bi serbazê fermandarê alaya Farqînê re ev kar bi hev re dikirin. Van hevkarên artêşa Tirk, firotina keç û jinan dikirin. Ji aliyê din ve jî li deşta Farqînê
cerdevanî pêş dixistin. Malbata hevkarê artêşa Tirk çek rakiribûn û bi darê zorê didan gelê deştê. Wazîfeya me jî ev bû, emê biçûna û meyê li deştê darbeyek mezin li wan bixista.
Ji bo rêwîtiya me ya deştê, ji me re rêzanek lazim bû. Kesek ji me heya deştê neçûbû û me rêya gundê emê biçûnayê jî nas nedikir.
Piştî em biçûna deştê ji wir û pêde wê welatparêzan alîkariya me bikiran. Li deştê malek hebû, vê malê wê alîkariya me bikira û tiştên pêwîst ji me re bianiyan. Rêwîtiya me gelekî zehmet bû, lê zehmetiya herî girîng jî heya deştê bû. Jê û pêve meyê karê xwe bixwe bikira. Me ji bo rêberiyê xeber ji rêzanekî re şand. Ev kes wê bihata û em heya deştê di cihên saxlem re bibiran. Me agahî şand û em li benda hatina wî man. Di vê navberê de me li hemberî tevî îhtîmalan karên xwe kir. Bi ser agahiya me re demek derbas bû, lê kesek nehat. Rojek, du roj, sê roj em li cihê xwe man, lê kesek nehat. Wer xuya dikir ku kes cesaret nake biçe deştê. Hûn rastiyê bixwazin ev kes jî mafdar bûn. Ma çûna deştê rihet bû? Eger rewşek neyînî derketa, kî dikariya xwe ji deştê xilas bike? Vê tirsê bi serê xwe têra her tiştî dikir. Li vê deştê hevalan berê, gelekî caran wendahî dabûn. Pêwîst bû em bi rêkûpêk bûna, heya deştê biçûna û vegeriyana. Em di cihê xwe de, li benda rêzan bûn. Roj li ser hev derbas dibûn. Hewa jî her ku diçû germ dibû. Em di bin tavê de dikeliyan, dilê me dilerizî.
Li ber me çemek gelekî fireh hebû. Lê me dikariya em biçin û xwe biavêjin avê. Dilê me ji tîbûnê dilerizî. Li ber bendavê gund hebûn milet ji xwe re digeriya. Lê hayê wan ji me û rewşa me tine bû. Em jî xwedî cîhanekê bûn, li gor me pîvan û jiyaneke me jî hebû. Lê carna vê rastiyê mirov dêşand û xemsar dikir. Carna min ji xwe pirsên wiha dikirin?
"Gelo, Niha hayê kesekî ji me heye, kes rewşa me dizane, kî dizane ku gerîla li ber ava kanî û çem tî dimînin?" Kî dizane ku zarokên vî gelî li ser axa xwe bûne penaber û qaçax. Weke dijminê me dibêje dijqanûnî.
Bi rastî çima em dijqanûnî bûn?
Roj li ser hev derbas dibûn, lê kesê rêzan ne dihat. Wisa xuya dikir ku, ev kar jî li ser însiyatîfa me dima. Me biryar girt ku emê her tiştê xwe bi xwe bikin, heya deştê biçin û vegerin. Karê ku meyê bikira karek giran bû û bi xeter bû. Lê ti rêyên din li pêşiya me nemabûn. Ji bo keşfa rê, hevalan ez û Çekdar wezîfedar kirin. Meyê di nava çend rojan de her aliyê rê keşif bikira. Ji bo em keşfê baş bikin emê biçûna çiyayê pêş û meyê deşt bişopanda. Ez û Çekdar ji bo çavdêriyê ji cem hevalan ketin ser rê. Cihê heval lê diman hinek çal bû. Li dor me çiyayên bilind hebûn. Me berê xwe da çiyayê bilind û bi wan ve hilkişiyan. Em bi çiyayên bilind yên Farqînê ve di meşiyan. Ez li herêmê nû bûm, lê Çekdar herêm nas dikir. Ew ji berê ve li herêmê bû. Li çiya gerîla ji cihekî re çiqas xerîb be jî, dîsa dikare rêya xwe bibîne. Lê deşt ne wisa ye, em ji deştê re xerîb bûn. Yekemîn car bû emê biçûna deştê. Em bi plan bûn, lê di nava plana me de gelekî tiştên nediyar hebûn. Plana me ya sereke ev bû, emê biçûna deştê û meyê serekê karê xirab bigirta û bi xwe re bianiya biryargehê. Lê kesê ku meyê bigirta, me nas nedikir. Me ne gundê em

diçûnê nas dikir û ne jî wî kesî. Dema dinya tarî bû em derketin ser çiyayê bilind. Me bi çavê gerîla li deştê mêze kir. Li ezmên tijî stêrk bûn. Şev tarî, çavan çav nedidîtin. Ji dûr ve di nav şeva tarî de, lembeyên gund û bajaran hebûn. Demek dirêj bû min ewqas lembeyên vêketî bi hev re nedîtibûn. Ji aliyekî ve lembeyên Farqînê ji aliyê din ve lembeyên Batmanê û yên gundan li ber çavên me bûn. Tevî van lembeyan weke helbestekê bûn. Di rêyan de bi hezaran wesaît hebûn û li dor hev digeriyan. Me gelekî tişt didîtin, lê ti kesî em nedidîtin. Li serê vî çiyayê bilind wê kî em bidîtan? Û di vê şeva tarî de. Çavên me çiqwas dûr dît, me kişif kir. Ez ya rastî bêjim, dema ku min li deştê mêze kir heybeta deştê tirs xist nava dilê min. Deşt ewqasî dirêj û fireh bû ku ne serî û ne jî dawiya wê hebû. Deşt heya dihat dîtin, dirêj û fireh bû. Di nav vê firehiyê de, bê guman rê, newal, çiya, zevî û gelekî tiştên din jî hebûn. Ya herî girîng jî cihê dijmin bû. Kî dizane li çend cihan kemîn hebûn. Wisa xuya dikir ku di deştê de ne dar ne jî çiya tine bûn.

Me yek bi yek tiştên ku dîtin nivîsandin. Gundên xuya dikirin, malên bi tenê, zevî li kû hebûn û bi taybetî jî rê li kû ji bo derbasbûnê baş bûn. Dijmin eger kemîn daniya wê li kû daniya? Me li gor dîtina xwe tev kifş kir û kir rapor.

Di vê demê de ku min û Çekdar me li deştê mêze dikir Çekdar bang li min kir:

"Di vê deştê de cihê manevrayê jî nîne, bûyerek biqewime emê çi bikin?

Ez bi kûrahiya deştê ve çûm û min li deştê mêze dikir.

Li jêrî me rêya sereke hebû. Rê ji Amedê dihat û ber bi Batmanê ve diçû. Di rê de li pey hev wesaît derbas dibûn. Gelekî ji wan jî wesaîtên lerşkerî bûn. Panzêr, maşîna Topê û cîp di rê re derbas dibûn. Van wesaîtên leşkerî çavên mirovan ditirsandin. Di nav bêdengiya şevê de dengê wesaîtên leşkerî dihat guhên me. Ji bo demekê, çûna deştê zêde ne bi xeter bû. Lê ji bo demek nediyar bi xeter bû. Mixabin ya me ne wisa bû, emê li ser navnîşaneke ne diyar bi serê xwe heya deştê biçûna. Piştî ku emê biçûna deştê, meyê çalakî li dar bixista û paş ve vegeriyan. Emê li deştê çiqas bimana? Ne diyar bû. Hefteyek du hefte kesî nizaniiya wê karê me çawa biçe. Ne diyar bû?

Rojek dîsa me keşf dikir. Ez û Çekdar em dîsa ji bo keşfê derketinbûn serê çiya. Em li ser çiyayê bilind digeriyan û me deşt dişopand. Di wê şeva tarî de her tişt sar û bêdeng bû û di nav xemgîniyê de bû. Çekdar destê xwe ber bi bajarekî ve kir:

"Hevalê Azad, tu vî Bajarê lembeyê wî vêxistî nas dikî?"

"Ezê ji kû nas bikim, hem dinya tarî ye û hem jî ez hê nû hatime vê herêmê, ma ezê ji kû bizanibim vê şeva tarî em hatine kû? Na, ez nas nakim."

Yekemîn car bû, ez ewqas nêzî bajarekî dibim, minê ji kû nas bikira ev bajarê ku lembeyên wî vêxistî kîjan bajar e.

"Na ez nas nakim, ev der kû der e?"

Çekdar bi naz û henek serê xwe hejand û keniya:

"Batman e.. hevalê azad Batman.. tu çawa Bajarê xwe nas nakî?"

Çavên min li ser lembeyên bajêr zûq man û min li bajêr mêze kir. Nefesa min hinek geng bû. Cara yekemîn bû ku min ji çiyayê Kurdistanê Batman didît. Ya din jî ez zêde li Batmanê nemabûm, ez li metrepolên Tirkiyê li herêma Egeyê mezin bûbûm. Di wê şeva tarî de li ser çiyayê Kurdistanê min bi çavên xwe Batman didît. Tişteke wiha min di xewnên xwe de jî nedîtibûn. Tenê di xewjînên min de hebû rojek wiha. Niha jî ez weke kesek parêzger, li serê van çiyayan bûm û di tarîtiya şevê de min gund û bajar dişopandin. Çeka min di destê min de bû û rextê min li pişta min bû. Di şevên tarî de ji çiyayê Kurdistanê, gerîla dixwaze weke bazan bi ser bajaran ve bifire. Li ser gund û bajaran dayne. Wê şevê li gor çavdêriya xwe, me çi dît me rapor kir anî û da hevalan.

Emê çawa biçûna deştê û di kû re derbas bibûna. Li deştê tiştek biqewimiya meyê di kû re manevra bikira. Me tev, li ser kaxizê xîz kir anî û da hevalan.
Me çavdêriya xwe anî û ji hevalan re ragihand. Rêya ku emê tê re biçûna û tiştên ku rû bidana me tev ji hevalan re gotin. Di rêya dûr de emê di ku re biçûna, cihê ku tîm lê disekinîn li ku bûn? Me amade kir. Çend nuqteyên ku cerdevan lê disekinîn jî hebûn. Piştî ku em li ser rêwîtiya xwe axivîn, êdî em ji rêwîtiyê re amade bûn. Meyê bi insiyatîfa xwe wezîfeya xwe bi cih bianiya. Emê heya gundekî Farqînê biçûna û meyê wezîfeya xwe bi cih bianiya. Ji ber serhildana gel, hêzên dewletê gelekî bûyerên ne baş bikar dianîn. Kontrayên dewletê û hevkarên wan, li herêmê dest avêtibûn firotina jinan. Dewleta Tirk bi tevî şerê taybet ku li hemberî hêza gerîla bi ser neket. Vê carê jî dest avêtibû civaka Kurd û xira dikir. Ji bo em pêşî li van bûyeran bigrin em ketibûn ser rê. Rêya dûr û dirêj li pêşiya me bû.
Me dixwest em di wext de bigihîjin hewara gelê xwe. Jinên neçar ku di civakê de hatibûn terikandin, li bendî hewara me bûn. Ji bo hewara gelê xwe, em hatibûn wezîfedarkirin. Wezîfeya me mezin û giran bû, ji ber ku ev kar li deştê pêk dihat barê me girantir dikir. Ya din jî ev kar di nav cerdevanan û tîmên taybet de pêk dihat. Em hê nû hatibûn Şehîd Kendal û me herêm baş jî nas nedikir. Wer xûya dikir ku meyê di vî karê xwe yê destpêkê de zehmetiyên mezin bidîtan. Me li ser rêwîtiya xwe civîneke piçûk li dar xist. Me her aliyên çalakiyê di ber çavan de derbas kir. Me hev ji bo meşa deştê baş hişyar kir. Ev çalakiya meyê destpêkê bû ku me li deştê li dar dixist. Pêwîst bû di vî karî de em bi ser bikevin. Ji bo her heval pir hesas tevbigere me li ser hev, hev hişyar kir. Di nav hişiyariyên me de ji bo hevalên ku qût bibe û ji bo dema ku operasyon derkeve ka emê çi bikin me ji hev re got. Me her aliyên îhtîmalan da ber çavên xwe. Piştî em amade bûn me xwe ji çiyê ber da.

Meşa ber bi deştê ve

Em li ser çiyayê Farqînê bûn. Êdî em heya ser çiyayên nêzî deştê hatibûn û me ji bo cara dawiyê deşt şopand. Ez Çekdar, Wedad, Ozan û Kurmanc-berpirsiyarê taximê-emê biçûna deştê. Tîrêj, Deniz, Sadun û Mahsum jî li herêmê diman. Li ser çiyayên bilind cara dawiyê rêya ku emê tê re biçûna me di ber çavan de derbas kir. Di yekemîn karê xwe de em ji bo gava yekemîn amade bûn. Deşta dirêj tarî dikir û li benda me bû. Li ser me bi hezaran stêrk hebûn, her yek ji ya din xweşiktir bû. Di bin van stêrkan de meyê ji hin hevalan xatir bixwesta û emê di tarîtiya vê şevê de biçûna. Em bi giştî 12 heval bûn. Mangeyek heval ku ez jî tê de bûm emê biçûna deştê, hevalên din jî wê karê xwe dewam bikirana. Me ji hevalên xwe careke din xatir xwest. Ji ber ku xatir xwestin perçeyek ji karê me bû, em hînê xartir xwestinê bûbûn. Lê dema ku me ji hev xatir dixwest weke em yekemîn car ji hev xatir dixwazin. Me xatirê xwe xwest û dest bi meşa xwe kir. Ji çiyayê bilind em ber bi deştê ve ketin ser rê. Ji ber ku rêzanê me nehatibû em li gor zanebûna xwe diçûn. Emê li gor rêberiya hevalên ku herêm hinek nas dikirin biçûna. Hevalê Ozan û Çekdar herêm hinek nas dikirin. Em bi deştê ve dimeşiyan, lê tirsa me her kû diçû zêde dibû. Em bi fikar bûn, li kû derê çi hebû, kî hebû ne diyar bû. Cihên cerdevan lê disekinîn û cihên ku leşker û tîmên taybet kemîn lê dantaniyan ne diyar bûn. Tevî van pirsan di serê me de bi cih bûbûn û li benda bersivan bûn. Li deştê gerîla weke çiya ne xwedî avantaja şer e. Li çiya mirov dikare êriş bike û dikare paş ve vekişe. Lê li deştê, deşta xopan ne wisa bû. Li deştê dijmin bi me bihesiya, em mecbûr bûn di demek kin de, bêyî ku wendahî bidin vekişin. Bûyerek bi vî rengî dibû sedem ku

çalakiya me nîvco bima û em vegeriyana. Ji aliyê din ve di rewşek wiha de dijmin tiştên ku bi gundiyan bikirana jî diyar bûn. Di bûyerên wiha de gelekî gund hatibûn valakirin û gundiyan êşkence dîtibûn. Me xwe bi deştê ve berda, emê biçûna û meyê kesê ku serkêşiya karê ne baş dikir bigirta. Her ku em bi deştê ve diçûn me meşa xwe lez dikir. Zehmetiya me ya herî mezin ew bû ku em bê rêzan bûn. Kesekî ji me, rê baş nas nedikir. Ya din, kesê ku meyê bigirta me qet nedîtibû. Li gor ji me re hatî gotin, emê biçûna deştê û bi alîkariya welatparêzên nas karê xwe bikira. Piştî ku emê bigihîştina deştê welatparêzek hebû wê rê nîşanî me bida. Deşta xopan li benda me bû, deşta bê ser û bin, deşta bi tirs û xof, çiqas ji me re ziwa bû.
Li ser rêya deştê di şeva yekemîn de heya şeveqê em meşiyan. Deşt ewqasî bêdeng bû ku em ditirsandin. Her kes di mal de bû. Zevî bê kes û vala bûn. Zeviyên genim ewqas dirêj bûn bi meşê qet bi dawî nedibûn. Her wiha li deştê kûçik jî zêde bûn. Li cem her şivanî, bi dehan kûçik hebûn. Em di kû re derbas dibûn, kûçikan bi ser me de dikirin hewtehewt.... Di wê şeva tarî de em li ser halê xwe û yê gelê xwe dêşiyan. Di meşa xwe de em di ber gund û malan de derbas dibûn. Hin kes ji nav zeviyan vedigeriyan û ji bo zû bigihîjin mal lez dikirin. Gundiyên li derveyê malan, bi guman li me mêze dikirin. Em dişibandin kontrayan. Li herêmê bi dehan komên kontrayan hebûn. Tim li pey provakasyonan digeriyan. Em gav bi gav nêzî navnîşana xwe dibûn.
Me ji deştê carna li pey xwe mêze dikir. Rêya em tê re hatibûn di nav tarîtiyê de mabû û kêm xuya dikir. Çiyayên ku warê jiyanê bûn, ber bi ezman ve bilind dibûn û reş dikirin. Di navbera me û çiyayên bilind de mij hebû, mij li ser tevî deştê xwe pêça bû. Li hemberî çiya weke em di nav deryayekê de bin. Deşt û çiya weke du cîhanên cuda bûn. Her ku em nêzî mala welatparêz dibûn, dilê me rehet dibû. Em hatin û nêzî malekê sekinîn. Ji dûr ve me mal keşif kir. Piştî ku tiştek nebû em ber bi malê ve meşiyan. Em hatin û gihiştin ber mala ku jimere hatî gotin. Li gor ji me re hatî gotin, li dor gund malek hebû û ew mal welatparêz bû. Her wiha şehîdek wan jî hebû, em li gor agahiyan hatin û li ber malê rawestiyan. Di navbera me û malê de nêzî dused metro hebû. Kûçikên malê kirin hewtehewt.... Li ser hewthewta kûçikan ji malê du kes bi dizî ji nav tarîtiya hundir bi guman derketin derveyê malê. Xwediyên malê gelekî ditirsiyan û bi fikaran, bi awayekî nîv nizmkirî li dora xwe mêze dikirin. Diyar bû ku di şevên wiha tarî de gelekî caran hatine tirsandin. Em jî weke wan bi guman di cihê xwe de rawestiyan. Ji malê jin û mêrek derketin der ve, li dora xwe mêze kirin. Di nav reşahiya şevê de li dor xwe mêze kirin. Kûçikan bê navber dikirin hewtehewt. Kesên ji malê derketîn bi aliyê kûçikan ve mêze kirin. Ji nişka ve em dîtin. Piştî ku çavê wan hate ser me, kincê me yê gerîla ferq kirin. Dengê kûçikan dan sekinandin û çend gavan bi aliyê me ve hatin. Piştî ku bi cem me ve hatin, em jî ber bi wan ve çûn. Li deştê gelekî car, kontrayên dewletê digeriyan û zextên dijwar li gel dikirin. Gelekî car kincên gerîla li xwe dikirin û diçûn malên kesên welatparêz. Bi vî awayî dixwestin malên welatparêz nas bikin. Piştî ku fêr dibûn jî tiştê hovane dianîn serê wan. Xwediyên malê bi tirs nêzî me bûn. Tirsa me tine bû, tenê ji bo rastiya malê gumanên me hebûn. Du kesên ku ji malê derketin, jin û mêrek bûn. Weke çend gavên din jî bi aliyê me de hatin û li cihekî sekinîn bang li me kirin:
"Hûn kî ne?Navên xwe bêjin!"
"Em heval in, heval, em ji çiya tên,ka dengê van kûçikan bidin sekinandin!"
Kûçikan hê jî dikirin hewtehewt. Bi vê axaftina me re xwediyê malê careke din dengê xwe li kûçikan kir. Zarokên li malê serê xwe di ber pencerê de derdixistin û bi dizî li der ve temaşe dikrin. Ji tirsa di serê wan de bi dehan tiştên dijwar derbas dibûn. Dengê çek û bombeyan tim li ber guhê wan bûn. Dengê çekan qet ji ber guhê wan neqediya bû.

Her roj kesek dihat ber derî û ditirsandin. Rojekê esker dihat, rojekê kontra, rojekê tîmên taybet, cerdevan û her wiha. Wisa xuya dikir ku ev kes ji jiyana xwe ya pêşerojê ne bawer bûn. Ji bo pêşerojê dibe ku planên wan hebin? Di serê min de derbas dibû. Di nav vê jiyana dagirkirî de ji bo wan ti maf hatibû hiştin? Ez bawer nakim ku mafeke wan yê wisa hebe. Piştî me got, em heval in xwediyên malê di cih de demekê bêdeng man. Destpêkê weke bi fikar bin tiştek negotin. Wer bê deng di cihê xwe de man. Demekê li rûyê hev mêze kirin û rawestiyan. Berî em werin deştê me bi milîsan re agahî şandibû. Ev mal welatparêz bû, me bê tirs çûna xwe ji wan re ragihandibû. Me tenê ji wan re gotibû; wê heval werin cem we, alîkariya wan bikin. Derheqê roj û demê de me ti agahî nedabûn.Dema em nêzî hev bûn me bi xêrhatina hev kir. Xwediyê malê ji cil û berg û axaftinê em nas kirin.
Şekil û axaftina me rêwiyên çiya didan xuyakirin. Xwediyê malê li ser vê yekêbi kêfxweşiyeke ji dil û can em pêşwazî kirin. Piştî hevpirsîneke kin em vexwendin hundir.
"De werin hundir werin, li der ve nesekinin, bila kes we nebîne;
Piştî ku em nas kirin, bi dîtina me pir kêfxweş bûn. Bi rastî jî rawestandina me ya li der ve xetere bû. Eger hina em li der ve bidîtan plana me berovacî dibû. Me ji wan wisa fêm kir ku ji zû ve gerîla nedîtine. Wer xuya dikir ku xwediyê malê tev bi hatina me kêfxweş bûne. Ev pêşwaziya ku ji dilgermî pêk dihat, em gelekî kêfxweş kirin. Demeke dirêj bû em nehatibûn tu malan, ji ber vê yekê jî mal ji me re gelekî xerîb hat. Xwediyê malê xwest ku em rihet bin:
"Rihet bin me hûn nas kirin, em jî malbateke welatparêz in, hûn di destên saxlem de ne, em nahêlin tiştek bi we were."
Agahiya ku me ji wan re şandibû gihiştibû wan. Li gor ku ji mere hatibû gotin, şehîdê vê malê hebû. Ez ya rastiyê bêjim, bi me re tirsek hebû. Em li deştê di nava malekê de bûn. Emê çawa rihet bimana? Me yek bi yek çavê xwe li ser zarokên malê gerandin. Tevî zarokan piçûk bûn, di bin deh û yazdehan re bûn. Dibe ku zarokên mezin jî çûbin metrepolên Tirkiyê. Li Bakûrê Kurdistanê ji ber dijwariya dewletê malbatan zarokên mezin dişandin bajaran. Li malê du zarokên temenê wan di navbera, deh û yazdehan de hebûn. Di nav deşta fireh de malek hebû, di nav malê de zarokên piçûk hebûn. Dijmin pê bihesiya ku em li vi rin û di bin çavdêriya wan de ne, rewşa me û ya wan pir xirab bû. Du zarok li malê hebûn, pir bala min kişandin. Qet ji me neditirsiyan, barovacî, bi hatina me gelekî kêfxweş bûbûn. Bi ken û pirsan dixwestin bi me re baxivin. Me li ser hatina xwe, hişyarî dan xwediyê malê.
"Hatina me ji ti kesî re nebêjin, bila kes nizanibe ku em hatine deştê. Eger bi hatina me bihesin wê rewşa me û ya we jî xirab bibe:"
"Na na kes nizane ku hûn hatine deştê, hûnê bîstûçar saetan di bin çavdêriya me de bin, qet meraqan nekin, ji niha û şûn de parastina we li ser milê me ye."
Wê şevê heya ber destê şeveqê em axivîn. Geh li ser hatina me û geh li ser pêvajoyê. Ji bo malbat ji hatina me netirsin me moral da wan. Ji bûyeran, jibîranînan me ji wan re basa gelekî tiştan kir. Me li ser hatina xwe jî agahî da wan. Em ji bo çi hatibûn deştê, meyê çi bikira me ji wan re got. Piştî axaftin û xwe nasandinê, dem bû berdestê şeveqê. Êdî dema çûnê bû. Dinya hêdî hêdî ronî dibû. Me bêhna xwe veda û nanê xwe xwar. Bi vî awayî me sînorek jî derbas kiribû. Niha jî ji bo me, cihek baş ku em lê bimana pêwîst bû. Tiştên nîvco mayîn jî, emê êvarê bi malbatê re baxiviyan. Niha dema çûnê bû. Me lez da xwe û em ji malê derketin. Berî em ji malê derkevin, me malbat careke din baş hişyar kir? Hatina me li nav gund, belav bibûya wê li herêmê operasyon bihata lidarxistin. Di buyereke wisa de, em û niştecihên herêmê emê bi hev re bişewitiyan. Em

ji malê derketin û ber bi cihekî baş ve çûn. Xwediyê malê jî bi me re hat û em li cihekî baş bi cih kirin. Cihê ku emê lê bimana li binê malê bû. Li binê malê sê çar zevî li cihekî teng digihîştin hev. Ava ku ji van zeviyan dihat, li cihekî teng newalek piçûk çêkiribû. Ne tam cihoka avê bû û ne jî weke newalê bû. Nêzî mitreyekê kûr û mitreyekê jî fireh bû. Meyê xwe di nav vê newalê de veşarta.
Li herêmê genim hatibûn dirûtin. Qesel pir bû, me bi roj li ser xwe qesel tijî dikir û heya êvarê em di bin de diman. Bi vî awayî ti kesî em nedidîtin. Xwediyê malê berî ku ji ba me biçe, ji me re wiha got:
"Ji şeveqê heya êvarê emê nobeta we bigirin, hûn qet meraqan nekin; dema tiştek çêbû emê bi awayekî ji we re bêjin:"
Bi van axaftinan em hinekî rihet bûn. Em di nav vê cohokê de bi cih bûn û li benda roja nû man. Em ketin nav korteke biçûk û me li ser xwe tijî qesel kir. Piştî em bi cih bûn, êdî em li benda derketina roj û şeveqê bûn. Emê ji şeveqê heya êvarê bêdeng, di binê qeselê de bimana. Kesek bi ser me de bihata jî me deng nedikir. Saet di rojên wiha de carna zû diçû û carna jî hêdî hêdî diçû. Bi şev dem zû derbas dibû, lê bi roj saet dibûn çiya û ji şûna xwe nediçûn. Tava roja nû hêdî hêdî serê xwe derdixist û bi ser me de dihat. Dinya hêdî hêdî dibû şeveq. Rojê li me mêze dikir û gav bi gav bi ser me ve dihat. Roja me ya yekem, li deştê wê çawa derbas bibûya! Di roja yekemîn de, bûyer derneketina baş bû. Eger kesên derdor, di roja yekemîn de bi me bihesiyana wê xebata me asteng bibûya. Ne tenê xebata me têk diçû, her wiha malbatên welatparêz jî dişewitîn. Em di binê qeselê de, wisa li benda şeveqê bûn.
Ez fikirîm gelo, malbata ku me diparêzin niha di çi rewşê de ne? Jin û mêr çi diaxivîn û zarok di çi rewşê de bûn. Zarok gelekî ditirsiyan, an na? Lê di rewşeke wiha de mirov çawa bê tirs bisekine?
Tava germ gav bi gav bi ser me de dihat û ti deng ji derdor nedihatin. Piştî roj derket û tiştek i xuya nekir, em hinekî rihet bûn. Her ku wext pêş diket, vê carê jî dinya germ dibû. Di binê qeselê de rewşa me her ku diçû xirab dibû. Me deqe bi deqe, wext dijmart. Deqe li me bûbûn saet, saet jî li me bûbûn weke rojê. Di binê qeselê de di wê hewa germ de em difikirîn' gelo bûyerek pêk bihata wê çi bibûya? Meyê xwe ji deştê xilas bikira an na? Me dikariya em li deştê şer bikin. Wisa dixuya di bûyereke wiha de ji deştê xilasbûn, gelekî zehmet bû. Li vê derê ti wateya şer jî nebû. Di bûyereke wiha de, halê me xirab bû û meyê wendahî bidan. Ev ji bûyerên berê jî hatibû piştrastkirin. Ya din, em ji xwe zêdetir, ji bo niştecihên herêmê ditirsiyan. Me ji bo xwe fikar nedikirin, dijmin bi me bihesiya jî heya ji destê me bihata meyê berxwedan bikira. Lê welatparêzên bê parastin û belengaz ne weke me bûn. Ew ne weke me azad bûn û ne jî weke me serbixwe bûn. Di destê wan de ne çek hebûn û ne jî dikariyan biçin çiya. Dijmin di bûyereke wiha de, wê mal û gundên nêz bi tevî xira bikiran. Ji bûyerên berê jî ev yek hatibû piştrastkirin. Me roja yekemîn, bê qeza û bela derbas kir. Ev roja me ya yekemîn bû li deşê derbas dibû. Piştî vê rojê roj li ser hev hatin û derbas bûn. Di nav van rojan de me amadekariya rêya xwe dikir. Berî em dest bi gava duyemîn bikin me xwest em herêmê hinekî nas bikin. Bi roj me xwe diveşart, bi şev jî em diçûn cem mala ku em di bin çavdêriya wan de bûn. Dema dibû şev û ro diçû ava me qesel ji ser xwe diavêt û em ji çalê derdiketin.êvaran em an diçûn cem malbatê, an jî em bi hinek cihên bilind ve diçûn û me herêm dişopand. êvarê em li ber stêrkên ezmana rûdiniştin û me sohbet dikir. Çiyayên Farqînê xuya dikirin, weke em di binê çaleke kûr de bin li me giran dihat. Çawa ku emê qet venegerin cihê xwe ev deşt li me giran dihat. Me li ser çalakiya xwe plan çêdikirin. Roj û şevên me wiha li benda mayineke nediyar derbas dibûn. Di van rojên dijwar de hin

tişt hebûn ku qet ji bîra min naçin. Em ji hevalan dûr bûn û me xwe nîşanî kesî nedida. Em di nav tenêtiyekê de bûn, lê malbata welatparêz ev tenêtiya me tijî dikirin. Têkiliya me û malbata welaparêz gelekî hêja bû. Em di bin çavdêriya wan de bûn. Nêzîkbûna wan ji bo me, mînaka herî baş ya welatparêziyê bû. Di van rojên dijwar de, dema ku roj diçû ava, me bi tirs serê xwe ji bin qeselê derdixist.
Me bi dizî serê xwe derdixist û li dora xwe mêze dikir. Ji bo ti kes me nebîne me gelekî dîqat dikir. Di rojên wiha de me didît ku her du zarokên vê malbatê bi aliyê me ve tên. Di destê her du zarokan de nan û ava qeşayê-buz- hebû û bi aliyê me ve dihatin. Zarok bi wî temenî bê tirs, bi kêfxweşî dihatin cem me. Weke di pêşbirkekê de bin bi aliyê me ve baz didan. Şabûna van zarokan hêjayî her tiştî bû. Ev bûyer ti car ji bîra min naçe. Kenê wan û moralê wan, hê jî li ber çavê min in. Dilgermiya wan, ji bo me ji her tiştî girîngtir bû. Dema me ev zarok wiha didîtin, tevî tirs û dijwariya deştê ji bîra me diçû.
Em jî weke wan dibûn zarok û bi wan re dibûn heval. Kîn û kedera ku dilê me kiribû weke kevir ji bo demekê ji cem me vediqetiyan. Xwîna me germ dibû û dilê me geş dibû. Her çiqas ew zarok bûn jî dîsa dixwestin alîkariya me bikin. Rewşa me dizaniyan û dixwestin tiştên ji destê wan bên bikin. Alîkariya wan zarokan ji bo me mînaka herî baş ya hevaltî û Kurdewariyê bû. Nêzîkbûneke wiha ji bo me, bedelê her tiştî bû. Van zarokên piçûk êşa me dizaniyan û ji me fêm dikirin. Belkî rûmeta karê me bi paqijiya zaroktî fêm dikirin. Rêwîtiya me, di nava erdên mayînkirî de derbas dibû. Ji aliyekî ve em pir hişyar bûn, ji aliyê din ve jî fikarên me hebûn. Me nizaniya wê ji kû ve teqîn pêk bê. Di vê rê de, guleyên kor hebûn, mayinên xayin hatibûn çandin. Me kengê pê li mayinan bikira, li kû emê biketan kemîna dijmin ne diyar bû. Ya din jî ev çalakiya me ya yekemîn bû, me li vê herêmê li dar dixist. Ji ber vê yekê, ev çalakî ji bo me gelekî girîng bû. Di çalakiya destpêkê de em bi ser neketan evê ji me re bibûya mînakeke ne baş. Ji bilî serkeftinê, ti rê li pêşiya me nebûn. An emê bi ser biketan, an jî emê bê moral vegeriyana. Vê bûyerê wê bandora xwe li tevî xebatên me yê pêşerojê bikira. Roj li dû hev, dihatin û derbas dibûn. Lê em hê jî li cihê xwe yê berê bûn. Em ji rawestînê aciz bûn. Me dixwest em di demeke kin de biçin û karê xwe bikin. Li deşta xopan li heman cihî, me roj dijmartin. Li gor plana me ji gundê ku emê biçûnayê wê kesek bihata û em heya gund bibiran. Lê belê ev kes jî nedihat. Li gerîla koryetî heye, her kes heya cihekî rê nas dike. Wisa nebe, bi ewlehî xebata gerîla nayê meşandin. Di karê xwe de em dîsa li benda alîkariyê bûn. Em heya vir hatibûn, ew çend roj bûn em li vir bûn. Lê ji bo em pêş de biçûna rêzan lazim bû. Ev kesê ez basa wî dikim wê bihata û em bibiran cihê çalakiyê. Roj derbas dibûn lê kesek nedihat. Ev rewş li me bûbû weke zîndanê. Em li nava deştê, li cihê xwe neçar mabûn. Rojên me weke xezebê, derbas dibûn. Dinya pir germ bû, em bi roj di binê qeselê de heya êvarê diman. Bi şev jî em diçûn mala ku em di bin çavdêriya wan de bûn. Me bi wan re guftûgo dikirin, lê em pir aciz bûbûn. Em li gor plana xwe li vir zêde mabûn. Dema ger û meşa me ya li çiyê, dihat bîra me, em ji rojên di binê qeselê de bêzar dibûn. Dema me ev her du alî didan ber hev bêçaretiya me ya li deştê em gelekî aciz dikirin. Rojekê me di nav xwe de biryar girt ku, em zilamê malê bişînin pey kesê ku wê bihata û em ji vir bibiran. Ti rêyên cuda li pêşiya me nemabûn. Me gelekî caran xeber ji wî kesî re şandibû, lê nedihat. Ev kesê em li benda wî bûn, heya deştê em li ser daxwaziya wî hatibûn. Piştî em heya deştê hatin, vê carê zilam nedihat û alîkariya me nedikir. Em bêçare di cihê xwe de mabûn. Me nikariya em ne pêş de û ne jî paş de biçin.
Gerîla demek zêde nikare li cihekî bisekine. Pêwîst e ku car bi car cihê xwe biguherîne. Em li wê deştê hatibûn girêdan û me nikariya em gavekê jî biavêjin. ædî hedana me

nedihat, me dixwest em demeke zû karê xwe biqedînin û vegerin çiyê. Em weke kesên bê av, tiyê azadiyê bûn. Li deştê em girtî bûn, me dixwest em azad bibin. Me ji zilam re got, biçe wî kesî serwext bike û bîne cem me. Ji bo çi nayê? Hayê wî ji me heye, derdê wî çi ye, ji bo çi nayê?
Xwediyê malê li ser dazwaziya me,ket rê û çû. Bê yî ku bifikire çû. Rêzan nehata jî emê biçûna, lê meyê çawa bikira nediyar bû. Tiştên ku em jê re amade bûn, me dizaniya di demên wiha de insiyatîf pêwîst e. Di gerîla de çend tiştên girîng hene; dem, cih û usul. Di demê de pêkanîna kar, li gor cih nêzîkbûn û usul gelekî girîng e. Ango li cihê ku çi pêwîst be, bi çi awayî û usul çawa be, gelekî girîng e. Meyê jî heya dawiyê însiyatîfa xwe bikar bianiya. Ji dema ku me zilam şandî ve em li benda wan bûn. Zilam danê şeveqê ketibû rê û çûbû. Dinya dibû tarî em li benda hatina wî bûn. Zilam wê biçûya û ew kesê ku soz dabû me bihaniya. Şeva tarî hat û tevî deştê careke din xist bin bandora xwe. Piştî ku bû êvar em jî hatin ber malê runiştin.
Em li ber malê runiştîn û li benda wan her du zilaman bûn. Jina malê ji me re nan anî ça çêkir, bi zarokan ve hatin û li cem me rûniştin. Zarokên malê li dora me kom bûn. Hestên veqetandinê xwe li me tevan pêçabû. Zarokan li nava çavên me mêze dikirin. Dixwestin gelekî tiştan bêjin, lê ji bo gotina van tiştan, ne demê têrê dikir ne jî dil xwe li ber wan digirt. Me nan xwar ça vexwar û me li saeta xwe mêze kir. Wext dereng bû. Pêwîst bû zilam bihata, wisa nebûya em nedigiştîn cihê xwe. Di vê navberê de me li ser meşa xwe plan çêdikirin. Zilam nehata jî emê biketana rê û biçûna. Di vê navberê de ku me li ser çalakiya xwe nîqaş dikir, jina malê ji bo em di karê xwe de hişyar bin em pir hişyar kirin: "Li xwe miqate bin, deşt ne weke çiya ye, hûn ne tenê ji bo xwe, her wiha ji bo gelek têdikoşin."
Bê guman me ev hişyarî li ber çavan girtin û moral jî sitand. Di vê navberê de deng bi kûçikan ket. Bû hewthewta wan. Me fêm kir ku hin ber bi malê ve tên. Me bi carekê xwe ji ber malê da alî. Ji bo em fêm bikin ka kî hatiye, me xwe ji wir dûr kir. Piştî ku me xwe ji ber malê da alî, me dît ku xwediyê malê û kesekî din bi aliyê malê ve tên. Bi hatina wan em pir kêfxweş bûn. Zilam ji bo me çûbû û ji rêya dûr rêzanê ku wê bihata pey me anîbû. Bi zilam re kesekî din jî hebû. Kesê pê re jî rêberê rêya me ya pêş bû. Me fêm kir, ew kesê ku em li bendê bûn ew e? Xwediyê malê berê xwe da me:
"Erê, ew kes ev e, ez çûm û min anî. Ji niha û pêve hûn emanetê vî kesî ne."
Me hinek li şekil û bergê wî, li rûyê wî mêze kir. Zilam kesek paqiş bû, wer xuya dikir ku li xwe baş mêze dike. Xwediyê malê careke din bi aliyê me ve vegeriya û wiha got:
"Tişta ku ji destê me hat, me kir. Ji niha û şûn de heya gundê ku hûnê biçinê û şûn ve jî ewê alîkariya we bike."
Me xwe ji çûnê re amade kir, wextê me teng dibû. Piştî nîqaşeke kurt me xwe ji bo meşê amade kir. Hinek dereng be jî rêzanê me hatibû û emê biçûna. Emê ji van rojên dijwar xilas bibûna. Emê ji germa rojê, ji tirsa deştê hinekî rizgar bibûna û çend gavan bi pêş ve biçûna. Me rêzanê xwe nas kir û em got em amade ne. Li vir dîsa xatir xwestin li bêşiya me bû. Ev kesên ku bi rojan nobeta me girtibûn, nan û av dabûn me, emê vê carê ji wan veqetiyana. Bi rastî veqetîna ji malbata welatparêz gelekî zehmet bû. Em ew çend di bin çavdîriya wan de mabûn. Niha hûnê bixwazin fêr bibin ka em çawa veqetiyan?Bi rastî ev pirsek di cih de ye. Veqetîna me ya ji malê ne rehet bû, gelekî zehmet bû. Di wan rojên dijwar de, me xwe sipartibû wan û em di bin çavdêriya wan de bûn. Ji aliyê din ve eger zilam neçûya û kesê rêzan neaniya emê di cihê xwe de bimana.
Aliyekî din yê vê malbatê hebû. Ew jî zarokê vî malê bûn.

Du zarokê vî malê, her êvar bi aliyê me ve bazdidan û ji mere nan û av dianîtin. Her wiha bi dizî, soz dabûn me ku wê tevlî gerîla bibin. Wê rojê xatir xwestin çixwas zehmet bû. Belê we şaş fêm nekir. Ev her du zarok, dixwestin bi mere bêne çiyê. Ji mere bi dizî digotin;
"Em dixwazin tevlî gerîla bibin, me jî bi xwe re bibin, serê çiya."
Roja ku êdî em li ser rê bûn, ji me xwestin ku em wan bi xwe re bibin. Ev zarok, bi me ve hatibûn girêdan û dixwestin bi me re bêne çiyê. Lê me vê yekê nikari bû bikira. Biryarek wiha ji bo me pir giran bû. Her çiqas ji bo me şervanên nû lazim bûn jî. Em di bin zextek de bûn û me nikaribû em tiştek wiha li vê malê bikin. Ji aliyê din ve malbat nan û av dabûn me. Di rojên dijwar de li deşta xopan me parastibûn. Me nanê wan xwaribû û em bûbûn kesek ji mala wan. Belkî me bûyer eşkere ji dê û bavê zarokan re bi gota, wê tiştek negotina û zaroka bi destê xwe bidana me. Lê zarok hê biçûk bûn, me got na. Em nikarin zarokan bi xwe re bibin. Ev malbat nebûya halê me wê li deştê çawa bûya?
Dema xatir xwestinê bû. Veqetin û xatir xwestin bûbû hevalekî me. Belkî ji hevalek nêzîktir bû jî. Meyê xatirê xwe bi xwesta, û carek din emê biketana ser rê. Ev axa Kurdistanê jî bi meşê qet naqede. Me ji xwediyê malê, xatirê xwe xwest. Her çi mêvandariya me, demek kurt bû jî, di vê dema kurt de me têkilyek hêja çêkiribû. Ev mêvandariya me ya çend roja, li cem me xwedî demek dirêj û cihek taybet bû. Ji bo me xwedî wateyek giran bû. Me li cem xwe, van rojan, bi xatirê salan dihesiband. Xatir xwestin, li me ewçend zor hat ku ji dilê me çîzînî hat der. Piştî me xatirê xwe xwest, êdî em ji meşa dirêj re amade bûn. Me ji mezinên malê yek bi yek xatir xwest. Yek bi yek ji dil me wan sipas kir. Ji bo alîkariya ku ji me re kirin, ji bo nanê dabûne me û ji bo ku me parastibûn, em minetdarê wan bûn.
Li ber me du zarok disekinîn, du zarok, du çavşîn li bendî xatir xwestina me bûn. Belkî nedixwestin tevlî vê demê bibin, lê ev dema me û wan ya dawiyê bû. Belkî ji vê demê xwe veşartibûn, lê ya carekî din me hev nedîta? Zarok poşman bûbûn û hatibûn cihê xatirxwestinê. Zarok ji bo vê hevdîtina dawî hatibûn û li bendî xatir xwestina me bûn. Me ne dikaribû em ji wan xatir bixwazin, ne jî wan bikin hevalbendên rê ya xwe. Her du zarok li ber me disekinîn û bi çavên teyr û bazan li me mêze dikirin. Ji wan çavan tîrêjên kûr û dijwar didan ser me. Di çavên wan de hem xemgînî hebû, hem jî evîndarî. Me nikaribû em xwe li ber wan tîrêjên çavan bigrin. Em di nava du diliyan de mabûn. Wextê me kêm bû, meyê xatirê xwe ji wan bi xwesta û emê di rêya xwe re biçûna. Hê li pêşiya me gelekî cih hebûn, ev der bi tenê yek cihek ji rawestgeha me bû. Me yek bi yek zaroka hemêz kir û em ketin ser rê. Gava me ji zarokan xatir xwest, her du zarok li pey me bi çavên tije hêstir dênêrtin. Lê me nikaribû em wan bi xwe re bi bin. Ev xatirxwestin li me gelekî giran hat.
Hevalbendiya ku di navbera me û zarokan de çê bûbû. Dê û bavê zarokan jî hişyar kiribû. Lê mixabin zarok li axaftinên me hatibûn girêdan. Bi taybetî rewşa me li ser wan gelekî bandor kiribû. Zor û zehmetiya ku em pêre ru biru diman, li xebata me hatibûn girêdan. Di vê deşta xopan de armanca me ne birina şervana bû. Em li ser karekî bûn û rêya me jî gelekî bi xeter bû. Me nikaribû em kesek bi xwere bibin. Em dilşikestî dil bikul ji cem vê malbatê ketin rê. Em gav bi gav ji wê derê ketin rê û meşiyan. Ev malbat ji yek malî bû ku di nav sîstema qirêj de pawij mabû. Em ji cem wê malê, gav bi gav bi nav tarîtiya şevê ve di meşiyan. Şeva tarî me digirt nav xwe û ji ber çavan wenda didir. Me ji bo zarokan tenê du hevok gotin:
"Emê dîsa werin û emê we bibînin, niha karê me heye emê biçin, lê emê vegerin:"

Axaftina me ya ji bo zarokan ev bû. Bi vê axaftina giran û bi şewat, me gavên xwe lezgîntir kirin. Em ji wê derê jî bi biryardayin ketin ser rê. Me di wê rêya xwe de gaveke din jî diavêt. Bi hin bûyer û derengî be jî me karê xwe bi dawî kir û em ketin ser rê. Em ber bi gava herî girîg ve diçûn. Ev çalakiya ku meyê li dar bixista ji bo xebata me ya herêmê roleke girîng dilîst. Em ji rojên dirêj ku em li deştê dîl digirtin azad dibûn. Di rê de me plana xwe çêdikir. Dema em bigîştina gund, meyê karê xwe bi encam bikira. Me di dilê xwe de digot, em çawa gihiştin gund emê wî zilamî bigirin û bi xwe re bibin biryargehê. Li gor planê, me li gund qet wext wenda nedikir. Di nav demeke kurt de meyê karê xwe biqedan da û emê vegeriyana çiyê. Lê bi van pirsan re di serê me de gelekî pirs jî hebûn. Em di karê xwe de ber bi gava mezin ve diçûn. Çalakiya me wê çawa derbas bibûya ne diyar bû. Di serê me de gelekî pirsên bê bersiv hebûn.
Em weke kesên şeveder, tim di şevên tarî de dimeşiyan. Ji vê cîhana xweş, ji me re bi tenê şevên tarî hiştibûn. Bi tenê meş û meş ji mere mabûn. Meşa me qet bi dawî nedibû. Roj ji me re tije tirs û fikar bûn, şev jî roja me bû. Dema kar û xebatê. Em di şeveke din ya tarî de ketin ser rêya bi kemîn û dimeşiyan. Em vê carê di rêya deştê de dimeşiyan. Di nava zeviyên genim de, em li pey hev rêzkirî bûn. Me gav bi gav meşa xwe lezgîn dikir û carna jî me baz dida. Em careke din, ji rewşa girtiyan azad bûbûn. Di wê şeva tarî de em li nîvê deştê bûn. Dengê lingên me li ser qeselê guje guj dikir û lingên me qesela bi erdê ve xwar dikir. Rêya me di nav zeviya zebeşan de derbas dibû. Em li nav zeviya zebeşan rawestiyan, me ji xwe re çend heb zebeş anîn û xwarin. Zebeş hêjayî dîtinê bûn, tahma wan gelekî xweş bû. Me têra xwe zebeş xwar û me dîsa rêya xwe dewam kir. Rêzanê me li pêş em jî yek bi yek li pey dimeşiyan. Di rê de me carna ji rêzanê xwe pirs dikirin, lê wî nedixwest bersivê bide. Bi taybetî jî li ser pirsên çalakiyê nedixwest bersivan bide. Me jê xwest ji me re hinekî behsa kesê emê wî bigrin bike.
"Ew kesê ku emê bigrin li kû dimîne, kesek çawa ye?"
"Ev kes bi taybetî li Farqînê dimîne mala wî li gund e, çend malên wan li gund hene."
Ji bo em zû bigihîjin cihê xwe em her ku diçûn me meşa xwe lezgîntir dikir. Di vê meşa me de tiştekê bala me kişand. Rêzanê me di meşê de dixwest me asteng bike û nebe gund. Me lîstok ji destpêkê ve ferq kiribû. Ji bo zilam guman neke, me rewş nedida xuyakirin. Me ferq kir ku naxwaze me bibe gund. Me xwest bi axaftinan em serwext bikin. Em heya deştê li ser soza vî kesî hatibûn. Ev kesê ku em heya deştê li ser daxwaza wan hatibûn li ser hatina me planên nebaş çêdikirin. Wer xuya dikir rêzanê me ji bo me tiştên nebaş difikire. Rastî ji me re nedigot. Her ku em nêzî gund dibûn fikarên me li ser zilam zêde dibûn. Zilam di rê de behsa plana me kir û wiha got:
"Ew kesê hûn lê digerin êdî qet nayê gund, tim li Farqînê dimîne."
"Çawa nayê, ma mala wî li vir nîne?"
Bi fikar û bi guman em heya ber gund hatin. Zilam bi hemû astengiyan em îkna nekirin. Bi tevî bêdiliya wî em heya ber gund hatin. Piştî ku em heya nêzî gund hatin, zilam dest bi planekî din kir. Li ber gund, ji me re cihekî ku em lê bimana pêwîst bû. Em hatin û li newaleke pişta gund sekinîn. Weke çend deqe me gund şopand û me xwest em biçin gund. Dema me xwest em ber gund ve biçin, zilam bi axaftin û hereketan xwest me asteng bike. Li pêşiya me sekinî û nehişt em ber gund ve biçin. Piştî ku em çend gavan meşiyan cihekî vekirî nîşanî me da û wiha got:
"Temam heval, hûn li vir bimînin, ezê biçim mal, dema ev kesê hûn lê digerin were ezê werim ji we re bêjim. Hûn xwe li vir veşêrin ezê ji were nan û tiştên din jî bînim."

Ez rastiyê bêjim axaftina wî weke kêrekê li ser dilê me ket. Em ne li bendî planekî wiha bûn, ji der ve û li ber gundekî emê çawa bimana? Ev axaftin hem em êşandin û hem jî em dan fikirandin.
Em gerîla bûn ji çiyê hatibûn, li vê deşta vala zilam em li ber gund di newaleke vala de bi cih dikirin. Mala din ku em li cem wan mabûn hate bîra min. Dema em gihiştin cem wan bêyî ku em bêjin ew bixwe ji me re cihekî baş amade kirin. ó heya dawiyê jî em parastibûn. Lê vî zilamî axaftinên weke zarokan dikirin û dixwest em li cihekî vekirî bi cih bibin. Belkî jî di xwest em werin girtin. Li hemberî pêşniyara wî em şoq bûn. Me daxwaza wî baş fêm kir.
"Çawa dibe, emê li vir çawa bimînin, ev der vala û vekirî ye, bi roj wê li vir sewal û zarok tije bibin."
Emê li cihekî vekirî çawa bimana? Kesekî em bidîtan û giliyê me bikiran meyê çi bikira? Di rewşeke wiha de wê gundên nêz jî zerar bidîtana. Heya ev kesê em ji bo wî hatîn bihata gund, pêwîst bû me xwe li cihekî baş veşarta. Dema bihata emê biçûna meyê bigirta. Piştî ku me bigirta ji bo lêpirsînê meyê bi xwe re bibira çiyê. Armanca me ev bû. Cihê zilam nîşanî me dayî, cihekî vekirî bû, ne mumkin bû ku em li wê derê bimana. Eger em li wir bimana, em ji wê derê bê bûyer xilas nedibûn. Em tev bi hev re, li hemberî daxwaza wî derketin. Zilam raste rast em didan girtin. Ne wisa bûya jî aliyê encamê di ber çavan de derbas nedikir. Eger em li wî cihî bimana, ji sedî sed bi roj wê gundiyan em bidîtina. Em li ser mijarê fikirîn; zilam dixwest çi bike? Eger em bihatan girtin em û ew emê bi hev re bişewitiyana. Me daxwaza wî qebûl nekir û me bersiveke giran dayê.
"Em çawa li vir bimînin, em li vir bimînin piştî demekê wê dijmin li ser serê me kom bibe, ma malek nîne? Ya herî baş em li malekê bimînin."
Zilam destpêkê daxwaza me bi hin hîncetan qebûl nekir.
"Li gund malên vala ku hûn lê bimînin nînin, li gund tije mirov in, li nava gund hûnê bêne dîtin."
"Tiştek nabe emê bi dizî niha biçin malekê û xwe veşêrin."
Em ji çiya heya deştê ji bo vî gelî hatibûn, niha cihekî em lê bimînin tine bû. Em li hemberî vê bûyerê gelekî aciz bûn û me bi hêrs li hev mêze kir. Meyê çi bikira ji destê me çi dihat? Me israr kir û xwest ku em biçin gund û li malekê bi cih bibin. Piştî ku me israr kir zilam wiha got:
"De baş e werin ez we bibim malekê, mal ya xizmekî min ne, mal hinekî vala ye ezê we bibin wê derê."
Dinya ronî bûbû û dema nimêjê bû. Em bi lez ber bi nava gund ve meşiyan. Di ber hewş û malan de em bi fikar derbas bûn. Dinya ronî bûbû, hin kes li derveyî malê desmêj digirtin. Hin kes jî ketibûn axur sewal derdixistin. Ji bo kesek me nebîne zilam li pêş em jî li pey wî ketin nava gund. Di rê de bi xwe re daxivî û digot, ez wan bibim kîjan malê? Kîjan mal vala ye?
Em hatin û li derveyî gund li ber malekê sekinîn. Zilam ji mere got, hûn li vir çend deqeyan bisekinin ez derî vekim. Piştî çend deqeyan ku em li cihê xwe sekinîn deriyê malê vekir. Em ketin hundirê malê me li dora xwe mêze kir. Cihê ku em anîbûnê kadîn bû. Em li nav ka û giyê de bi cih bûn. Nîvro keça malê ji me re xwarin anî. Me nanê nîvro xwar û me xwe dirêj kir. Heya piştî nîvro karê me tine bû. Ber bi êvarê ve zilam hat mal û ji me re got werin odeya mêvanan em nan bixwin. Me kesên di malê de nas kirin, jinek û çend zarok li malê hebûn. Ez bawer dikim mal ne ya wî bû, ya xizmekî wî bû. Xwediyê malê ne li malê bû. Zilam û zarokên malê yê mezin ji bo kar çûbûn bajarên Tirkiyê. Wer xuya dikir meyê di maleke wisa de ji bo dayin û standinê zehmetî bikşanda. Di malê de

têkiliya me wê bi kesên li mal re çêbûya. Lê meyê çawa li hev bikira ne diyar bû. Zilam em bi xwediyê malê dan nasandin. Xwediyê malê em nas kirin û bixêrhatina me kir. Hayê wan ji hatina me hebû, dema em ketibûn mal bi me hesiyabûn. Piştî em ketin hundirê malê, zilam û jinik çûn odeyeke din axivîn. Me zaniya li ser hatina me diaxivin. Me nanê xwe xwar ça anîn me ça jî vexwar. Wisa xuya dikir emê bi roj li cihekî bi şev jî li cihekî bimana. Em ji karesatekê xilas bûbûn. Bi hatina me ya malê re em kêfxweş bûn. Li der ve dengê zarok û jinan li nav gund belav dibû. Dengê sewalan û dengê mirovan bi nav hev diketin. Me li malê mêze kir û li cihê ku zilam nîşanî me dabû. Di nav de çiqas ferq hebû. Zilam û jinikê piştî ku axaftina xwe qedandin vegeriyan cem me. Zilam cihê ku emê bi şev û bi roj lê bimana nîşanî me da. Wer xuya dikir ku roja me wê li du cihan derbas bibûya. Cihekî ji bo şevê bû û cihek jî ji bo rojê bû.
Bi roj ji bo kes me nebîne me xwe li kadînê diveşart. Dema dibû şev jî em dihatin odeya mêvanan. Bi roj ji ber ku mirov digeriyan diçûn û dihatin, em diketin kadînê me xwe di nav ka û genim de diveşart. Bi şev jiyana gund hinekî radiwestiya. Şevên me baş derbas dibûn, lê em hê jî ji xezeba rojan xilas nebûbûn. Rojên me di nav ka û qeselê de derbas dibûn. Di bin kayê de xwêdan bi me diket û em dixuriyan. Carna me serê xwe radikir, dema dengek dihata me xwe bi binê kayê ve dişidand. Me digot belkî em ji wan rojan azad bibin, lê hê jî ew xezeb li pêşiya me bû. Bi vî awayî emê li benda wê kesî bûna, dema bihata emê biçûna meyê bigirta. Zilam her şev dihat cem me û agahî didan me. Çend saetan li cem me dima, pişt re dîsa diçû. Em bi vî awayî li benda agahiya wî bûn. Heya ku ew kesê ajan bihata, emê di cihê xwe de veşartî bimana. Di vê dema ku dîsa em dîl hatibûn girtin, em li benda agahiya li ser vî kesî bûn. Dem derbas dibû em li ser karê xwe bûn. Ji bo me dem pir pêwîst bû, lê dem dihat û li ber me disekinî. Di van rojên ku weke bagerê derbas dibûn, zeman dihat û li ber me radiwestiya. Rojan em qehir dikirin û em dîl digirtin.
Carna zaroktiya min ya ku min li hemberî bayê baz dida dihat bîra min. Ba bi awayekî dijwar bi ser min de dihat. Min ji rêya xwe paş de gav nediavêtin û ez bi ser bayê ve diçûm. Bi tevî hêza xwe min li ber xwe dida, lê min nikariya ez gavekê jî pêş de biavêjim. Ba bi ser min ve gur dibû, kom dibû vê carê ez li hemberî wê qels diketim. Bayê ez dîl digirtim û min nikariya ez xwe jê rizgar bikim. Ji çar aliyên min ve, ez dor pêç dikir. Ba bi tevî hêza xwe bi ser min ve dihat û nedihişt ku ez hewayê jî bistînim. Di wan demên ku gelekî caran dihat serê min, ez bê hewa dimam. Piştî ku ez mezin bûm di rojên wiha de min li hemberî bayê xwe diceriband. Vê carê ez li hemberî bayê bi ser diketim. Ev demên ku min behsa wan kir, li hemberî wan êdî ez bi ser diketim. Heya ku ez tevlî refên gerîla bûm vê yekê dewam kir.
Di nav refên gerîla de bayê şûna xwe da rojê. Vê carê jî rojê weke bayê ez dîl digirtim. Piştî bayê roj jî li hemberî min dibûn dijmin. Êdî roj jî dijminê min bûn, ez li kû bigirtam ez diketim bextê şevê. Ji bo bibe şev min li ser hev hêvî dikirin. Di nav refên gerîla de ez gelekî car ji rojê aciz dibûm. Van rojan em dîl digirtin û azadiya me ji destê me distendin. Bi ser hatina me ya vê malê re, çend roj derbas bûn. Em li benda agahiya hatina kesê ajan bûn. Her ku diçû li ser hatina me roj zêde dibûn, lê ev kes nedihat. Em di hundir de bûn, me tiştên ji der ve nedidîtin. Kî dihat gund, kî diçû, kî çi dikir, em ji tevan bê agahî bûn. Bi vî awayî çend rojên me li pey hev derbas bûn. Zilam weke berê di dema xwe de nedihat cem me.Wer dixuya ku naxwaze were. Li ser navberên hatina zilam roj zêde dibûn. Piştî çend rojan ku zilam nehat, me bi zarokekî re bang kir ku were û agahiyê bide me. Li gund agahiyên dawî çi bûn? Zilam hatiye yan na? Li gor ji mere hatibû gotin, mala kesê ajan li gund bû.

Nîvê gund yê wî û yê xizmên wî bû. Tim diçû Farqînê bi rayedarên devletê re kar dikir. Piştî banga me zilam derket û hate cem me. Me pirsa vi kesî jê kir.
"Ev kes nehat? berê her roj dihat çima piştî em hatin êdî nayê?"
Zilam li ser pirsa me wiha got:
"Wer xuya dike êdî qet neyê gund."
"Çima nayê em dikarin fêr bibin?"
"Li Farqînê karê wî gelek e ji ber vê jî kêm caran tê gund û di heman rojê de vedigere."
Me mijar baş fêm kir, zilam berî em werin du rojan carekê dihat gund. Lê piştî em hatin êdî nehat. Zêdetir li Farqînê dima û bi serbazên artêşê re kar dikir. Hatin û çûna wî jî ne diyar bû. Gumanên me yên li ser her ku diçû zêde dibûn. Me ji zilam re got?, "Tu ji me re rastiyê dibêjî an na, ji me re rastiyê bîje, tu naxwazî em vî zilamî bigirin, ne wisa."
Zilam li hemberî pirsên me di şûna xwe de bêdeng ma. Hinekî fikirî û wiha got:
"Ev zilamê hûn li bendê ne, êdî nayê, hûn çi dixwazin? Lêxin biçin cihê xwe."
Piştî ku di nav me de nîqaşek wiha dest pê kir, me jê xwest ku malê nîşanî me bide.
"Bide pêşiya me, me bibe ber mala wî, jê û pêve emê karê xwe bikin."
Daxwaza me qebûl ne kir û wiha got:
"Ez nikarim we bibim ber malê, hûn bi xwe biçin û malê bibînin."
Me mijar baş fêm kir. Em li ser daxwaza van kesan heya gund hatibûn. Piştî ku giraniya mijarê hatibû fêmkirin, zilam paş de gav avêtibûn. Rastiya mijarê ev bû, nedixwestin ku li gund şer derkeve. Piştî em hatibûn deştê jî agahiyên nerast dabûne me û bi karê me lîstibûn. Berî vê, careke din jî bi agahiyên şaş karê me vala derxistibûn. Bi vê re dibû cara duemîn ku em dihatin xapandin. Me sedema vê helwestê jê pirsî.
Ev qas kar û xebat, çawa dikariyan bi me tiştekî wisa bikin? Bi karê rêxistinê çawa dikariyan bilîzin. Bêguman piştî ku me bi guhên xwe ev lîstik bihîstin em hêrs bûn.
"Hûn çawa dikarin derheqê me de biryareke wiha bigirin? Em li ser daxwaza we heya vir hatine."
"Em bi rûsipiyên malbatê re axivîn, me biryar da ku li gund şer çênebe wê baştir be, eger li gund şer çêbe wê ji me bizanibin û rewşa me xira bibe."
Piştî me fêm kir, bi agahiyên şaş bi gerîla dilîzin em li ser vê bûyerê aciz bûn û bi zilam re hêrs bûn. Em rast e rast, hatibûn xapandin. Ji deştê bang li me hatibû kirin û em li ser daxwaza wan hatibûn. Em ne dîn bûn biketana rê û heya deştê bihatana. Ji vî gundî ji me re bi rêya milîsan notek hatibû şandin. Di notê de wiha dihate gotin, li der û dora Fanqînê kesekî bi navê A. F, heye li herêmê bazirganiya jinan dike û li deştê cerdevaniyê li ser gel ferz dike. Tevî van karên xirap bi fermandarê alaya Farqînê re dikirin. Ji bo em pêşî li vî karî bigirin heya deştê em hatibûn. Bi taybetî em li ser daxwaza welatparêzên herêmê hatibûn. Bi vê bûyerê re me xwe weke kesên hatîn xapandin dihesiband. Me hêrsa xwe negirt û em bi ser zilam de çûn. Piştî em bi zilam re hêrs bûn, ji nav me derket hinekî dûr bû û axaftina xwe ya dawiyê kir.
"Ez rê nîşanî we nadim, hûn çi dikin bikin, lêxin û biçin, hûn neçin niha ezê biçim giliyê we bikim."
Axaftinên dawiyê em gelek êşandibûn. Dema em pê re hêrs bûn jin û keçên malê li me temaşe dikirin.
Ti deng ji wan nedihat, wer mat mabûn û li halê me dinihêrtin. Bi halê me diêşiyan. Piştî ku zilam ji nav me derket û çû, em li ser lingan li şûna xwe man. Em bi hev şêwirîn me çi bikira, li gundekî ku qet hayê me ji der ve tine bû em bi tenê hatibûn hiştin.

Jinikê li şûna xwe sekinî û bêdeng li me mêze kir. Keçên wê li dor xwe çûn û hatin, dixwestin alîkariya me bikin, lê nikariyan. Keçên malê jî weke me li ser vê bûyera nebaş hêrs bûbûn.
Di nava malê de diçûn û dihatin. Carekê çend gavan nêzî me bûn û xwestin ji me re tiştekî bêjin.
Lê mixabin çanda civaka me, orf û adetên me, nedihiştin ku ev keç alîkariya me bikin. Wer li ser lingan li nava çavên me mêze dikirin.
Belkî li benda gotina me bûn, ku me ji wan alîkarî bixwesta û alîkariya me bikirana. Dizaniyan ku bi hezaran keçên weke wan li serê çiya ji bo azadiya xwe şer dikin. Me fêm kir ku dixwazin alîkariya me bikin. Lê me nikariya em keçên malê bidin pêşiya xwe û biçin cihê çalakiyê. Ji ber ku piştî çalakiyê emê bi rêya xwe de biçûna, lê ewê li cihê xwe bimana. Di bûyereke wiha de wê gelekî tiştên mebaş bihatan serê wan. Kesek tine bû wan biparêze jî.
Li deşta dûr û fireh em ketibûn dafika gundiyan.
Em fikirîn ji destê me çi dihat? Me çi bikira?Dema biryardayina lezgîn bû, zilam ji mal bazda û derket. Em ji ber çûna zilam bi fikar bûn. Piştî em li holê man li ser lingan em bi hev şêwirîn. Wextê me kêm bû, di demeke kurt de pêwîst bû em biryareke rast bidin. Em bi hev şêwirîn û me got;
"Ev zilam neçe giliyê me neke?" Ji xwe dema derket jî wiha got ez, nahêlim hûn li vir çalakiyê li dar bixin.
Di rewşeke wisa de biryara rast çi bû! Me biryareke çawa bida? Di nava deşta fireh de, li gundekî ku me kesek nas nedikir em li ser encama çalakiyê fikirîn.
Em bi hev şêwirîn û me wiha got;
"Em heya deştê hatine nabe ku em ji vir vegerin." Biryargehê wezîfeyek dabû me, heya me ev kar pêk neaniya me nikariya em vegerin. Me got, emê dîsa li gor însiyatîfa xwe tevbigerin û karê xwe pêk bînin. Aliyê cuda yê gerîla jî, di dema teng û bêderfet de afirandina biryara rast bû. Ya rast jî ev bû ku me bi xwe karê xwe bikira. Hêza gerîla di demên wiha de derdikeve holê. Em bi rêz ketin pey hev yek bi yek ji malê derketin. Jin û zarokan jî li hemberî helwesta ku li dijî me hatibû nîşandan nerazîbûn nîşan dan. Dixwestin ji me lêborîna xwe bixwazin û rê nîşanî me bidin. Lê ji destê wan jî tiştek nedihat. Ji xwe ji hêrsê me ji wan ne xatir xwest, ne jî guh da wan. Em bi carekê ji malê derketin. Li gund li me komplo hatibû kirin. Raste rast em hatibûn xapandin û li holê hatibûn hiştin. Em ketin pey hev û ber bi mala ku emê bavêjin ser ve meşiyan. Me mal nas nedikir li gor agahiyên texmînî em diçûn. Dema em di rê de hatîn, zilam ji me re gotibû mala wî li derveyî gund e. Me zilam jî nas nedikir. Karê me bi texmînan û bi şensê ve girêdayî bû. Şev tarî bû çavan çav nedidîtin. Em li dû hev di nav malan de dimeşiyan. Dema em nêzî taxa ku mal lê bû, bûn, em bûn du tîm. Tîma yekemîn Ozan û Wedat bûn. Tîma duemîn jî Kurmanç, Çekdar û ez bûm. Li gor agahiyên ku me berê standibûn, emê ber bi malê ve biçûna. Berî em ji hev veqetin û bikevin nava taxê, me parolaya çalakiyê ji hev re got. Ji bo destpêka çalakiyê ji bo alîkariyê û ji bo paşvekişînê me parola amade kir. Her wiha parolaya,birîndar heye û ji bo cihê ku emê piştî çalakiyê bigîştina hev me parolaya çalakiyê ji hev re got. Em li ser parolayê serwext bûn. Li gor planê emê di nava şer de herî zêde çar an jî pênç deqan bimana. Me nikariya em pir di nav çalakiyê de bimînin. Cebilxaneya me kêm bû, meyê zêde gule jî neteqandan. Piştî me parola da û hişyarî kir, em bûn du tîm û ji hev veqetiyan. Tîma me emê ji aliyê jor a gund ve biçûna û li malê vegeriyana. Tîma din ewê jî biketana nava gund û ber bi malê ve biçûna. Meyê ji du aliyan ve biavêta ser malê û çekên di destên cerdevanan de

bigirtan. Xwesteka me girtina kesê ajan bû. Şev li ser gund fireh bûbû. Dinya germ bû, her kes li serbanên xaniyan bûn. Lembeyên malan tev vêketîbûn. Di nava bêdengiyê de dengê sewalan li nav gund belav dibû. Bêdengiya şevê wê demeke din, bi dengê çekan bihata xerakirin. Dengê axîn û qêrînê, wê careke din tevlî bêdengiya şevên Kurdistanê bibûya.
Em ber bi malê ve meşiyan. Cihê ku tîma me, em tê re diçûn, cihekî kaş û bilind bû. Pêwîst bû em pir bi dîqet bimeşin. Piştî ku me mal bi çavan bidîta nêzî set metroyê, meyê li ser erdê xwe kaş bikira. Piştî sed metro cihê kaşkirinê, emê bigihîştana ber hedefa xwe. Cihê ku me xwe li ser kaş dikir, cihekî rast û rût bû. Tev kevir, strî û moristan bû. Me dest pêkir li ser stiryan xwe kaş kir. Em sê kes bûn û me xwe li pey hev kaş kir. Nêzî pêncî metre me xwe bi ser erdê ve kaş kir. Em hê negihîştibûn cihê xwe, li nîvê rê dengê çekan tevlî tarîtiya şevê bû. Li gor planê wê şer ji aliyê me ve dest pê bikira. Heya me dest pê nekira tîma din wê çek bi kar neaniya.
Lê belê em li nivî rê hatin gitin. Ozan û Wedad di nava gund re çûbûn. Dema têne ber malekê mêze dikin hin kes li ber dîwêr runiştî ne û diaxivin. Ji wan pirsa mala A, F,dikin. Ozan li pêş e û Wedad li paş dimeşe. Yên rûniştî ji Ozan re dibêjin em wî kesî nas nakin. Ozan li dora xwe mêze dike û bi fikar çend gavan diavêje. Bi van çend gavan re guleyan bi ser wan de direşînin. Wedat dinêre yek dikeve hindir. Wedat dibêje bisekine teslîm bibe. Di wê navberê de, gule û bombe diaxivin. Dengê çekan bi nav tarîtiya şevê dikeve. Ozan xwe diavêje erdê, Wedad jî wî diparêze. Heval nizanin li çi rast hatine, lê ferq dikin ku kesê bi hundir ve reviyayî ew kesê ku em lê digeriyan bû. Armanca me ne kuştin bû, tenê girtina kesê ajan û desteserkirina çekên cerdevanan bû. Wedad û Ozan li cihekî ketin kemînê em jî li cihekî din. Dema şer dest pê kir berî ku em çek bi kar bînin, me bang li cerdevanan kir:
"Teslîm bibin, eger hûn çekên xwe daynin em tiştekî bi we nakin."
Hê banga me bi dawî nebûyî, berê çekan dan ser me. Gule weke baranê bi ser me de hatin reşandin. Li ser vê yekê me jî xwe parast û bersiv da. Dema berê guleyan dan ser me, me bi aliyê patosê ve bazda. Bi teqîna guleyan re Ozan û Wedad jî xwe parastin. Şer di nava gund de çêdibû. Ji bo tiştek bi kesên sivîl neyê me pir dîqat dikir. Piştî ku şer dest pê kir em jî ber bi hedefa xwe ve bezîn. Hinek kesên malbatê patos dikirin û hinek jî bi çekan nobeta wan digirtin. Bi teqîna guleyan re yên patos dikirin reviyan. Me baz da û xwe gihand ber patosê. Çar aliyên me vekirî bûn. Em sê heval li meydana patosê ketin şer. Ji bo çekên xwe daynin, me dîsa bang li cerdevanan kir. Cerdevan bi bangkirinê re bi dijwarî bi ser me de dihatin. Hevalên din jî li nav gund ketibûn şer û nikariyan alîkariya me bikin.
Dema ku ji bo şer hatî diyarkirin derbas bûbû, lê heval nehatin alîkariya me. Dor li me dihate girtin, pêwîst bû em ji nav gund derkevin. Plana me sê an jî çar deqîqe bûn, lê em di nava şer de nêzî deh deqeyan man. Me nikariya em ji cihê xwe derkevin. Ji ber vê yekê jî di demeke kurt de cebilxaneya me kêm bû û ji bo vekişînê me îşaret da hevalan. Ji aliyê din ve em çiqasî di nava şer de bimana ji bo me ewqasî bi xeter bû. Ev dibû sedema ku leşkerên Tirk zû bên û gund dorpêç bikin. Plana me bi carekê xira bûbû, ya rast ew bû ku em di demeke kurt de vekişin. Me di şer de derbeyeke mezin li wan da, çekek jî rakir. Niha jî bêyî ku em wendahî bidin lazim bû em vekişin. Emê ji nav gund derketana lê hevalan bersiv nedidan banga me. Me li ser hev çend caran bang li wan kir. Me parola li ser hev dubare kir, lê banga me bê bersiv ma. Piştî çend caran ku me bang li hevalan kir û bersiv tine bû, me got, bêyî ku em wendahiyan bidin em ji cihê çalakiyê derkevin. Piştî paroleyê em ji cihê şer dûr ketin. Fikarên me li ser rewşa hevalan hebûn.

Me got, an birîndar heye an jî şehîd dane. ædî wextê çûnê bû, yek bi yek em ji cihê bûyerê vekişiyan.
Ez li wê derê ji qirika xwe bi sivikayî birîndar bûbûm. Di nav çalakiyê de ez zêde eşkere tevdigeriyam. Çend caran hevalê Çekdar wiha got:
"Azad, azad, ranebe ser lingan, serê xwe xwar bike, wê li te bidin."
Ji çar aliyên me ve gule dihatin. Lê ji bo me ya girîng hevalên tîma din bûn. Em ji ber hevalên din di nava tirs û fikaran de bûn. Li gor plana me ewê bihatana alîkariya me û meyê mal dorpêç bikira. Plana me wisa bû. Lê heval nehatin alîkariya me û bersiva banga me jî nedan. Bi dengê çekan re ji Farqînê leşker ketin rê û bi aliyê gund ve dihatin. Me lez da xwe da em xwe bigihînin cihê kombûnê. Ji bo me derheqê hevalan de agahî bigirta me lez da meşa xwe. Berî çalakiyê me cihekî plan kiribû, piştî çalakiyê meyê hev li wir bidîta. Em bi awayekî lezgîn gihîştin cihê diyarkirî. Lê li wê derê kesek tine bû. Me xwe ji cihê şer dûr xist û li ser hev me bang li hevalan kir. Ji cihê şer agir bilind dibû, dengê qarawarê bi ser gund ketibû. Şeva bêdeng veguherîbû cihê mehşerê. Ji ber agirê guleyan derdorên gund dişewitî. Agir ketibû zeviyên genimê û qesel dişewitî. Zeviyên gemin hê nehatibûn paqijkirin, agir bi wan ketibû. Her ku diçû agir li nav zeviyan gur dibû. Wek boriya betrolê bê teqandin dişewitî her der.
Wesaîtên leşkerî ji Farqînê ketibûn rê û bi aliyê gund ve dihatin. Li dû hev bûbûn rêz. Karwanê leşkeran bi ser me de dihat. Cihê şer nêzî Farqînê bû, bi dengê çekan re wesaîtên leşkerî jî ketibûn ser şopa me. Li deştê operasyon hatibû destpêkirin û tevî cihên derbasbûnê ji aliyê tîmên taybet ve hatibûn girtin.
Li ser banga me ku me bê navber dubare dikir, ji nav reşahiya şevê heval yek bi yek derketin hatin. Wendahî û birîndar tine bûn. Heval jî weke me di nav gund de asê bûbûn û nikariyan derkevin. Dema me heval dîtin em pir kêfxweş bûn.
Me rewşa hev bi kinahî pirsî û em yekser ketin ser rê. Wextê me tine bû, em hê jî nêzî cihêşer bûn. Pêwîst bû em xwe ji herêmê dûr bikin. Rêya me jî dûr bû. Lazim bû wê şevê em xwe biavêjin çiyayê Farqînê. Di nava şevekê de meyê deşt biqedanda. Em yek ser ketin rê û me lez da meşa xwe. Çalakî li gor dilê me derbas nebûbû. Em heya deştê hatibûn û li gund me li xayinan xistibû. Me hem li wan xistibû, hem jî çekek rakiribû. Belkî plana me ne wisa bû lê ev jî ji bo me serkeftinek bû. Me gava duemîn jî bi serkeftî li dû xwe hiştibû. Em diketin gava sêemîn, eger heya cem hevalan em ji deştê bê bûyer biçûna, emê pir kêfxweş bibûna. Li pêşiya me meşeke dirêj hebû. Pêwîst bû heya danê sibê, me xwe bigihanda pişta çiyayên Farqînê. Me wezîfeya xwe ya deştê bi dawî kiribû. Di xebata xwe ya li deştê de me gelekî bûyer derbas kiribûn û me wendahî jî nedabûn. Di vê rêwîtiya zehmet de êdî dema vegerê bû. Rêya dûr û meşa zehmet li dû me dima. Em gelek westiyabûn, lê ji ber ku em vedigeriyan em pir kêf xweş bûn. Heval li ber çavên me bûn. Me bi fikar dest bi meşa xwe kir. Lê em bi kêfxweşî vedigeriyan.
Me berê xwe da çiyayê Farqînê û meşiyan. Rêhevalên me yên ku li benda me bûn, em ber bi wan ve diçûn. Kêf û coşa vegerê di rûyê me de xuya dikir. Bi vî moralî di demeke kurt de meyê rêyeke dirêj biqedanda. Ji ber ku dijmin bi dengê me hesiyabû, vegera me zehmetir bû. Li ser rêya me gundên cerdevanan jî hebûn. Her wiha gelekî cihên deştê jî hatibûn girtin. Jî ber ku rêyên cuda tine bûn, em neçar bûn di rêya kin de, di nava gundên cerdevanan de derbas bibin. Ji ber vê yekê diviyabû em pir bi dîqet bin. Em gav bi gav ji cihê şer dûr dibûn. Dengê wesaîtên leşkerî li deştê belav bûbûn. Her der ji aliyê tîmên taybet ve hatibû girtin. Em di ber kîjan gundî re derbas dibûn kûçikan dikirin hewtehewt. Me dikir nedikir kûçikan dengên xwe qut nedikirin. Bi koman êrişî me dikirin. Ozan em hişyar kirin:

"Li vir kemînên tîmên taybet hene, em nekevin kemîna wan pir baş e."
Eger em li deştê biketan şer me xwe ji destê dijmin zor xilas dikir. Em gav bi gav di nav tarîtiya şevê de dimeşiyan. Me çiya kiribû hedefa xwe û em bi aliyê wan de dimeşiyan. Em hatin cihekî ku tim kemîn lê dihate danîn. Em li wir ji hev dûr bûn. Em yek bi yek li pey hev meşiyan. Li cihê kemînê ku me bahsa wê dikir, tîmên taybet bi ser me de gule reşandin. Ozan got, eha bi şeref rêya me hatiye girtin. Em bi carekê ketin kemîna dijmin. Li ser kemînê fikarên me hebûn û rast jî derketin. Dijmin bi dengê çalakiya me hesiyabû. Piştî ku dengê çekan ji deştê hatibû bihîstin, cerdevan, esker û tîmên taybet derketibûn operasyonê û li gelekî cihan kemîn danîbûn. Hema hema tevahiya deştê hatibû girtin. Em bi carekê ketin kemînê. Cerdevan û tîmên taybet bi ser me de gule reşandin. Di saetên dawiyê de ku êdî me rêya xwe bi dawî dikir, em ketibûn kemînê. Di tevî rêya xwe de em ji kemîneke wiha ditirsiyan û jê bi guman bûn. Di kemînê de heya ji destê me hat me çek bi kar nehanîn. Em li rêya derketinê geriyan. Ji bo me ya girîng derketina ji kemînê bû. Li vê deştê me şer bikira piştî, deh deqeyan wê tevî leşker, cerdevan û tîmên taybet yên Farqînê bihatana û em dorpêç bikirana.
Xilasiya me jî vê carê gelekî zehmet dibû. Em ketibûn nava agir, der û dora me tev hatibû girtin. Ne kesekî dikariya bihata alîkariya me û ne jî me dikariya em dengê xwe bigihînin hevalan. Li cihê ku em lê ketîn kemînê, ne me dikariya em paş ve vegerin, ne jî bi pêş ve biçin. Pêwîst bû di demeke kurt de me planek çêkira û em ji kemînê derketana. Me bi lez, ji nav hevalan tîmek diyar kir. Ozan û Çekdar wê biçûna li dor kemînê vegeriyana. Emê dîsa bibûna du tîm. Tîmekê wê li cihê xwe bima, tîma din jî wê biçûya ji pişt kemînê ve êriş bikira. Bi vî awayî meyê xwe ji kemînê xilas bikira. Bi pilaneke wiha belkî me xwe ji kemînê xilas bikira. Ozan û Çekdar ji bo ji me re rêyekê vekin ketin rê û ji cem me çûn.
Eger heval bêyî ku dijmin bi wan bihesiya bigihiştana pişta kemînê wê plana me cihê xwe bigirta. Em li cihê xwe li benda hevalan rawestiyan. Ya baş ew bû ku şev tarî bû û tavaheyv tine bû. Ev ji bo me pir baş bû. Di saetên dawiyê de em ketibûn kemînê. Piştî deh deqeyan, careke din deng bi çekan ket. ëşev dibû cara duemîn ku em diketin şer. ëşev ji ber guhên me dengên çekan bi dawî nedibûn. Dengê gule û bombeyan careke din ji deştê bilind bû. Dengê gule û bombeyan bê destûra me hawirdor dixiste nava tirs û fikaran. Bêhna barudê li ser kincên me runiştibû. Ji her aliyê me bêhna çekan dihat. Bi dengê çekan re kesên li derveyê malan bi carekê baz dan hundir. Dengê kûçikan li deştê careke din belav dibû û her yek ji wan bi cihekî ve baz da. Me bi vê meşa xwe di nava deştê de gereke dirêj dabû destpêkirin. Heya vir me ti wendahî nedabûn, em serkeftî bûn. Heya heval gihiştin pişt kemînê me gule avêtin ser kemînê. Bi vî awayî ji tîman kirî ku em di cihê xwe de asê mane. Tîmên taybet xwe ji bo komekê amade kiribû. Piştî ku hevalan cihê xwe girtin û ji pişt ve êrîş kirin, em ji nav kemînê derketin. Em ji cihê xwe rabûn bi aliyê ku heval tê re derbas bûyîn ve meşiyan. Heya me xwe ji cihê xeter derbas kir hevalan şer kirin û em parastin. Li deştê bi planeke wiha me xwe ji kemînê xilas kir. Dema em gihîştin cem hev me dît ku bi sivikî Wedat birîndar bûye. Perçeyek gule li milê wî ketibû. Ji kemîna ku xilasî gelekî zehmet bû, hevalek me sivik birîndar bû û em xilas bûn.
Di bin siya guleyan de me baz da em ji nav kemînê dûr bûn. Ji aliyekî ve me baz dida ji aliyê din ve jî em bi halê tîman dikeniyan. Me got ma em bûna li vir kesek xilas dibû. Wele kesek ji destê me xilas nedibû. Her ku em ji deştê dûr dibûn fikarên me kêm dibûn û em digihiştin azadiya xwe.

Em gav bi gav nêzî hevalan dibûn û me deşt li pey xwe dihişt. Li nîvê deştê em ketibûn kemînê lê me ev yek jî derbas kiribû. Dinya hêdî hêdî ronî dibû û cihê xwe dida şeveqê. Şeveq ji bo leşker û eskerên Tirk re wextê kemîn û operasyonan bû. Yanî dema wan bû. Di tevî dema em li deştê bûn, em bê destûr di bin bandora tirs û fikaran de mabûn. Şeveqa wê sibê em gav bi gav, ber bi azadiya xwe ve dimeşiyan. Cihê ku heval lê diman xuya dikir. Çiyayên ku me ji deştê ji dûr ve li wan dinêrt niha çiqasî nêzî me bûn. Çiyayên ku ji deştê di tarîtiya şevê de dûr bûn, niha li ber destê me bûn. Em ewqas nêzî çiyayê Farqînê bûn, me destê xwe dirêj bikira emê bigihîştana wan. Me cihê kemînê jî li pey xwe dihişt. Ji aliyê din ve me rêwîtiya xwe ya dijwar û bi tirs jî xilas dikir. Dema dinya ronî bû, em gihîştin binê nuqteya hevalan. Piştî ku em gihîştin binê nuqtê, tevî tirsa li ser me rabû. Tevî rehtbûna me ji ser me rabû û em sivik dibûn. Em weke baz bi çiyayê bilind ve hilkişiyan. Yek dengî dikariya hevalan bîne binê çiyê. Vê yekê hêz û moraleke zêde dida me. Her ku em bi çiyayê bilind ve hildikişiyan, em li pey xwe vedigeriyan û me li deştê mêze dikir. Deşta dûr û rast li ber cavên me bû. Em ji vê rêwîtiyê jî rizgar dibûn. Lê me bawer nedikir. Me bawer nedikir ku em ji deştê xilas bibin. Em gav bi gav ketin nava nokta hevalan.

Dema em nêzî hevalan bûn lingên me giran bûn û gavên me teng bûn. Me xwe gihandibû cem hevalan êdî tirsa me nemabû. Ji kêfê ken ji ser rûyê me nediçû. Me bi xwe jî bawer nedikir ku rêya dûr û dirêj bi dawî bûye. Di deşta xopan de, me planên li dijî xwe vala derxistibûn. Em ji kemînan rizgar bûbûn û em heya ber çiyayên Farqînê hatibûn. Rêya dûr ku me jê bawer nedikir bi dawî dibû. Di rêwîtiya deştê de em pir bêxew mabûn, qirêjiya li ser me jî em bêzar dikirin. Em pir bi qilêr bûbûn. Me dixwest em demeke zûtir bigihijin cem hevalan û vê mijarê şîrove bikin. Me digot, em biçin cem hevalan û çîroka xwe ji wan re bêjin. Ber destê şeveqê em gav bi gav ketin nava nuqteya hevalan. Ro hêdî hêdî diyar dibû. Em jî di dema xwe de gihiştibûn cihê xwe. Nobetdar em ji dûr ve dîtin. Dema em gihîştin cem hevalan me hev bi dilgermiya hevaltî hemêz kir. Himêzkirina me weke himêzkirina dayik û kuran bû. Weke himêzkirina bav û bira germ bû. Me xebateke baş bidawî dikir, di xebata xwe ya yekemîn de em serkefî bûn.

Di vê demê de pirs û lêpirsîn hatin destpêkirin. Demeke kurt bû em ji hevalan veqetiyabûn. Lê ji ber ku ev veqetîn li deştê bû ji me re weke demeke dirêj dihat. Mûnaqeşê dest pê kir, guftûgoyên ji birînan kurtir hatin destpêkirin. Bûyerên hatîn serê me, yek bi yek me ji hevalan re gotin. Heval di cihê xwe de mat bûn. Bawer nedikirin ku evqasî bûyer hatine serê me. Bi taybetî jî ji kompoyên ku gundiyan anîn serê me. Hevalan digotin nabe, çawa wisa kirin. Jî çiya zahmetiya deştê baş nedihat zanîn. Berî em dest bi meşa xwe ya deştê bikin, me jî nizaniya ku çûna deştê wê ewqasî zehmet be. Me digot, ev jî rêwîtiyek weke her demê ye. Ev jî kareke ji karê her demê ye. Lê ne wisa bû, rêwîtiya deştê ji karê çiyê gelekî cuda bû. Meyê çawa bizaniya emê bikevin kemînan û li komploya gundiyan rast werin. Hevalan bawer nedikirin ku em ji aliyê gundiyan ve hatine xapandin.

Karê gerîla yê li deştê tim ji aliyê hin hevalan ve dihate meşandin. Ev heval tevî karê me yê deştê dikirin. Ji me re carna behsa zehmetiyên deştê dikirin. Lê me ji gotinên wan bawer nedikir. Li gor me gerîla li her derê gerîla bû. Zehmetî jî li her cihî heman zehmetî bûn. Piştî em hatîn herêma Şehîd Kendal ev cara duemîn bû, em diketin kemînê. Berî vê em careke din jî ketibûn kemînê. Berî em bêne herêmê, hevalan em ji bo kemînan hişyar kiribûn. Li ser kemîn û operasyonan gelekî tişt hatibûn gotin. Lê di şer de tişt ji destê mirovan nayên. Di şer de ti tişt li gor planan nameşin. Her tiştê ku mirov bi zanistî

nêz dibe jî carna berovacî dibe. Vê roja ku em gihîştin cem hevalan em li ser kar û xebata xwe heya derengiya şevê axivîn. Axaftinên me piranî li ser kemîn û operasyonan bûn. Dema em bi hev re diaxivîn, hevalan wiha gotin. Ev çend kemîn in ku em derbas dikin. Em ji gelek kemîn û şeran derbas bûne, lê baş e ku me heya niha wendahî nedane.
Em berî vê careke din jî li herêmê ketibûn kemînê. Di wê kemînê de jî şansê me hebû em xilas bûbûn. Em ji bo wazîfeyekê bi aliyê Amedê ve çûbûn. Me ji bo çalakiyê amadekarî dikir. Li herêmê hinek bûyer qewimîn. Me di plana xwe de guhertin çêkiribû. Pêwîst bû em di demeke kurt de vegerin herêma xwe. Me karê xwe di cih de hişt û emê vegeriyana. Emê biçûna tiştên şaş rast bikiran. Hevalê Ozan herêm baş nas dikir. Me jê pirs kir?
"Ji bo em di demeke kin de bigihîjin herêma Şehîd Kendal, em di kîjan rê de biçin baş e, rêya herî nêz kîjan e."
Ozan herêm baş nas dikir, li ser pirsa me hinek fikirî û bersiveke wiha da:
"Li pêşiya me du rê hene, rêya yekemîn, di deştê re diçe. Rêya duemîn jî di çiyê re diçe. Di kîjan rê de bê xwestin ez dikarin we bibim."
Li gor axaftina wî, rêya deştê saxlem lê dûr bû. Eger em di wir de biçûna, emê ji çiya daketana deşta Licê. Di ber gundên Sinê û Rehşanê de derbasî Şehîd Kendal bibûna. Li gor rêya çiyê hinek saxlem bû, lê rêyeke dûr û dirêj bû. Rêya çiyê li gor ya deştê ne dûr nêz bû, lê ev der jî bi xeter bû. Di rêya çiyê de gelek cihên kemînan hebûn. Rê di çiyayên asê re derbas dibû û heya Şehîd Kendal diçû. Çiyayên qereqola Sîsê û çiyayên gundên cerdevanên Sinê li pêşiya me bûn. Her wiha ev rê diser çiyayê Hezroyê de derbas bidû. Di vê rê de em her gav bi xeteran re rû bi rû bûn. Ji ber vê yekê di wan çiyayên asê de gelek çeper hebûn. Li ser rêya çiyê bi taybetî tîmên taybet û kontra disekinîn. Li çiyayê bi ser gundê Sinê jî cerdevanan kemîn datanîn. Meyê ji xwe re rêyek hilbijarta û emê tê re biçûna. Me dest bi pirs û lêpirsînan kir, em di kîjan rê de biçûna baş bû?Em di rê ya deştê de biçûna, an jî, di rêya çiyê de?Ji ber ku dema me kêm bû ji bo me rêya nêz kîjan bûya ew der baş bû. Em di kîjan rê de zû bigihiştana herêmê emê di wir de biçûna. Ozan hevalek rêzan bû, di navbera herêman de heval dibir û dianîn. Navê rêzanê herêmên zehet Ozan bû. Di nav operasyonan, di nav şer û di rêyên dûr de tim Ozan digeriya. Me pirsa rê jê kir.
"Dema me kin e, ji bo me rêya çiyê çawa ye? Em dikarin di demeke kin de bi ewle di rêya çiyê de derbas bibin?"
"Rêya çiyê bi xeter e, li ser rê çend cihên kemînan hene, eger di rê de bûyerek dernekeve û em baş bimeşin, emê zû bigihijîn nuqteya nêz. Lê di rê de dibe ku kemîn an jî operasyon hebin, divê em li van jî pir dîqat bikin. Di rê de eger tiştek nebe û em nekevin kemînan, an jî operasyon tine bin emê xwe di şevekê de biavêjin nuqteya herî nêz ya herêmê."
Ozan axaftina xwe wiha domand:
"Li pêşiya me hin cihên kemînan hene, em li wan deran nekevin kemînê pir baş e. Ji ber ku li wir tîmên taybet tim kemînan datînin. Bi taybetî li ser çiyayê Hezroyê ciheke teng heye, ji wê derê pêde rêyek din nîne. Ew der tim ji aliyê tîmên taybet û kontrayên dewletê ve tê girtin."
Me di nav xwe de nîqaşek kin kir, em di kîjan rê de biçûna baş bû? Dawiyê me biryar da, dema me kurt bû. Emê di rêya çiyê de biçûna. Ji bo di demeke kurt de em bigihîjin cem hevalan, em ketin rê. Emê di rêya bi xeter de biçûna, lê karê me ji her tiştî girîngtir bû. Me berê xwe da çiyayên asê û em bi wan ve hilkişiyan. Çiyayên di navbera deşta Licê û

Hezroyê de li benda me bûn. Em li ber qereqola Sîsê bûn. Rêya me di nav gund û çiyayan de derbas dibû. Bi vî awayî emê di demeke kurt de bigîştan cem hevalan. Şev tarî bû ti deng nedihatin bihîstin. Em heya ser çiyayê gundê Sinê hatin. Li ser çiyê gelekî çeperên cerdevanên Sinê hebûn. Gelek caran dihatin çeper digirtin. Ev cerdevan gelek dijwar bûn. Dijminê gerîla bûn.
Wê şevê her ku em dimeşiyan şeva tarî cihê xwe dida taveheyvê. Her ku em bi çiyayên bilind ve dimeşiyan navbera me û ezmên ronî dibû û em nêzî taveheyvê dibûn. Her ku saet bi derengiya şevê de diçû dinya ronîtir dibû.
Şeva tarî cihê xwe dida dema kemîn û operasyonan. Em hilkişiyan ser çiyayê li ser gundê Sinê. Em gav bi gav ketin nav çeperên cerdevanan û me kontrol kirin. Me yek bi yek çeper kontrol kirin, kes di wan de tine bû. Bi vî awayî em ji cerdevanên Sinê xilas bûn. Piştî ev çeper vala bûn, em hinek rehet bûn. Me got madem ev çeper vala ne, li pêş jî kes nîne. Me meşa xwe bi heman tempoyî dewam kir. Saet di navbera yazdeh û diwazdehê şevê de bû. Em gav bi gav li ser çiyayê Hezroyê dimeşiyan. Meşa me li ser xeta di navbera reş û ronahî de pêk dihat. Aliyek me şeva tarî, aliyê din jî ji ronahiya lembeyan pêk dihat. Di vê meşa me de her ku em dimeşiyan, dinya ronî dibû. Taveheyvê weke rojê dinya ronî dikir. Ji bo em ji çiyayê Hezroyê derbas bibin, me lez da xwe.
Dema wext nîvê şevê bû, êdî em li ser çiyayên bilind yên Hezroyê dimeşiyan. Di şevên wiha de me weke navê xwe dizanibû dijmin kemînê datîne. Me ji xwe re wiha got, ji ber ku di vê saetê de tavaheyv ewçend ronî ye ev qedera me ye. Me dizaniya ev saet saeta kemîn û şer e. Me çiqas meşa xwe lez dikir, dinya ewqasî ronî dibû. Em û taveheyvê em bi hev re ketibûn pêşbirkê. Kî wê ji yê din derbas bibûya.
Rêza me jî wiha bû: Ozan li pêş, Kurmanc li pey wî, ez, Tîrêj, Çekdar, Deniz, Resûl û Mahsûm em li pey hev dimeşiyan. Me lez dabû xwe ka serkeftin wê bibûya ya kî. Her ku dinya ronî dibû fikarên me yên li ser kemînan jî zêde dibûn. Li ser çiyayê Hezroyê me li çar aliyên xwe mêze dikir. Ji çar aliyan ve dinya ronî dibû. Çiyayê ku em li ser dimeşiyan rût û vala bû. Di dilê me de hîsek ku em giran dikirin û em ji meşê asteng dikirin hebû. Me çiqas meşa xwe lez dikir, dîsa giraniyek li ser me hebû. Em weke di nava operasyonê de bimeşin giran bûbûn. Em li ser çiyayê Hezroyê mat û zuq mabûn. Cara yekemîn bû min cihek wisa rût û vala didît. Jora çiyê bi kevirên weke mermer hatibû nexşkirin. Mirov digot, qey kevir yek bi yek bi destan hatine rêzkirin. Ji aliyekî ve me li kevirên weke mermer, ji aliyê din ve li der û dora xwe dinêrt. Lembeyên Hezroyê vekirî bûn û di nav bêndegiyê de şoq didan. Lembeyên Hezroyê û Sinê dinya ronî dikirin û tavaheyv jî bi ser de. Di bin wê taveheyvê û şoqa lembeyên li dor, me meşa xwe lez kir. Di vê meşa kin de em di çend cihên kemînê re derbas bûn. Tirsa me kêm bûbû, lê me bi vê re cihê kemînê ya herî bi xeter jibîr kiribû. Eger em ji çiyayê Hezroyê derbas bibûna li pêşiya me deşteke dirêj dima. Ji wê û pêde, êdî tirsa me tine bû. Cihê herî bi xeter ev der bû. Li aliyekî me tabûra leşkerî ya Hezroyê, li aliyê din jî gundê cerdevanên Sinê hebû. Cerdevanên vî gundî bi rastî jî har bûn. Ne zimanê wan û ne jî ola wan nedihate zanîn. Tiştê ku baş dihate zanîn dijminê gerîla bûn. Li vir gelek hevalan di kemîn û şer de jiyana xwe ji dest dabûn. Ji ber van bûyeran her kes gundên wiha baş nas dike.
Em li cihekî rast û vala dimeşiyan. Di navbera me û cihê çepera ku Ozan behsa wê dikir de, çend gav mabûn. Em ji cihek hinek jor, bi ser çeperê ve diçûn. Dema em nêzî çeperê bûn, Ozan ji dûr ve çeper nîşanî me da û wiha got:
"Binêrin cihê ku min basa wê dikir ev der e. Tîmên taybet û kontrayên dewletê tim li vir disekinin. Wer xuya dike ku îro kes li vir nîne. Tiştek ecêb e, îro ev der çi bêdeng e."

Ji ber ku em ji cihên bi xeter derbas bûbûn, me bawer nedikir ku dijmin li vir hebin. Li pêşiya me cihê bixeter ev der mabû, em ji vê derê jî derbas bibûna em ji cihên bi kemîn rizgar dibûn. Axaftina Ozan hê bi dawî nebûbû, bi carekî bi ser me ve gule hatin reşandin...
Bi carekî em ketin kemînê. Em şaş mabûn. Me xwe di nava dengê çek, bome û rokêtan de dît. Bi dengê çekan re me xwe avêt erdê. Em ewqas nêzî çeperên dijmin bûn ku hindik mabû em biçin û li nav çeperê mêze bikin. Di navbera me û dijmin de tenê çend gav mabûn. Çend gavên din jî em bimeşiyan, me destê xwe davêt çeperê. Di vê kêliyê de ji çeperan bi ser me de çekên giran dihatin bikaranîn. Em ewqasî nêzî kemînê bûn, ne dijmin, ne jî em bi wan hesiyabûn. Lê wisa xuya dikir ku dijmin jî bi carekî em li ber xwe dîtine. Ew jî bi hatina me şoq bûbûn. Na eger ne wisa bûya, wê ji cihê bûyerê cesedên mirovan bihatana rakirin.
Bi dengê çekan re em ji hev belav bûn. Her yek ji me em bi cihek ve çûn. Dengê çekan di nav şeva tarî de weke brûskan deng vedidan. Ji her alî ve rokêt bombe, bombayên ronîkirina şevê û bîksî dihatin teqandin. Piştî dengê çekan hat bihîstin ji her alî ve, êrişî me dikirin. Ji tabûra Hezro, Gundê Sinê û ji cihên kemînê êrişî me dikirin. Ji sê aliyan ve çek berî me didan.Weke tiştek birîndar bikeve destê guran, ji sê aliyê me ve êrişî me dikirin. Ev rêya em tê de hatîn ji aliyê hevalan ve gelek caran hatibû bikaranîn. Hevalên herêmê çend caran li vê derê avêtibûn ser tabûra Hezroyê. Li vir çend caran çalakî hatibûn lidarxistin û dijmin wendahî dabûn. Piştî van çalakiyan dijmin li vir kemîn didanî. Em bi carekî ketin kemîna tîman. Dema ji çeperê êrişî me kirin me her yekî xwe bi cihekî ve avêt erdê. Di vê şeva tarî de, me xwe bi carekî di nava kemînê de dîtibû. Ji aliyekî ve bi çekan li me didan, ji aliyê din ve jî bo dinya ronîtir bibe bombeyên ronahiyê diavêtin ser me. Li wî cihê rast û vala, em her yek bi cihekî ve çûn. Wê şevê dengê çekan şeva me xera kirin. Dijmin em ji xewa şêrîn şiyar kirin û em ji ser rêya me girtin. Em ji rê hatibûn astengkirin. Dengê gule û bombeyan di ber guhên me de diçûn û dihatin. Vizevize guleyan bû, bi ser me de diavêtin. Weke zarokek ji xew were hişyarkirin, em jî wisa ji rê hatibûn girtin. Di destpêka kemînê de me wendahî nedabûn. Lê em gelekî ji hev dûr ketibûn û belav bûbûn. Bi dengê çekan re, em her yek bi cihekî ve çûbûn. Bi vî awayî em ji ber çeperê paş de kişiyan. Em ji nav lepên tîman derketin û weke sed metroyî dûrî wan li pişt keviran sekinîn. Em ji hev dûr bûn, hayê me ji hev tine bû. Şev nîvê şevê bû, lê dîsa jî dinya ronî bû. Me bang li hev kir û rewşa xwe ji hev re got. Di navbera me de weke deh metroyan hebû, me got kî birîndar, kî wenda ye? Li gor bersivan tevî hevalan baş bûn. Rêya li pêşiya me bi meşê rojek bû. Em li cihek bi xeter ya vê meşê ketibûn kemînê. Lê vê carê li pêşiya me pirsgirêkek din hebû, emê ji cihê kemînê çawa derketana? Ev pirsek di cih de bû. Ya rast ew bû ku em dido dido ji nav kemînê derên û li cihek baş li bendî hev bisekinin. Ji ber ku li pêşiya me derbasokek teng jîhebû, îhtimal hebû ku li wir jî kemîn hebe. Ji ber vê yekê emê bi tîmên jimar kêm ji wê derê derbas bibûna. Piştî ku me xwe ji nav lepên tîman derxist, emê ji cihê kemînê dûr bibûna. Ozan û Deniz li pêş çûn em sê hevalên din em li cihê xwe man. Piştî ku deh deqe bi ser çûna Ozan û Deniz re derbas bûn, em jî ketin rê. Me xwe ji nav kemînê derxist û em heya derbasoka çiyê a cihê teng hatin. Ji wê û pêde me xwe ji çiyê berjêr dikir. Ji ber ku em ji nav kemînê bi saxlemî derketin em kêfxweş bûn. Li gor plana me Ozan û Deniz wê li vir li bendî me bimana. Dema em hatin derbasoka çiyê heval tine bûn. Em ji ber kemînê dûr bûn, lê vê carê me hev wenda kir. Em ji nav kemînê bi saxlemî derketin û paşê ji hev qut bûn. Di nav me de Ozan û Deniz herêm baş nas dikirin. Ne ez ne jî Çekdar me rê weke wan nas nedikir. Ya baş ew bû, me di kemînê de

wendahî nedabû. Em tev ji cihên xwe yên cuda bi sivikayî birîndar bûbûn. Ji ber ku me xwe li erdê kaş kir, ji destê min xwîn dihat. Perçeyên keviran li me ketibûn. Em bi şensek mezin ji kemînê rizgar bûbûn, lê vê carê em ji hev wenda bûn.

Ji ber ku em ji hev wenda bûn, em gelek hêrs bûn. Vê carê em bi giştî di nava kemînê de asê bûn. Her komê em bi cihekî ve çûbûn. Ji aliyekî ve me dixwest em ji herêma kemînê derkevin, ji aliyê din ve me rê nizanibû. Ya din emê bê hevalê xwe ji wê derê çawa biçûna. Em ji nav kemînê derketibûn, lê hê jî dengê çekan dihat. Ji cihê kemînê, ji tabûra Hezroyê û ji gundên cerdevanên Sinê, gule diavêtin. Ji sê aliyan ve em hatibûn dorpêçkirin. Em ketibûn nava agir û ti rê tine bûn. Bi ser me de weke baranê gule dihatin reşandin. Ji sê aliyan ve gule li ser me kom dibûn û dihatin xwarê. Gule li ser me li hev diketin û diteqiyan. Li jorê ezman gule perçe dibûn û bi ser me ve dihatin xwarê. Meyê çi bikira?Pêwîst bû em zû ji vê derê derkevin?Em bi carekî ketibûn kemînê û bi carekî ji hev wenda bûbûn. Me bi fîkînî bang li hevalan kir, me kir qarewar. Dengê banga me li wan deran belav dibû. Dijmin ji bîra me derketibû. Me bang dikir, dikir gazî.

Dijmin bi dengê me hesiyabû, em û tîman ketibûn nav hev. Dijminê ku li rewşa me mêze dikir digot, an birîndar dane an jî şehîd dane û nikarin ji cihê kemînê derkevin. Ji tîman re ji du aliyan ve alîkarî dihat. Konvoya leşkerî ket rê û bi aliyê me ve dihatin. Me nizanibû em çi bikin û biryarekî çawa bidin; em biçin an na?Heval xuya nedikirin, me ti mane nedida wendabûna wan. Li pêşiya me ji nav kemînê derketibûn û bi carekî wenda bûbûn. Me dest bi qêrîn û fîkînan kir. Em nêzî du saetan li dora vî çiyayî çûn û hatin. Tîmên taybet bi lêgerîna me tirsiyan û di cihazê de eşkere alîkarî xwestin. Di cîhazê de liv û tevgera leşkeran dest pê kir. Ji Tabura Hezro ji gundê Sinê tev ketin nava tevgerê. Qêrîn û fîkîna me tîmên tabet xistibûn nava tirs û fikaran. Difikirîn ku an me şehîd dane an jî em nikarin şehîdê xwe ji nav kemînê derînin. Yan jî em nikarin ji nav kemînê derkevin. Ma wê ji kû bizanibûna me xwe ji kemînê rizgar kiriye û em ji hev wenda bûne. Rewşa me ne baş bû, lê leşkeran bi rewşa me nizanibûn. Belkî rewşa leşkeran jî ne baş bû, lê me jî ya wan nizanibû. Di nava kemînê de em ji hev qut bûn û em bûn du beş. Hevalê Ozan û Deniz ji me wenda bûn em jî li wan digeriyan.

Vê şeva ku em ketin kemînê, ji yekîneya Şehîd Remzî hevalê Faîq bi rewşa me hesiya. Faîq di şer de hevalekî kevin û xwedî tecrûbe bû. Ji taktîkên şer baş fêm dikir. Wê şevê li ser çiyayê Qurmikê bû. Ji çiyayê Qurmikê cihê em lê ketibûn kemînê deng baş dihate bihîstin. Her du çiya li hemberî hev bûn. Hinek dûr bûn, lê dengê şer diçû Qurmikê. Hevalê Faîq wê şevê di cîhazê de guhdarî bûyerê dike. Wisa têdgihêje ku em ketine kemînê û nikarin ji nav derkevin. Dijmin di cîhazê de alîkariyê dixwaze û dibêje ku me ew xistine kemînê, nikarin derkevin. Ji her alî ve esker dihatin. Li ber vê bûyerê hevalê Faîq wiha dibêje:

"Rewşa hevalên Şehîd Kendal ne başe, ji bo wan alîkarî pêwîst e. Sedî sed ketine kemînê û nikarin derkevin. Ez çi bikim ku heval ji kemînê xwe rizgar bikin? Ji destê min çi tê?"

Dengê çek û bombeyan ji ser çiyayê Hezroyê belav dibû. Dûmana ku ji devê çekan û ji bombeyan bilind dibû bêhna şevê xira dikir. Ji bo me heval bidîtan, em geh vir de geh wir de diçûn. Alîkariya Faîq ji bo me gelekî pêwîst bû, lê çawa û bi çi şêweyî? Ji herêmek weke Şehîd Kendal me hêvî nedikir ku kesek alikariya me bike. Ji aliyekî ve leşker ji aliyê din ve cerdevan bi çiyê ve hildikişiyan. Li herêmê liv û tevgerek lezgîn dest pê kiribû. Emê ji nav kemînê çawa derketan ne diyar bû. Lê mucîzeyên şer ji bîra me nediçûn. Şer hem carna ilim qebûl nedikir, lê carnan bi mucîzeyan tije bû. Di şer de carna mucîzeyên ku qet nedihatin bîra mirovan çêdibûn.

Faîq ku ji çiyayê Qurmikê dixwest alîkariya me bike wiha dibêje:
"Ez çî bikim ku leşkerên têne alîkariyê dereng bimînin, heya ku heval xwe welas bikin. Wisa xuya dike ku ji bo hevalan hinek dem lazim e."
Ji bo em xilas bibin Faîq planekê çêdike. Wê şevê dikeve cîhaza dijmin û wan şaş dike. Di cîhazê de weke hevalek ji koma me be û bi zanebûn em ji cihê kemînê dernakevin nîşan dide. Di cîhazê de wiha dibêje: Werin, werin, em li benda we ne, heya em çend kesan ji we nekujin em ji vir naçin. Werin faşîstên Tirk, werin.
Dijmin guhdarî dike û li hemberî vê bangê ditirsin û di cihê xwe de dimînin. Wer fêm dikin ku me kemîn daniye, gava bi ser me ve werin emê li wan bixin. Hevalê Faîq bi van axaftinan çavê dijmin tirsandibû û ji me re, dem dabû qezençkirin. Ji bo em hevalan bibînin û em ji cihê bûyerê dûr bikevin ev fersendekî mezin bû. Mucîzeya ku em lê digeriyan jî ev bû. Piştî axaftina Faîq konvoya leşkerî di cih de sekinîn. Ji gundê Sinê cerdevan jî ketibûn rê û bi ser me de dihatin. Ew jî rawestiyabûn. Cerdevanan çek berî hewayê didan û bang li me dikirin. Em ji cihê kemînê derketin û me xwe ji wê derê dûr kir. Me dest bi qîrîn û bangê kir. Fîkîna me heya nava Hezroyê dûçû. Dengê me li hev kom dibû û li ser çiyayê bilind belav dibû. Piştî em hinekî pêş de meşiyan, me dît ku heval li wir in. Xwe ji cihê bûyerê dûr kiribûn û li pêş li bendî me mabûn. Lê em li kû li wan digeriyan. Cihê me nîşanî wan dayî, çiyayê ber me bû, lê ew derbasî çiyayê din bûbûn. Em hineke din bi halê xwe û yê dijmin keniyan. Di taveheyva şevê de li ber me li me nexistibûn. Halê me jî ji vê ne kêmtir kenok bû. Em ji kemînê derketin lê paşê me hev wenda kir. Em bi wê acizbûnê hinek bi halê xwe keniyan. Di vê serkeftinê de bê guman rola mezin yê hevalê Faîq bû. Eger ev plana wî nebûya wê dijmin zû bi ser me de bihata û meyê nikaribûya ji nav kemînê derkevin. Me xwe ji cihê bûyerê zû dûr xist. Bi rastî piştî ku tevahiya hevalan em saxlem hatin cem hev, em pir kêfxweş bûn. Me xwe ji kemînê rizgar kiribû, me bi halê dijmin jî hinekî keniyan. Hayê me ji Faîq nebû, me digot, dijmin diraze nizanin şer jî bikin. Eger li şûna wan em bûna yek ji wan ji destê me xilas nebibû. Bi rastî jî di wê şeva ku weke nava rojê bû, eger dijmin biketana kemîna me yekî ji wan xwe rizgar nedikir. Vê carê hinek hevalan gotin em kemînê daynin. Lê dema me nemabû, dem dereng bû, li pêşiya me çend saet mabûn, lazim bû me xwe bigihanda noktaya pêş. Ji cihê me û heya nuqteya pêş qederek rê mabû. Bê guman şeveqê wê li herêmê operasyon jî bihata lidarxistin. Em çiqas ji cihê bûyerê dûr biketana ji bo me ewqas baş bû.
Yek rê li pêşiya me hebû, pêwîst bu bi lez û bez me xwe bavêta nuqteya pêş. Me daxwaza hevalan ya şer qebûl nekir. Em ji wê kemînê wisa xilas bûn û me rêya xwe dewam kir. Wê şevê em heya şeveqê meşiyan. Di meşê de ji bo em zû bigihin nuqteya xwe me xwe dida çiyayên asê û kaş. Li pêşiya me gelekî çiya û zevî hatibûn şewitandin. Em nîvê şevê ketibûn kemînê, piştî em ji kemînê rizgar bûn heya ku dinya ronî bû, em meşiyan û gihîştin cem hevalan.
Bi vê kemîna li deştê re dibû du car ku em li vê herêmê diketin kemînan. Li herêma Şehîd Kendal heval, gelek caran ketibûn kemînê û wendayî dabûn. Hevalên ku berî me hatibûn vê herêmê jî ketibûn şer û wendayî dabûn. Em jî di demeke kurt de ketin çend kemînan, lê me heya hingê wendahî nedabûn. Me çalakî lidar xist, em ketin kemînan, heya deştê çûn û vegeriyan. Me kemîna duemîn jî derbas kir û berê xwe da cihên parastgeh. Em li gor hevalên pêşiya xwe, bi şens bûn. Her wiha em di xebata xwe de jî serkeftî bûn.
Piştî ku em ji destê hatin li nuqteya ser gundê Elîreşê em rawestiya bûn. Em li cem hevalên xwe bûn. Li binê nuqteya me gundek hatî valakirin jî hebû. Ev gund li cihek pir

xweş ava bûbû, lê mixabin ev jî weke gundên din hatibû şewitandin û valakirin. Çiyayê ku em lê diman gund li qûntara wî bû. Li cihek rast û fireh cih digirt. Kaniyek ku ava wê weke cemedê bû hebû. Em gelek caran diçûn ser wê kaniyê û me ji xwe re av dianî. Gundê din yê herî nêzî me Elîreşê bû. Nîştecîhên vî gûndî jî welatparêz bûn. Gund ji ber ku bi deştê ve bû, nehatibû valakirin. Cihê em lê diman û gundê Elîreşê li hemberî hev bûn û li hev mêze dikirin.
Me şeva xwe wisa bi axaftin û bîranînan derbas kir. Em li ser şer, çalakî û kemînan axivîn û me şeva xwe bi dawî kir. Piştî ewçend lêpirsîn, êdî wextê plankirina rêwîtiyê bû. Meyê cihê xwe çawa biguherta, an jî emê biçûna kîjan nuqteyê? Em li ser planek nû fikirîn. Ji wê şevê ve em ketin nava plankirina cihek din. Bê guman dijmin em dişopandin. Piştî ku ev yek bihata tespîtkirin wê operasyon bi ser me de bihata. Li gor plana ku em li ser hevdeng bûn, wiha bû, 'emê heya şeveqê di cihê xwe de bimana. Dijmin bi ser me de bihata jî me cihê xwe zû bi zû nîşan nedida. Me ti liv û tevger nedikir. Her wiha me xwe ji bo her tiştî jî amade kiribû. Şer jî di nav de. Heya şeveqê eger tiştek nebûya piştî nîvro emê biçûna gundê nêzî me Elîreşê. Li gund meyê li ser çalakiya xwe agahî bigirtan û bi lez emê ji wir veqetiyan. Em di nav nuqteyê de bi cih bûn û li benda şeveqê man. Nuqteya em lê bûn ji kevirên weke zinaran pêk hatibû. Di bin kevirên mezin de me xwe veşart. Me meşa xwe ya dûr qedand û êdî em ji deştê xilas bûbûn. Me di vê meşê de karek baş pêk anîbû. Em heya deştê çûn û me dijmin li deştê tirsand. Dema pêvajoya berê dihate bîra me, em li gor wan hevalan serkeftî bûn. Me zanibû herêma Şehîd Kendal herêmek gelek zehmet e. Me baş dizanibû ku hevalan di kemîn û şer de wendahî dane. Herêma Şehîd Kendal, li eyaleta Amedê bi pîvanên xwe yên zor û zehmet dihate naskirin. Me jî destpêkê, hin tişt dan ber çav. Me got emê jî di demek kurt de wendahî bidin. Me ji bo pêşeroja herêmê û azadiya gelê Kurd her tişt dabû ber çav. Heya dawiyê jî meyê li ber xwe bida. Weke gelek şevên din, em carek din li bendî operasyona şeveqê bûn. Di vî şerê ku ti qural û pîvan nas nedikir, em li benda rojeke din bûn. Heya hingê em di karê xwe de bi serkeftî bûn. Piştî hingê çi bibûya ne diyar bû. Li cihek weke şehîd Kendal wê kengê çi pêk bihata ne diyar bû.
Dinya hêdî hêdî ronî dibû û dibû şeveq. Me guhdarî cîhaza dijmin kir, ji cîhaza wan, ti agahiyên li ser operasyonê tine bûn. Carek din roj derket û dinya bû şeveq. Piştî ku liv û tevgera dijmin xwuya nedikir em li bendî saetên êvarê man. Piştî nîvro dema tiştek xwuya nekir me xwe ji rêwîtiyê re amade kir. Lazim bû me di demek kurt de cihê xwe biguherta. Emê ji vê herêmê dûr bibûna, lê berî ku em biçûna pêwîst bû me li ser rewşa dawî agahî bigirtan. Em ketin nav gund û li ser çalakiya xwe me agahî stand. Me ji gundiyan re negot me çalakî pêk aniye. Me got, di van rojan de li gundên nêz ti bûyer pêk hatin e, an na?Gundiyan jî gotin, li gundekî deştê şer derketiye dijmin ji vê bûyerê gelek tirsiyaye. Çalakiya me dijmin li deştê jî xistibû nava tirsê. Em heya deştê çûn û me li dijmin xist. Li gor agahiyên ku me girtin, çalakiya me li deştê dengek baş vedabû. Gel li ser diaxiviya. Bi çalakiyê dijmin an wê dest ji karê nebaş berdan, an jî wê bi tirsa me bijiyana.
Me ji gund agahî girt û ji bo rêwîtiyê ji xwe re hinek pêxwarin girt. Em ji gund bi kêf ketin rê.
Li pêşiya me dîsa rêyek dûr û çiyayên bilind xuya dikir. Piştî rêya deştê ya dûr û dirêj careke din rêwîtî li pêşiya me bû. Lê vê carê em ji deştê dûr dibûn. Em ji gund derketin û me berê xwe da çiyayên bilind. Ji gundê Elîreşê bi çiyayên bilind ve pêwîst bû em bi saetan hilkişiyana. Em dîsa li ser rêya xwe bûn û dimeşiyan. Lê, ev meş pir xweş bû, ne weke meşa deştê bû. Mirov ji meşa çiyê tam digire û bidil dimeşe. Jiyana li çiyê, li

hemberî xwezayê berxwedanek e. Ev berxwedan mirovan roj bi roj mezin û bi hêz dike. Em dîsa li ser çiyayên Kurdistana azad dimeşiyan. Meşa li çiyê ne bi saetan bi rojan bû, lê em ti car jê aciz nedibûn. Em ji rêwîtiyek derketin û ketin rêwîtiyeke din. Rêwîtiya li ser çiyayê Farqînê li pêşiya me bû. Em gav bi gav di vê rê de dimeşiyan. Ji ber ku rêya me ber bi jor ve bû, em di nava xwêdanê de man. Li gor axaftina hevalan nuqteya ku em diçûnê bi meşê şevek bû. Em li ser çiyayê bilind di meşiyan û rojên me yên li deştê dihatin bîra me. Dema em gihiştin ser lutkeya herî jor, deşta fireh di nav tarîtiya şevê de bû. Lembeyên malan di nav reşahiya şevê de diberiqîn. Em ewqasî bilind bûn ku bi dehan gund li hemberî me ketibûn rêzê. Lembeyên malan weke morîkan li ber hev vêketî bûn. Di rê de wesaît li pey hev diçûn û dihatin. Ew rojên zehmet û dijwar çiqas zor bûn. Rojên me yên li deştê yên di çaltoka avê û rojên me yên li gund ku di bin ka û qeselê de derbas bûbûn, em ji kûr ve dêşandin. Ji çiyayên bilind me li deştê temaşe kir. Lembeyên gund û malan li du hev rêzkirî bûn. Li deştê ne yek, bi dehan gund hebûn. Deşt weke deryayekî kûr li bin destê me bû. Ji deştê dengeke nizm û bi tirs belav dibû. Deng li hev kom dibû û bi çiyayê bilind ve dihat. Dengê kûçik û bayê li nav hev diket û gur dibû.

Em ji deştê xilas bûbûn, bi vê yekê em pir kêfxweş bûn. Em ber bi nuqteya xwe ve dimeşiyan. Li gor gotina hevalan emê heya şeveqê bimeşiyana, berbanga şeveqê emê bigihîştana nuqteya Qahweyê. Nuqteya Qahweyê di navbera deşta Farqînê, Licê û Geliyê Zorê de bû. Hevalan navê Qahweyê li vê nuqteyê kiribûn. Emê vê şevê biçûna Qehweyê û ji wir jî emê derbasî Geliyê Zorê bibûna. Di wê rewşê de nuqteya Qahweyê ji bo me ne baş bû. Emê bi tenê rojekî li wir bimana û roja din jî derbasî Geliyê Zorê bibûna. Di meşê de em li ser çalakiya xwe diaxifîn. Her hevalekî cebilxaneya ku bikar anîbû got. Her hevalî nêzî nîv jarjorê avêtibûn. Lê min nêzî jerjurek û nîv bikar anîbû. Dema Wedad bihîst ku min evqas gule berdane gelekî aciz bû. Ez û wî em li ser lingan ketin nîqaşê. Li gor Wedad min gelek gule avêtibûn. Ya rastî jî wisa bû, lê di şer de mirov nikare pêşiya guleyan bigire. Em li cihek ne baş ketibûn şer û ji her alî ve hatibûn dorpêçkirin. Ya din li herêmê cebilxane gelek kêm bû. Piştî ku nîqaşa me li dijî hev hinek dewam kir, heval ketin navberê û em rawestandin. Bi hişyarkirina hevalan re me dengê xwe birî.

Em ber bi nuqteya Qahweyê ve dimeşiyan. Meşa me piştî nîvro dest pê kiribû û hêdî hêdî ro derdiket. Rêwîtiya me jî hindik mabû. Em ketin nava newala avê û tê de meşiyan. Ji bo rêçên me dernekevin em di nav ava newalê de meşiyan. Em weke sed metroyan di nava avê de meşiyan. Li çiya gerîla azad e, eger pêdiviyên gerîlatî pêk bên, zû bi zû nakeve tengasiyê. Bi dawîbûna şevê re ro derdiket û em gav bi gav nêzî nuqteya Qehweyê dibûn. Tevî şevê em meşiyan û ji deştê dûr bûn. Me amadekariyên xwe li gor operasyonekî berfireh dikir. Me li deştê meşek dirêj dabû destpêkirin û çalakiyek jî lidarxistibû. Dema me tevahiya vana dida ber çav, ne mumkûn bû ku operasyon nehata lidarxistin. Ji bo şopên lingên me dernekevin me pir dîqat dikir. Dema em nêzî nuqteyê bûn em geh li ser keviran geh di nav avê de meşiyan. Nuqteya Qehweyê cihekî pir hesas bû, me pir diqatê şop, deng û tiştên bihatan dîtin dikir. Nuqteya Qehweyê ji yek nuqteyên herî hesas yê vê herêmê bû. Berî ku em xwe berî hundirê nuqteyê bidin, me dora nuqteyê baş şopand û guhdar kir. Li derdor ne deng û ne jî nîşanên operasyonê tine bûn. Piştî me dora nuqteyê şopand me xwe berî hundir da. Em yek bi yek ketin hundir. Nuqte di binê zinaran de bû, ava newalê di binê çiya de cih vekiribû. Hevalan ev der kiribûn nuqte. Di vê nuqteyê de tiştê herî baş jî ew bû av hebû. Newalek weke ava aş dihat û di nav nuqteyê de diherikî. Bi mehan bu me xwe

neşûştibû, bi taybetî di meşa me ya di deştê de, em gelek qirêj bûbûn. Li çiyan ji bo roja din ti kes nikare tiştekî bêje.
Rojeke me hebû di wê rojê de meyê tevî pêdiviyên xwe pêk baniyan. Dema em ketin nuqteyê dinya hêdî hêdî ronî dibû. Em pir reht bûbûn, ji bilî nobetdar em yekser ketin xewê. Wisa xewa me dihat, çawa me serê xwe danî em bi xew ve çûn. Bi tenê nobetdarê me Çekdar şiyar bû. Em weke nîv saetê ku ji bo me weke rojan hat em razan. Di wê nîv saetê de em ketin xeweke kûr. Li nav nuqteyê dengê avê weke melodiya mûzîkê belav dibû. Weke em di nav dergûşê de bin, em li ber dengê avê di xew re çûn. Bi banga şeveqê re ji me ti deng dernediket. Çûn û hatin bi tevahî hatibûn rawestandin. Em her yek li cihê xwe raketî bûn. Tenê nobetdarê me Çekdar şiyar bû.
Piştî qederek ku li me gelekî dirêj bû, bi carekî dengê Çekdar yê nizim û bi hêrs li ber guhên me ket. Min serê xwe bilind kir ku Çekdar yek bi yek hevalan ji xewê şiyar dike. Em ji xewa şêrîn ku me bi rojan negirtibû şiyar bûn. Em bi dengê Çekdar şiyar bûn û rabûn ser xwe.
"Çi bû Çekdar çi bû? Ma tiştek bû?"
"Qet dengê xwe nekin û bêdeng bin, li dor nuqteya me tije leşker in, şeveqê min xwest ez keşif bikim, ka li der ve tişkek heye an na, min dît ku li jor leşker digerin;"
"Ew te ditin,"
"Na ew min nedîtin."
Piştî ku me xwe dirêj kirî bi nîv saetê Çekdar dijmin ferq dike û me şiyar dike. Em bi lez rabûn ser xwe û me li hev nêrî. Ji çavê me tevan gumanên kûr û bi wate derdibûn. Ji awirên çavên me hêrs dikişiyan û li hev diketin. Şoqa li ser rûyê me guherîbû û rengek din girtibû. Di vê nuqteyê de û şer? Bi danê sibê re agahiyek bê oxir li ber guhên me ketibû. Ev agahiya bê oxir em ji xewa şêrîn şiyar kirin. Em ji bêxewiya rojan şiyar bûn. Min destê xwe di nav pora xwe de bir û anî. Çend caran çavê xwe paqij kir. Li ber dilê me bi sedan şik û guman derbas dibûn. Dema em hatîn leşker em dîtibûn an na? An jî ev operasyonek normal bû? Dema em gihiştîn ber nuqteyê me dora xwe baş kontrol kiribû. Li der û dora nuqteyê tiştekî xuya nekiribû. Ji cîhazê dijmin jî tevgera operasyonê nedihat bihîstin. Dibe ku bi carekî bi helîkoptêran leşker danîbin ser nuqteyê. Di vê demê de her heval dîtina xwe digot. Hevalan digotin eger dijmin hatina me ya vir dîtibin, wê bi ser nuqteya me de werin. Eger nedîtibin ji xwe wê biçin. Deqe û saetên me weke wesaîta di heriyê de hêdî hêdî diçû. Lê dijmin nediçû û li ser çiyê kom dibûn. Me gelek kemîn û bûyer derbas kiribûn, lê vê carê bi rastî jî rewşa me ne baş bû. Yekemîn car bû, em di nav bêçaretiyê de difikirîn. Em li cihek wisa de hatibûn girtin ku li pêşiya me ti rê tinebûn. Eger cihê me ji şer re baş bûya meyê şer bikira. Na eger li pêşiya me rêya derketinê hebûya emê derketana. Mixabin, ne li pêşiya me rê nemabûn û ne jî ji destê me tiştek dihat. Me hevalê Ozan ji bo çavdêriyê şand ka dijmin çi dike?Me got, Ozan pir bi dîqat be, biçe di binê zinaran de binêre ka esker çi dikin û jimara wan çiqas e. Em hevalên din di cihê xwe de man. Ji bo deng derneyê, em li cihê xwe bê deng rûniştin. Em li benda Ozan man. Liv û tevgera leşkeran çibû me nizanibû. Leşker bi ser me ve dihatin an jî bi cihek din ve diçûn, hayê me ji wan nebû. Di rojên wiha de saet derbas nabin. Saet di navbera heft û heştan de bû. Ev saet ji bo şer wextekî pir bi xeter bû. Ya din jî li herêma Şehîd Kendal û bi taybetî jî li nuqteya Qehweyê şer yekser mirin bû. Nuqte di cihek wisa de bû rê dihat û li ber disekinî. Ji dûr ve çend roket bihatan avêtin an jî kobra bihata, xilasiya me tine bû. Em li benda çavdêriya Ozan bûn. Leşkerên artêşa Tirk heya hingê nehatibûn ser nuqteya me. Lê dîsa jî tirs û fikarên me zêde bûn. Hevalê Ozan ji çavdêriyê hat û bi dileke mat û di nav heyecanê de wiha got:

"Gelek leşker derketine operasyonê, helîkopter leşkeran tîne û li jorî nuqteya me datîne. Bi xwedê ji vê derê xilasiya me gelek zehmet e."
"Jimara leşkeran çiqas e, gelek in? Çekên wan yên giran çi ne, bi aliyê nuqteyê ve tên?"
"Jimara leşkeran zêde ye, bi wan re cerdevan jî hene."
Li gor agahiya Ozan, jimara dijmin gelek bû. Di operasyonê de cerdevanan ji leşkeran re rêzanî dikirin. Dema Ozan behsa cerdevanan kir, me ji dil axînî kişand. Ne ji xayinên me bûya, ma leşkerên Tirk ji bajarên dûr dikaribûn bihatana welatê me û di nav çiyayên me yên asê de, li hemberî gerîla şer bikin? Nexêr, eger ne ji xayinên me bûya eskerên Tirk nikaribûn biketana pey şopa gerîlayan. Dijmin Kurd bi destê Kurdan didan kuştin. Cerdevan di operasyonan de didan pêşiya eskeran û dianîn ser cihên me. Careke din qewmê kewê dîroka xwe dubare dikir. Ev qewmê xiyanetkar li pêşiya dijmin dimeşiya û dijmin bi ser şopa me de dianîn. Ji destê me tiştek nedihat, emê li bendê bûna ka wê çi bibûya. Rê tine bû ku em ji cihê xwe derkevin û cihê xwe biguherînin. Cihê me ji bo şer qet ne baş bû. Em li vê nuqteyê biketan şer kesek ji me xilas nedibû. Me xwe ji her rewşê re amade kir. Di rojên wiha de ev saeta xopan, qet derbas nabe û nabe êvar. Min di dilê xwe de wiha got:
"Em vê carê jî xilas bibin, vê carê jî tiştek bi me neyê, êdî em ti car nayên zevtkirin. Em vê carê jî di binê van şkêran de neyên girtin, mirin ji kû ve tê bila bê. Li ser sera û li ser çavan."
Em di cihek wisa de hatibûn girtin ku ji bo xilasiya me ti rê nedidîtin. Li pêşiya me ne rê hebû, ne jî şensekî me yê din. Me yek bi yek hevalên herêm nas dikirin şandin çavdêriyê. Hevalê ku diçû û vedigeriya agahiya ne baş dubare dikir. Lê şandina hevalan ji bo guherandina rewşa me têr nedikir. Dijmin gav bi gav ber bi me ve dihat. Her ku dem pêş diket, dijmin jî ew çend nêzî me dibû. Wê rojê bûyerên bi êş danîn bîra me. Di serê me hemûyan de, tiştên kevin zîndî dibûn. Zaroktî, ciwantî û hê gelek demên din dihatin bîra me. Li gorî dijmin diviyabû em bihatana darizandin, lê ne dadgeh hebû me darizîne û ne jî mafên me didan me.
Em di nuqteyê de hatin girtin û me nikaribû em tiştekî bikin. Şerên giran yên bi wendahî li vê herêmê xwe dubare dikirin. Nuqteya Qehweyê di şer de wê ji me re bibûya cihê dawiyê! Em li vê nuqteyê gihîştibûn cem hevalan. Piştî ew çend xebata zor û zehmet niha em li heman nuqteyê, li ser rêya dawiyê bûn? Dijwariya vê herêmê, tevahiya rojên xweş û bi êş di nuqteya Qehweyê de dihat serê me. Bi vê bûyerê me rewşa hevalên berî xwe baş fêm dikir. Hevalên berî me hatîn vê herêmê di demeke kurt de şehîd ketibûn. Em ji dema ku hatibûn herêmê û heya hingê li gor pêvajoyên berê serkeftî bûn. Lê ev roj ne di nav de bû. ëro wê çi bibûya ne diyar bû. ëro di nav têkoşîna me de xwedî cihek girîng bû. Ev jiyan wê li vir bi dawî bibûya an na? Emê jî weke hevalên berê li vê herêmê ji dijmin re bibûna gezek nan? Emê jî weke Mahsum û yên din li vê derê di bêdengiya dîrokê de biçûna? Meyê ev qeder ji xwe re qebûl bikira an na? Me careke din hevalekî din ji bo çavdêriyê şand, ka rewşa dawî ya der ve çawa ye?Hevalê Wedat, hevalê herî kevin yê herêma Şehîd Kendal bû. Li herêmê zêde mabû û ji rewşa operasyonan baş fêm dikir. Li herêmê gelek operasyon derbas kiribûn û dizaniya wê leşker bi kû ve biçin û çawa tevbigerin. Vê carê jî ji bo çavdêriyê Wedat ber bi zinaran ve çû. Em wisa di cihê xwe de li bendê bûn. Di hemam wextê de em li benda qedera xwe bûn jî. Xeta ku li ser eniya me hatibû nivîsandin û ji me re bûbû navnîşan. Qedera ku li herêmê hatibû serê tevahiya hevalên me, niha jî li benda me bû. Meyê ev qeder ji xwe re qebûl bikira, an na? Ne diyar bû. Li herêmê şer û wendahî weke qederê bûn. Ji ber vê qederê kesekî nikariya xwe rizgar bike. Em jî li vê qederê asê bûbûn. Em bi benê vê qederê hatibûn

girêdan. Ev roj weke guliya stiriyê li me biheliqe, em asê bûbûn. Em li cihê xwe bê çare li benda mucizeyekê bûn.
Berê li malê malbata min ji min re behsa mucizeyan dikir. Ji ber ku ez piçûk bûm, min ji mucizeyan bawer dikir. Di dilê min de bi sedan hêvî û daxwaz hebûn. Li gor min ewê rojekê bibûna rastî. Ev qeder ji bo me hatibû nivîsandin û enceq mucîzê em jê xilas bikiran. Çi dibû bila bibûya meyê heya dawiyê berxwedan bikira. Me hêviya xwe wenda nedikir. Me ji xwe re digot, eger dijmin me bibîne jî emê heya êvarê şer bikin û bi şev ji vir derkevin. Li hemberî teslîmîyet û xiyanetê em yekdeng bûn. Me ji bo xwe şehadeta bi rûmet hilbijartibû. Wedat çûbû çavdêriyê û nehatibû, em li bendî agahiyek baş bûn. Em bi hêvî bûn. Çavên me li benda rêya hevalê me bûn. Agahiya ku li ber guhên me belav bibûya wê baş bûya an jî xirab. Me baş dizanibû ji bo agahiya baş mucîze pêwîst e. Lê dîsa me hêviya xwe nedibirî. Dema hevalê Wedat hat û kete hundirê nuqteyê, rûyê xwe tirş kir û bi xemgînî wiha got:
"Emê şer bikin, emê heya dawiyê şer bikin. Weke din çara me nîne, li pêşiya me ti rê nehatine hiştin."
Dijmin an em dîtine an jî hayê wan ji me nîne û bi aliyê me de tên. Li gor çavdêriya Wedat dijmin gav bi gav bi ser nuqteya me ve dihat. Jimarek zêde tîm, leşker û cerdevan cihê me dorpêç kiribûn. Cihê me jî ji bo şer qet ne baş bû, meyê çi bikira? Emê çawa ji vê bûyerê xilas bibûna? Ne diyar bû. Leşker heya ser nuqteya me hatibûn û li jorî nuqteyê li ser zinarên asê û bilind kom bûbûn. Li ser çiyê di cihên weke çeperan de kom bi kom li hev diciviyan.
Wer xuya dikir ku xwe ji şer re amade dikin. Li jorî nuktaya me zinarên pir asê hebûn. Zinar weke çeperan hatibûn çêkirin. Ji bo parastinê jî cihên pir baş bûn. Leşker yek bi yek di van çeperan de bi cih dibûn. Dengê leşkeran heya nava nuqteya me dihat û bi ser dengê ava newalê diket. Gurgura dengê ava newalê, li ber dengê leşkeran hindik dima. Dengê leşker û cerdevanan dengê avê kêm dikir û bi ser diket. Dengê cerdevanan ji nav dengê eskeran cuda dibû. Bi axaftina xwe ya nîv Tirkî tevlî axaftina leşkeran dibûn. Axaftina wan ji dûr ve diyar bû. Ne Tirkiya wan tam bû, ne jî Kurdiya wan. Her du jî nîvco bûn. Lê tiştê ku bala me dikişand, liv û tevgera wan bû. Cerdevanan di operasyonê de, rê nîşanî leşkerên Tirk dikirin. Leşkerên artêşa Tirk di operasyonê de dikirin qarawar, bi vê yekê dixwestin tirsa xwe bişkênin. Dengê leşkeran di nav zinaran de belav dibû, di nav dar û şikêran de deng dibû yek û bi ezmanan ve bilind dibû.
Em bi vî awayî her yek li cihê xwe difikirîn. Em li rêyan digeriyan, lê ti rê li ber me xuya nedikir. Herî dawiyê hevalê Wedat jî agahiya nebaş dubare kiribû. Di rewşa me de ti guhertin pêk nedihat. Em bi saetan li benda mucizeyekî bûn. Lê ti mucîze pêk nedihat. Di vê dema ku tevahiya jiyanê ji bo me sekinî bû, hewa nediçû û nedihat û belg nedihejiyan. Di ser nuqteyê de çûk û quling nedifirîn. Kevokan rêya xwe ji cem me dûr kiribûn. Em bi xewjîn û bi fikaran re mabûn. Av bi dengek dijwar diherikî.
Di vê dema ku zeman û saet rawestiyabûn, em bi dengek dijwar û gurr hejiyan. Ne tenê em, çiya û zinar jî hejiyan. Dengek gur û dijwar ji ser nuqteya me bilind bû. Deng ji çiyê, ji nav leşkeran dihat. Ev çi deng bû? Me mêze kir, gelo ev dengê çekan bû? Lê deng ne dengê kobra bû û ne jî yê çek û bombeyê bû. Ji dûr ve bihata meyê bigota, dijmin çek diavêje. Lê ev deng ji nav leşkerên ku li jor kom bûbûn dihat. Dijmin carna di operasyonan de bi zanebûn li hinekan dixist. Carna jî raste rast çek berdidan. Me got belkî dîsa li yekî xistibin. Me ji hev pirs kir ka ev deng yê çi bû. Deng dengê teqînekî dijwar bû, lê ji ber ku ev deng ji nav leşkeran dihat me jê fêm nekir. Bi teqînê re di nav leşkeran de çûn û hatinek lezgîn dest pê kir. Leşker bi carekê ketibûn nava liv û tevgerê.

Li çar aliyê çiyê liv û tevgera leşkeran zêde bû. Leşker li ser zinarên asê dikirin qarawar. Bi ser dengê teqînê re demek kin derbas bû, vê carê jî dengê helîkoptêran li ser çiya belav bû.
Dengê kobra û sikoskiyê li çaraliyê çiyê belav bû. Li ser nuqteya me diçûn û dihatin. Bi tevî vana re fikarên me zêde bûn. Em dîtibûn, an na?
Ev çûn û hatina leşkeran ji bo çi bû?
Li ser nuqteya me liv û tevgerek xurt hatibû destpêkirin.
Em di binê zinaran di cihê xwe de bêdeng rawestiyabûn. Piştî çend saetan hêdî hêdî dinya bû êvar. Liv û tevgera leşkeran weke şeveqê nemabû. Dengê wan û yê çek û kobrayan kêm bûbû. Bi hatina şevê re em pir kêfxweş bûn. Tişta ku ji me dihat, jimartina deqe û saetan bû. Meyê çi bikira?Ji destê me tiştek nedihat. Em li ser denqê teqînê fikirîn. Leşker heya ser nuqteya me hatibûn û sekinîbûn.
Ev çi bû? Li jor tiştek çêbûbû, lê çi bû? Pêşî dengê teqînekî bilind bû, paşê dengê helîkopteran li herêmê zêde bû. Ev roj jî ji wan rojên ku em dîl digirtin bû. Lê êdî roj diçû ava û dibû şev. Careke din em ji xezeba rojê xilas dibûn. Bi hatina şevê re leşker hêdî hêdî paş ve kişiyan. Helîkopter leşker radikir dibirin. Tarî li her deverê dibû desthilatdar. ædî em û şev bi hev re bûn. Kesekî nikaribû me bigire. Ji bo em derkevin, me dest bi planan kir. Em careke din ji dîlgirtina rojan xilas dibûn. Roja tije tirs û fikar bi dawî dibû. Em ji ronahiyê ketin nava tarîtiyê. Ronî ji me diqeriya û dûr dibû. Rûyê me tevî hevalan tije ken bû. Em ji vê bûyera xirab jî xilas bûbûn.
Di nav me de coşek bilind dest pê kir. Me wê şevê bi saetan li ser operasyonê şîrove kirin. Kesek ji der ve bihata û li halê me binêriya, wê bigota, li vir ne operasyon, şahî hatiye lidarxistin. Gerîlatî wisa ye. Carna êş têne kişandin carna jî xweşî heye. Gerîlatî karek gelekî zehmet û ew çend jî zor e. Jiyana gerîla bi zehmetiyan derbas dibe, lê kêf û şahiya çiya jî gelek e. Kêf û coşa çiyê bi wate ye û gelekî sade ye. Di nav de heskirina rêhevaltiyê heye. Hevaltiyek bi hest, germ û ji dil e. æş û xweşî tevlîhev dibin û hevaltiyeke hêja diafirêne. Carna operasyonên berfireh têne lidarxistin, mirov di nav de gelekî zehmetiyan dikşîne. Birçîbûn tîbûn û bêxewî heye. Lê ev jiyana ku bi êş û birûmet derbas dibe, tamekî hêja di bedena mirovan de digerîne. Gerîla berî ku biçe çalakiyê şahiyê li dar dixe, bi kêf û moral li ser rêya çûn û nehatinê dimeşe. Jiyanek zehmet û rêwîtiyek di nav zeviyên mayinkirî de derbas dibe. Ev rêwîtî mirov ji her demî bihêztir dike. Em jî di vê rêwîtiya xwe de heya ser pira siradê hatibûn û rawestiyabûn. Ez nizanim mucîze ev bû yan na? Gelo ev ne mucize bû, ger ne mucîze bûya çi tişt bû?Eger ev ne mucîze bûya jî rastiyek hebû. Me li hemberî trajedî û qederê li ber xwe dida. Di dema ku ji bo me ti rê nema bûn, me xwe bi baweriya azadiyê û berxwedanê jîn dikir. Leşker heya ser nuqteya me hatibûn û bi dengê teqînê re rawestiyabûn. Di serê me de gelek pirs û fikar hebûn. Ji bo me bersiva pirsên xwe bigirta, emê li benda sibê bimana. Heya ku bû êvar leşker li dora nuqteya me diçûn û dihatin. Me nizanibû leşker tev vekişiyan an na?Hayê me ji wan tine bû.
Ji aliyekî ve me got em di vê navberê de ji cihê xwe derkevin û biçin. Lê ji aliyê din ve li pêşiya me deştek dirêj ras û vala hebû. Eger dijmin li herêmê bûya û em bidîtan me bi destê xwe rewşa xwe xera dikir. Hevalên berî me jî di rewşeke wiha de hatibûn girtin û tev şehîd ketibûn. Li herêmê dema dijmin gerîla didît, ji bo îmha bike heya dawiyê li pey wan diket. Hevalên berî me piştî ku dijmin cihê wan keşif dike, dixwazin cihê xwe biguherînin. Li hemberî çekên giran û kobrayan bi ser nakevin. Ji ber vê yekê, ya baş ew bû em heya sibê piştî nîvro bimînin û paşê biçin. Me heya derdorên xwe keşif nekiran, me nikariya em ji cihê xwe derkevin. Wê şevê em heya nîvê şevê şiyar man. ædî em

ketibûn şeva tarî, di şeva tarî de em azad bûn. Ji ber ku me zanibû bi şev tiştek nabe. Weke her carî û her roj dîsa şev û rojê cihê xwe guhertin. Şevê cih da rojê. Rojê jî cih dida şevê. Me di nava şevekê de azadî tam kir. Careke din rojê şewqa xwe da ser me. Hêdî hêdî dinya dîsa ronî dibû. Em li benda rojê bûn. Destpêka vê rojê wê ji me re hin tişt bianiyan. Bi vê rojê re an emê bigihîştana azadiya xwe, an jî wê dijmin heya ser nuqteya me bihata.
Ji vê serdegirtinê xilasiya me nedibû. Weke ti tişt nebûbe dinya ronî bû. Rojê şoqa xwe da ser nuqteya me. Bi destpêka rojê re em li ser lingan bûn. Me her tiştên xwe kom kiribûn, em di rewşa awarte de bûn. Dem û zeman hêdî hêdî li hev kom dibûn. Her ku dem pêş diket em kêfxweş dibûn. Wer xuya dikir dijmin li dor me nemabû. Danê şeveqê ti deng ji dor me nedihat. Rojê germahiya xwe li ser çiya belav dikir. Weke êvarê ji ava newalê deng bilind nedibû. Her alî pir bêdeng bû. Ji der ve jî ti deng nedihat. Li gor saetê ku ber bi nîvro ve diçû, êdî tiştek nedibû. Eger dijmin li dor me hebûna wê xuya bikirana. Li gor liv û tevgera dijmin ku xwuya nedikir, êdî em azad bûn. Ji nîvro û şûn de êdî wext ji bo me dişixulî. Piştî nîvro dijmin li çiya nedima.
Me du heval ji bo kontrolê şandin jorê çiyê. Me got bila heval biçin hem li derdorê mêze bikin û hem jî sedema wî dengî fêr bibin. Tîrêj û Ozan ji nuqteyê derketin û bi çiyê ve hilkişiyan. Em di nava meraqê de li benda wan man. Me ji xwe pirs dikir, li jorê çiyê çi pêk hatibû? Dijmin ji bo çi heya ser nuqteya me hatibûn û sekinîbûn. Tîrêj û Ozan hem hevalên kevin bûn û hem jî herêm nas dikirin. Bi kêf û coj bi çiyê ve hilkişiyan. Her ku bi çiyê ve diçin kêfxweş dibin. Dema digihîjin serê çiyê tevî herêm li ber destê wan e. Her der di nava bêdengiyê de ye. Li cihê ku bi hezaran leşker hebûn kesek nemaye. Bi tenê çopa leşkeran heye. Leşkerên Tirk di operesyonan de çiyayên Kurdistanê pir qirêş dikirin. Ji wê dera ku dengek zêde dihat niha vala bû. Ne leşker û ne jî cerdevan li çiyê nemabûn. Heval gav bi gav li dor aliyê çiyê dinêrin, ne tiştek heye û ne jî kesek maye. Pişt re hildikişin ser zinarên herî jor. Dema digihîjin cihê ku deng jê hatibû, dikevin nava çeperê. Di nav çeperê de xwîn û kincên qetayî dibînin. Li çar alîyê çeperê xwîn rijiyaye û perçeyên ji laşê mirovan belav bûne. Çeper bi ser hev ve pelişîne. Çeperek pir xira bûye û têde xwîn rijiyaye. Her wiha perçeyên mayinê jî li dor belav bûne. Kuşikek ku perçe bûye jî heye. Wise xuya dike ku tiştek dijwar bi kuçik ve teqiya ye. Di çeperê de tiştek pir dijwar bi leşkeran ve teqiyaye. Li dor çeperê ji aliyekî ve xwîn heye ji aliyê din ve kincên bûyîn perçe perçe hene. Eşkere ye ku leşker birîndar bûne. Belkî ne tenê birîndar mirî jî hebûne. Lê ji ber ku dema operasyonê ji cem me tiştekî xuya nedikir, me nizanibû encamên wê çi ne.
Tîrêj û Ozan hatin û tiştên ku dîtibûn ji me re gotin. Piştî evqasî şopên li ber çav, me mijar dereng be jî fêm dikir. Rastiya mijarê me wê rojê ji radyoyê bihîst. Li gor agahiya radyoyê rastiya bûyerê wiha bû:
Piştî ku liv û tevgera me ya li herêmê tê bihîstin, operasyoneke berfireh tê lidarxistin. Armanca vê operasyonê jî ew bû ku me îmha bikin. Di operasyonê de gelekî leşker, tîmên taybet û cerdevan cih girtibûn. Leşker heya ser nuqteya me hatibûn û li çar aliyê nuqteya me kom bûbûn. Li ser çiya çeperên asê hebûn. Leşker û hin serbaz dikevin nava çepera mayinkirî. Piştî çend deqeyan ji nav çeperê dengekî bilind radibe. Ew dengê ku me sah kirî, yê vê mayinê bû. Bi teqîna mayinê re tevî serbaz û leşkerên di çeperê de bi hewayê dikevin. Li gor agahiya radyoyê û agahiya ku me paşê ji gundiyan wergirt, di wê teqînê de yazde leşker ku di nav wan de serbaz jî hebûn miribûn. Her wiha yên birîndar jî hebûn.

Bûyerek wisa pêk hatibû ku me hêvî jî bikira pêk nedihat. Em bi vê bûyerê gelekî kêfxweş bûn. Di rojeke wiha de mayin teqiyabû û em bi vê re rizgar bûbûn. Mucîzeya ku em li bendê bûn jî belkî ev bi xwe bû. Mucîzeya ku me behsa wê dikir divê ev bûya.
Hevalê Tîrêj li me mêze kir û wiha got:
"Hûn dizanin ev mayina kî bû? Kî li wir bi cih kiribû?"
"Na, em ji kû bizanibin, ma em wê demê li wir bûn? Kî mayin li wir bi cih kiribû?"
"Ev mayina hevalê Delîl bû, berî ku ji vir biçe, li wir bi cih kiribû. Bi şeref ev mayina hevalê Delîl bû."
Way be dêmek ev mayina Delîl bû he.....
Piştî ku navê Delîl hate bîra hevalan, her kesî got erê, bi rastî ev mayina Delîl bû. Lê kengê û çawa li wir bi cih kiriye. Delîl qet ne di bîra me de bû. Kengê hatibû bîra wî û mayin li wir bi cih kiribû? Me got, gelo Delîl dizanibû emê rojekê li vir bikevin tengasiyê û mayin wê me xilas bike. Ez bawerdikim ji ber ku mayin li wir bi cih kiribû, tiştek wiha di hişê wî de hebû.
Delîl di şer de hevalek kevin bû. Min û wî ji berê de me hev nas dikir. Çend meh berî ku em werin Şehîd Kendal, bi herêmek din ve çûbû. Em li Licê, di yekîneya Şehîd Remzî de bi hev re bûn. Di belavbûnekê de ew hatibû Şehîd Kendal. Berî ez werim vê herêmê ew çûbû başûrê Muşê. Min û wî me bi hev re salên xweş û baş derbs kiribûn. Gelek bîranînên me yên xweş bi hev re hene.

Li vir fotoya Delil
Nav-Huseyîn Aydin
Kod-Delîlê Koçer
Şehadet-1999 Qulp

Çîroka Delîl jî weke ya min dirêj bû. Çîroka wî di nav refên gerîla de, dûr û dirêj bû. Li çiyayên Kurdistanê, salên dirêj derbas kiribûn. Bi eslê xwe koçer bû. Malbata wî ji koçerên Sêrtê bû. Lê li Batmanê mezin bûbû. Di salên 1990'î de li Batmanê serhildan gelek xurt bûn. Di wan salan de ji Batmanê bi sedan ciwan tevlî nav refên gerîla bûbûn. Di wan salan de ji aliyekî ve serhildan xurt bûn, ji aliyê din ve jî zext û zora dewletê gihiştibû asta dawî. Dijwariya li ser gel roj bi roj zêde dibû. Di bin navê Hîzbûllahê de,

hêzên dewletê bi hezaran welatparêzên Kurd kuştibûn. Gelek ji wan bûyeran, li ber çavên Delîl pêk hatibûn. Sêwiyên li kolanên Batmanê Delîl xemgîn dikirin. Li hemberî zext û zora dewletê roja biryarê bû. Delîl dev ji jin û zarokên xwe berdide û tevlî nav refên gerîla dibe. Biryareke zor û ewqas jî zehmet digire. Jin, zarok û malbatê li dû xwe dihêle û dikeve nav têkoşîna azadiyê. Dev ji jiyana sîstemê berdide û ji bo gelê xwe dibe gerîla. Di vê rêwîtiya xwe de despêkê diçe herêma Zaxros, paşê yek bi yek heya sala 1997an li Başûrê Kurdistanê dimîne. Salên dirêj û bi êş li çiyayê Kurdistanê derbas dike. æş û xweşiya gerîlatî tam dike.
Di sala 1997an de tê herêma Amedê. Li herêmê yekîneya wî ya yekemîn Şehîd Remzî bû. Dema hatî ez jî di wê yekîneyê de bûm. Li Başûrê welêt salên dijwar derbas kiribûn. Ji tîrên çavên wî dihatin dîtin ku pir êş kişandiye. Li çiyayê Zaxros, li Behdîna di nav şerê dijwar de mabû. Di temenê ciwan de di nav pora wî de mûyên sipî tije bûbûn. Li ser eniya wî xetên ku weke nexşeya salên bi şewat bûn, xuya dikirin. Çavên reş yên weke qîrê bi hundir ve kişiyabûn. Çawa ku bixwezin xwe veşêrin, şermok bûbûn. Birhên wî weke dara bêav guliyên xwe bi ser çav de xwar kiribûn. Di nav refên gerîla de, ji 10 salan zêdetir li herêmên herî zehmet xebat meşandibû. Piştî ewqas êş û dijwariya salên giran, ji êş û jana xilas nedibû. Rêwîtiya ku ji Bakûr heya Başûr dabû destpêkirin, vê carê ber bi Bakûr ve dihat.
Hatibû Amedê, lê tiştên ku hêvî kiribûn nedîtibûn. Li Amedê pratîkek nebaş hebû. Ji bo guhertina pratîka herêmê, hem bi xebat û hem jî bi fikir têkoşîn meşand. Li Başûr di perwerdeyên siyasî yên navedî de derbas bûbû. Ji pirsgirêkên herêmê baş fêm dikir. Min jê re behsa gel dikir, ewî jî ji min re behsa gerîlatiya Başûr dikir. Demeke dirêj bû ji nav gel derketibû. Rewşa gel meraq dikir.
Li Şehîd Remzî em bi hev re bûn. Li herêma me her roj operasyon çêdibûn. Havînê me amadekariyên zivistanê dikirin. Me dest bi kar û bar kiribû. Zivistana sar û seqem li bendî me bû. Seqem û berfê bi carekê bi ser me de girt. Me ji xwe re li Geliyê Kûviyan cihek çêkiribû. Emê wê zivistanê li wir bimana. Li erdê nîv metro zêdetir berf hebû. Barîna berf û baranê li ser hev dewam dikir. Roja ku baran û berf dibariya em diçûn me hem ji xwe re zexîre dianî, hem jî me karê xwe yê din dikir.
Piştre hêzên biryargehê cihê me yê li Geliyê Kûviyan ji me xwestin. Ji ber hin sedeman diviyabû em cihê xwe bidin wan. Me cihê xwe da wan û ji bo cihekî din me dest bi amadekariyê kir. Me ji xwe re li çiyayê Licê cihek dît. Li çiyayê Qurmikê ku weke werîsekî dirêj dikir, me li ber hev gelek nuqte çêkiribûn. Çiyayê Qurmikê ji bo me navê her tiştî bû. Li vir her tişt li ber destê me bû. Li herêma Şehîd Remzî nuqteya dihat naskirin ev der bû. Kesê bihata herêmê di vir re derbas dibû.
Piştî me cihê xwe amade kir em di cihê zivistanê de bi cih bûn. Me dest bi perwerdê kir. Hê em di destpêka zivistanê de bûn, carekedin em neçarî çûnê bûn. Gundiyên nêz heya ser cihê me hatin û cihê me dîtin. Ji ber vê sedemê me dest bi lêgerîna cihek din kir. Nuqteyên me li cem hev bûn. Nivê zivistanê em ji nuqteyekê derbasî yeka din bûn. Me dest bi kişandina tiştên xwe kir. Ji bo şopên me dernekevin me tenê dikaribû em di berfê de karê xwe bikin. Ji bo em karê xwe bikin me wê rojê perwerde da sekinandin. Wê rojê ji êvarê heya şeveqê berf bariya. Berî ku em biçin, me li ser meşa xwe nirxandinek kir. Em biçûna, yan na?Hin hevalan gotin, berf zêde dibare û cemed jî heye, em îro neçin. Em rojeke din biçin. Hinek hevalên din jî gotin, em di rojên xweş de nikaribin biçin, nexwe emê kengê biçin?
Meyê çawa bikira? Ne me dikariya di rojên xweş û ne jî di rojên şilî de em karê xwe bikin. Tirsa me hebû ku di dema meşê de, hin heval ji ser zinaran bişemitin. Em ji bo

çûnê bifikar bûn. Dawiyê me biryar da û piştî nîvro em ketin ser rê. Ji aliyekî ve berfê lêdikir ji aliyê din ve teht û çiya bi tevahî cemed girtibûn. Çûna me ya di rojeke wiha de gelek zehmet bû. Lê ti rêyên din li pêşiya me tine bûn. Di rojên ku berfê lêdikir, şop dernediket û dijmin jî di van rojan de zû bi zû dernediket operasyonê. Me du caran cihê xwe guhertibû vê carê jî me nikaribû em careke din tişteke wisa bikin. Her du nuqteyên me li kêleka hev bûn. Lê di navbera her du nuqteyan de cihekî gelek teng hebû. Havînê em ji wir bi tirs û fikar derbas dibûn. Derbasbûna ji wê derê gelekê zehmet bû. Dema em di wir re derbas dibûn dilê me dikir kutkut. Berfa li erdê her ku diçû zêde dibû. Biharê ev der çi xweş bû. Darûber heşîn dibûn û ava newalê gurgura wê bû diherikî. Çiyayê Qurmikê biharê cihek hêjayî dîtinê bû. Seranserê çiyê dar di heman texmê de bûn. Di nav gundên vala de darên fêkiyan hêşîn dikirin. Lê niha her de sipî bû. Berfa sipî xwe li her derî pêçabû. Ji ber berf û cemedê em bi tirs dimeşiyan. Her gava ku me diavêt, me çend caran li dor xwe mêze dikir. Hevalên ku li pêş dimeşiyan ji bo kes neşemite, em hişyar dikirin. Her kes ji hevalê li cem xwe re dibû alîkar. Her hevalê ku derbas dibû ji bo hevalên tên re hişyarî dikirin. Em hatin ber cihê teng û yek bi yek derbas dibûn. Hevalên li pêş derbas bûn û çûn. Em jî li pey wan dime?iyan. Pi?tî ku çend kes derbas bûn, min tirsa xwe ?kand û ez jî derbas bûm. Ez ji ser cihê teng çend gavan derbas bûm, dengekî dijwar û gur di mejiyê min de zirmînî kir...heval, heval... min bigirin... ez ketim... h..e..v..a..a..l...
Ez li pişt xwe vegeriyam min dît ku deng ji Hevalê Delîl tê û ji zinaran dikeve. Em tevî hevalan li hemberî vê bûyerê mat bûn û di cihê xwe de man. Me li Delîl mêze dikir. Bi vê bûyerê re em jî weke wî li cihê xwe şel bûn. Nîvê hevalan ji wî cihê teng derbas bûn û nîvê din jî hê derbas nebûbûn. Em bûbûn du beş nîvî li vî alî, nîvê din jî li aliyê din mabûn.
Hevalê Delîl dema digihêje cihê teng hewl dide derbas bibe. Lê dema ku dixwaze ji wê derê derbas bibe, bi carekî ji ser zinaran dikeve xwarê. Ji zinarên ku ne serî û ne jî binî bûn, di ser hev de digindirî û ji zinaran dikete xwarê. Her zinarekî davêt ser zinara din û kaş dibû. Li hemberî ketina wî ji dilê me çîzînî dihat der, lê tenê me dikaribû em lê binêrin.
"Delîl xwe bigre... delîl .xwe bigre".....
Her çiqas me xwest em Delîl haş bikin jî, dîsa jî bi ser hev de diket xwarê. Li hemberî bûyerê em tev li cihê xwe bûn kevir, me nikaribû em gavekî biavêjin.
Hevalekî me li ber çavê me ji ser zinaran diket xwarê, lê sed car mixabin ku me nikaribû em alîkariya wî bikin. Xwîn ji dev û çengên wî diherikîn û li ser berfa sipî weke werîsek sor dirêj dibû. Ji aliyekî ve qêrîna wî ji aliyê din ve xwîna sor ya li ser berfa spî, dilê me birîndar dikir. Li hemberî vê bûyerê ji dilê me nalîn bilind dibûn.
Li hemberî vê bûyerê ez bi zaroktiya xwe ve çûm. Bûyerên di zaroktiya min de hatîn serê min, yek bi yek di ber çavên min de derbas bûn. Di zaroktiyê de jî me alîkariya hev dikir, me rû û destê hev paqij dikir. Di zaroktî û di rojên wiha de diya min alîkariya min dikir. Lê niha li ber çavê me dijwariya kambax diqewimî, lê em bê çare bûn. Em hevalên ku me ji bo hev canê xwe dida, niha me nikaribû em destê xwe bidin hev. Hevalekî me li ber çavê me dikir qîrîn.... dikir......nalîn... dikir hewar û sed gazî, lê destê me nedigihîştê. Delîl bang li me dikir û dikir qêrîn.
"Heval.. heval.. min bigirin.. min .bigrin...hûn çima alîkariya min nakin?"
Delîl li ber çavê me, li ser berfa sipî weke girêdayî be berjêr dibû û diket. Destê xwe davêt dara, li keviran diket lê dîsa digindirî. Çi dikir nikaribû xwe bi cihekî bigire. Destê xwe davêt kîjan şax û kevirî, di desê wî de diman. Heya xwarê gindirî û li cihek asê

heliqî. Di vê navberê de me çend heval ji bo alîkariya wî şandin xwarê. Me çend caran xwe ceriband ku em li pey xwe berdin, lê me nikaribû. Mixabin ji ber ku cihê jê ketî xwarê bilind û asê bû. Ji aliyekî ve berfê lêdikir, ji aliyê din ve her der bûbû cemed. Kesekî nikaribû alîkariya wî bike. Zinar pir bilind û asê bûn. Heval di cihekî asê de daketin jêr û çûn alîkariya wî. Dema heval digihîjin cem, li ser berfê weke kesekî ku deh gule xwaribin dirêjkirî ye. Heval yekser digirin û dibin nuqteyê. Me rahişt tiştên xwe û em jî ber bi nuqteyê ve ketin rê. Dema me karê xwe qedand em di rêyeke din re vegeriyan. Me nedixwest hevalekî din jî li ber çavê me ji van zinarên bilin û asê bikeve xwarê. Dema em daketin binê çiyê em hatin û di ber cihê ku Delîl lê asê bûbû sekinîn. Her dever bûbû xwîn. Di cihê ku tê de ketî xwarê weke zinarek ji jor bê xwarê cih vedabû. Dema me li wir mêze kir, em bixwe jê tirsiyan. Me di dilê xwe de got, ji sedî sed Delîl ji vê bûyerê xilas nabe. Em ber nuqteyê ve dihatin. Li erdê nîv metroyê zêdetir berf hebû, em heya çonga diketin nav de.
Li ser me berfeke hûrik hûrik dibariya. Em ji serî heya binî şil bûbûn. Delîl li ber çavê me bû. Wêneyê wî yê birîndar li ber çavê me digeriya. Gava em hatin nuqteyê me bazda cem. Hevalan anîbûn û dirêj kiribûn. Di xewa kûr ve çûbû. Ji her aliyê wî xwîn herikîbû. Laşê wî tev werimîbû. Ketibû haleke wisa ku nedihat naskirin. Nikaribû biaxive. Eger ne Delîl, yekî din bûya, ji vê bûyerê xilas nedibû. Tevî diranên wî yên pêş ketibûn û yên paş jî şikiyabûn. Dev û pozê wî werimîbûn û parsiwên wî jî gelekî êşiyabûn.
Em bi halê wî gelekî dêşiyan. Me nedixwest em di wî halî de bibînin. Rewşa wî ewqas xira bûbû ji çavên me êstir dibariyan. Ji bo baş bibe dixtor lazim bû, lê meyê çawa dixtor baniya. Zivistan her ku diçû dijwar dibû, ba dibû seqem, seqem jî dibû cemed. Em di cihê xwe yê zivistanê de bûn. Li tevî herêma me Amedê yek dixtor hebû. Ew jî li biryarghehê bû. Meyê dixtor ji biryargehê çawa baniya. Me bang li dixtor kir, lê di wê zivistanê de nikaribû were. Mixabin me çiqas hewl da jî me nekarî em dixtor bîbin û Delîl bidin dermankirin. Kesekî nikaribû derkeve der ve û heya biryargehê biçe.
Delîl heya biharê çend mehan wisa li erdê dirêjkirî ma. Ne dikaribû tevlî perwerdê bibe û ne jî derkeve der ve. Bi hatina biharê re hêdî hêdî baş bû. Germahiya biharê ew baş dikir. Carna me pê yarî dikirin. Ez rastiyê bêjim piştî vê bûyerê, em bi halê Delîl pir dikeniyan. Piştî bûyerê di şekl û axaftina wî de pir guhertin çêbûbûn. Berê hevalek hinek feodal, xwegirtî û hişk bû. Ji malbatek feodal dihat. Bi vê bûyerê re ketibû şeklek pir kenok de. Axaftin û meşa wî wisa guherî, em bê hemdê xwe pê dikeniyan. Me nedixwest embi halê wî bikenin, lê ji aliyê din ve jî me xwe nedigirt. Bi taybetî ji ber diranên wî em pê dikeniyan. Diranên wî yên pêş bi tevahî ketibûn û tim devê xwe bi destê xwe digirt. Destê xwe datanî ser devê xwe da kes diranên wî nebîne. Em jî pê dikeniyan. Lê ewî em baş nas dikirin, dizaniya ku di dilê me de tişteke xirab tine ye. Carna bi xwe yarî dikir û wiha di got.
"Eyb e şerm e em diranên min bidin çêkirin, bila jina min û zarokên min, min bi vî halî nebînin. Em yên pêş bidin çêkirin, ez nikarim bi vî awayî wêne jî bikşînim."
Delîl ji bo diranên xwe bide çêkirin di nava hewldanê de bû. Hem di nav rêveberiya yekîneyê de, hem jî di nav hevalan de daxwaza xwe dianî ziman. Lê wisa xuya dikir ku daxwaza wî ne hêsan e. Ji bo çêkirina diranan diviyabû biçûya bajêr û bidan çêkirin. Şensê wî hebû wê zivistanê, ji ber pirsgirêkên nav yekîneyê, rêveberên eyaleta Amedê hatibûn cem me. Di serî de Dr.Elî û berpirsiyara PJA ya wê demê Hêvîdar hatibûn yekîneya me. Hatina van hevalan ji bo daxwaza Delîl ya diranan fersendekî mezin bû. Rojekê piştî nîvro em li ber deriyê şkeftê ji xwe re diaxivîn. Di vê axaftina germ de Dr.

Elî, Delîl, ez, Zinarîn û Rozerîn hebûn. Delîl ji berê de li bendî rojeke wiha bû. Ji cihê xwe rabû çû cem Dr.Elî û wiha got;
"HevaLê Elî ez dixwazin diranên xwe bidim çêkirin, diranên min yên pêş tev ketine."
"Baş e hevalê Delîl em jî dixwazin diranên te bidin çêkirin, lê rewşa me jî li ber çav e, vê zivistanê em diranên te çawa çêbikin?"
Dema ew her du heval diaxafîn me guhdarî wan dikir. Ji ber ku axaftina wan bi ken bû em jî dikeniyan.
Delîl di biryara xwe de bi israr bû. Axaftinê nîve nîv bi ken dewam dikir.
"Hevalê Elî ez nikarim wêneyekî jî bikişînim, ji jina xwe û ji zarokên xwe re bişînim?
Bersiva Dr.Elî jî bi ken bû.
"Tiştek nabe dema te wêne kişand, devê xwe bigire û xilas, tû devê xwe venekî, ti tişt nabe. Bi vî awayî kes nizane ku diranên te yên pêş nînin."
Li ser van yariyan êdî me xwe negirt û em jî keniyan. Em tev bi hev re, bi dengekî bilind keniyan. Bi van yariyan armanca me ne şkandina wî ji bo kêfxweşiya wî bû. Bi berxwedan û zîrektî Delîl heya beharê baş bû. Dema ew ji zinaran ketî xwarê, serê zivistanê bû. Lê niha berfa li erdê rabûbû û demsal guherîbû. Ser bûyerê re meh derbas bûbûn. Bi hatina biharê re daran pel vekirin û giya careke din hêşîn bûn. Daristanê xwe ji bo sala nû xemilandibû. Me jî xwe ji pratîkê re amade dikir. Her kes ji bo pratîkê herêmek hildibijart. Piştî ku Delîl baş bû ewî jî pêşniyar kir ku biçe herêma Şehîd Kendal. Her çiqas rewşa wî ne li gor vê herêmê bû jîhevalan pêşniyara wî li ber çavan girtin. Ev herêm cihek zehmet bû, hevalên birîndar û yên temenê wan mezin, li vir nikaribûn bimana. Bi tenê taximek hevalên xort yên zîrek li vê herêmê dima. Pêşniyara Delîl hati qebûlkirin. Piştî ku tê vê herêmê zehmetiyan dibîne, lê ti car nade xuyakirin. Bi dilekî paqij hatibû herêmê û heval nas kiribûn. Di çalakiyan de cih girtibû.
Çend caran bi hevalan re tê li nuqteya Qehweyê dimîne. Cihê nuqteyê wî dixe nava tirs û fikaran. Ev nuqte ji aliyê hevalan ve pir dihat bikaranîn. Ji aliyekî ve nêzî tevî nuqteyan bû, ji aliyê din ve jî li ser rê bû. Cihê nuqteyê nêzî her derî bû, lê ewqas jî di cihek bi xeter de bû. Delîl carekê li nuqteyê pirseke wiha dike:
"Niha operasyon derkeve û leşker werin ser nuqteya me, emê çi bikin? Em nikarin tiştekî jî bikin."
Tevî hevalên li nuqteyê bêdeng dibin û li ser vê rewşê difikirin. Heya wê demê hevalan pirseke wiha ji hev nekiribûn. Hevalên dihatin nuqteya Qehweyê bên vedidan, xwe û kincên xwe dişûştin û diçûn. Kesek li ser vê rewşê neketibû nava lêkolînan. Heval dixwazin axaftinên Delîl vala derbixin:
"Rewş weke tu dibînî nîne, ji bo nuqteya me neyê dîtin em tiştekî nakin, rastî ev e.
Axaftina hevalan, Delîl diêşîne, piştî van axaftinan li ser vê mijarê pir difikire ka planekî çawa amade bike. Ji hevalan re wiha dibêje;
"Ezê mayinekî amade bikim, li ser nuqteya me di nava çeperekî de bi cih bikim. Dema leşker werin wê bi wan ve biteqe. Piştî bûreyê leşker wê bêjin gerîla ji cihekê dûr hatine mayin li vir bicih kirine. Bi vî awayî wê bala wan neyê ser vê nuqteyê."
Delîl mayinekê amade dike û dibe li jora nuqteyê di çepera ku bi leşkeran ve teqiya de bi cih dike. Li herêmê tim operasyon dihatin lidarxistin, lê leşker heya wê rojê nêzî nuqteya Qehweyê nebûbûn. Eger heya ser cihê me bihatana wê cihê me bidîtan. Mayinê di ciheke gelek baş di nav tehtan de bi cih dike. Piştî mayinê bi cih dike bi ken ji hevalan re wiha dibêje;
"Hûnê bibînin ev mayin wê çawa bi dijmin ve biteqe, hûn qet vê rojê jibîr nekin:"

Piştî ku dijmin li ser liv û tevgera me ya li herêmê agahî sitandin operasyoneke berfireh lidarxistin. Leşker heya ser nuqteya me hatin û mayina Delîl bi wan ve teqiya. Ev mayin nebûya, wê dijmin em bidîtan. Piştî şehadeta Delîl bi çend mehan, di rojeke wiha de mayina wî em xilas kirin. Ev mayin bû mucîzeya ku em li bendê bûn. Bi vî awayî em bi mayina Delîl ji vê operasyonê rizgar bûn. Bi vê bûyerê re Delîl hate bîra me. Me di rojeke wiha giran de ew bi bîr anî.
Berî şehîd bikeve berê xwe dabû Muşê. Weke her derî li Mûşê jî dest bi karê giran kiribû. Ji xwe ti car xwe ji kar nedida alî. Li Muşê wezîfeya herî zehmet xebata di nav gel de bû. Di nav gundê cerdevan û kemînan de, bê rawestan diçû û dihat. Rojekê ji bo şervanên nû bîne diçe gundekî nêzî gundê cerdevanan. Şervanên nû digre cem xwe û dikeve rê. Bi dilek xweş dikevin rê û dimeşin. Di rê de behsa gel û gerîla tê kirin. Dikevin rêya dûr û bi çiyayên kaş ve hildikişin. Wê ji kû bizanibin li pêşiya wan kemîn heye. Dijmin li ser şandina şervanan agahî stendiye û li ser rê kemîn daniye. Tavaheyv heye û şev weke nava rojê ye. Li wê derê dikevin kemînê. Çar aliyên rê ji aliyê tîm, leşler û cerdevanan ve hatiye girtin. Dîsa cerdevan di rêza pêş de cih digrin. Heval li cihek rast û vekirî dikevin şer. Ne zinarek ne jî çeperek li dor wan tine ye. Şer dest pê dike, diteqin bombe û gule. Dengê çek û bombeyan careke din ji herêmê bilind dibe. Di gerîla de şerî herî bi xeter ketina kemîna ye. Şerê bê însiyatîf li gerîla wendahî ye.
Careke din dengê axîna ciwanên Kurd bi nav şeva tarî dikeve. Xwîna wan li ser axa wan belav dibe. Delîl û şervanên nû li ber xwe didin, lê çi fêde. Şev e û tavaheyv dinyayê ronî dike. Dijmin hevalan dorpêç dikin û şer gur dibe. Piştî ku Delîl dibîne ji kemînê xilasî nîne, ji şervanên nû re dibêje hûn biçin, ezê şer bikim. Hûn xwe xilas bikin. Derketina ji kemînê bê îmkan e. Dijmin gelek e û çekên giran bikar tînin. Delîl û hevalên pê re di wê kemînê de şehîd dikevin. Roja ku ev bûyera bi şewat pêk hatî me ji cîhaza dijmin gohdarî dikir. Bûyer li ber gohên me zîndî pêk dihat.
Weke her carî wê rojê jî me tenê dikaribû em bûyerê ji dûr ve gohdarî bikin. Tiştek ji destê me nedihat. Ev bûyer jî weke bûyerên berê diqewimî. Rêza van bûyeran bi vê re zêde dibû.
Rewşa Delîl û hevalên wî dihat ber çavên min. Li hemberî sê kesan û bi çeka qilêş, bi dehan çekên giran û leşkerên bê jimar hebûn. Ji aliyê din ve qewmê îxanetkar hebûn. Dîsa kûrmê darê ji hundir ve êriş dikir. Ev çend car bû, hevalên min li ber çavên min diketin kemînê û min nikaribû ez tiştekê bikim. Ev çend car bûn, li ber guhên min dengê teqînê bilind dibû. Dengê qêrîn û nalînê, dengê bombe û rokêtan tevlîhev dibûn. Vê bûyera xwezayî ya şer û bi êş tim xwe dubare dikir. Her roj li cihekî pêk dihat. Her roj navek di bûyerên wiha de li yên din zêde dibû. Dema ez hatim herêma Şehîd Kendal demek kurt bû ku Delîl ji vê herêmê çûbû.
ëro bi evqasî bûyeran re Delîl hate bîra me. ó me bi bîr anî. Mayina wî em ji bûyerekê xilas kiribûn. Piştî ku mijar baş ronî bû, em hem xemgîn bûn û hem jî pir kêfxweş bûn. Me nizanibû em ji bo Delîl çi bikin û çi bêjin. Lê ew ne amade bû. Me jê re sipasî bikiran jî ew pê nedihesiya. Ji me zû veqetiya û ket nav karwanê şehîdan.
Piştî ku ji başûr hatî Amedê malbata wî fêr bûbû ku dijî. Ji xwe malbatê hêviya xwe jê birî bûn. Li Amedê ji malbata xwe re name û wêne şandibûn. Heya wê demê nizanibûn ku dijî. Malbatê digot qey ji zû de şehîd ketiye. Li vê herêma ku jê agahî girtibûn ne pir dûr bûn. Çend wêne nameyek, bersiva salên dirêj bûn. Bersiva salên bêdeng û veşartî bûn. Wêne hebûna zîndî û kesayetiya azad bûn. Dema ji mal derketî ciwan bû, di wêneyê de gelek mezin bû. Dema ji mal çûyî zarokên wî piçûk bûn. Li ser temenê Delîl 10 sal zêde bûbû. Zarokên ku çûna bavê xwe nedîtibûn mezin bûbûn û bavê xwe ji

name û wêneyan nas dikirin. Belkî zarokan di nav hevalên xwe de behsa bavê xwe nekiribûn. Lê niha ji bo gotinê amade bûn. Dixwestin ji tevî cîhanê re bêjin bavê me jî heye. Bavê me jî heye.
æşek giran bû, lê rastiya têkoşîna rizgariya neteweyî bû. Delîl piştî salên dirêj nameyekê û çend wêneyan şandibû malê. Bi vê nameyê malbat agahiya rast digire. Bi vê nameyê hêviyên winda bûyîn careke din paş de hatibûn. Piştî nameyê malbatê dixwaze bên bibînin. Hevalan ev daxwaza ku ji dilê bi kul dihate kirin qebûl kiribûn. Roja hevdîtinê hatibû diyarkirin. Piştî salên dirêj û dijwar malbat bi hêviyek mezin tê serdana wî. Di dilan de belkî hêviyên wendahî û jibîrkirî jî hebûn. Lê dîsa jî dîtina Delîl ji bo wan hêjayî her tiştî bû. Ji zarokan name hatibûn û ji mezinan jî pirs û lêpirsînên nediyar hebûn.Her tişt ji bo wê rojê hatibû amadekirin. Lê sed mixabin ku Delîl û malbatê wê rojê hev nedîtin. Roja ku malbat hat cihê hevdîtinê, Şehîd Kendal Delîl rojek berî wan ji herêmê veqetiya bû. Belavkirina hevalan hatibû çêkirin û ew jî di nav komek heval de çûbû. Haya hevalan ji mijarê hebû lê rêwîtiyek lezgîn hebû. Bi rojek navberê re hesreta bi salan û hêviyên bê sînor pûç bûbûn. Li hemberî vê hesret û rewşa dijwar her kesî birînên xwe vedişartin. Malbat serê xwe xwar dike û diçe. Delîl ji zû de ji herêmê veqetiyabû. Hevalan jî di hundirê xwe de axîn dikişandin. Em jî weke wan bi vê rewşê diêşiyan. æşa Delîl û malbata wî gelekî giran bû û derdê bê derman bû. Piştî ku me mijar ronî kir hevalê Tîrêj got, bes e em axivîn rabin em biçin.
Dîsa dema rêwîtiyê bû. Me berê xwe da gelî. Ji bo em li cihekî din bênê vedin em careke din ketin ser rê. Em gelekî westiyabûn, ji dema ku em hatibûn vir ve, em dimeşiyan. Çiya û deşt gelî û zozan em geriyabûn. Geliyê Zorê ji bo bênvedanê cihek pir baş bû. Bi mehan bu ku me li cihekî baş bêna xwe nedabû. Gelî di navbera du çiyayên bilind de dirêj dibû. Ava gelî weke bedena kurdewariyê ji dil diherikî. Çi biketa ber bi xwe re dibir û diçû. Gelî ew qas xweşik bû ku hêjayî dîtinê bû. Bi rojan mirov dikaribû lê mêze bike. Ava vê derê di navbera çiyayên Farqîn, Qulp û Sasonê de diherikî.
Ev av ji çiyayên bilind ên Amedê diherikî. Kanî bi kanî, newal bi newal av diherikî û gur dibû. Masiyên di nav avê de ji masiyên herî xweş yên cîhanê bûn. Ava gelî ji du milan dihat, milek avê ji aliyê Qulpê ve dihat milekî din jî ji Sasonê dihat. Her du mil jî li Geliyê Zorê digihîştin hev û ber bi deşta Batmanê ve diherikî û li Bendava Malabadê dibû lîçek mezin.
Ev der ji berê de ji çekdarên Kurd re bûbû parastgeh. Berî me li vê derê bi sedan heval mabûn. Em ne yên destpêkê bûn ne jî yên dawî. Berî me jî li van cihan heval hebûn, em hatin û çûn. Wa hê jî tên. Ev gelî destpêkê ji çekdarên Mala Eliyê ónis re bûbû war. Ji çiyayên Helqîs û Mereto heya Geliyê Zorê û Geliyê Herhendê ev der bûbûn qada şer. Li Sasonê çiyayên bilind û zinarên asê hebûn. Te digot qey bi destan hatine çêkirin. Kurdan li hemberî Roma Reş bi salan li serê van çiyayên bilind berxwedan kiribûn. Çiyayê Helqîs û Mereto ji şer re çi xweş bûn. Ez li van çiyayan di nav xewê de bûm û rêberê min jî kalê min bû. Kalê min ji min re çîrok digot, min jî lê guhdarî dikir.
Kalê min behsa mala Eliyê ónis û raperîna wan dikir. Ji min re çîroka wan ya dûr û dirêj digot. Ez bi çîroka kalê xwe li ser van çiyayên bilind dimeşiyam. Di nava çîrokê de bûm. Di nava helbestekê de bûm û min çanda xwe dijî. Çanda ku hatibû jibîrkirin. Li ser van çiyayan ez fêrî heskirin û evîndariyê dibûm. Yekem car bû ez nêzî axê dibûm, ez bi saetan li ser axê dirêjkirî dimam. Geliyê Zorê û geliyê Kûviyan gelek dişibiyan hev. Her du gelî kûr bûn û gelek bi wate bûn. Li van deran gelek tiştên veşartî hebûn. Ez di nav van tiştên veşartî de li tiştên wendabûyî digeriyam. Li tiştên ku ji min hatibûn stendin. Rêya bê veger li pêşiya min bû û min nikariya jê vegerim. Her wiha çekdarên Şêx Seîdê

kal jî xwe spartibûn van çiyayan. Di van çiyayan de ew jî dihatin bênvedanê. Li ser van çiyayan şopên dîrokî hebûn. Li ser kevir û zinaran wêne hatibûn çêkirin. Di zinarên asê de cihê spartinê hatibûn kifşkirin. Her wiha li gelî şkeft jî hebûn. Şkeftên gelek kûr û fireh bûn. Ji aliyê din ve li van deran çekên giran jî hatibûn bikaranîn. Zinar perçe bûbûn, dar hişk bûbûn û çalên pir kur hebûn.
Li vê herêmê navê Şehîd Kendal hatibû kirin. Weke tevî herêmên din ev jî navê şehîdeke Kurd bû.
Min zehf xwest ez li ser herêmê agahî bigrim, lê mixabin ji ber kêmbûna agahiyan tenê navê herêmê û li ser herêmê çend agahî bi destê min ketin. Hevalê Kendal di salên 1990'î de li herêma Amedê gerîla bû. Bi taybetî li vê herêmê fermandarî kiribû. Berê li herêmê gelek heval diman. Ji aliyekî ve perwerde dihate dayîn, ji aliyê din ve jî ev herêm di navbera Eyaleta Amed û Xerza de bû. Ji ber vê yekê jî ev herêm cihekî pir girîng bû. Herêma Şehîd Kendal di navbera Golav (Sason) Batman û Amedê de bû. Ji ber vê yekê jî girîngiyek taybet jê re dihate dayîn. Piştî salên 90'î hevalê Kendal li vê herêmê şehîd ketibû. Jê û pê de navê vê herêmê bûbû Şehîd Kendal.
Ev herêm gelek zehmet bû. Li hember tevî zehmetiyan jî her kesî dixwest were vê herêmê. Li herêma Amedê yek ji herêmên herî zehmet ev der bû. Her wiha dijmin jî gelekî girîngî dida vê derê. Li vir heval binikên çixareyan jî li erdê nedihiştin. Yek bi yek kom dikirin û binax dikirin. Bermayiyên ti tişî li holê nediman. Me çi biavêta kom dikirin û li cihek baş binax dikirin. Li herêmê şopa lingan yek bi yek baş dihatin paqijkirin. Dijmin gelek caran ji ber tedbîrên me, şaş dima. Li vir bi tenê taximekî hevalên xort dima. Ev der ji bo hevalên jin gelek zehmet bû. Gelek aliyên balkêş yê vê herêmê hebûn.Dema hevalan behsa Şehîd Kendal dikirin û pesin didan,mirov mat dima.
Cara yekemîn dema belavbûna me çêbû min pir xwest ez bême vir. Wê rojê ji biryargehê heya yekîneya Şehîd Remzî min israr kir. Ji ber ku belavbûna min li gor herêma Şehîd Remzî hatibû çêkirin, daxwaza min nehate qebûlkirin. Heval çiqas ji cem min diçûn Şehîd Kendal û dihatin, ez hinekî din bi vê herêmê ve dihatim girêdan. Ev herêm di mêjiyê min de bûbû evînek bêderman. Li ser wê ji bedena min xwîn diherikî. Ez li bendê bûm ka kengê ezê biçim vê herêmê. Min bawer nedikir ku wê rojek bê û ezê li ser çiyayên Şehîd Kendal bigerim. Sason, Batman, Amed, Licê, Farqîn li ber çavê min bûn. Çiyayên ku minê li ser wan gundê xwe bidîta û ezê bi zaroktiya xwe ve biçûma. Ji vê herêmê çiyayên Helqîs û Mereto weke bejna eqîdek li ser linga xuya dikirin. Ava newala ku di ber gundê me de derbas dibû û daristanê Gomika minê bidîtan. Malbata min gelek behsa daristanên Gomika dikirin. Kalê min dema behsa daristanê dikir wiha digot:
"Daristana Gomikê ya me bû, darên wê pir xweşik bûn, lê niha kesên biyanî dest danîne ser û jêdikin. Piştî em bûn koçber hin kes hatin û li ser malên me rûniştin."
Gomika navê herêma daristanê bû. Herêm ji gelekî dar û çiyayên asê pêk dihat. Bavê min jî carna behsa gomika dikir:
"Gomika yê me bû dar û berê wê zêde bûn, ava wê weke cemedê bû. Lê piştî ku em ji wê derê ketin ser rêya penaberiyê û çûn, cerdevan hatin û lê bicîh bûn."
Piştî ez tevlî refên gerîla bûm, min fersend dît û ez li Gomika tevî geriyam. Li Şehîd Kendal ez nêzî gundê xwe Timoq bûm. Gundê ku ez şeş heft salî jê derketibûm û bi welatê xerîbiyê ve çûbûm.Ev der niha ewqasî nêzî min bû, min bi çavan didît. Piştî ku em ji gund derketin, çiya û newalên gund tim di bîra min de bûn. Koçkirina me ya ji gund ez gelekî êşandibûm. Min çi dikir gund ji bîra min nediçû. Lê tim hêviyekî min jî hebû, min digot,

ezê rojekî vegerim, li ser çiyayê Helqîs û Mereto bigerim. Hêvî û bendewariya min ya çiya û gund hê jî di bîra min de ye. Ez bi van hêvî û baweriyê tevlî gerîla bûm û va ye li ser wan çiyayan digerim. Hê jî giraniya wan rojan li ser min heye. Ez li ser vê mijarê bi zanistî jî rawestiyam. Tiştê ku ez têgihiştim ev bû; veqetîna ji gund ji aliyê mêjî û sosyolojiyê ve li ser min bandorek giran kiribû. Roja ku ez li bendê bûm hatibû û li ber min sekinîbû. Ez gav bi gav ber bi çiyayên Xerza ve dihatim. Çiyayên Helqîs û Mereto bi tevî xweşikiya xwe ez pêşwazî dikirim. Li ser axa Mala Eliyê ónis li ser van çiyayên bi rûmet ku li ser, şerê bi dehsalan hatibû kirin, disekinîm. Ne salek ne du, bi dehsalan li ser vê axê şerê dijwar hatibû meşandin. Piştî şerê dijwar û dirêj dewleta Roma Reş weke berê bi komployan ev raperîn jî têk biribû.
Gel xwe avêtibû çiyayên Helqîs û Mereto. Bi hezaran kes li gund û bajaran bi xîzanî û belengazî jiyana xwe wenda kiribûn. Di van çiyayan de bûyerên bi êş hatibûn jiyîn. Lê ne di pirtûkan de hatibûn nivîsîn ne jî ji hişan derketibûn. Karesatên dijwar pêk hatibûn û di mêjiyan de bi cih bûbûn. Di mejiyan de weke qurmê dara çinarê ra dabûn. Weke êstir hêvî ji çavan diherikîn. Di vê roja ku ez li ser çiyayên Xerza bûm, herêm bi herêm digeriyam. Min xwe weke nûnerê van şehîdan didît. ó niha jî li ser van çiyayan weke kesekî ji bo tolhildanê amade bûm. Li ser vê axê xwîna bi hezaran kesî hebû. Axînên dayikan ji ber guhên min nediçûn. Keçên ciwan bi salan xêlîyên xwe rakiribûn û di şer de xwe ji zinarên asê avêtibûn xwarê. Jin ji cem mêrê xwe dûr nebûbûn. Keç li pey dergistiyê xwe dimeşiyan. Xort ji xwe qet ji serê çiya venegeriyabûn malê. Li hemberî Roma Reş sal bi sal şer dikirin. Minê ev bûyer tev çawa jibîr bikiran. Minê kesera dayikan, hêviyên keç û xortan çawa jibîr bikiran? Min jibîr bikiran jî ma wê bihatana jibîrkirin? Ma dihatin jibîr kirin?Ne dihatin jibîrkirin û ne jî dihatin tinekirin. Di her gavavêtina min de zarokên Mala Eliyê ónis hebûn. Ji bo wan ezê li ser linga bimama. Ji bo keçên bê xêlî, ji bo zarokên zik birçî ezê li ser vê axê weke kesekî têkoşêr bimama. Ji her aliyê çiyayên me, av diherikî. Min gelek caran li ser helbest dinivîsandin û bi hestên weke agir dixwendin. Li ber herikîna avê min kilamên evîndariyê li ser welêt digotin. Li ber kaniyê min serê xwe danî û razam. Min carna ji xwe pirs dikir, çima li welatê me ewçend kanî hene?Ev av ji kû derê tê? Weke pirsa Govend û Dengbêjiyê ku min ji xwe pirs dikir, ev jî li yên din zêde dibû. Bersiva van pirsan di dîrokê de veşartîbû. Li gor min ne kaniyên welatê me, ne Govend û ne jî Dengbêjiya Kurdan ne bê sedem bûn. Bersiva van pirsan êş, keder, nalîn û rondikên çavan bûn.
Kurdan ji êş û derdan stiran digotin, ji bêçaretiyê jî di her şert û mercan de govend digirtin. Bi taybetî di demên ne xweş de govend digirin. Ji rondikên çavan her derê welatê me bûye kanî, bûye çem bûye newal û diherikin. Li ser axa walatê me ji her cihî av diherike. Kanî dibin newal, newal dibin çem, çem dibin bendav. Li ser vê axê jan û êş dibin kilam û li hev dirêj dibin. Welatê me cihê çand û afirandinê ye.
Di zifistana welatê xwe de, ez qet nedicemidîm. Ji ber ku ev serma ya welatê min bû. æşa ku ji bo welêt dihate kişandin, ne serma bû. Ev êşji bo welatek azad dihate kişandin. Çiya ji min re bûbûn jiyan, li vê herêmê ez careke din hatibûm dinê. Daxwaza min û bersiva pirsên min yek bi yek bi cih dihatin. Çiyayê Kurdistanê ji bo min cihek weke lêgera zêran bû. Weke ku ez kesek zêrker bim û her roj tiştekî dîrokî bibînim. Li Şehîd Kendal ez di nava çîrokekê de bûm. Em kêm bûn, lê jiyana me hêja û bi rûmet bû. Tevî hevalên taximê em bi hev re li cihên dîrokî digeriyan. Gav bi gav min herêm nas dikir, roj bi roj ez ji vê çandê tiştan fêr dibûm. Li gelî li Gomika li Herhendê em di nava lêgerînek de bûm. Li Gomika li çiyayê Xerza di bin darên mazî de, me gelek roj jimartin. Ez di nav vê çîrokê de li dor çiyayên gundê xwe digeriyam. Bi hevalên ku niha di artêşa

şehîdan de ne, me wêne girtin û wan wêneyan li ser dilê xwe bi cih kirin. Li ser dar û kuçeyan me helbest nîvisandin. Me wêne kirin name û ji dîrokê re şahid hiştin. Me helbest ji çanda wendahî re nivîsandin. Wêneyên ku nehatibûn kişandin, helbestên ku nehatibûn nivîsandin, me li gor xwe ragirt û anîn. Me karekî giranbiha û zehmet dikir. Lê em ji vî karî razî bûn. Wêneyên ku pêwîst bû ji aliyê egîdan ve bihata girtin me ragirt û anîn. Wêneyên ku şahidên roja giran bûn, li ber me disekinîn.
Ev nasnameya wan û wêneyên wan kesan bûn ku niha ji bo me her yek çirîskek ronahiyê ne. Rûpel bi rûpel min xêz kirin û danîn ser hev. Ez ketibûm nava çîroka bê nav û bê dawî. Bi dîrokê ve diçûm dibûm helbestvan. Bi gotina kilaman li ser raperîna mala Eliyê ónis dibûm dengbêj. Bi dîrokê ve diçûm diketim nav dîrokê û li evîndaran digeriyam. Li çiyayê Helqîs û Mereto me çend roj bê nan û bê av derbas kirin? Em çend rojan dibin seqema zivistanê de man? Ne diyar bû. Li ser çiyayên asê di bin berfê de roj û mehan li ber xwe didan û nedibûn bihar. Hesreta bi salan bi cih dihat. Hêviya di dilê min de ewçend gur bû ku, ez bi vê herêmê ve anîbûm. Li Şehîd Kendal tevî hesret û evîna dûr, êdî bi dawî dibûn. æşên ku di bedena min de bûbûn birînên kûr, yek bi yek baş dibûn û dihatin dermankirin.
Em tevî hevalên di taximê de, me ji hev hes dikir. Hin heval hebûn me ji berê de hev nas dikir. Li cem min Çekdar, Tîrêj, Wedat, Deniz, Resul, Mahsum hebûn. Ev cara duemîn bû ku ez û Tîrêj em bi hev re diman. Min û wî me hev ji berê de nas dikir. Hevalek têgihiştî û dilpak bû, qet bi çavê mezin li xwe mêze nedikir. Li herêma Şehîd Remzî me bi hev re salên zehmet derbas kiribûn. Piştî ez hatim Şehîd Kendal, ji min re pir alîkarî kir. Yek ji hevalên din jî ku me hev ji berê de hev nas dikir Çekdar bû. Ez û wî jî em di yekîneya Şehîd Remzî de bi hev re bûn. Resul û Mahsum hê nû bûn. Bi van hevalan re hevaltiya min gelek xweş û baş derbas dibû. Lê hevaltiya min û Tîrêj gelekî cuda bû. Ez baş nizanim lê di nav gerîla de, cihê du hevalan ji bo min gelek cuda bû. Yek ji van hevalê Faîq bû, yê din jî Tîrêj bû. Ev her du heval gelek dilpak bûn. Dema ez vê nivîsê dinivîsînim hestên min li min kom dibin. Ez ji cihê xwe diçim û li derbasbûyê xwe vedigerim. Ez nizanim ji destê van hestan çi bikim. Ew heval, ew axa pîroz, li welatê xerîbiyê, li ber çavê min dibin wêneyên zîndî û li ser dilê min dibin birînên kûr. Her yek li ezmên dibin stêrk û ji min dûr dibin. Ez dikim nakim nagîhîjim wan. Belkî ev hesret mirovan demek dirêj li ser linga dihêle, lê bi xwe re birînek kûr jî vedike. Ev birîn her ku diçe kûr dibe. Gelek caran ez bixwe re dikevim nav lêpirsînan. Bîranîna wan gelek dijwar e, lê rastiya jiyanê ev e.
Ez ne nivîsînim di dîrokê de ez xwe efû nakim. Li ser min barek giran kom dibe û ez bê nefes dimînim. Dema ez dinivîsînim dikevim nava xewjînan û bi kûrahiya dîrokê ve diçim. Ez her tiştê roja îro jibîr dikim û bi rojên borî ve diçim. Kûr û dûr bi dirokê ve diçim, diçim li cem hevalan dibim mêvan. Ji bo çend rojan li cem wan dimînim. Li Şehîd Kendal, Şehîd Remzî, Golav, Apê Musa, Aqdax, Gênç û cihên din. Ez diçim çiyayê Qurmikê û dibim mêvanê hevalan. Hevalên nû hatine herêmê û ji yên berê kesek nemaye. Diçim Geliyê Kûviyan li cihê ku min perwerdeya xwe ya yekemîn dîtî. Li geliyê ku me masî digirtin, digerim. Cihê ku min dest bi jiyana nû kiribû.
Di nav van hestan de ez ji xwe re wiha dibêjim. Li ser vê axê, em ne yê despêkê ne û ne jî yên dawiyê. Berî me hebûn,vane em digerin û wa hê jî tên. Me jî mohra xwe li xebata herêmê xist. Me jî meh û sal derbas kirin. Me jî li herêmê bi zivistan û beharê re hevaltî kir. Em jî bi zivistana sar re ketin pêşbirkê. Em jî li meydana şer ketin şerê giran. Em li herêmê ketin şer ji şeveqê heya êvarê me şer kir. Lê me ti car çeperên xwe bernedan. Me birîndar dan, me şehîd dan, lê me ti car şehîdên xwe di destê dijmin de nehiştin.

Dem hat em tirsiyan, roj hat em vekişiyan, lê li serê çiyayê Kurdistanê li hemberî eskerên artêşa Tirk me hêrs û bêrxasiya egîdî jiya. Mêrxasî, çelengî û egîdî tim li cem me bû. Dilê me bi hêstek welatperwerî diavêt. Hinekî be jî me tiştên di dilê xwe de pêk anîbûn. Hêrs û kîna di dilê xwe de, evîn û heskirina xwe me roj bi roj pêk dianîn. Em li ser rêça hevalên ku bi xwîna xwe ji me re çeper çêkiribûn dimeşiyan.

Geliyê Zorê

Em ji nuqteya Qehwê derketin û ber bi Geliyê Zorê ve diçûn. Di vê rêya dirêj û zehmet de em gav bi gav bê rawestan dimeşiyan. Me roj, meh, sal, havîn û zivistan li pey xwe dihiştin. Çîroka me ya bê nav her roj bi xwe re, ji me re tiştek nû dianî. Me nizanibû wê sibê çi bibe. Kî biçe û kî bimîne. Li pêşiya me deştek dirêj hebû. Geliyê fireh û kûr li benda me bû. Bi rastî jî Geliyê Zorê mirov dixist nava xewjînan. Geliyek pir fireh û kûr e. Li nêzî gelî gundên cerdevanan jî hebûn. Em bigîştina gelî me xwe ji bo demekî diparast cihên parastgeh. Li wir ji bo parastinê ti fikarên me nebûn. Dar û berên gelî weke darê çinaran mezin bûn. Di nav van daran de mirov dikaribû bi rojan li ber xwe bide. Darên çinar, darên mazî û darên bî gelek bûn. Van daran eşkere dikirin ku gelî cihek gelek kevn e. Di gelî de şkêr û şkeft hebûn, ev jî aliyê dîrokî didan xuyakirin. Li çar aliyê gelî şkeft hatibûn çêkirin. Ya din li gelî tiştek din yê balkêş jî hebû.
Tiştê balkîş jî masiyên gelî bûn. Ezê li ser masiyan bi awayek berfireh bisekinim. Masiyên pir bitam û xweş bûn. Em ji deşta vala ber bi gelî ve diçûn. Ji dûr ve gelî xuya dikir, dar û berên wî pir bilind bûn. Ji deşta vala gelî weke giravek dixuya. Demek dirêj bû em ji daristanê dûr bûn. Li deştê û li nuqteyên din ewqas me xwe xwar kiribû, êdî stûyê me dêşiya. Ew çend meh bûn em li cihê bê dar diman. Nuqteyên me bi giştî ji zinar û cihên vekirî pêk dihatin. Li Gelî emê bi saetan li ser linga bimana. Heya me dikaribûn em baz jî bidin. Em gav bi gav diketin nava gelî, di nav dar û beran de em dimeşiyan. Demek dirêj bû me zinar, dar, kevir û çemekî wiha nedîtibû. Dema em ketin gelî me deşt li dû xwe hişt. ædî li ser ewlekariyê ti tirs û fikarên me nebûn. Me zanibû êdî em li cihek parastgeh in. Em ji rêya dûr ji kemîn û operasyonan xilas bûbûn. Di plana me de ji bo çend rojan bênvedan hebû. Rêya ku em tê de dimeşiyan tev dar û strî bûn. Gelî ewqasî kûr bû ku me bawer nedikir em bigihîjîn jêr. Rê li dû hev vedigeriya û heya jêr diçû. Ji ber ku rêya me berjêr bû em bi lez dimeşiyan. Em hatin û li ber ava gelî rawestiyan. Dema av li ber çavê me ket, em bi cîhanekî din ve çûn. Gelî gelekî fireh û dirêj bû. Gurgura avê bû li pey hev diherikî. Carna bilind dibû, carna jî nizim dibû. Lê rastiyek hebû gelek bi hêz diherikî. Av çiqas bi lez diherikî ewçend jî dijwar dibû. Ji bo bênvedanê em hatin û li ber çem rûniştin. Rûniştina me ya li ber avê bi serê xwe kêfxweşiyek bû. Me xwe li ber qeraxa avê dirêj kir û dengê avê guhdarî kir. Pişta me li ser erdê, çavê me li ezmên bû. Ezman gelekî bilind bû, me çavê xwe girt û guhê xwe vekir. Dengê avê weke melodiya mûzîkê, li ber guhê me xuşxuş dikir û diherikî. Li ber me di nav avê de masiyan xwe hildavêtin. Me li masiyan temaşe kir. Çi xweşik bûn. Me tevî tirs û fikarên xwe jibîr kir û em diaxivîn.
Axaftin hat û li ser masiyan sekinî. Tîrêj çavê xwe vekiribû û li masiyan mêze dikir û wiha got:
"Hûn van masiyan dibîn hevalno, di vê avê de masiyên gelekî xweş hene. Min berê ji vir masî girtine, gelekî xweş in, ez bawer nakim we masiyên wisa xweş xwaribin:"
Tîrêj çend caran ji vir masî girtibûn û xwaribûn. Baş dizanibû ku masiyên vir çiqas bi tam in. Bi rastî jî masiyan bala me kişandibûn. Li ser gotina hevalê Tîrêj, hevalan gotin em ji

xwe re masiyan bigrin. Lê meyê çawa bigirtan? Em hê nû hatibûn gelî. Ji aliyê din ve li herêmê operasyon hatibûn lidarxistin. Meyê masî bi çi û çawa bigirta? Eger cihê me bihata dîtin, meyê malik li serê xwe xira bikira. Ji sedî sed wê li gelî operasyon çêbûya. Ji xwe li nêzî me gundên cerdevanên har jî hebûn. Vê bi serê xwe têra operasyonekî dikir. Li nêzî me gundê cerdevanên ku ji wan re 'Xî' dihate gotin hebûn.
Ev cerdevan gelekî harbûn û di operasyonan de cih digirtin. Dema operasyon li herêmê derdiket cerdevan li pêşiya operasyonê dimeşiyan. Li vê herêmê gelekî heval bi cerdevanan re ketibûn şer û şehîd ketibûn. Em ji bo masiyan bigrin bibiryar bûn. Hevalê Tîrêj ji bo girtina masiyan gelekî israr dikir. Ji avjenî û girtina masiyan re pir jêhatî bû. Li Bismil li gundekî nêzî çem mezin bûbû. Di zaroktiya xwe de tim ketibû çem û masî girtibûn. Li Şehîd Remzî dema heval biçûna masiyan tim ew bi wan re bû. Bê wî heval nediçûn. Ji bo girtina masiyan ew bûbû navê sereke. Hem di girtina masiyan de xurt bû, hem jî ji pijandina wan re. Ne tenê masî çêkirina her xwarinê ji destê wî dihat. Em ji rêyek dûr dihatin û gelekî westiyabûn. Li hemberî matmayina me, li halê me mêze kir û wiha got;
"Çi dibe bila bibe em bê masî ji ser çem naçin. Emê masiyan bigrin û bixwin, ev çend meh in ku çavê me bi goşt neketiye. Ma em masiyan bigrin wê dinya xira bibe. Ya din jî pêxwarina me tine bû. Masî ji me re derman bûn. Me fersend nedîtibû ku em ji xwe re pêxwarin bînin. Tiştên ku me bi xwe re anîbûn jî zû xilas bûbûn. Me biryara xwe da, em masiyan bigrin. Ya rastî min berê gelek caran masiyên çem û newalan, yên cihê xwaribûn. Lê li gor hevalan behsa masiyên gelî dikirin, di cîhanê de weke wan bi tam li ti cihî tine bûn. Ji bo girtina masiyan min jî piştgiriya Tîrêj kir;
"Baş e emê masiyan bigrin lê çawa û bi çi? Ji bo girtinê tiştek bi me re tine:"
Em tev di girtina masiyan de bûn yek deng. Me tev pêşniyara Tîrêj qebûl kir. Tîrêj li ser axaftina me, destê xwe avêt çentê pişta xwe û vekir. Destê xwe tê de bir û anî, mayinek derxist. Me baş mêze kir, erê mayinek bû. Em şaş bûn, me nizanibû ku pê re mayin heye. Ji aliyê din ve em ne li bendê bûn ku Tîrêj mayinê ji bo masiyan bikar bîne. Li ser vê yekê Wedat xwest ku ji vê biryarê vegerîne.
"Mayin heyf e hevalê Tîrêj, em mayinê ji bo masiyan bikar neynin, sibê du sibe wê ji me re pir lazim bibe."
"Em jî endamê vê rêxistinê ne, em ne dijmin in, hûn vê mayinê dibînin? "
Mayinek nîşanî me kir;
"Erê em dibînin, çi bûye;"
"Ev mayin bi mehan e ku di çentê pişta min de ye, ez li benda rojekê wiha bûm ku ez biteqînim. Ez ji vê mayinê aciz bûme wê rojekê bi min ve biteqe, ma hûn ji min bawer nakin. Hem ez bawer nakim ku biteqe."
Li ber me ji bo hilbijartinê ti rê nehiştin.
"Baş e.. baş e.. hêrs nebe, em ji te bawer dikin temam."
Hevalên ku haya wan ji vê mayinê hebû wiha gotin:
"Erê hevalê Tîrêj rast dibêje, ev mayin bi mehan e ku pê re ye."
Ji bo li cihek baş bikar bîne xistibû çentê xwe de. Lê bi ser de meh derbas bûbûn, rojek wiha nehatibû. Li serê çiya amadekariyên bi vi rengî tim di nav hevalan de hebûn. Mayina Delil pişti mehan jiyana me xilas kiribû. Niha jî meyê bi mayina Tirêj ku bi mehan di çentê wî de bû ji xwe re pê masî bigirtan. Piştî ku Tîrêj em îkna kirin pir bi kêf bû. Rahişt mayina xwe û çû ber qeraxa çem sekinî. Ji niha ve bêhna goştê masiyan li ber pozê me diket. Masî di nav avê de bilind dibûn û dadiketin. Nizanibûn piştî çend

deqeyan wê çi were serê wan. Hevalê Tîrêj her hevalek li cihekî wezîfedar kir û axaftina dawî kir"
"Her kes bila karê xwe baş bike ha?Kî karê xwe baş neke û bihêle ku masî birevin emê nobeta wî zêde binivîsînin."
Berî ku mayinê biteqîne cihê hevalan plan dikir. Her yekî li cihek bi cih kir. Yê soberî baş dizanibûn û yê kêm dizanibûn bi cih kirin. Di vê plana bi cih kirinê de, ez û hevalê Germiyan ji bo em biçin noktê amadekariyê bikin em hatin wezîfedarkirin. Ji bo min tişta herî zehmet ew bû ku ezê neketama evê. Di demek wiha de ji ber çem bê avjenî çûhûn, li min giran dihat. Min ji avjeniyê gelek hes dikir, lê vê carê min nikariya bi dilê xwe bikevim avê. Piştî ku Tîrêj navê min ji bo çûna nuqteyê diyar kir ez çûm cem û min wiha got;
"Hevalê Tirêj, tu dizanî ez çiqas ji avê hes dikim, ez jî li vir bimînim û masiyan bigrim. Bila hevalekî din biçe nuqteyê û amadekariyê bike."
"Na hevalê Azad, tu û hevalê Germiyan biçin nuqteyê û ji me re amadekarî bikin. Hevîr bikin û ji bo çêkirina masiyan jî daran kom bikin."
Min çi jî kir daxwaza min nehat qebûlkirin. Ji ber ku min Tîrêj fêm dikir ez zêde bi ser de neçûm. Min dixwest ez bikevin avê û masiyan bigrim. Herî dawiyê min got, qet nebe em xwe bişûn û biçin. Çend caran em xwe bavêjin navê û biçin. Piştî ku ev daxwaza min jî nehat qebûlkirin, em ketin rê û çûn. Ez û Germiyan ji bo em amadekarî bikin em bi nav daristanê ve meşiyan. Em ketin rê di nav dar û gezikan de meşiyan. Me çend gav avêtin dengê Tîrêj hat guhê me
"Amade bin, cihê xwe bigrin;"
Bi dengê Tîrêj re dengekî bilind û dijwar ji gelî rabû. Dema me ev dengê dijwar bihîst em şoq bûn. Dengek weke hewanê ji çem bilind bû. Ji ber dengê mayinê çem bi tevahî hejiya û di nav çiyê de deng çû û hat. Çivîkên li ser daran bi carekî firiyan û bi ezman ketin. Dema dengê mayinê ji nav avê bilind bû, ez li dû xwe vegeriyam û min lê mêze kir. Tiştê ku ji çem di nav daran de xuya dikir ezman bû. Li dor me darên bilind hebûn û ezmanê fireh li ser me bû. Me rêya xwe dewam kir. Heval piştî ku dengekî ewçend dijwar dibîhîsin, dikenin û bi Tîrêj henekan dikin;
"Hevalê Tîrêj te dît, mayin çawa teqiya..ka te digot, mayin nateqe..."
Dengê mayinê gelekî gur û dijwar bû, ev jî bû sedema ku heval bi Tîrêj yariyan bikin. Tîrêj ji ber ku di axaftina xwe de mafdar bû, di cih de bersivek lezgîn dide;
"Hevalno dev ji yariyan berdin masiyan bigrin masî çûn.. masî.çûn...min got belkî mayin neteqe. Ma we dizanibû wê wisa dijwar biteqe, haydê masiyan bigirin yek jî nereve. Ji aliyê kî ve masî birevin emê wî ceza bikin, emê nobeta wî zêde binivîsînin û wî du caran li ser hev derxin çêkirina xwarinê;
Ev cezayên me bûn. Bi axaftina Tîrêj re heval xwe davêjin ava çem û li pey masiyan dikevin. Av gelek e, masî dikevin ber û bi xwe re dibe. Masiyê hatîn kuştin bi girtinê xilas nabin. Masiyên kuştî di nava çem de weke berfê sipî dikin. Her masiyek wek du bostan hebûn. Heval xwe avêtin nava avê û bi pey masiyan ketin.
Ez û hevalê Germiyan em ber bi nuqteyê ve diçûn. Daxwaza min di qirika min de mabû. Min pir dixwest ez bikevim avê lê ev yek pêk nehat. Em di bin darên mezin û di nav gezikên li hev pêçayî de dimeşiyan. Li gor ji me re hatibû gotin em çûn û gihîştin nuqteyê. Me ji bo hevalan dest bi amadekariyan kir. Min li nav nuqteyê mêze kir, cihek pir xweş bû. Ez yekem car dihatim vê noqteyê. Nuqte di cihek ji çem hinek bilind, li nîvê çiyê bû. Li binê nuqteyê dar û ber ber bi çem ve dirêj dibûn. Li jorî me jî dar heya serê çiyê bilind dibûn. Çiyayê li ser me bi ser nuqteya me ve berjêr dibû. Her çar aliyên me bi

darên dirêj hatibûn pêçan. Di nav nuqteyê de min kanî dît. Ev kanî aliyê nuqteyê ya herî xweş bû. Li nîvê noqteyê bû. Min çenga xwe da ber avê avek weke cemedê bû. Min çenga xwe tije av kir û vexwar, ox..avek çixweş e..
Yeke din jî min vexwar. Me lez da xwe, dest avêt kar, destpêkê me hevîr kir da zû tirş bibe. Me hevîr kir û ji bo tirş bibe me ser girt. Vê carê ji bo daran kom bikin, em ketin nav daran. Me ji dor aliyê nuqteyê her yek gurzekî dar kom kir. Me tevî karê xwe qedand û em li bendî hevalan man.
Em li ber kaniyê rûniştin. Ji kaniyê bê rawestan av diherikî. Herikîna avê bala mirovan dikişand ser xwe. Mirov dikaribû bi saetan lê mêze bike û li dengê wê guhdarî bike. Em ketin axaftinê û avê em bi salên borî ve birin. Germiyan jî hevalekî min yê kevin bû, li yekîneya Licê em bi hev re bûn. Ji Başûrê Kurdistanê ji herêma Germiyan bû. Di nav hêzên başûr de gelekî mabû, demekê pêşmergetî jî kiribû. Piştî ku PKK'ê nas dike tevlî nav refên gerîla dibe. Hevalek dilpak û karker bû. Pir henek dikirin. Bi taybetî deme dixwest bi Tirkî biaxive, em pê dikeniyan. Axaftina wî nîv Kurdî û nîv Tirkî bû. Carna min jê re digot, Germiyan bi Tirkî meaxive, bi Kurdî biaxive. Ewî jî digot, hevalê Azad, ez bi Tirkî neaxivim kes ji min fêm nake û kes bi min re naxive. Ez mecbur im fêrî Tirkî bibim. Ez û wî em li ser kaniyê bi bîranînên dûr ve çûn. Ji dema yekîneya Licê gelekî bîranînên me yên kenok hebûn.
Li yekîneya Licê Germiyan Rokêtavêjê yekîneya me bû. Em gelek caran bi hev re çûbûn çalakiyê. Ji ber ku baş bi Tirkî nizanibû min alîkariya wî dikir. Di têkiliyên xwe de hinek teng bû, lê hevalek gelekî girêdayî partiyê bû û durist bû. Bîranînekî min û wî bi hev re heye, qet ji bîra min naçe.
Dema em di yekîneya Licê de bi hev re bûn, me li ser hev çalakî li dar dixist. Bi taybetî li hemberî wesaîtên leşkerî ku bi şev digeriyan, me li wan dixist. Ev wesaîtên leşkerî ji Licê diçûn Qulpê û Gêncê. Di van deran de her şev dewriyeyên şevê digeriyan. Di nav van wesaîtan de panzêr, daxgeyikî, tang û cemse hebûn. Me tim li hemberî wan çalakî li dar dixistin. Çalakiyên me bi rokêtavêj, mayin û çekên şexsî çêdibûn. Germiyan ji ber ku li başûr rokêt bikar anîbûn xwedî tecrûbe bû. Rokêtavêjê yekîneya me jî ew bû. Rojekê meyê li hemberî van dewriyeyan çalakî li dar bixista. Tîmek ku Germiyan jî di nav de bû tîma êrişê bû. Tîmek din jî hebû, ew jî tîma mayinê bû. Dewriyeyên şevê tim du wesaît bi hev re digeriyan. Daxgeyikî û panzêr, an jî tang û cemse bûn. Me di çalakiyê de ji bo panzêrê mayin bikar danî, ji bo daxgeyikî an jî ji bo cemseyan rokêt bikar dianî. Wê rojê me tevî amadekariyên xwe qedand û em ber bi cihê çalakiyê ve çûn. Ez jî li cem fermandarê yekîneyê bûm, me çalakî qordîne dikir. ævarê heval ber bi cihê çalakiyê ve çûn û em jî bi çiyayê Qurmikê ve hilkişiyan.Dema heval amade bibûna meyê jî qordîne bikira. Wesaîtên leşkerî çi ne, ya li pêş û ya li paş çi bûn, me heval li gor wan agahdar dikirin. Em çûn li navsera çiyê me cihê xwe girt. Çiyayê Qurmikê li ber me fireh û dirêj dibû. Dema wesaîtên leşkerî hatin, me heval agahdar kirin. Daxgeyikî û panzêrek ketibûn rê û bi aliyê wan ve diçûn. Me mijar ji hevalan re got û xwe amade kirin. Dema wesaîtên leşkerî ketin kemînê, hevalan li wan xistin. Mayin bi panzêrê ve teqiya û teqînek bilind jê hat. Du teqîn li pey hev ji panzêrê hatin, yek mayina me bû, ya din jî tiştên di nav panzêrê de bûn. Piştî lêdana panzêrê diviyabû Germiyan bi rokêtê li daxgeyikê bide. Daxgeyigî bi maneya Kurdî tê wateya Pezkoviyê Çiyê. Ji ber ku bi erdê ve diçû û wek kîsoyan bû.
Lê tiştek balkêş bû rokêt lê nediçûn. Me bi dûrbînê baş mêze kir, ka rokêta Germiyan lê ket an na. Na daxgeyikî bi lez di rêya xwe de diçû. Ji ber ku nikaribû bi carekî vegere li ser rê raste rast diçû. Şev tarî bû hevalan di nava gundê Tûtê de kemîn danîbûn. Gund ji

berê de hatibû valakirin. Li cem rê çend malên nîvxirabe mabûn. Di nav malên li ser rê de hevalan kemîn danîbûn. Rê di nava gund de derbas dibû. Her wiha gund nêzî navçeya Licê bû. Di navbera Licê û Qulpê de bû. Dema me dît rokêt neteqiya em ji ewlekariya hevalan ketin nav fikaran. Bêguman wê wesaît vegeriya û li wan bixista. Şevek gelekî tarî bû, Germiyan ji cihek nêz ve rokêtê diavêje. Ji ber ku rokêt ji nêz ve tê avêtin nateqe. Rokêt diçe li daxgeyikî dikeve û ji ser dişemite. Piştî teqînê eskeran alîkarî xwestin. Di nav çend deqeyan de hêzek weke konvoy ji Licê ketin rê û bi aliyê teqînê ve çûn. Me rewş ji hevalan re got û ji wan xwest ku bi lez ji cihê bûyerê dûr bibin. Dijmin cihê hevalan dide ber çekên giran. Germiyan dema ji wir vedikişe dikeve erdê û serê xwe li dîwêr dide. Daxgeyikî rê li hevalan digre û nahêle ku ji cihê xwe dûr bibin. Çalakî baş derbas bû û heval bê wendahî vegeriyan. Dema heval ji çalakiyê hatin me mêze kir ku Germiyan ji hevalan dûr rûdinê. Me pirs kir me got, çi bûye? Hevalan gotin dema Germiyan bazda ji cihek bilind ket û serê xwe li dîwarê malekê da. Ji ber ku şev tarî bû me dest û serê wî nedît. Germiyan li ser hev digot, tiştek nîne ez baş im. Li ser vê yekê me got, baş e emê sibê gazî dixtor bikin.
Danê sibê dema em rabûn me mêze kir ku her derê Germiyan bûye birîn. Bi şev xuya nedikir, lê her deverê Germiyan xwîn bûbûn û birînên wî reş bûbûn. Bi taybetî jî dev û diranên wî gelek êşiyabûn. Hinek diranên pêş şkiyabûn û destên wî werimîbûn. Cihekî wî bê pêçayî nemabû. Piştî Delîl cara duemîn bû, hevalekî me dikete rewşekî wisa. Dema Germiyan birîndar bû min gelekî alîkariya wî dikir. Em bi hevre gelekî daxivîn, me bi hev re li ser çalakiyan proje amade dikir. Heya birînên wî baş bûn me karên giran nedidanê. Piştî salên dirêj û bi êş niha jî em bi hev re bûn. Me behsa hevalên ku çûbûn dikir, Rozerîn, Binevş û yên din......
Dîsa birîna me der bû û weke ava ji kaniya li ber me diherikî. Dem her ku diçû dereng dibû. Di vê navberê de me behsa hevalan kir. Gelo hevalan wê masî bianîna an na? Bi vê hevokê re dengê wan li ber guhên me ket. Hevalan bi hev yarî dikirin û dihatin. Li gor planê heval herî zêde li benda çend kîlo masî bûn. Lê dema ku mayin diteqe heval dikevin avê û sê torbe masî kom dikin. Belê hûn rast dibihîsin, hevalan sê torbe masî kom kiribûn. Gava bi sê torbe masî ve ketin nava nuqteyê me jî bawer nekir. Lê ya rast ev bû, mayin gelekî dijwar teqiyabû. Ewqas masî çawa hatibûn girtin em jî ecêbmayî man. Mayina ku Tîrêj digot, belkî neteqe çem hejandibû û tije masî kiribû. Kêfa me kêf bû. Li Gelî li binê wan daran em li ber masiyan rûniştin. Me dest bi pijandina masiyan kir. Weke her karî di karê pijandinê de jî hevalê Tîrêj dewlemend bû. Her tişt ji destê wî dihat. Hevalan digotin nîvê masiyan ewî girtine. Niha jî xwe ji bo pijandinê amade dikir. Em sê rojan li wê nuqteyê man. Me sê rojan li ser hev masî çêkir û xwarin. Ji aliyê din ve tiştekî me yê din jî tine bû. Ez rastiyê bêjim min masiyên ji çemê Amedê û Batmanê xwaribûn, ez heya bajarên Tirkiyê Egeyê jî çûm û min masiyên wir jî xwaribûn, lê weke masiyên Geliyê Zorê bi tam û xweş min qet nedîtibûn. Ewqasî xweş bûn min jî nizaniya. Pişti xwarina masiyan me ji bo vî karê baş ji Tîrêj re sipas kir.
Li dor noqteya me simaq hebûn, Germiyan komek simaq komkir û anî. Me xist nava bîdonên biçûk yên tije av û hejand. Av weke lîmonê tirş dibû. Me ev av li ser masiyan dikir, tama masiyan bi ava simaqê gelekî xweş dibû. Ev tecrûbeya gundan ya kevin bû, lê Germiyan dizanibû û jibîr nekiribû. Bi serê daran ve weke goşiya tirî sor dikirin. Dema rojê dida ser diberiqîn û ji dûr ve dil dixwest. Carna me xurî jî dixwarin. Li cem me ava cemidî, masî û simaq hebûn, ev her sê tişt li hev gelekî diçûn. Yek bê ya din nedibû û tam nedida. Em li gelî bi cih bûbûn. Cihek fireh û girtî bû. Dengê teqîna mayina me nehatibû bihîstin, ev ji bo me pir baş bû. Em di navbera çiyayên Sason, Qulp û Farqînê

de bûn. Pêwîstiya me bi bênvedanek çend rojan hebû. Em bi bernameyek berfireh hatibûn herêmê. Li gor vê bernameyê em li nuqteya Qehwê gihîştibûn cem hevalan. Piştî wê em ber bi Bendava Malabadê ve çûn û nêzî deştê bûbûn. Em çûn deştê di navbera Batman û Farqînê de geriyan û dîsa vegeriyan.
Piştî rêwîtiya deştê em careke din hatibûn çiyê nuqteya Qehwê. Ji wir jî bi meşeke dirêj em hatibûn Geliyê Zorê. Me kemîn û operasyonan li dû xwe hiştibûn. Em ewqas meşiyabûn ku êdî me li gelî kon veda. Her çiqas me li gor daxwaza xwe kar nekir jî, li gor pratîkên berê em serkeftî bûn.
Li gelî bîranînên kevin yên dîrokî hebûn, me êvarê serê xwe bi van bîranînan dirêj dikir û em bi wan radibûn. Di vî geliyê kûr de em bi kûrahiya bîranînên xwe yên dîrokî ve diçûn. Em di pêngava bênvedan û kûrbûna îdolojîk de bûn.Me dest bi perwerdeyê kiribû. Li gerîla piraniya dem, bi perwerdeyê derbas dibû. Li ber dengê ava gelî me perwerde didît. Piştî perwerdê her kes bi cihekî ve diçû. Me xwe li binê daran dirêj dikir û bên vedida. Piraniya wextê me li ber ava çem, li binê siya daran derbas dibû.Jimara me kêm bû, me dema xwe bi nîqaşê derbas dikir. Di rojeke wisa de hevalê Tîrêj kûr û dûr difikirî. Ne diyar bû ka li ser çi tiştî ewqas kûr bûye û difikire. Ez fikirîm ev tişta ku hevalê min dida fikirandin çi bû?Ava gelî li hemberî me diherikî. Geh bilind dibû û geh nizim dibû. Dengê avê weke melodiya muzîkê jidil lime têsîr dikir. Gurgura avê bû, Tîrêj dîl girtibû û bi salên borî ve biribû.Dilê wî ji ber demên borî xwîn diherikî. Tîrêj ji xwe pirsên wiha dikirin;
"Hey gidî zeman, zeman çiqas dijwar e û çiqas ji rastiyê dûr e. Zeman mirovan ji hev dûr dixe û li êşan êşê zêde dike. Navê din yê zeman çi ye?"
Dibe ku navê din êş be, an jî dema bê dawî be? An jî çîroka bê nav be.
Tîrêj jî weke min evîndarê jiyana gerîla û herêma Şehîd Kendal bû. Gelek şervanên nû anîbûn û gelek hevalên xwe di gorên ku bi destê xwe kolabûn de veşartibûn. Zûqî avê bûbû û ji hundirê wî dûmana agir bilind dibû. Bê rawestan li heman cihî mêze dikir. Bi laşê xwe belkî li cem me bû, lê bi fikir û raman dûr çûbû......
Tîrêj ketibû rêya dûr û weke bazdanvanekî dimeşiya. Çavên wî weke çavên nêçîrvanê li ser nêçîra xwe bûn. Weke evîndarê li ser rêya evîna xwe mat û melûl bûbû. Evîn û dijwarî, azadî û tenêtî xwe lê pêça bûn. Gurgura dengê avê bi rojên borî ve biribûn. Ti tiş nikariya ew ji wê demê derbixe. Weke teyr û bazê li ser nêçîra xwe zoq bûbû. Li vê herêmê di dilê xwe de bi sedan kul û keder veşartibûn. Di nava pora xwe de, bê jimar mûyên sipî bicih kiribûn. Pora sor nîve nîv sipî bûbû. Ji çavên zer tîrên dijwar der dibûn. Mirov dixwest bi Tîrêj re baxive û lê guhdarî bike. Belkî dengê avê destûr nedida. Bi tevî hêz û xweşikiya xwe li ber me diherikî. Dengê çûk û beqan li ber guhên Tîrêj bilind dibûn. Ji çavên wî rondik dihatin xwarê. Baş dihate fêmkirin ku li salên borî difikire û li ser demê kûr dibe.
Zeman çi tişt bû? ó yê kî bû? Azadî hebû, an na?
Kesekî bersiva vê pirsê dizanibû, yan na?
Zeman ji bo her kesî dijwar bû, yan ji bo me tenê wisa bû?   Jiyana her kesî weke ya me bû, an na?
Mirov çima li hemberî demê ew çend bê hêz bû? Ne diyar bû. ënsan guhertin çêdikir, an jî demê. Dem esas bû an jî însan. Di demên wiha de zeman hem derman û hem jî neyar e.Carna tenêtî dermanê her birînê ye. Lê carna jî neyarê xwe bi xwe ye. Naveke din yê demê jî êş e, kul û keder e. Zeman carna tê û bi xwe re veqetinê tîne. æş û derdan tîne. Carnan jî derbas dibe û li dû xwe birînên kûr dihêle. Birînên ku nayên derman kirin. Ne

dixtor ne hekîm û ne jî hevaltî nikarin vê birînê bipêçin. Carna ev êş ji ber birîna evînê ye, car na ji ber veqetinê ye.
Li cihên weke vir tevî birînên mirovan der dibin. Bîranîn li mirovan kom dibin. Lê carna jî zeman dermanê her birînê ye. Ji birînên kûr re dibe melhem û dipêçe. Tîrêj evîndarê Apê Musa, Gênc, Licê û Şehîd Kendal bû. Li van herêman mabû. Li ser herêma Şehîd Kendal, agahiyên min kêm bûn. Ji bo vê min ji hevalê Tîrêj xwest ku serhatiyê vê herêmê ji min re bêje. Li vê herêmê çi hatibû jiyîn?Di van deran re kî hatibû û kî derbas bûbû? Tîrêj hevalekî kevin bû û li ser herêma Amedê agahiyên wî hebûn. Min jê pirs kir? Ji ava gelî çend hevalan masî girtibûn? Çend kes di noqteya Qehwê de derbas bûbûn. Çend kes li vê herêmê di gorên bê navnîşan de radizan?Tîrêj pêşî nexwest bersiv bide min. Li hemberî pirsa min wiha got, 'Hevalê Azad, pirsan ji min meke, ev herêm jî weke herêmên din e.
Min Tîrêj nas dikir li vê herêmê çi pêk hatibû, min nizanibû, ez bi ser de çûm. Min got, li gor ku tu dizanî ji min re behsa herêmê bike. Ez ji te tiştê zêde naxwazim, li gor ku tu dizanî agahiyan bide min. Hinekî fikirî û hêdî hêdî dest bi axaftinê kir.
"Hevalê Azad, ez û tu em ji hev baş fêm dikin, madem tu dixwazî ezê ji te re behsa çend tiştan bikim. Serhatiyên vê herêmê gelek in. Berê li vê herêmê gelek heval hebûn, bi sedan hevalan li vir xebat dimeşandin. Keç û xortên qehreman hebûn, lê paşê yek bi yek şehîd ketin. Li van deran perwerde dihat dîtin. Li van deran qehremanî çêbûn, lê nehatin nivîsandin, ji wan hin di hişan de man, lê gelekî ji wan ji ber ku nehatin nivîsandin hatin jibîrkirin. Li vê herêmê berê herî kêm pênsed heval diman."
"Pênsed"...
"Erê erê, belkî zêde bû jî."
Pênsed heval ev jimar ji bo herêma Şehîd Kendal ne hindik bû jimarekî pir.. pir zêde bû.
"Hevalê Azad, li herêmê gelekî nuqteyên me hebûn, li Geliyê Zorê cihê me yê perwerdê hebû. Li vir hevalan perwerdeya siyasî û leşkerî didan, ev gundê ku tu dibînî û niha kevir li ser kevir nemaye, cihê perwerdê bû. Niha çiqas bêdeng e ne wisa."
Bi destê xwe, gundek hatî valakirin li hemberî me nîşanî min da.
"Erê ez dibînim:"
"Li vir şervanên nû dihatin perwerdekirin, carna rêz dirêj dibû cihê hevalan nedima. Şervanên nû ji vir bi herêmên hundir ve dihatin şandin. Ji vir heval diçûn yekîneyên din."
Herêma Şehîd Kendal di navbera eyaleta Amed û Xerza de bû. Herêma herî nêzî vir jî herêma Sason bû. Sason jî di navbera Amed û Xerza de bû. Ciyayên Sason ji Batmanê dest pê dikir û heya Qulpê dirêj dibûn. Li van her du herêman li her yekî taximek hevalên xort dima. Hevalên jin nikaribûn li van herêman bimînin. Gerîlatiya van herêman taybet bû.
Hevalê Tîrêj hinek xemgin bû û axaftina xwe wiha domand;
"Li vê herêmê gelekî hevalên hêja şehîd ketin, dem hat ku Sason bû cihê qetlîaman û cihê wendahiyan. Her roj şer çêdibû, di nav vî şerî de me her roj wendahî didan. Tevahiya jimara ku min ji tere got, roj hat tev belav bûn. Piştî wê jî li van her du herêman her yek taximek heval ma.
Li ber axaftina Tirêj min nikariya ez xwe bigrim. Em di rêyek dûr û bi êş de bûn. Di dilê me de gelek bûyerên bi êş veşartî bûn. Ez jî pêre di biraninên kûr ve diçûm. Dibûm rêhevalê Tirêj û yên din, bi wan re digeriyam. Em bi hev re di bîranînên kûr û dûr de diçûn. Ez diketim rêwîtiya dûr û zehmet, diketim nava girseya hevalan, nav artêşa şehîdan. Di nav wan de min ji xwe re cihek didît. Rêyên teng yên herêma Şehîd Kendal û deşta vala rê ne didan min. Ez di rêyên teng de asteng dibûm. Ji kemîn û operasyonan

derbas dibûm. Min carna li Ava Sarmê dida, di Çileyê zivistanê de em heya qirikê diketin ava weke cemedê. Dar tine bûn em ji xwe re agir dadin. Carna bi rêyên dûr ve diçûm, paşê dihatim ku kesek li benda min nemaye. Her hevalek bi cihekî ve çûye.
Gelek hevalên hêja bê destûr û bê xatir ji cem me çûbûn. Her hevalek li cihekî mabû. Her yek di goristanek bê navnîşan de bû. Yên navnîşana wan nediyar jî hebûn. Min carna pirsek wiha dikir;
Baş e ku navnîşana van hevalan nediyar e. Eger navnîşana wan diyar bûya, pêwîst bû me her deh metroyan gorek çêbikira. Yanî diviyabû di her deh metroyan de em bisekinîna û li hemberî şehîdan biketina rêz girtinê. Bê buman em li pey rêya wan bûn, lê jimara wan ewqas zêde bû, li ti goristanan nedihatin veşartin. Ji xwe navnîşana wan diyar bûya dijmin wê tev xera bikiran. Lê min carna jî wiha digot, xwezî navnîşana van hevalan diyar bûya, ez carna biçûma ser gora wan û bi wan re biaxiviyama. Mixabin gorên Binevş, Rozerîn, Celal û Faîq nediyar bûn.
Minê li ser gorên wan derd û kulên xwe bigotan. Belkî min nikaribû ez êstirên çavên xwe bigrim, lê ev ne pirsgirêk bû. Niha ew li çiyayên ku di bin bombe baranê de, di gorên nediyar de veşartî ne.
Agahiyên ku Tîrêj didan, min gav bi gav bi kûrahiya êşan ve dibirim û ez diketim xewjinên kûr. Piştî ku Tîrêj bi kinahî li ser herêmê agahî dan, li ser piratîka dawî rawestiya. Ji min re behsa hevalên herî dawiyê ku berî me hatibûn herêmê kir. Ev heval piştî demeke kurt ku hatibûn herêmê şehîd ketibûn. Li ser axaftina Tîrêj min serê xwe hejand û wiha bersiv da;
"Erê hevalê Tîrêj, min ew heval dîtibûn."
Min ew ji nêz ve nas dikirin. Em li biryargeha Amedê demek kin bi hev re mabûn. Dema em li biryargehê bûn, konferansa leşkerî ya eylaleta Amedê pêk dihat. Tevahiya gerîlayên li eyaletê beşdarî civînê bûbûn. Di vê civînê de ji bo çareseriya pirsgirêkan guftugo dihatin meşandin. Bi rojan li biryargehê civîn hatin lidarxistin. Di van çivînan de gelekî tişt hatibûn zimên. Kêmasî û tarzê dijmin yê şer hatibû şîrovekirin. Di konferansê de gelek biryar hatibûn girtin û ji bo herêmê taktîk û planên nû hatibûn diyarkirin. Serokatiya partiyê jî bi rêya telefonê beşdarî konferansê bûbû û li ser herêmê perspektîfên girîng dabûn. Civîn bi taybetî bi rêya telefonê ji aliyê serokatiya partiyê ve hatibû meşandin. Di vê konferansê de taxima Şehîd Kendal jî hebû. Ji ber şert û mercên herêmê yên dijwar, vê taximê ji hevalan hurmet didît. Piştî ku civîn bi bidawî bû heval ji bo biçin yekîneyên xwe dest bi amadekariyê kirin. Ji bo herêma Şehîd Kendal taximek ji hevalên xurt hatibû amadekirin. Ev taxim ji hevalên şareza û xwedî tecrûbe pêk dihat. Heval ji biryargehê bi moralekî xurt ketibûn ser rê. Piştî ku gihiştibûn herêmê di demeke kurt de ketibûn şer.
Roja ku heval ketîn şer ez û hevalek ji bo em muxabereya biryargehê pêk bînin em derketibûn serê Çiyayê Lîs. (Kel Tepe) Piştî ku me ji çend herêman agahî girt, bi carekî li ber çavê me dûman bilind bû. Dûmana şewata dijwar li ber çavê me pêl bi pêl bilind dibû û li ezmên belav dibû. Me hewl da em ji herêmê agahî bigrin û mijarê ronî bikin. Me çi kir nekarî em ji herêma Şehîd Kendal agahî bigrin. Ji cîhaza hevalan ti deng dernediket. Lê ji ya dijmin gelekî deng dihat, wisa xuya dikir ku dijmin di nav liv û tevgerê de bû. Ji aliyê din ve li ber çavê me agir pê diket. Me di heman wextê de bi lez bûyer ji hevalên biryargehê re ragihand. Biryargehê ji me xwest ku em bi hevalên herêma nêz Sason (Golav) re bikevin têkiliyê û mijarê ronî bikin. Herêma Sason û Şehîd Kendal li cem hev bûn. Li ser vê yekê, me bi hevalên herêma Sason re têkilî danî û mijar pirs kir. Li gor agahiyên ku hevalan dan me, taxima Şehîd Kendal bi roj bi dijmin re ketibû şer û rewşa

wan nebaş bû. Piştî ku heval dikevin şer tên dorpêçkirin û nikarin ji nav kemînê derkevin. Heval çi dikin nikarin ji nava dorpêça dijmin derbikevin. Li herêmê bi gîştî dozde heval diman. Heval hê nû çûbûn herêmê û li ser xebata herêmê plan û proje çêdikirin. Bi hatina wan re dijmin jî bi ser wan de çûbû. Li herêmê demekî dirêj bû ku çalakî nehatibûn lidarxistin. Ji bo plan û çalakiyan taximek hevalên zîrek çûbû herêmê. Rojekê ber destê şeveqê nobetdar hevalan ji xew şiyar dike. Ji cihazê dengê dijmin tê û gelekî nêz in. Heval tev radibin û li nav nuqteyê belav dibin. Lê mixabin dijmin ji berê de heval ferq kirine û dorpêç kirine. Heval li bendê ne ka leşker wê bi ser wan de werin yan na. Piştî çend saetan bi hezaran leşker li dor nuqtê kom dibin. Wê rojê bi deh hezaran leşker cerdevan û tîmên taybet dikevin herêmê. Her çiqas heval xwe ji şer dûr dikin û naxwazin bikevin şer jî, leşker bi ser wan de tên. Piştî ku leşker dikevin nav nokteyê şer dest pê dike.

Dem û zeman xwe radestî dengê çekên giran dike. Bi dengê çekan re herêm dibe weke cihê mahşerê. Şerek dijwar û ne li gor aliyan tê meşandin. Danê sibê şer dest pê dike û ne diyar e wê kengê bidawî bibe. Heval nizanin wê xwe çawa rizgar bikin. Ji bo ji nav şer derbikevin li benda şevê ne. Dema rêyekê bibînin wê ji nav şer derbikevin. Ji cîhaza dijmin rewşa operasyonê gur dibe. Li gor axaftinan dijmin li benda kobra û balafiran e. Eger rast be di nav çend deqeyan de wê kobrayên dijmin li jor diyar bibin. Di rewşeke wiha de divê heval cihê xwe biguherînin, eger vê yekê nekin ji sedî sed wê îmha bibin. Piştî şerek dijwar ku heval dibînin xilasî nîne, dixwazin cihê xwe bigorînin. Dem piştî nîvro ye, lê şer bi tevî dijwariya xwe dewam dike. Heval li hemberî dem, li hember şewatê û li hember artêşa bi hezar leşkerî li ber xwe didin. Agir bi herêmê ketiye û dişewite. Hindik maye ku agir bigîhîje cihê wan. Ji aliyê din ve li hember rojê berxwedan heye. Roj naçe ava û nabe şev.

Cebilxane jî her ku diçe kêm dibe, ji her alî ve dijmin tê û cebilxane têrê nake. Eger wisa biçe wê bê cebilxane bimînin. Hindik maye ku kobra serê xwe derxin û werin. Bi carekî li ezmên dengê kobrayan belav dibe. Tipatipa kobra ye li ser nuqteyê difirin. Dengê weke brûskan li her derî belav dibe. Kobra tên ser nuqtê û rokêtan davêjin. Bi hatina kobrayan re herêm dibe qadeke din ya şer. Her rokêtên ku têne avêtin herêm ji cihê xwe diheje. Xwendevan, Mazlum, Dijwar, Palo û Mahsun di nav şer de ne. Ji aliyê din ve jî bi hezaran leşker çekên giran, paşî jî kobra hatibûn. Kobrayên dijmin di nav dûmana agir de li ezman diçin û tên. Ji aliyekî ve agir bi herêmê ketiye dişewite, ji aliyê din ve jî kobra bi rêzê tên û li cihê hevalan didin.

Kobra her rokêta ku diavêje tê li nav nuqteyê dikeve û dike zirmînî.

Ji erdê dûman radibe û telaşê keviran wek gule bi doralî ve dipekin.Rêkêt du deng derdixin, yek dema ku diteqe û ya din jî li jorî çiyê tê. Yek, du sê kobra wisa rokêtan diavêjin ku her der diheje. Heval di cihê xwe de hatine girtin, dikin nakin nikarin ji nav kemînê derkevin. Herî dawî dibêjin eger em cihê xwe neguherînin xilasiya me tune ye. Dijmin bi hemû hêza xwe êrişê wan dike. Di demeke wiha de heval dixwazin yek bi yek cihê xwe bigorînin. Lê li hemberî ewçend çekên giran û kobrayan liv û tevger jî gelek bi xeter e.

Di şerê li Kurdistanê de wendahiyên gerîla bi giştî ji ber kobrayan bûn. Helîkopterên kobra di şer de gelekî dijwar bûn. Ji aliyê din ve ev kobra di şer de gelek bandor jî li gerîla dikirin.

Ne bi rokêt û guleyên xwe her wiha ji aliyê pîskolojîk ve jî li ser mirovan tesîr dikirin. Bi taybetî dengê wan mirov di cih de sar dikirin. Li ser şahadeta gelek hevalan êrişa kobrayan hatiye nivîsandin. Qatilê bi hezaran ciwanên Kurd kobrayên dijmin bûn. Bi

sedan heval bê dem ketibûn kemînê û jiyana xwe ji dest dabûn. Hevalên Şehîd Kendal jî di rewşeke wiha de bûn. Ketibûn kemîna dijmin û li êrişa kobrayan rast hatibûn.
Piştî ku dixwazin ji ber hedefa kobrayan derkevin û cihê xwe bigorînin, her hevalê ku ji cihê xwe dertê bi êrişa kobtayan dikeve erdê. Dozde heval dibin dozde stêrkên li ezman. 12 kulîlkên ser daran, dozde ciwanên ber dilên dayikan, li ser axa sar dirêj dibin. Dozde hevalên xwedî tecrûbe û şareza li herêma Şehîd Kendal ketibûn nav karwanê şehîdan. Dema me ev agahiya bi şewat girt piştî nîvro bû û hê jî şer dewam dikir. Şer dewam dikir û agir jî bi herêmê ketibû. Hem şer û hem jî şewat, dijwariyariya şerê li Kurdistanê nîşan dida. Min ev bûyer li ser Çiyayê Lîs(Kel Tepe) dil bi kul û bi çavê tije hêstir temaşe dikir. Ji çavê min, bê destûra min hêstir dibariyan û li ber min kom dibûn. Ji dilê min agir belav dibû û her parçeyekî bi cihekî ve diçû. Pizot, pizot li ser hev kom dibûn û dişewitandin. Li ber bûyereke wiha minê çawa xwe bigirta, ezê çawa weke zarokan negiriyama? Zarokên vî welatî li ser axa xwe dihatin kuştin. Mafên ku dixwestin çi bûn? Mafê jiyanek wek her mirovî wek her gelî bûn. Lê belê ev yek ji aliyê zîhniyeta faşîst ve nedihat qebulkirin. Berdêla Kurdbûnê û daxwaza mafan mirinbû. Di dilê min de kîn û nefretek kûr bi cih dibû. Di dilê min de ku weke gelî kûr bû bêhna tolhildanê tije dibû. Ev kîn û nefret wê bikira ku di rojên pêş ez bême herêma Şehîd Kendal û heyfa hevalên xwe bistînim.
Ji wê roja ku ev bûyer pêk hat ve min li ser Şehîd Kendal xeyal dikirin. Min roj bi roj dijmart heya ku ew roj hat û ez hatim. Ez û Mahsum em di perwerdeya destpêkê ya partiyê de bi hev re bûn. Mahsum piştî ku çûyî Şehîd Kendal, di nav wan 12 hevalan de şehîd ketibû. Hevalê Dijwar hevalekî Ciwan û zîrek bû, perwerdeya me ya leşkerî wî dabû. Em ji perwerdeya wî razî bûn. Hevalê Palo û Xwendevan bi hev re şehîd ketibûn. Şehîdbûna van hevalan di singê min de birînek kûr vekiribû. Ev bûyerên bi şewat û bikeser hem dilê min û hem jî dilê Tîrêj kul kiribûn.
Ez û Tîrêj em bi xewjînên şêrîn û bi êş ve çûbûn. Em weke salan axivîbûn û rehet bûbûn. Me tiştên di dilê xwe de careke din rave kiribûn. Tîrêj di vê navberê de wiha got;
"Ev hevaltî nebûya, ev heval nebûna, ma têkoşîn dihate meşandin? Hevalê Azad, eger ev nirx û kesên bi rûmet tine bûna, têkoşîna demdirêj wê çawa bihata meşandin. Eger ewqas şehîd nebûna gelê Kurt wê bi çi ve bihata girêdan. Wê çi tiştî em heya serê van çiyayên bilind baniyan û bidan şerkirin. Eger ev bîranîn nebûna, wateya dîrokê jî tîne bû, meyê weke niha çi par ve bikira. Van kesan ked dan û bi xwîna xwe dîroka me şûştin. Berê me ji xwe û dîroka xwe fedî dikir, lê niha em bi her tişê xwe serbilindin. Bi taybetî jî bi têkoşîna di bin rêberiya Serok Apo de."
Tîrêj axaftina xwe wiha dewam kir;
"Ya rast ev e, divê mirov nekeve bin têsîra bîranînan, lê ji aliyê din ve jî lazim e mirov ti car dîrok û rastiya xwe jibîr neke. Di nav tevgerek weke PKK'ê de ji bo mirov bikaribe demdirêj kar bimeşîne divê mirov li bûyeran neheliqe. Ji aliyê din ve dîsa ji bo mirov bikaribe demdirêj têbikoşe, divê mirov ti car ji rastiya xwe dûr nebe."
Tîrêj rast digot, ji bo mirov bikaribe demdirêj têbikoşe û bibiryar xebatê bike, divê mirov nekeve bin bandora bûyer û hevalan. Ji bo her şoreşgerekî pêwîst e ku bûyeran bi ilmî binirxîne. Dîroka xwe û rastiya xwe jibîr neke û li ser pêşerojê plan û bernameyan çêbike. Her roj li cihekî bûyerek çêdibû û heval weke stêrkan ji ezmên berjêr dibûn. Axaftinên Tîrêj ez birim cîhaneke din.
Ez dixwazim li vir hinekê behsa hevalekî ku ji bo min taybet bû bikim. Weke di axaftina min de jî diyar dibe, carna hin heval li ser mirovan gelek têsîrê dikin. Min di nav têkoşîna PKK'ê de, gelek heval nas kirin. Li herêmên cuda û bi hevalên cuda re ez mam. Ew roj ji bo min hem rojên xweş û hem jî yên dijwar bûn. Lê tiştek rast hebû, têkoşîna PKK'ê

mirov zû mezin dikirin. Li temenê min sal zêde dikirin. Ji wan hevalên ku em bi hev re mabûn, gelek ji wan şehîd ketin. Hin heval hene ku carna mirov xwe nêzî wan dibîne û bi wan re têkiliyên taybet datîne. Heya niha min heval bi gelemperî bi we dan naskirin, ez niha jî dixwazim li ser hinek aliyên wan rawestim. Ev hevalên ku ezê behsa wan bikim di rêwîtiya dûr de di demên xweş û bi şewat de em bi hev re bûn. Em bi hev re hem keniyan û hem jî hestiyar bûn. Yên ezê behsa wan bikim Tîrêj, Faîq û Celal in. Bîranînên wan rojan qet ji bîra min naçin. Li herêma Şehîd Remzî ku yekîneya min ya yekemîn bû, jimara me nêzî sih kesî bû. Lê ji nav hevalên ku ji kar fêm dikirin, baz didan û xebat dikirin Celal, Faîq û Tîrêj bûn. Hin hevalên din jî hebûn, lê yên navdar ev bûn. Di yekîneyê de herî zêde van hevalan kar dikirin. Hevalê Celal hevalê herî kevin yê ji Başûrê Rojavayê Kurdistanê bû. Celal gelekî xurt bû, di kar de kesekî weke wî lezgîn û zîrek tine bû. Di temenek piçûk de tevlî nav refên gerîla bûbû. Ji rêwîtiyek dûr ji Başûrê Rojavayê Kurdistanê heya Amedê hatibû. Li Amedê gelek bûyer dîtibûn û jiyabû. Carna behsa herêmê dikir û wiha di got, berê ev gundên vala tev tije bûn. Dema behsa wan rojan dikir, em di cihê xwe de sar dibûn û me li dor xwe, li gund û çiyayan mêze dikir. Ji bo zîrekiya wî me navê kobra Celal lê kiribû. Weke kobra lezgîn bû û di kar de jî gelek zîrek bû. Ji ber ku pir zîrek bû û dixwest karê xwe zû bike, tim li hespekî siwar bû. Her roj me mêze dikir, Celal hespek nû aniye û bi cihekî ve diçe.
Liyek din ya balkêş jî axaftina wî bû. Bi zimanê Tirkî qet nizanibû. Tenê çen hevokên weke (nasilsin, îyîmîsîn napiyorsin yo) weke din nizanibû...
Her roj hinek hevokên Tirkî fêr dibû û yarî dikirin. Bi zimanê nîv Tirkî û nîv Kurdiya Rojava yarî dikirin. Bi wan yariyan em ji xwe diçûn, em li şûna xwe ziwa dibûn û pê dikeniyan.
Hevalekî din ku ji bo min xwedî cihek taybet bû Faîq bû. Ji Bakûrê Kurdistanê ji bajarê Semsûrê ji malbatek Elewî bû. Ew jî weke Celal û Tîrêj hevalekî gelekî dilpak û jêhatî bû. Ti karî ji hev cuda nedikirin. Çi kar hebûya bi daxwaza xwe dikir. Min bi van hevalan re salên ku ez qet ji bîr nakim, derbas kirin. Ez hê jî wan rojan bibîr tînim û hêviya xwe bi wan rojan tînim. Faîq hevalek mamoste bû, di her warî de jêhatî bû û ji alîkariyê gelek hes dikir. Li Amedê yek ji hevalên ku min jê re sifatê fermandarê PKK'ê bikar dianya ew bû. Ez jê fêrî gelek tiştan bûm. Tişta ku wî weke zana û mamoste nîşan dida axaftina wî û sernermiya wî bû. Ji malbatek Elewiyê asîmilebûyî bû, lê di nav gerîla de xwe fêrî axaftina Kurdî kiribû. Bi hevalên ku Kurdî nizanibûn re danûstandinek baş dikir. Hevalên ji Rojhilat, Rojava û ji Başûr, ji ber ku hevalek ji bakûrê Kurdistanê û ji Semsûrê xwe fêrî Kurdî kiribû û bi wan re bi Kurdî diaxivî, pir jê hes dikirin. Ev jî aliyek din bû ku Faîq dida heskirin.
Hevalekî din ku di vê çîrokê de xwedî roleke qehremaniyê bû Tîrêj bû. Navbera min û wî gelek xweş bû. Me di gelek waran de ji hev fêm dikir û li hev dikir. Di navbera me de hevaltiyek cuda hebû. Me ji hev re her tiştê xwe digot. Ji yekîneya Şehîd Remzî (Yekîneya Licê) ve me hev nas dikir. Dema ez çûyîm yekîneya Şehîd Remzî Tîrêj li wê derê bû. Em di pratikê de çend salan bi hev re man. Çend salên ku weke temenekî dirêj bû, me bi hev re derbas kirin. Li gelek herêmên eyaleta Amedê mabû û herêm baş dinasî. Em gelek caran bi hev re diçûn wezîfeyê.
Carna em bi hev re ji bo kar diçûn herêmên dûr. Ji wê demê bîranînekî me heye ku qet ji bira min naçe. Em carek ji herêma Şehîd Remzî li ser bangê çûbûn biryargehê. Fermandarê biryargehê ji yekîneya me xwest ku em tîmek ji sê hevalan amade bikin û bişînin herêma Gêncê. Ev sê heval wê biçûna Gencê û hin pêdivî bianiyan. Berpirsiyarê yekîneya me li ser daxwaza biryargehê sê kesên ku ez jî di nav de bûm kifş kirin. Li gor

planê ez, Kawa û Tîrêj, emê biçûna Gêncê. Rêzanê me jî hevalê Tîrêj bû. Berê li herêma Gencê mabû û herêm baş nas dikir. Danê êvarê em ketin rê û bi herêma Gencê ve çûn. Weke bayê bi coş em ji cem hevalan veqetiyan. Em gav bi gav ji biryargehê dûr dibûn û bi herêmeke xerîb ve diçûn. Kawa û Tîrêj ji vê rêwîtiyê re ne xerîp bûn, berê her du li wir mabûn. Lê ez ji vê rêwîtiyê re xerîb bûm, ez berê neçûbûm Gêncê. Ev rêwîtî ji bo min rêwîtiyek xweş û balkêş bû. Em sê kes bûn û her yek ji me, xwedî taybetmendiyek cuda bû. Min ji meş û rêwîtiya dûr pir hes dikir. Kawa hevalek kevin bû û di şer de xwedî tecrûbe bû. Tîrêj rêzanê rêyan bû û herêma Gêncê jî baş nas dikir. Em sê heval di karekî wiha xweş de hatibûn cem hev. Li pêş Tîrêj, li pey Kawa û ez li pey wan bûm. Em ji herêma biryargehê derketin û ketin nav herêma Gêncê.
Dema em gihîştin herêmê operasyon çêbûbû û me heval li cihê wan nedîtin. Vê carê em ketin pey rêça hevalan. Lê mixabin me nedîtin. Yekîneya Gêncê dema artêşa Tirk operasyon li dar dixe cihê xwe diguherînin. Piştî ku me nedîtin vê carê jî pîlên cîhaza me xillas bûn û em li wê navê man. Têkiliya me ji her kesî qut bû û em li holê man. Di nav operasyonê de em ketin pey rêça hevalan. Bêşensiya me bi carekê bi ser hev de hatibû. Ji aliyekî ve me herêm baş nas nedikir, ji aliyê di ve operasyon derket û cîhaza me jî xira bû.
Operasyon berfireh bû û em di nav de, vir de wir de diçûn. Nêzî hefteyekî em bê çare di vê rewşê de man. Rojeke wiha rêya me ket gundê Ezdînan. Dinya careke din bûbû şeva reş. Gundên herêmê tev hatibûn valakirin. Tîrêj got li pêşiya me gundek heye, em biçin nan bixwin û ji xwe re hin pêxwarin bigrin. Her wiha emê li ser operasyonê agahî jî bigrin. Gundê Ezdînan di nava geliyekî kûr de bû. Li her aliyê gund çiyayên bilind hebûn. Gund di newalek de bû û di nav de robarek gur derbas dibû. Li ber avê darê goz û biyan yên bilind hebûn. Ev dar li ber avê bilind bûbûn û li ber hev rêz bûbûn. Şevek gelek tarî bû. Berî em bikevin nava gund Tîrêj got li vî gundî malbatek welatparêz heye, em biçin mala wan. Keçeke wan di nava refên gerîla de ye. Li jorî gund çeperên dijmin hebûn, me çeper di ber çavan de derbas kirin. Kes di wan de tine bû. Piştî ku kesek nebû, me xwe ber bi gund ve berda. Em ketin nava gund û ber bi wê malê ve çûn. Me li deriyê malê xist û em ketin hundir. Xwediyê malê bi kêfxweşî em pêşxwazî kirin. Heya derengiya şevê em bi xwediyê malê re axivîn.
Piştî ku dema çûnê hat, me ji xwediyê malê xatirê xwe xwest û em dîsa ketin ser rê. Ji ber ku gund di çalê de bû, me bi zorê hev didît. Em ji malê derketin û ber bi newalê ve berjêr bûn. Dema em hatin ber avê ji ber ku dinya tarî bû em bi zehmetî di ser de derbas bûn. Heya em derbas bûn em tev şil bûn. Piştî derbas bûnê, me berê xwe da çiyayê bilind. Li pêşiya me çiyayekî bilind hebû. Berî ku dinya ronî bibûya, diviya me ji xwe re cihek baş bidîta. Em çiqas dimeşiyan çiya xilas nedibû û rê jî bidawî nedibû. Em wê şevê heya berdestê şeveqê meşiyan.
Piştî demekî li ser rê fifakarên me zêde dibûn. Em dimeşiyan lê rêya me bidawî nedibû. Em şaş bûn ma ev çiya ewqasî bilind bû û rêya me ewqasî dirêj bû? Wê şevê ji ber ku şev gelekî tarî bû Tîrêj rê şaş kiribû. Lê wî bi xwe jî nizanibû ku rê şaş kiriye. Em ji rêya dûr hatibûn û em gelekî westiyabûn. Di wê şevê de ku em gelekî westiya bûn, di ser de em du caran, li dora çiyê geriyabûn. Piştî ku gumanên me zêde bûn, hevalê Kawa ji Tîrêj pirs kir;
"Hevalê Tîrêj, em di rêya rast de ne, an na? Em li dû xwe nevegeriyabin? Tu baş dizanî, em li ser rêya rast in?"
"Hevalê Kawa, rêya me rast e, ev çend saet in em li ser rêya xwe dimeşin, hindik maye em bigîhîjin rêya sereke û ji vî çiyayî xilas bibin. Hindik maye em derbasî aliyê din bibin."

Çiya tijî dar bûn, me nikariya em di nav de bimeşin. Me dixwest em demeke zû ji vî çiyayê asê xilas bibin. Kawa û Tîrêj bi hev re hêrs bûn, min xwest ez wan haşt bikim.
"Baş e niha emê bibînin ka rêya me rast e an na, eger rêya me şaş be wê nîşana ku em di ber re derbas bûn, emê bibînin. Na eger rêya me ne şaş be, ji xwe emê di rêya xwe de bimeşin."
Hevalê Kawa di vê navberê de gelekî aciz bûbû hindik mabû bi Tîrêj ve biqîre.
Kawa bi hêrs wiha got"
"De baş e, hevalê Tîrêj, eger em şaş hatibin ji xwe li pêşiya me bi qasî sed mêtroyan ew goristana ku em di ber de derbas bûyîn emê bibînin. Na eger em rast hatibin ji xwe emê rêya xwe dewam bikin û heya cihek baş bimeşin."
Diviya berî ku dinya ronî bibe, em ji xwe re cihek baş bibînin. Goristana ku me behsê dikir li pêşiya me bû. Dema em ji gundê Ezdînan derketîn û ketîn ser rê, em di ber de derbas bûbûn. Goristan ji çend goran pêk dihat û li dor bi keviran dîwarek hatibû lêkirin. Wê demê me ji Tîrêj pirs kiribû ka ew goristan çi ye.
Tîrêj bersivek wiha dabû me" 'ev goristana şehîdên Kurdan e, lewma li serê çiya hatiye çêkirin. Gel xwedî lê dertê û diparêze. Piştr e em di ber de derbas bûbûn. Di vê navberê de hêrsa me jî zêde bûbû. Piştî deh deqeyan ku axaftina me hê bi dawî nebûbû, di wê şeva tarî de bi carekî em hatin û li ber goristana ku me behsa wê dikir rawestiyan.
Niha baş diyar bû ku em di rêya şaş de bûn. Yanî em nêzî çend saetan di rêya şaş de meşiyabûn. Bi vê westandinê min li hemberî wê bûyerê xwe negirt û ez keniyam. Minê çi bikira min baş dizanibû ku hevalê Tîrêj bê sûc e. Ji ber ku di nav hewldanekî xurt û hêja de ji me re rêberî dikir. Min qet jê guman nedikirin û jê aciz nedibûm. Tenê ji ber ku ez pê keniyam hinek madê xwe xira kir. Lê hevalê Kawa weke min nêz nebû. Li hember vê bûyerê xwe negirt û gelekî aciz bû. Pir aciz bû û ji bo neqîre xwe bi zorê digirt. Vir de diçû, wir de diçû, li dor xwe digeriya û axaftinên giran dikirin.
"Tîrêj te dît, ka em di rêya rast de bûn, ev çend saet in em di rêya şaş de dimeşin. ëcar tu wê xwe çawa xilas bikî. Ji vê saetê emê bi ku de biçin?"
Tîrêj rûyê xwe tirş kir û nikaribû tiştekî bêje. Ew bi xwe jî ji ber vê bûyerê gelekî aciz bûbû. Em gelekî meşiyabûn û hê jî rêya me mabû. Tîrêj di nava xwe de ji xwe pirs dikirin. Ev bûyer li wî jî giran hatibû. Bi dengekî nizim û weke kesekî xwe sûcdar bibîne, bi xemgînê wiha got"
"Wer xuya dike min rê jibîr kiriye, demeke dirêj e ez nehatime vê herêmê, piştî salan mirov hin tiştan jibîr dike. Ez li van deran tev geriyabûm, min çawa jibîr kiriye, ez jî nizanim."
Wê rojê em hem bi hev re keniyan û hem jî bi hev re aciz bûn. Demek bi êş û bi kenok bû. Ew roja bi kenok qet ji bîra min naçe. Em bi wê westandinê du caran li dora çiyayekî bilind geriyabûn. Bi vê bûyerê me gelekî wext jî wenda kiribû. Me çi bikira ev tenê kêmasiyek piçûk bû. Bûyerên bi vî rengî di nav gerîla de gelek car çêdibûn. Me dîsa berê xwe da rêya ku emê tê re biçin. Piştî vegerê ev bîranîn ji bo me her sê hevalan bû mijareke sereke.
Bîranînên me yên weke van gelek in ku me bi hev re derbas kirîn. Em di yekîneya Şehîd Remzî de bi hev re gelekî mabûn. Paşê ew çûbû Şehîd Kendal. Bi belavbûnekî, ez jî hatim cem wî. Me hev li wir jî dît. Li Şehîd Kendal rojên baş û xweş me bi hev re derbas kirin. Ev herêm ji bo me weke pirtûka dîrokê bû. Ne serî û ne jî dawiya wê hebû. Me ji xwe re ji nav vê pirtûkê çend rûpel hilbijartin. Di pirtûka dîrokê de gelek rûpelên cuda hebûn. Êş hebû, hest hebûn, şahî û kêfxweşî hebûn. Di rûpelên ku ji bo me hatibûn hilbijartin de, me gelek tiştên xweş qeyd kirin.

Me bi hev re êş kişand, em bi hev re birçî û tî man. Di mehên zifistanê de me xwe bi hev re di nav ava qeşayê de di şûşt. Li ser pişta hespê em bi hev re ji rêya dûr diketin pêşbirkê. Ne ba û ne jî zeman digîhîşt me, em li pêşiya her tiştî dimeşiyan. Ev bûyer ji me re dibûn nasname. Em li herêmek gelek xweş bûn. Li herêmek şert û mercên gelek zehmet, em bi hev re bûn. Li Şehîd Kendal ez û Tîrêj em careke din bi hev re bûn û me bi hev re bîranîn par ve dikirin.
Li Geliyê Zorê di bin darên bilind de me plana çalakiyan çêdikir. 15'ê Tebaxê nêz dibû, ji bo vê roja dîrokî me plana çalakiyan amade dikir. Hedefa me çalakiyek li navenda Farqînê bû. Em jî weke herêmên din di nava liv û tevgerek xurt de bûn. Me xebata xwe bi dawî kiribû û em li benda wê roja pîroz bûn. Me tevî aliyên çalakiyê di ber çavan re derbas kirin. Ji aliyekî ve di rojeva me de rewşa serok hebû, ji aliyê din ve jî me plana çalakiyan dikir. Ne em bi tenê tevahiya hêzên gerîla ji bo çalakiyan plan û bername amade dikirin. Mijara me ya sereke rewşa serok bû. Daxwiyanî û talîmatên di vê demê de bihatina dayîn ji bo me gelek girîng bûn. Di demeke wiha de daxwiyaniya serok ya paşvekişîna Başûrê Kurdistanê kete rojevê. Li gor vê daxwiyaniyê tevî hêzên gerîla wê ji Bakûrê Kurdistanê biçûna başûr. Vê daxwiyaniyê li ser me hêzên gerîla bandorek neyînî kiribû. Ji ber ku mijar ne ronî bû û gelek tevlîhev bû nedihate fêmkirin. Talîmat hatibû dayîn, emê ji bakûr biçûna başûr. Vekişîn li me gelekî giran dihat. Navê vekişînê bi xwe jî giran bû, me nikaribû em bi lêv bikin. Me ji xwe pirs dikirin; meyê çawa çeperên xwe berdan û emê biçûna başûr. Di serê me de gelekî nakokî hebûn, lê kesekî nikaribû yekî din serwext bike.
Bi vê biryarê re me tevî planên xwe dabûn sekinandin. Piştî talîmata serok biryargeh ji tevî yekîneyan re talîmatek şand. Dihate xwestin ku her yekîne tevahiya karên xwe bidin sekinandin û werin biryargehê. Her wiha dihat xwestin ku çalakiyan bidin sekinandin. Me mijara vekişînê baş fêm nekiribû û me nedixwest em ji van deran biçin. Lê ji bo me mijar ronî bikira, me dixwest em zû biçin biryargehê û fêr bibin. Bi vê daxwazê me dest bi kar kir û tiştên xwe kom kirin. Ji ber ku em ji van deran diçûn û em pir aciz dibûn. Piştî me tiştên xwe kom kirin, em ketin ser rêya biryargehê. Ji dilê me çîzînî dihat der. Emê çawa ji van deran biçûna. Herêm bi herêm çeper bi çeper, meyê çawa berdan. Di dilê me de xemgîniyek bi êş hebû û nava me dişewitand. Em di kû re derbas dibûn, dema derbasbûyî dihat bîra me. Meyê ew çawa li vir bihiştan. Li ser her girekî, li ber her çem û her kaniyê wêneyên hevalên me hebûn. Meyê çawa xatirê xwe ji wan bixwesta. Me dizanibû eger em ji van deran biçin, êdî em nikarin bên. Çûyîn zor û bi êş bû, lê careke din veger zehmetir bû. Ji rêya dûr û di demeke cuda de wê kî bihata. An jî ev fersend wê ji bo me bihata dayîn? Fersenda vegerê wê bi destê me biketa, an na? Ev baweriyek gelekî sivik û ji rastiyê jî dûr bû.
Em di hin cihan de derbas bûn û hatin Mezra Miho û Goma Elî. Dema em hatin ber çemê Mezra Miho komeke heval ji bo biçin Başûrê Kurdistanê amade bûn. Di bin rêveberiya Dr, Elî û Doxan de komek ji 60 hevalan amade bûn. Komek bi jimar pir zêde bû, lê dihat gotin ku wê di rê de ji hev cuda bibin. Koma yekemîn nêzî 30 kesî ketibû rê û gihîştibûn Sasonê. Dema em gihiştin cem koma duemîn, em bi torenê hatin pêşwazîkirin. Di vê komê de gelekî hevalên ku min nas dikirin jî hebûn. Di vê navberê de hêzên biryargehê jî li nuqteyekî jor bûn. Ev nuqteya ku hêzên biryargehê lê diman, nuqteya yekemîn bu ku min hêzên biryargehê dîtibûn. Yanî bi kurtasî dema ez hê nû tevlî refên gerîla bûyîm, ji Sasonê ez hatibûm vê nuqteyê. Li vê nuqteyê min hevalên hêza biryargehê dîtibûn. ó her wiha axaftina min ya yekemîn ya bi fermî jî li vê nuqteyê pêk hatibû. Fermandarê biryaregehê bang li min kiribû û bi min re hevdîtinek çêkiribû. Ev

nuqte ji bo min gelekî bi wate bû. Ev nuqte çawa ji min re bûbû cihek yekemîn wê bibûya cihê dawiyê jî. Çend rojan em li jêr li ber çem, li cem koma ku wê biçûna başûr man. Pişt re biryargehê bang li koma me kir. Li ber ava çem me xatirê xwe ji hev xwest, koma li ser rê bi aliyê başûr ve çûn, em ji bi aliyê biryargehê ve ketin ser rê. Ev kom wê di rêya Xerza de biçûya. Di çiyayên asê yên Xerza de heya başûr wê bimeşiyana. Li ser rêya hevalan gelek gundên cerdevanan hebûn. Zor û zehmetiya rêwîtiyê ji destpêkê ve xuya dikir. Koma dirêj ku dawiya wê xuya nedikir, li dû hev rêzkirî dimeşiyan. Li pêşiya me jî çiyayek bilind hebû. Dema em gihîştin cem hêzên biryargehê gelekî heval li wir amade bûn. Dem her ku duçû kêm dibû, diviya di demek kin de heval biçin başûr. Biryargeha Amedê di demek kin de komên hevalan amade dikir û dişandin. Ev dem ji bo koma me jî derbas dibû. Dema em gihiştin biryargehê hevalan dest bi amadekariya komeke nû kirin. Piştî çend rojan hevalên çûyîn kar hatin û komek din ji bo rê amade bû. Rêveberên biryargehê yek bi yek hevalên koma sêemîn jî diyar kirin. Di vê koma sêemîn de ez jî hebûm. Dibû koma sêemîn ku heval ji Amedê diketin rê. Em rêwî bûn lê dilê me dişewitî. Li pêşiya me dîsa veqetîn hebû, emê dîsa ji hevalan veqetiyan. Li biryargehê gelek hevalên ji herêmên cuda hebûn, ti kesî nedixwest biçe. Yekemîn car bû ku me ewçend heval li biryargehê didîtin. Her wiha li biryargehê hevalên ku ji başûr hatibûn jî hebûn. Ji kongra PKK"ê ya 6"emîn hevalên ku hatibûn jî gihiştibûn bakûr. Du komên hevalan di vê dema vekişînê de xwe gihandibûn Amedê û rawestiyabûn. Komek ji bo herêma Erziromê hatibû, koma din jî ji bo Dêrsimê. Dema komên hevalan gihiştin Amedê banga vekişînê hatibû kirin. Ev heval nêzî mehekî meşiyabûn. Di rê de gelek zehmetî jî dîtibûn. Ketibûn kemîn û operasyonan û şer kiribûn. Dema behsa rêwîtiya xwe dikirin em şaş dibûn. Digotin em mehekê meşiyan. Mehekî demek gelekî dirêj bû, bi meşê dawî li vê rêyê nedihat. Ev heval jî wê di nav koman de bihatana bi cihkirin û vegeriyana başûr. Min berê başûrê Kurdistanê nedîtibû, her wiha bi tenê min navê Qendîlê bîhîstibû. Li ser Qendîlê gelek tişt dihatin gotin. Ji niha ve cihên cuda û hevalên cuda dihatin ber çavên me. Me ji xwe re digot, 'emê di vê rêya dirêj de gelekî hevalan bibînin. Û her wiha emê cihên cuda yên Kurdistanê jî bibînin.

Botan, Gabar, Qato, Geliyê Hêzîl, Faraşîn, Kelareş, Çadiran, Zaxros û Qendîl. Emê di tevî van deran de bigeriyan. Emê ji Amedê heya Qendîlê biçûna. Ev pirs di serê tevî hevalan de hebû. Di serê me de gelek pirs hebûn, lê bê bersiv bûn.

Ji bo me bersiva pirsên xwe bigirta, emê heya başûr biçûna. Piştî guftûgoyekê, navên hevalên ku wê di koma me de cih bigirtan diyar bûn. Di koma me de hin hevalên ku ji başûr hatibûn û vedigeriyan jî hebûn. Ev heval wê di rê de herêman nîşanî me bidan. Weke her carê dîsa torena veqetînê hat amadekirin. Me yek bi yek xatirê xwe ji tevî hevalan xwest û em ketin ser rê. Ev vegetîn ji yên berê gelekî cuda bû. Dem cuda bû û armanc cuda bû. Vê carê rê dûr bû û ne diyar bû ka emê careke din vegerin an na. Li başûr meyê hev bitdîta an na. Weke berê di vê xatirxwestinê de jî ev hevoka ku gelek car dihat gotin, careke din xwe dubare dikir. 'Emê hev bibînin, li xwe baş mêze bike. Serkeftin.

Ji bo min tiştê herî baş ew bû ku di koma me de gelek hevalên ku min ji nêz ve nas dikirin hebûn. Rêwîtiyek ewqas dûr jî encax wisa derbas dibû. Her wiha di vê komê de ez û Tîrêj careke din em bi hev re bûn. Careke din daxwaza min pêk hatibû. Dema navê min û Tîrêj di yek komê de hat diyarkirin, ez pir kêfxweş bûm. Rêya me ya dûr û bi şewat ji Geliyê Kûviyan bi dilên kul dest pê kir. Em ne tenê ji hevalên xwe dûr dibûn em ji tevî gelî, çem, newal, çiya, gund û dostan dûr dibûn. Ev herêma ku bi salan em xwedî kiribû, nan û av dabû me, em jê vediqetiyan. Ev cihên ku ketibûn wêneyên me û di nav

helbestên me de cih girtibûn, li pey me diman. Em gav bi gav û roj bi roj ji Amedê ji warê egîdan dûr dibûn. Di vê rêwîtiyê de meyê gelek herêmên Kurdistanê bidîtan. Şensê min hebû ku di rêwîtiyeke wiha dirêj de hevalên baş û nas li cem min bûn. Ne wisa bûya ev rêwîtî nedihat kişandin û bidawî nedihat. Ez û Tîrêj heya başûrê Kurdistanê em bi hev re bûn, minê çi bi xwesta. Rêwîtiya me bi giştî mehekê diajot. Em di rojên xweş û ne xweş de, li cem hev bûn. Li ser rêya dûr bi bîranînên kûr bi hev re bûn. Di rê de dema agahiyek nebaş bihata meyê hev teselî bikira.
Di rêwîtiya xwe de her wiha şêweyê jiyana herêman jî meyê bidîta. Li ser axa çar perçeyên Kurdistanê, hêzek bi hezaran gerîla hebû. Bê guman gelek aliyên wan yên cuda jî hebûn. Ev meş ji me re dibû tecrûbeyeke weke ya deh salan. Kesek deh salan di nav partiyê de bimaya, di nav çend mehan de ewqas herêm nas nedikirin. Ji aliyê din ve ji ber ku em ji herêma xwe diçûn em xemgîn bûn. Xemgînî û kêfxweşî di heman wextê de dihat jiyîn. Di nav demeke kurt de me tarîxek kin derbas dikir. Hevalên ku di van rêyan de hatibûn, herêm bi herêm nîşanî me didan. Cihên bi xeter û cihên ku kemîn lê dihatin danîn nîşanî me didan. Di rojeke wiha de me rêwîtiya xwe dewam dikir. Em li ser çiyayên bilind yên Geliyê Hêzîlê dimeşiyan. Çiya ewqasî asê û bilind bûn, em ditirsandin. Lê bi rastî meşa di van çiyayan de moral dida me û cihên gelek xweş bûn. Di meşa van çiyayan de mirov bi ciwantiya xwe ve diçû. Geliyê Hêzîlê di nav çiyayên bilind û asê de weke çîrokekê xuya dikir û mirov mat dihişt. Em bi meşa li vir bi cîhanek din ve diçûn. Di rojek wiha de ku em dimeşiyan min mêze kir ku moralê Tîrêj tine. Li vir ji ser van çiyayan çawa dibû ku moralê mirovan xira bibe. Her kes bi hewa gelî moral digirt, lê Tîrêj bê moral bû. Li ser vê yekê min jê pirs kir, lê ewî ji min re tiştek negot. Bersiva min neda, lê diyar bû ku xemgîn e. Heval ji rewşa hev baş fêm dikin, min baş fêm dikir ku xemgîn e, lê nedixwest ku heval xemgîniya wî bizanibin. Piştî ku min hinek israr kir neçar ma û wiha got"
"Hevalê Azad, baş e ezê ji te re bêjim,lê tu ji hevalên din re nebêjî, bila li ser vê bûyerê moralê wan xira nebe:"
Bi dengekî nizim diaxivî, em hem dimeşiyan û hem jî diaxivîn. Berê me li ser ava geliyê Hêzilê û li ser çiya bû. Geliyek gelekî kûr bû, em li nîvê çiyayê ku bi ser gelî ve bilind dibû, dimeşiyan. Çiya pir asê û pir bilind bû. Min jê re got, bêje soz, ez ji kesekî re nabêjim:
"Hevalê Azad, guhdarî bike, îro min di cîhaz de bihîst hevalê Wedat şehîd ketiye, hevalan li ser vê yekê tekmîl dan û min jî bihîst."
"Li kû, çawa?"
"Li gor agahiyan li Şehîd Kendal ketiye kemînê, piştî ku gelekî li ber xwe dide, tê dorpêç kirin û şehîd dikeve."
Piştî ku em ji Amedê dikevin rê, Wedat careke din vedigere herêma Şehîd Kendal. Ji xwe ew bi tenê hêrêm baş nas dikir. Ji bilî wî kesek din ku herêm baş nas dikir nemabû. Li herêmê gelekî tiştên me hebûn. Ji cebilxanê bigrin heya zexîre û dostên nas. Li tevî herêman heval diman. Wedat li herêma Şehîd Kendal bi tenê mabû, tevî hevalên nas ji cem çûbûn. Ne ez, ne Tîrêj, ne Ozan û ne jî Çekdar, kes li cem nemabû. Dema em li Şehîd Kendal bûn ew jî li wir bû. Li herêmê hevalê herî kevin ew bû. Em ber bi başûrê Kurdistanê ve ketibûn rê, Wedat jî bi Şehît Kendal ve çûbû. Lê ew weke me ne bi şens bû. Tîrêj serê xwe xwar kir, çavê xwe paqij kir û wiha got;
"Xwezî em li cem bûna, em li cem bûna meyê rizgar bikira, me nedihişt şehîd bikeve."
Destên xwe di nav pora xwe de bir anî û ji dil axînî kişand. ædî ji destê me tiştek nedihat, tiştê ji destê me dihat jî teselî dayîna hev bû. Me tiştekî din jî nikaribû bikira.

Wedat ne yê despêkê bû û ne jî yê dawiyê. Berî wî jî çûbûn û wê piştî wî jî biçûna. Ev çîrokek bû, ne navê wê hebû û ne jî usula wê diyar bû. Her dem hevalek bi xwe re dibir. Rêwîtiya me heya Başurê Kurdistanê dewam kir. Heya dawiya rêya xwe em bi saxlemî hatin. Yek ji komên ku bi saxlemî rêwîtiya xwe bi dawî kir koma me bû. Em di operasyon û kemînan de derbas bûn, lê heya başûrê Kurdistanê, me ti wendahî nehan. Di koma me de hevalên ji başûr hatîn hebûn. Belkî ji ber vê yekê bû em heya başûr saxlem çûn. Min xwe weke hevalekî ku rê nas nake nedidît. Bi her awayî me rola xwe dilîst. Hevalên ku rê nas dikirin herêm nîşanî me didan û didan nasandin. Dema em ji Amedê ketîn rê me ji xwe re neh pozên wêneyan kirîbûn. Hevalên ji başûr hatîn ev mijar baş dizanibûn.Ji ber ku êdî wê fersenda me ya kişandina wêneyan tinebûya. Li herêmên hundir derfetên me tinebûn ku em wêneyan bikşînin. Lê ji ber ku êdî em ji herêmê diçûn, me got vê carê emê bi dilê xwe wêneyan bikşînin. Ji Amedê me dest bi kişandina wêneyan kir heya başûrê Kurdistanê.Li her cihê ku li gorî me xweş bû me wêne kişandin. Di rê de kîjan heval cihek xweş didît digot, ka em li vir wêneyekê bikşînin. Rêwîtiya ku me ji Amedê dabû destpêkirin, wek fîlmekê li Qendîlê bidawî bû. Em ketibûn herêmên azadkirî, me li dû xwe roj û hefte hiştibûn. Em ketibûn nav hevalên başûr. Ev der Başurê Kurdistanê bû. Li vir her tişt bi zêdehî hebû.

Qendîl

Başûr ji me re gelekî cuda dihat. Jiyana başûr rewşa başûr ji ya bakûr gelekî cuda bû. Em gihiştin Qendîl û di qampan de bi cih bûn. Tevî hêzên bakûr em li herêma Qendîlê bûn. Bi taybetî jî em li qampa Şehîd Eşref bi cih bûn. Li kampa me jimara hevalên ku ji bakûr hatîn, nêzî heşsed kesî bû. Kom bi kom heval dihatin û li dora Qendîlê bi cih dibûn. Despêkê em di qampekî de bi cih bûn, lê paşê jimara qampan bi hatina komên hevalan re zêde bûn. Jimara me ewqasî zêde bû, jimara qampa bû dido û paşê jî bû sisê.
Qampa yekemîn ya Tirkî bû, piştî demekî din qampekî din jî hate avakirin. Ev qamp jî ji bo dibistana Kurdî bû. Piştî demekî ku du kampan têrî me nekir, me kampa sêemîn jî çêkir. Li Qendîlê li kampa Şehîd Eşref êdî ne du kamp, sê kampên me hebûn. Bi giştî hejmara me nêzî heşsed hevalî bû. Bê guman ev jimara zêde bi xwe re berpirsiyarî jî dianî. Pirsgirêkên kampan her ku diçû zêde dibûn. Piraniya karê me, perwerde bû. Ji şeveqê heya êvarê perwerde hebû. Bi şev jî perwerdeya şevê-Etut- hebû. Ev perwerde ne bi rojan bi hefte û bi mehan dewam kir. Piştî em gihîştîn başûr vê carê em li benda hevalên ku ji bakûr dihatin man. Çavê me li rêya wan bû. Ez û Tîrêj em li başûrê Kurdîstanê di yek qampê de bûn. Her wiha yekîneya me jî yek bû. Li Başûr li ser hev civîn û toren çêdibûn, rêvebirên rêxistinê beşdarî van civînan dibûn. Bi saya van civîn û torena tevî hevalan me hev didît. Çend roj carekê em dihatin cem hev û me bi hev re derd û kulên xwe par ve dikirin. Li ser bûyer û mijaran me dîtina xwe ji hev re digotin. Em li Başûr bi cih bûn, roj û meh li pey me mabûn. Me rojên xwe bi perwerdê derbas dikir. Yekemîn car bû ku hêzên gerîla li ser hev perwerdeyek wiha zêde didîtin. Li herêmê kar gelekî kêm bû, karê me bi piranî derketina çiyê, nîzamiye, çêkirina şkeftan bû. Ji derveyî van ti karê me tine bû. Me xwe gihandibû Başûr em ji kemîn û operasyonên dijmin xilas bûbûn. Lê hevalên li Bakûrê Kurdistanê di nava şer û kemînan de mabûn. Ji Bakûr her roj nûçeyên şer û şehadeta hevalan dihatin. Komên hevalan li ser hev kom bûbûn û rê tine bûn ku derkevin û bêne başûr. Bi taybetî jî komên ku ji Dêrsim û Erziromê dihatin. Ev komên dereng mayîn, li Amedê barê hevalan giran dikirin. Li Amedê hêzeke gelekî

zêde kom bûbû. Ji ber vê operasyon li ser hev dihatin lidarxistin. Dema ev kom diketin rê ji kemîn û operasyonan xilas nedibûn. Di rê de hevalan gelekî wendahî dabûn. Me êşa hevalan ji başûr di dilê xwe de hîs dikir. Çavê me li benda wan bû. Koma ku dihat başûr me baz dida û bixêrhatina wan dikir.
Dîsa di rojeke wiha de, wê komekî heval ji Amedê bihata. Em pir kêfxweş bûn û ji rûyê me ken xalî nedibû. Em li ser rê kom bûn û li benda hevalan man. Heya hatin em li benda wan bi bîranînên kûr ve çûn. Em nêzî pazde bîst kes li benda wan rûniştî bûn. Ji yekîneya Şehîd Remzî û Şehîd Kendal ez, Tîrêj, Rizgar, Hogir, Çekdar, Piling û hin hevalên din bûn. Em bi bîranînên xwe yên Amedê ve çûn. Em li cihek ji qampê hinek bilind rûniştin. Carna axaftina me bi ken dewam dikir, carna jî ji ber hevalên ku di rêwîtiya Başûr de şehîd ketibûn, em xemgîn dibûn. Yek bi yek me êş û xweşiya herêmê bi bîr dianiya. Ya ku em li ser pir di sekinîn şehadeta hevalan bû. Piştî vekişînê gelek heval di rê de şehîd ketibûn. Di destê me de agahiyên rast tine bûn. Di vê nîqaşa me de ku em kûr pêve çûbûn, bi carekî me dît ku koma hevalan li dû hev rêz bûne û ber bi me ve tên. Em ji cihê xwe rabûn da ku xêrhatina wan bikin. Nêzî sih kesî bûn ji herêma Amedê dihatin. Ji Amedê heya Başûr rêyek pir dirêj bû, em jî di wê rê de hatibûn. Pêşwazî û dîtina hevala ji bo me hêjayî her tiştî bû. Heyecana ku me girt, nayê gotin. Ew dem û ew gav hêjayî dîtinê bû. Yek bi yek me xêrhatina wan kir. Hevalên me ji Amedê xatir ji wan xwestî, heya başûr meşiyabûn. Her wiha di rê de gelekî zehmetî jî dîtibûn. Di rê de ji şer û kemînan xilas bûbûn û xwe gihandibûn Başûrê Kurdistanê herêma Qendîlê. Lê hin heval jî hê nehatibûn. Di cihê wiha de mirov hevalên xwe pirs dike, em ketin qirika hevalan. Kî li herêmê ma? Kî hat û kî şehîd ket?
Her ku navê hevalên şehîdketî dihate gotin, em xemgîn dibûn. Ji bedena me pêtên agir difiriyan. Piştî vekişînê, gelekî heval şehîd ketibûn û gelekî heval jî birîndar bûbûn. Jimara şehîdan ew çend zêde bû, mirov ditirsiya. Di vê navberê de ku me pirsa hevalan dikir, navê hevalê Faîq hate bîra min.
Faîq xuya nedikir û me jî pirsa wî nekiribû. Vê yekê bala min kişand û min pirsa wî kir. Min ji hevalekî nas pirs kir;
"Hevalno, hevalê Faîq xuya nake ma ew nehat, ew çawa bû, wê kengê were?"
Hevalên ku me hev nas dikir, nexwestin bersivê bidin. Bi vê yekê gumanên min li ser Faîq zêde bûn, min israr kir;
"Yan şehîd ket, ji me veneşêrin, kengê be jî emê fêr bibin."
Piştî me israr kir hevalên nas xwe bê deng kirin û serê xwe xwar kirin. Ti kesî bersiva min neda. Hevalekî li ser vê pirsa min wiha got;
"Faîq jî şehîd ket:"
"Çi? Te çi got, ya min şaş fêm kir:"
"Te rast seh kir, ew jî şehîd ket. Ji hevalên kevin yên herêmê ew bi tenê mabû, ew jî şehîd ket."
"Li kû û çawa? Çima heya niha ji me re nehate gotin?"
"Piştî ku heval ji bakûr kom bi kom dihatin başûrê Kurdistanê, li herêmên hundir operasyon zêde bûbûn, di van operasyonan de hevalên kevin bi her derî ve baz didan û diketin şer. Di operasyonekî de, li Geliyê Kûviyan hevalê Faîq şehîd ket."
Li ser van axaftinan em şaş bûn û di cihê xwe de sekinîn.......Axaftin ji dilê me derdiketin lê zimanê me nedigeriya. Dilê me û çavê me di vê demê de bûbûn zimanê me. Zimanê bedena me ya bi êş û keder. Way be.... dêmek Faîq jî şehîd ket ha.....Faîq..

Fotoya Faîq
Nav-Kemal Kapici
Kod-Faîq Welat
Jidayikbûn-Semsur-1974
Tevlîbûn-1993
Şehdadet- 1`ê Gulanê 2000
Cih-Licê Şehîd Remzî
Şêwe-di serdegirtina operasyonê de

Me pirsek kiribû, lê bersivê em gelekî êşandin. Em mecbur bûn me çibikira, ev jî rastiyek şer bû. Bersiva pirsa min, di qirika min de ma û bû birîna xencerê li ser dilê min. Ev bersiva dijwar û tijî bi êş li ser min bû barekî giran. Di vê şeva tarî de çavê min hinekî din jî tarî bûn. Cîhan li ber çavê min tarî dikir. Tevî van bûyerên giran û agahiyên dijwar li ser hev hatibûn. Piştî me agahiyek wiha bihîst, me tevî pirsên xwe qedandin û me qet pirsên din nekirin. Hevalên hêja û dilpak yek bi yek şehîd ketibûn. Piştî ku ji Bakûrê Kurdistanê çend kom ketibûn ser rê, pêşî li komên din hatibû girtin. Komên dihatin li ser hev diketin şer. Herêma Amedê li ser rêya çend navendan bû. Di pêvajoya vekişînê de gelekî heval şehît ketibûn. Hevalê Faîq hevalek xwedî tecrube bû. Min bawer nedikir ku wê di demek wiha de şehîd bikeve. Ji Amedê du rêyên ku heval têde dihatin başûrê Kurdistanê hebûn. Ya yekê di deşta Batmanê de bû. Ya duemîn jî di deşta Xerza de bû. Her du rê jî ji aliyê hêzên taybet yên dewleta Tirk ve hatibûn girtin. Piştî me bihîst Faîq jî şehît ketiye em ji xwe re ketin nava xewjînan. Piştî ku em tev ji cem wî hatibûn ew bi tenê mabû. Me bi hev re ewqas rojên xweş derbas kiribûn. Gelek bîranînên me bi hev re hebûn. Ji bo min hevalek gelekî girîng û hêja bû. Hevdîtina me ya herî dawiyê hate bîra min. Em li ser rêya başûrê Kurdistanê bûn. Wî bi destê xwe em bi rê kiribûn. Li ser rê em hişyar kiribûn û wiha gotibû"
"Li xwe miqate bin, heya Başûrê Kurdistanê baş bimeşin emê li wir hev bibînin. Di rê de wê kemîn hebin û operasyon bên lidarxistin, baş bimeşin. Piştî we emê jî bên, li başûr ji me re cihek baş amade bikin."
Di dawiya axaftina xwe de bi hevdîtina li Başûr, me ji hev re serkeftin xwestibû. Rêyek dûr li pêşiya me bû, emê heya Başûr bimeşiyana. Di rê de wê çi bihata serê me ne diyar bû? Me ji hevalan weke emê êdî qet hev nebînin xatir xwestibû û weke di demeke kurt de emê dîsa hev bi bînin ketibûn ser rê. Hevalê Faîq li gor ruhê Apocîtiyê tevdigeriya. Hevalek karker dilpak û zana bû. Gelekî aliyên wî yên baş hebûn. Yek ji aliyê wî yê baş jî ked û xebata wî bû.Ti car xwe ji kar nedida alî, karek li ku hebûya baz dida û pêk dianî. Di kesayeta wî de rihê rêhevaltiya PKK'ê hebû. Di çêkirina mayinan de jî zana bû. Piştî ewqasî bîranînên li ser hevalê Faîq êdî wextê çûnê bû. Şeva tarî xwe li me dipêça û em

di reşahiya şevê de mabûn. Halê me weke halê serxoşan bû, em li hemberî vê bayê dihejiyan. Şev ji me re bûbû navgînek ku em rûyê hev yê xemgîn û melûl nebînin. Baş bû ku me hev nedidît, eger me rûyê hev bidîta, li hemberî vê bûyerê emê ji hev haciz bibûna. Wê şev bibûya şeveq, lê me qet bawer nedikir. Ev reşahî wê bibûya ronahî, lê ti tişt nedigoriya. Faîq jî weke Wedat, Rozerîn, Binevş û yên din bê xatir û bê destûr çûbû. Minê çi bikira, ji destê min tiştek jî nedihat. Berî em belav bibin me koma hevalan li cihê wan bi cih kir. Saet yazdehê şevê bû, tevî hevalan li cihê xwe belav bûn. Ji rêya dûr hatibûn westayî bûn, çûn raketin. Ez û Tîrêj em tenê li cem hev man. Weke gelek carên din, wek rojên dijwar û bi keder yên berê, dîsa em bi tenê bi hev re mabûn. Dinya ji me re çiqas piçûk bû, me çi dikir me ji xwe re cihek nedidît. Yek bi yek heval wenda dibûn, wek stêrkan ji ezmanê jor berjêr dibûn. Demên wiha mirov mezin dikirin û li temen sal zêde dikirin. Di demên wiha de hestên dijwar cihê xwe didan hestên zarokan.
Di bedena min de agirek pêdiket ku li ti cihî nehatibû dîtin. Piştî ku min şehadeta Faîq bihîst, ez wek kevirekî li cihê xwe giran bûm. Wek zarokek melul bûm. Roniya çavê min kêm bû. Di nav pora min ya reş de bi dehan mûyên sipî bi cih dibûn. Li ser eniya min xetên kûr vedibûn û li ser hev rêz dibûn. Ev qedera ku ez jê direviyam bû. Qedera ku tim ez di şertên xirab de digirtim ev bû. Ev dem ji bo me bi tenê dijwar bû an na?Jiyan ji bo herkesî wiha zor bû? Ez bi carekî ketibûm nav çîroka ku kalê min behsa wê dikir. Min digot qey ez guhdarî çîrokekê dikim, lê ez di nav de bûm. Di çîrokê de her tişt hebû. Roj bi roj aliyên vê çîrokê derdiketin holê. Min serê xwe rakir û di şeva tarî de li ezmanê jor mêze kir. Li ezmên gelek stêrk hebûn û diberiqîn. Ez û Tîrêj, em li ber stêrkên ezmên rûniştibûn. Me nekarî em wek her carî li ser vê bûyera kambax jî biaxivin. Ev bûyer ji yên berê gelek bi êştir û dijwartir bû. Em bê daxwaza xwe di xewjînan de diçûn. Dibûn rêwiyê rêya dûr. Di vê xewjîna xwe de em ketin rê û çûn Amedê, di ava Sarmê de derbas bûn. Li çiyayê Hîndîv, Qurmik û Geliyê Kûviyan û li Keltepe em geriyan. Çiyayê Rût çiyayek çiqas dirêj bû, bi meşê xilas nedibû. Em li Geliyê Kûviyan di bin darên mezin û bilind de rûniştin. Li ber ava Sarmê me dest bi gotina kilaman kir. Li geliyê Kûviyan em li gora Faîq geriyam. Faîq li quntara çiyê li ber siya dara bero raketî bû. Li ber ava gelî diherikî. Cihê wî si bû û li ser tije giya bû.
Li ser zinaran li ber dengê avê, me çi wext derbas kir. Di vê şeva tarî de stêrkên li ezman yek bi yek xuya dikirin. Hevalê Faîq weke stêrkekê ji ber çavê min wenda bû. Çeka wî di dest de di nav tarîtiya şevê de diçû.
Min carna ji xwe pirs dikir. Ev êşa vê çîrokê bû an jî êşa Qendîlê bû. Qendîl xwedî taybetiyek çawa bû? Wek navê xwe bi şewat bû? Qendîl cihek wek dawiya çîroka me bû. Çîrokê ji Amedê dest pê dikir û li Qendîlê bi dawî dibû. Dawiya çîrokê ev der bû. Ji vê derê pê ve rêyên cuda nediman. Her wiha Qendîl bi awayek dijwar dawî li vê çîrokê dianî. Em di nava xewê de bûn, di nav çîroka bê nav de. Her ku komên hevalan ji Bakûr dihatin, me agahiyên bi şewat digirtin. Ev agahiyên bi şewat li ser hev kom dibûn û bedena me dişewitandin. Li ser hev rêz dibûn ev agahiyên dilşewat.
Li qampa me her ku diçû jimara hevalan zêde dibû.
Ji bo qampek nû me dest bi amadekariyan kir. Di vê belavbûnê de em hevalên kevin emê careke din ji hev veqetiyana. Bi vê belavbûnê ez, Tîrêj û hevalên din emê her yek biçûna yekîneyeke din. Her wiha ez û Tîrêj jî emê ji hev veqetiyan. Ew çû qampa dibistana Kurdî, ez jî li qampa dibistana Tirkî mam. Li pêşiya me meh û salên dirêj yên bi êş û şewat hebûn. Salên dijwar û bûyerên bi êş li pêşiya me rawestiyabûn. Em di nav van êşan de li dor xwe digeriyan. Li Başûrê Kurdistanê em li herêmek bi her alî kemîn û mayinkirî bi cih bûbûn. Çar aliyê me ji aliyê dijmin ve hatibû dorpêçkirin. Li başûr dijmin

ne tenê ji însanan pêk dihat. Li herêmê bi deh hezaran mayin hebûn. Axa Kurdistanê jî kiribûn dijmin. Mayin jî wekî dijminê dagirker dijwar bûn. Dijminê herî xirab mayinên di bin erdê de bûn. Ev dijmin ji bo rizgariyê ti îmkan nedidan mirovan. Kemînên li herêmê jî ji yên herî xirab bûn.
Min di yekîneyek nû de dest bi lêgerînek nû kiribû. Em di pêvajoyek dijwar de gihîştibûn Başûrê Kurdistanê. Hem ji aliyê pratîk û hem jî ji aliyê zîhnî ve pêvajoyek gelek zehmet û şîlo li pêşiya me bû. Em ketibûn nav rûpelên pirtûka dîrokê û di nav de diçûn û dihatin. Em di rêya mayinkirî di nav kemînan de dimeşiyan. Di nav vê pirtûkê de ji me re rûpelek çawa hatibû vekirin, ne diyar bû. Di van rûpelan de ji bo me wê çi bihata nivîsandin, ew jî ne diyar bû. Em ketibûn vê rêyê û dimeşiyan. Şev û rojên me ji hev cuda bûn. Dem û gav ji hev gelekî cuda bûn. Li van çiyayên Kurdistanê her tişt gelekî dijwar û zirav bû. Girêka herî mezin ya ben, ji qutbûnê re amade bû. Lê em bi biryar bûn, meyê di berxwedana xwe de israr bikira. Li vir naxwazim yek bi yek li ser pratîka Başûrê Kurdistanê bisekinim, ji ber ku pratîkek gelek alî û bi êş bû. Çîroka me ya başûr gelekî dirêj û bi bi bûyer e. Ji hevalên herêma Amedê ez û Tîrêj em li cem hev mabûn. Hevalên din tev yek bi yek bûbûn rêwî û di rêya bêveger de çûbûn. Hinek ji wan westiyabûn, hinek di şer de birîndar bûbûn. Hevalên herî baş û fedekar jî bê destûr ketibûn nav karwana şehîdan. Dema em dihatin cem hev me kul û kederên xwe par ve dikirin. Qendîla bi xweşikiya xwe bi nav û deng, ji derd û kederên me re nedibû bersiv. Newal kûr bûn, çiya bilind bûn. Darên li ser linga mayîn tev ji cihek xwe derbe xwaribûn. Daran bi çekên cuda derbe xwaribûn. Ji aliyê din ve jî mayin hebûn. Piştî em li qampên cuda belav bûn, demek dirêj min û Tîrêj me hev nedît. Li qampên cuda xebata me dimeşiya. Bi ser evqas bûyerên giran rojeva me jî her ku diçû germ dibû. Dijmin dixwest me ji herêmê derbixe. Li Qendîlê di nav gel de propaganda reşkirinê li dijî me dihate kirin. Roj bi roj dijmin bi ser qampên me de dihat. Em ewqas ketibûn nav hev êdî çeperên me li cem hev bûn. Herî dawiyê wisa bû ku hêzên herêmî heya nav qampên me hatin. Me dizanibû wê rojekê şer dest pê bike, ji ber vê yekê me gelekî hişyar kirin. Gelê herêmê li dijî şer bû, wan bi xwe jî digotin em ti car dijî gerîla şer nakin. Ji ber ku di nav hêzên gerîla de bi sedan hevalên ji Başûrê Kurdistanê hebûn. Ewqas jî şehîdê wan hebûn. Lê hêzên ku îradeya wan tinebe, wê tim bikevin xizmeta hêzên din. Lê gel lîstikên siyasî jî nizanibû.
Ev hêz roj bi roj nêzî me dibûn û çeper çêdikirin. Wer xuya dikir ku xwe ji şer re amade dikin. Her tişt li benda teqînekê bû ku şer destpê bike. Van hêzan dixwestin em şer bidin destpêkirin û xwe mafdar derbixin. Lê me heya dawiyê li berxwe da û fersend neda wan. Gelek caran em tahrîk dikirin, lê em nedihatin lîstoka wan. Her ku dem wiha derbas dibû me mêze kir çar aliyên me tên dorpêçkirin.
Lazim bû em vê planê pûç bikin. Ji bo wê rêxistinê planek amade kir. Ji bo dijmin hêzên xwe yên li dor me kom bûyîn vekişîne û em hinekî nefes bistînin, me biryar da ku em bi nav herêmên dijmin ve biçin. Yanî emê tabûrek heval, nêzî 60 gerîla, biçûna Qeledizê, Qaraçolan û heya Silêmaniyê. Bi hewldanek wiha meyê hêzên dijmin yên ku li dor qampên me kom bûyîn paş de bidin kişandin. Di heman wextê de meyê peyamek wiha jî bidaya; 'Em bixwazin dikarin heya bajarên mezin jî bên; Lê me nedixwest em bikevin şer. Wê demê dijmin wê neçar bima û hêzên xwe paş de bikişandan. Bi vê hewldana me, dijmin wê biryara an şer an jî aştiyê bidaya. Li Qendîlê li qampa Şehîd Eşref ku piranî ji hêzên bakûr pêk dihat, tabûrek heval hat hilbijartin. Berpirsiyarê yekîneya me Dijwarê ærkendî bû, yê yekîneya din jî Rûbar bû. Tabûrek heval emê heya nava çeperên dijmin biçûna û meyê dijmin bitirsanda. Me xwe ji rêwîtiyek dûr û dirêj re amade

kir. Bi rastî jî ev rêwîtî gelekî bi xeter bû. Ji aliyekî ve em diçûn nava dijmin û meyê ji hundir ve li wan bixista. Ji aliyê din ve herêma ku em tê de diçûn tev mayinkirî bû. Di dema şerê Iraq û ëranê de çiyayên di navbera başûrê Kûrdistanê û Rojhilatê Kûrdistanê de tevahî hatibûn mayinkirin. Emê biketina nava van mayinan û bi nav dijmin ve biçûna. Li pêşiya me du dijminên bi xeter hebûn. Berî em bikevin ser rê hevalan em ji bo mayin û hêzên dijmin baş agahdar û hişyar kirin. Hevalan li sehaya topê ya qampê ji me re torenek çêkirin û em bi rê kirin. Em wê rojê danê êvarê ketin rê û ji qampê derketin. Li ser rêya me Zelê hebû, li wir em şevekê man. Cihê em lê man geliyekî kûr bû. Aliyekî me Rojhilatê Kurdistanê bû, aliyê din jî Başûrê Kûrdistanê. Danê sibê me rêya xwe şopand û ber bi çiyayê bilind yê Mamendê ve em ketin ser rê. Çiyayê Mamend di navbera başûr û rojhilat de ye. Li aliyekî çiyê Kurdên başûrê Kurdistanê, li aliyê din jî Kurdên Rojhilatê Kurdistanê hebûn. Em di rêwîtiya xwe de, ketibûn roja duemîn. Em ji bo bernameya rêya xwe derbixin li Mamendê rawestiyan. Çiyayê Mamendê gelekî bilind bû. Ji ser çiyê gelek herêm gund û bajar baş dixuyan. Rêya ku emê tê de biçûna me nas nedikir. Bi roj meyê ji cihek vekirî rêya xwe kifş bikira û êvarê jî emê bimeşiyana. Bi vî awayî emê heya nava dijmin biçûna û paşê jî vegeriyana.
Ji vir û pê de ji bo me cihê bi xeter dest pê dikir. Di vê rêwîtiyê de karê min jî gelekî giran bû. Em du heval ji tevî ewlekariya tabûrê berpirsiyar bûn. Ji yekîneya me ez ji yekîneya din jî hevalek din hebû. Di her şert û mercan de meyê ewlekariya havalan plan bikira. Dema ku em gelek diwestiyan û bênvedanê de emê biketana van hewldanê û meyê du kes ji bo nobetê diyar bikiran. Di demên westandinê de diyarkirina nobetdaran ji her tiştî zehmettir bû. Piştî rêwîtiyên dirêj ku em ji hal diketin em diketin nav tabûrê û me ewlekariya hevalan plan dikir. Hevalên ku çiya biparastana yên nobet bigirtana û yên biçûna keşfê tev me diyar dikirin. Piştî me sererastkirinên nav tabûrê diyar kirin em ji rê re amade bûn. Wê şevê rêyek dirêj li pêşiya me bû. Ji çiyayê Mamendê di deşta Qeledizê de heya çiyayên Kûrîs û Asosê emê bimeşiyana. Li pêşiya me gund, bajar, deştek fireh û çiya hebûn. Her wiha hêzên herêmê jî hebûn. Li hemberî tevî astengiyan jî emê heya çiyayên diyarkirî biçûna. Ji bo di şerek wiha de em neyên dorpêçkirin, jimara me gelek bû. Tarzê hêzên herêmê dorpêçkirin bû. Ev ji bo îmhakirinê rêya sereke bû. Dema komek gerîla biketa kemînê, bi hêzekî zêde dorpêç dikirin û tev îmha dikirin. Bi sedan bûyerên wiha pêk hatibûn. Eger bûyerek wiha bihata serê me, meyê bi tevî hêza xwe şer bikira.
Em 60 heval li dû hev rêzkirî dimeşiyan. Rêya ku em li ser bûn rêya du şevan bû, lê li nîvê deştê me nikariya em bimînin. Pêwîst bû di şevekê de em ji deşta Qeledizê derbas bibin û xwe bigihînin herêma çiyayî. Wê şevê di rê de me qet bêhn veneda û em tim meşiyan. Li çend cihan em rastî çeperên hêzên herêmê hatin, lê ji ber ku hêza me zêde bû ti bûyer derneketin. Li deştê av pir kêm bû. Em di rêya xwe de heya ber Qeledizê hatin. Di ber re em derbas bûn û bi aliyê çiyê ve çûn. Rêya me pir dirêj bû bi meşê bi dawî nedibû. Gelek heval ji ber vê meşa dijwar ketin û nikaribûn bimeşin. Dema dinya ronî bû li pêşiya me rêya çend saetan mabû. Bi meşekî dûr û dirêj herî dawiyê em gihiştin qûntara çiyê. Dema em gihiştin ber çiyê me lez kir û çend komên hevalan derxistin çiyê. Li vir kesekî nedixwest biçe çiyê, gelekî westiyabûn. Bi hewldanekî xurt herî dawiyê min çend heval îkna kirin û em bi hev re di wê westandinê de çûn nobetê. Li gor planê emê çend rojan li wir bimana. Di vê navberê de meyê derdorên xwe kifş bikiran. Wê rojê me çend heval şandin gundek nêz ji bo ku ji me re hin pêwîstî bînin. Heval çûn gund pere dan gundiyan û vegeriyan. Danê êvarê dîsa heman heval ji bo girtina tiştan çûn gund. Dema ketin gund, bi carekî dengê çekan ji gund bilind bû. Bi

dengê teqînê re em tev ketin rewşek awarte. Me heval li her deverê belav kirin. Hin derketin serê çiyê, hin bi alîkariya koma ketî kemînê ve çûn. Tîmek ku ez jî tê de bûm, me bi aliyê gund ve bazda. Bi dengê teqînê re me dizanibû heval ketine kemînê. Piştî demekî dengê çekan rawestiya û heval yek bi yek ji nav gund derketin û hatin. Tiştek bi hevalan nehatibû tev saxlem bûn. Li gor agahiyan kesên ku ji me re çûyîn tiştan bînin, giliyê me kiribûn. Hêzên wir jî bi lez hatibûn û li gund kemîn danîbûn. Hevalên me ji vê yekê bê agahî bûn û bi carekî ketibûn kemînê. ædî karê me zehmettir dibû û em diketin rewşa şer. Em wê şevê ji wir ketin rê û bi aliyê çiyayê Kûris ve çûn. Me dizanibû piştî ku cihê me hat dîtin wê bi hezaran çekdar werin şerê me. Ya baş ew bû ku di demek kurt de em ji wir dûr bikevin. Em ketin rê û heya çiyayê bilind ê Kûrîsê meşiyan. Dema em gihiştin ber çiyê dinya ronî bû. Rêwîtiya di van deşt û zozan de gelekî dijwar bû. Pêwîst bû ji çiyayekî em xwe bigihînin çiyayekî din. Tişta herî xirab jî ew bû ku li herêmê av gelek kêm bû. Em ji tîbûnê ziwa dibûn. Ji bo demekî cihê me saxlem bû. Çiyayê Kûrîs gelekî xweş bû. Zêde ne mezin û fireh bû, lê ji bo demekî pir baş bû. Çar aliyên çiyê ji zinarên mezin weke çeperan pêk dihat. Di çiyê de çeperên pir xweş hebûn. Çiya bi giştî ji zinaran pêk dihat. Tabûra hevalan li ber çiyê di dolê de bû. Ev der di nava du çiyayên asê de bû. Çiyayek li vî milî çiyayê din jî li milê din bû. Ji bo di bûyerekê de em bikaribin xwe baş biparêzin pêwîst bû em du komên Çiyagir yanî ji du aliyan ve kesên ku me biparêzin derbixin. Ji her yekîneyê mangeyek heval wê derketa serê çiyê. Ji yekîneya me mangeya me amade bû. Ji bo çiyayê milê din jî yekîneya din komek heval derxist. Em ji êvarê heya şeveqê meşiyabûn, bi ser vê westandinê emê heya serê çiyê jî hilkişiyana û ewlekariya hevalan bigirtan. Em ketin rê û gav bi gav bi çiyayê Kûrîs ve hilkişiyan. Dema em gihiştin serê çiyê me derdorên xwe baş dîtin. Bi derketina çiyê re me keşfa şeveqê kir. Hêzên herêmî ketibûn pey rêça me û bi aliyê me ve dihatin. Ji çend aliyan ve bi sedan kes di rêya ku em tê de hatîn dihatin. Eger bikaribûna wê tevî tabûra ji 60 kesî îmha bikirana. Me encamên keşfa xwe ji hevalên tabûrê re gotin. Bi vî awayî em li cihê xwe sekinîn. Em gelekî westiyabûn, qederek zêde jî meşiyabûn. Pêwîst bû em hinekî bêhn vedin; meyê weke du tîman nobet bigirta. Her tîmê wê nobeta xwe bigirta û pişt re raza. Min û hevalekî me nobeta destpêkê girt. Ji bo em razin me xwe dirêj kir. Piştî ku me xwe dirêj kir, nîv saet derbas nebû, bi carekî hevalê Sîpan bang li min kir. Ez ji xewê şiyar bûm, lê ez hê nîvxew bûm. Dema min serê xwe rakir, dengê Sîpan û dengê pêşmergeyan li ber guhên min ket. Ez bi carekî rabûm ser xwe. Min dît ku pêşmerge heya ber me hatine. Ez şaş mam, hevalan çawa nedîtibûn, çawa ferq nekiribûn?Ji ber vê xemsariyê ez gelek aciz bûm. Dema me ew dîtibûn dûr bûn. Lê niha heya nav cihê me hatibûn. Pêşmerge ji binê çiyê ve derketibûn navsera çiyê, lê nobedar ferq nekiribûn. Dema axaftinê jî ji me re nemabû. Hema ez ji şûna xwe rabûm û bi lez min xwe avêt pişta kevirekî. Em li wê derê ketin şer. Şer danê sibê dest pê kir, heya tarîtiya êvarê dewam kir. Em mangeyek heval bûn û me li hember hêzek zêde li ber xwe da. Heya êvarê me nehişt ev hêz derkevin çiyê û me dorpêç bikin. Ewan ji aliyê jêr ve bi aliyê me ve êriş dikirin, me jî li ber xwe dida. Em carna paş de, carna jî bi ser wan de diçûn. Ji ber ku hêza wan li gorî me zêde bû, em gav bi gav neçar diman paş de biçin. Lê ji ber ku hevalên me li binê çiyê bûn, heya ji destê me dihat me cihê xwe bernedida. Piştî demekê ku şer dewam dikir, hinek heval bi alîkariya me ve hatin.

Bi hatina wan re em hinekî rehet bûn. Em li ser çiya ketin çeperan heya dinya bu şev, me nehişt ku bi ser me de werin. Me ew asteng kirin. Di şer de me ti wendayî nedan, lê wendahiyên hêzên li hemberî me hebûn. Piştî ku dinya bû tarî, em ji cihê xwe dûr bûn. Em ketin rê bi aliyê Rojhilatê Kurdistanê ve çûn. Em di armanca xwe de bi ser ketibûn.

Dijmin bi vê hewldana me armancên xwe eşkere kiribûn. Dema em li nav herêma wan bûn, li Qendîlê jî şer dest pê kiribû. Li Qendîl, Kanîcengê, Qalatuka û Zelê şerê dijwar hebû. Armanca wan ew bû ku zivistanê bi ser me de werin û me tengav bikin. Me ev yek dizanibû û me dixwest zû eşkere bikin. Bi vê tevgera me dijmin ermanca xwe eşkere kir û bi ser me de hat. Berî ku şer dest pê bike nêzî 30 hevalên bê çek ku di nav gel de kar dikirin girtin û şehîd kirin. Ev heval li herêma Qaradaxê bê çek di nav gel de karê siyasî dikirin. Li ser vê êrişê me jî şerê xweparastinê meşand. Li hemberî evqas xiyanet me nikaribû em xwe bigirin. Ev şer çiya û zozan ditirsandin. Em ti car ne alîgirê vî şerî bûn. Şer bê destûra me hat û li ber deriyê me sekinî. Tişta ji destê me dihat me kir, lê fêde nekir.
Li Qendîlê her şev çalakî û şer hebûn. Jimara me kêm bû lê ew bi hezaran bi ser hêzên me de dihatin. Rewşa tabûra me ji ya hevalên li Qendîlê baştir nebû. Rê li me hatibû girtin û nedihiştin em bi aliyê Qendîlê ve vegerin. Tevî rêyên ku emê di wan de biçûna hatibûn girtin. Piştî me dît rê tine herî dawiyê me berê xwe da Rojhilatê Kurdistanê. Emê bi nav axa ëranê de biçûna û ji wir jî derbasî Zelê û Qandîlê bibûna. Heya em ketin nav axa Rojhilat em û hêzên herêmî di nav şer de bûn. Bi şev em dimeşiyan û bi roj jî me şer dikir. Demek dirêj bû em ji hevalan dûr bûn. Em ber bi bajarê Zerdeşt û Mêrîwan ve diçûn. Rêya me di ber gund û navçeyan de derbas dibû. Piştî ku em ji pêşmergeyan xilas bûn, em li cihekî bêhnvedanê geriyan. Herî dawiyê em li zozanekî bi cih bûn. Me dest bi paqijiya xwe kir. Rojek din pastarên ëranê ber bi cihê me de hatin. Ji me dixwestin ku em bi lez ji nav axa ëranê derkevin. Bi hatina wan re em di nav zinaran de bi cih bûn. Berê jî gelek caran eskerên ëranê êrişî hêzên me kiribûn. Ji ber ku meşa bi roj talûkebû me çûyîn qebûl nekir. Me xwest heya êvarê demê bidin me, lê qebûl nekirin. Piştî ku ji cem me çûn, berê qatyûşa, roket û hewanan dane ser me. Bi taybetî jî eskerên ëranê bi avêtina qatyûşan dihatin naskirin. ærişa herî dijwar li ser çiyagirên me bû. Hewan û qatyûşa bê navber davêtin. Hevalan cara duemên ji hevalê Dijwar û Robar re gotin em çiya berdin an na? Piştî ku hevalan dîtin rewşa wan ne baş e gotin, xwe ji çiyê berdin werin. Li ser vê yekê heval hatin.
Qatyûş dihatin li ber me dikirin zirmînî. Nava rojê em neçar man li dû hev rêz bibin biçin. Em ne hindik bûn, taburek heval bûn. Em ji wir jî ketin rê di nav axa Rojhilatê Kurdistanê ve çûn. Vê carê jî eskerên ëranê ketibûn pey şopa me. Em bê rawestan dimeşiyan. Ji ajiyekî ve pastar û pêşmerge ji aliyê din ve jî mayin hebûn. Di nav mayinan de em ji çiyan derbas dibûn. Bi vî awayî em hatin li Zelê li cem hevalan rawestiyan. Herêma Zelê di destê me de bû. Gelek qampên me li wir hebûn. Dema em gihiştin Zelê, şer bi tevî dijwariya xwe dewam dikir. Me bi guhên xwe dengê çekên giran guhdarî dikir. Di vê rêwîtiyê de me gelek bêriya hevalan jî kiribû. Em ji rêwîtiyeke dûr û dirêj dihatin. Vê rêwîtiya me nêzî du mehan dewam kiribû. Di nava du mehan de, li qampê gelek tişt guherîbûn. Bi cîhazê me agahî digirtin, carna jî heval diçûn qampê dihatin. Li gor agahiyan di şer de hin heval şehîd ketibûn û hin jî birîndar bûbûn. Gelek hevalên kevin jî di vî şerî de şehîd ketibûn.
Di vê rêwîtiya xwe de me gelek zehmetî dîtibûn û ji kemînan derbas bûbûn. Ji bo em jî tevlî şer bibin, em bi herêma şer ve ketin rê. Şerê herî dijwar li Kanîcengê û Qalatuka dibû. Me gelek bêriya hevalan kiribû. Piştî ku li herêmê şer jî dest pê kir hestên me xurttir bûbûn. Piştî du mehên dirêj di rêya ku em tê re çûbûn, vegeriyan. Em bi torenê ji qampa xwe çûn û bi heman şêweyî hatin pêşwazîkirin.
Dema em gihiştin qampê hevalan ji me re torenek çêkirin, em bi kêf û moralek bilind pêşwazî kirin. Em li jorî qampa xwe ya berê li cem hevalan çend rojan man. Di vê

navberê de ji bo çalakiyan plan dihatin çêkirin. Li gor vê planê, pêwîst bû alîkarya Kanîcengê û Qalatuka bihata kirin. Di nava vê serastkirinê de wê yekîneya me jî biçûya Qelatuka. Em bi lez ketin ser rê çûn. Piştî veqetinek dûr û dirêj me heval didîtin. Ev hevdîtina me di nav şer de di şert û mercên giran de çêdibû. Demek dirêj bû me hevalên xwe yên kevin nedîtibûn. Bi taybetî jî min bêriya Tîrêj kiribû. Bi ser veqetina me de, meh derbas bûbûn. Şer tiştek ne baş bû, lê em mecbûrî şerê xweparastinê bûbûn. Tişta ji destê me dihat jî tenê ev bû. Yekîneyên ku ez û Tîrêj di wan de li cihên cuda yê şer bûn. Ez li aliyekî bûm Tîrêj jî li aliyê din bû. Di vî şerê xweparastinê de gelek wendahiyên me jî hebûn. Ji gelek herêman yekîneyên hevalan bi van herêman ve diçûn. Kemal, Erdal û Qehreman her yekî di şerekî de şehîd ketibû.
Şevek pir tarî bû, em ji Zelê ber bi Qalatûka ve diçûn. Minê ji kû bizaniya di vê şeva tarî de ezê cara dawî Tîrêj bibînim. Di vê şevê de em rastî hev hatin. Yekîneya me ber bi cihê şer ve diçû. Yekîneya Tîrêj jî ji qampê dihat diçû çalakiyê. Heval wê ji çend aliyan ve biavêtana ser biryargeha pêşmergeyan. Li gorî axaftina hevalan ev çalakiyek pir mezin bû. Heval li ser rêya şer bûn. Em ketin nav hevalan me halê hev pirs kir. Dema me kin bû, lê heval diçûn çalakiyê diviya me pirsa hev bikira. Tîrêj rih berdabû, riha wî wek her carî sor dikir. Di demek kurt de me bi bîranînên xwe par ve kirin. Kî şehîd ketibû, kî birîndar bûbû? Di nav demek kin de gelek guhertin çêbûbû.
Ez bi qempê ve diçûm Tîrêj jî diçû şer. Piştî demek kin banga çûnê hat û di ber guhên me derbas bû. Ev bang wek guleyekê li ber guhên me ket. Cîzînî ji nav dilê me anî. Ev tiştekî dîrokî û xwezayî bû. Ji berê de xwe dubare dikir. Ji hin tiştên ku xwe dubare dikirin û qet nediguherîn, yek ji van jî çûna çalakiyan bû. Çûyîn hebû û carna veger tine bû. Şer navekî jiyanê bû. Navê dijwar. Di demek kurt de kêfxweşî û veqetîn li ser hev kom bûbûn. Hem hestên kêfxweşiyê hebûn û hem jî hestên dilşewat. Dema ku em tê de dijiyan ez nizanim kêfxweşî bû an jî êş bû? Me di heman demê de kêfxweşî û veqetîn tam dikir. Tîrêj berî min diçû çalakiyê. Li ser linga me hev hemêz kir û ji hev re serkeftin xwest. Bi hevdîtina li qampê em ji hev veqetiyan. Me yek bi yek tevî hevalan hemêz kir û şandin.
Piştî ku heval bi cihê çalakiyê ve çûn, em jî ketin rê ber bi qampê ve meşiyan. Cihê ku kom diçû çalakiyê cihek taluke bû, lê ji bo me ti rê nemabûn. Ji wir tim êrişî çeperên me dikirin. Ev der biryargeha pêşmergeyan bû. An emê ji wir biçûna, an jî meyê ew rakiran. Em ber bi qampa hevalan de dimeşiyan. Piştî qederek meşê gampê hêdî hêdî xuya kir. Gav bi gav em di ketin nava qampê. Piştî ku hevalan em dîtin bixêrhatina me kirin. Em birin cihê ku ji bo me hatibû amadekirin. Em li cihekî nêzî çeperên dijmin bicih bûn. Bi şev bayek pir dijwar û sar dihat. Mangeyên heval tê de diman sergirtî bûn. Wek bejnek di erdê de bûn û wek bejnek jî bi keviran dîwar hatibû lêkirin. Li ser û dora wan naylon hatibû pêçan û bi axê hatibû tijîkirin. Di her mangeyê de 10, 12 kes diman. Yekîneya ku em lê bi cih bûyîn vala bû. Hevalên li vê yekîneyê diman çûbûn çalakiyê. Ev der di pêngava yekemîn ya şer de ji pêşmergeyan hatibû rizgarkirin. Ji ber vê yekê dixwestin vir paş de bistînin. Di qampê de, gelek yekîne hebûn, lê tevî hevalan 24 saetan di rewşa awarte de bûn. Dema em gihîştin cihê xwe ji me re wiha hat gotin; bila kesek tiştê xwe belav neke, di be ku bi carekî êriş çêbe. Em bi vî awayî li wê derê bi cih bûn. Her kes li benda hevalên çûyîn çalakiyê bû. Dema saeta şer hat me guh û çavên xwe baş vekirin. Bi tarîtiya şevê re şer dest pê kir. Ji ber dengê çek û bombeyan herêm ket nava kabûsê. Ji her alî ve dengê çek û rokêtan dihat. Dinya tarî bû, lê çekên diteqiyan şeva tarî ronî dikirin. Çiyayê bilind, çiyayê Mamendê û çiyayê Qendîlê ronî bûbûn. Lê ne ji ber rojê. Ji ber şer, ji ber agirê çekan. Li Qendîlê şer hebû û li tevahiya herêmê belav bûbû. Ji

dengê cîgazê baş dihat fêmkirin ku şer pir dijwar e. Di şevek wisa de koma Tîrêj di nav de ketibû şerek giran. Wê şevê hevalan ji her alî ve êriş birin ser biryargehê. Gelek çek rakiribûn. Şer bi serkeftî derbas bûbû. Şerê wê rojê ji saetên êvarê heya danê sibê dewam kir. Li gor planê şer zêde dewam kiribû. Piştî derbeyek mezin diviyabû heval vegerin. Rêya hevalan jî dûr bû.
Dema dinya ronî bû, heval yek bi yek vegeriyan. Li gor agahiyan, hevalên birîndar û şehîd jî hebûn. Piştî ku heval dikevin nav biryargehê şer pir dijwar dibe û asê dibin. Her wiha hêzek zêde ji bo alîkariyê jî hatibû. Ji ber şeva tarî hevalên şehîd nedihatin naskirin. Danê sibê piştî ku heval yek bi yek hatin, hevalên birîndar û şehîd diyar bûn. Hevalek bi tenê çeka wî li mil, serê wî xwar û kincên wî di nav xwînê de, bi aliyê min ve dihat. Min rewşa hevalan jê pirs kir. Kîjan heval birîndar e û kî şehîd e? Çend heval şehîd û çend heval birîndar bûbûn?Tikesî bersiv neda pirsa min.Hevalên ku ji şer vedigeriyan tev bê kêf û bê moral bûn. Kes bi kesî re nediaxivî. Kî dihat, diçû mangeyan û xwe dida koşeyekî. Heval westiyabûn, heya şeveqê bê xew şer kiribûn. Ji halê wan rewşa şer dihat fêmkirin. Min carek din ji hevalekî pirs kir; Hevalê din li kû ne?
Ji min re wiha got:
"Hevalên din birîndara tînin, meraq neke wê werin, belkî hinek dereng bimînin, lê wê werin:"
Her hevalekî ji cihekî xwe birîndar bûbû. Wê rojê heya êvarê em bi wan re mijul bûn. Yên birîna wan giran, me şandin nexweşxanê, yên birîna wan sivik jî me li yekîneyan belav kirin. Di nav birîndaran de min çavên xwe li çend hevalan gerandin. Lê min nedîtin. Roj diçû ava, lê hê jî heval bi tevahî nehatibûn. Şer bi şev dest pê kiribû, roj derketibû û carek din bûbû şev. Vê dema dirêj giraniya şer baş nîşan dida. Di nav wê rewşa giran de, min çavên xwe li Tîrêj gerandin, lê ew jî ne xuya bû. Derbarê gelek hevalan de agahiyek zelal tine bû.
Ew şev ji şevên berê gelek dijwar û girantir bû. Rojên ji bo me weke zîndan bûn cihê xwe dabûn şevê. Wê şeva dijwar her tişt dabû sekinandin. Çi tişta ku ji cîhana mirovahiyê bû, dîl hatibû girtin. Her tişta ji dijwarî û şewatê para xwe girtî li ser me kom bûbû. Wek her dem ji bedena me xwîn diherikî. Bi vê kêliyê re hevalan bang li mangeya me kirin. Li yekîneya pêş ya nêzî çeperên pêşmergeyan, gelek heval birîndar û şehîd bûbûn. Pêwîst bû heval biçin parastina wan. Di demên wiha de dijmin êriş dikir ser yekîneyên pêş. Em ji bo çalakiyê ji cihek din hatibûn vê herêmê. Ji bo çûna cem yekîneya pêş em hatin wezîfedarkirin. Yekîneya ku emê biçûna parastinê li eniya herî pêş ya şer bû. Em ji cem hevalên birîndar diçûn, rewşa hin hevalan hê jî ne diyar bû. Di hişê min de Tîrêj û çend hevalên din hebûn. Ez di nav şewata agir de hêdî hêdî dişewitîm. Em hevalên hev yên berê bûn. Gelo rewşa Tîrêj çawa bû? Kemal wek teoriya di perwerdeyê de, di şer de jî jêhatî bû? Hevalek gelek ciwan û zîrek bû. Bêyî ku em rewşa hevalan bi giştî fêr bibin, em neçarî veqetînê bûn. Em gerîla bûn û ji bo berjewendiyê gelê xwe li serê van çiyayan bûn. Rêxistinê berê me bida kû emê bi wir ve biçûna. Bi taybetî di demek wiha de em ti car li dijî biryaran dernediketin.
Di rêya ku emê tê re biçûna, hevalên birîndar dianîn. Dema ku me dest bi meşa xwe kir, hevalan ji me re gotin di rê ya hûn tê de diçin hevalên birîndar tînin, hay ji hev hebin bi şaşî li hev nexin. Wê şeva reştarî em ketin rê. Emê di rêya kin de biçûna. Dema em ji cem hevalan diçûn, dilê me dêşiya. Ji dilê me gişan xwîn diherikî. Me êşa xwe nedida diyarkirin. Şev li me ewqas tarî bû ku me pêşiya xwe nedidît. Ji bo em zû bigihîjin cem yekîneya pêş me lez da meşa xwe. Me got berî ku li yekîneya pêş tiştek biqewime, em bigihîjin cem hevalan. Bi tevî leza xwe em bi aliyê hevalan ve meşiyan. Heya wê saeta

şevê dengê çek û bombeyan nesekinîbû. Heval di hav hewldanê de bûn û birîndar ji nava şer derdixistin. Dijmin jî nedihişt ku hevalên birîndar bên derxistin. Di rê de her ku em dimeşiyan, hevalên ku birîndar dianîn rastî me dibûn. Me halê hev pirs dikir û em bi rêya xwe de diçûn. Di vê şeva tarî de em ber bi yekîneya herî nêzî çeperên dijmin ve dimeşiyan. Em rastûrast, bi aliyê wan de diçûn. Hevalên ku em diçûn cem wan, li ser çiyayekî bilind bûn û li jêrî wan newalek kûr hebû. Li aliyekî çeperên me li aliyê din jî çeperên wan hebûn. Li jora çiyê li ser wesaîtan bi çekên giran li me dixistin. Bi ser me de guleyên doçka û bîksiyan dibariyan. Dijmin em dîtibûn û digotin qey em diçin çalakiyê. Em jî li halê xwe heyirîn. Li pêş me yekîneya hevalan hebû û em ber bi wan ve diçûn. Li hemberî tevî astengiyan em ranewestiyan. Emê çawa neçûna, heval di nav agir de mabûn. Pêdiviya wan bi alîkariyê hebû. Hem jimara wan kêm bû, hem ji sedî sed wê şevê wê êrişî wan bikiran. Dema ku bi ser me de gule hatin avêtin, em çend caran li pişt xwe vegeriyan, lê me got em venagerin. Em yek bi yek li vê derê bikevin jî kî xwe rizgar bike wê ber bi yekîneya hevalan ve biçe. Helwesta hevaltiyê, hêz dida me ku em li hember her tiştî li ber xwe bidin û rêya xwe dewam bikin. Piştî demekî em ji ber hedefa çekan derketin. Me xwe gihand newalekê û bi vî awayî me meşa xwe dewam kir. Em di dolek asê de derbas bûn. Em ji hedefa dijmin derketin û me rêya xwe jî nîvî kir. Gav bi gav em ber bi yekîneyê ve diçûn. Li pêşiya me dengê çekan hê jî dihat. Wisa xuya dikir ku hê jî şer dom dike. Em ji dolê derketin ketin ser rêyek teng.

Tiştê ku em li ser difikirîn ev bû; emê kengê bigihîştana cem hevalan?Ji dûr ve di nav tarîtiya şevê de, hin kes ber bi me ve dihatin. Me meşa xwe hêdî hêdî dewam kir û em bêdeng meşiyan. Ev heval bûn yan na?Hevalan ji me re gotibûn di vê rê de birîndaran tînin. Hem şev tarî bû, hem jî xwe xwar dikirin û bi aliyê me de dihatin. Carna demek kin dimeşiyan û careke din disekinîn. Meşa wan weke ya dizan bû. Piştî em hinekî bêdeng meşiyan, me dît ku yên bi aliyê me ve tên heval in. Ji rewşa wan diyar bû ku tiştekî bi xwe re tînin. Şev tarî bû çavan çav nedidîtin. Ji aliyê din ve dengê çekan hê jî dihat. Dengê bombe, guleyên doçka, bîksî û hewanan xwezaya wê şevê xira dikir. Dengê çekan bêdengiya wê şevê xera dikir û cih dida hewayek aloz. Ji dûr ve me deng li wan kir.

"Hûn kî ne, deng bikin, navê xwe bêjin:"

"Em heval in heval, hûn bi kû ve diçin:"

"Em jî heval in, em diçin cem yekîneya pêş:"

Piştî ku me fêm kir heval in, em jî ber bi wan ve çûn. Em li cem hev sekinîn. Wer xuya dikir ku hevalekî birîndar tînin. Di nav destê wan de yekî pêçayî dixuya. Dido li pêş yek li paş, di nav xwe de tiştek dianiyan. Piştî ku me merhaba da hev, min ji hevalekî pirs kir:

"Hûn ji cihê çalakiyê tên?"

"Erê em ji cihê çalakiyê tên, hê jî şer dewam dike. Hevalên birîndar di nav çeperan de mane, em nikarin xwe bigihînin wan."

Bi van gotinan ji dilê me çîzînî hat. Di çalakiyê de hevalan gelek çek rakiribûn, derbeyek mezin li dijmin dabûn. Lê wendahî jî dabûn. Piştî ku derbê dixwin bi hêzek zêde hevalan dorpêç dikin.

Rojek bi ser çalakiyê re derbas bûbû, lê hê jî hevalên birîndar li cihê şer mabûn. Piştî ku me li ser encamên şer hin pirs kirin, min ji hevalekî pirsa wê tişta pêçayî kir.

"Ewê di nav destê we de çi ye, hevalek birîndar e?"

Hevalekî bersivek wiha da me.

"Na ne birîndar e, ew jî şehît ket."

Dema behsa şehîd hat kirin, jiyanek çawa bi dawî dibe, hat ber çavê me. Me her yekî di nav xwe de axînek kûr kişand û êşek din jî danî ser yên din. Me dilê xwe da ber vê êşê jî û ji singa bi keser axîn kişadin.
Dilê me ji xwe tijî kul û keder bû, me axînek din ji danî ser. Di vî şerî de hevalan gelek wendahî dabûn. Hevalek li ber me dijêrkirî bû. Jiyanê çawa des pê dikir û çawa bi dawî dibû, li ber çavê me bû. Li ser çiyayê Kurdistanê jiyana mirovan weke belgekî darê bû. Biharê hêşîn dibû û zifistanê jî yek bi yek ji guliyên darê diweşiyan.
Ciwanîkek din jî bi rêya dûr ve çûbû. Delalê ber bilê diya kî bû? Keç an jî xort bû? Min careke din pirsa navê hevalê şehîd kir.
Hevaleke din ji dilê bi keser bi aliyê min ve zivirî û wiha got;
"Ev heval pir baş bû, her kes jê razî bû, ji hêzên bakûr bû, li Amedê mabû."
Dema got li Amedê maye, ez hinek fikirîm, gelo kîjan heval bû?
"Di şer de gelek heval birîndar û şehîd bûn, navê gelekan nayê hişê min, lê navê vî hevalî navek wisa ye ji bîra min heçûye. Navê wî Tîrêj e, hevalan digotin weke navê xwe paqij û dilpak e."
Tîrêj...Tîrêj...
Dema navê Tîrêj hat gotin weke sed kes bi hev re li ber guhên min bêjin 'Tîrêj' Tîrêj ez veceniqîm.
"Çawa, te got Tîrêj?"
"Erê min got Tîrêj, navê vî hevalî Tîrêj e, ev nav di nav me de kêm in, ji ber wê ji bîra min neçûye."
Yê şehîd Tîrêj bû, zimanê min heliqî, ez sar bûm û di cihê xwe de bêdeng rawestiyam. Li ber guhên min bi hezaran navên Tîrêj diçûn û dihatin. Li ber çavên min bi sedan wêneyên wî derbas dibûn. Wêneyek ji Şehîd Kendal, yek ji Licê û yek ji Qendîlê. Di wê şeva tarî û di nava şer de, bi carekî Tîrêj li ber min dirêj kirin. Ti kesî negotibû şehîd ketiye. Digotin belkî birîndar bûbe, lê negotibûn şehîd e. Li ber min dirêjkirî bû û min nas nekiribû. Rêhevalê min yê ji ji Amedê heya Qendîlê, jiyana xwe ji dest dabû. Ez li ser linga wisa li cihê xwe bê deng û mat mam. Min nizaniya ez çi bêjim. Bi bersiva vî hevalî re weke topa hewanê li ber guhên min bikeve, ez gêj û bêdeng bûm.
Di rojek wer bi êş û şevek tarî de, ez rastî cenazeyê wî hatibûm. Min ji xwe pirs kir, di vê şeva tarî de em çawa rastî hev hatibûn?Ev çi tişt bû vê şevê em rastî hev anîbûn.Ez ji rêya dûr dihatim, ew jî ji şerê dijwar. Ez dilşikestî bûm ew di nav karwanê şehîdan de bû. Êdî ti tiştî nikariya vê rewşê biguherîne. Herî dawî hevalê Tîrêj jî şehîd ketibû. Piştî Faîq, Celal, Wedat, Rozerîn, Binevş herî dawiyê ew jî şehîd bûbû. Li ber stêrkên li ezman, min bi sedan pirs ji xwe kirin.
Gelo di kîjan saetê de û çawa şehîd ketibû? Kîjan destî çek girtibû û kîjan pêçî çûbû ser tetikê?
Bi kîjan çavî nîşan hatibû girtin? Min di nava xwe de bi hezan nifir li wan kesan kirin. Di dilê min de hêrsek dijwar hebû, min got ezê biçim nav dijmin û xwe bi wan ve biqetînim. Bi vê yekê ew dilê ku perçe bûbû wê rehet bibûya? Na tiştek nedihate guhertin.Ez di demek dijwar de derbas dibûm. Min çi bikara paş de nedihat. Bi ser şehadeta wî de saet derbas bûbûn.
Li başûr em bi tenê nêzî hev mabûn, bi vê şehadetê ez gelek êşiyam. Birînên min kûr bûn û wek ava çem xwîn jê herikî. Li ser êşa salên dûr û dirêj, li xopana xerîbiyê ez bi tenê hiştim û çû. Barek giran li pişta min kiribû û ez bi tenê hiştibûm. Ji bo hevalên din û her wisa ji bo tevî hevalan ez dêşiyam. Ji bo hinekan min digot, hê zû bû, ji bo hinekan jî min digot vî hevalî wê hê xebatek baş bikira. Lê ji bo şehadeta Tîrêj min ti nav nedidîtin.

Ne li cem min nav hebûn ku min nav lê bikira, ne jî nav lê dihatin. Ji bo vê rojê min çi dikir navek nedidît. Şehadetek bê dem û bê wext bû. Her wisa ev rasthatina me weke birûskê bû. Bê hemdê xwe ez bi xewjînan ve çûm. Yek bi yek hevalên ku şehîd ketibûn hatin bîra min. Rozerîn, Binevş, Celal, Faîq û herî dawiyê jî Tîrêj. Min serê xwe bilind kir û li ezmên mêze kir. Ev çi tofan bû hatibû serê min, şevek berê me hev dîtibû. Em pir kêfxweş bûbûn. Di nava şevekê de rewş ewqas guherîbû, wek sal derbas bûbin. Hevalên min yek bi yek ji cem min diçûn. Wek belgên daran, diketin ber bayê û her yek bi aliyekî ve difiriya. Min ji xwe pirs kir?
Çima ez jî weke wan naçim û dawiyê li vê jiyana bi êş naynim.
Gelo ezê kengê bibim rêhevalê pakrewanan. Ez tirsonek bûm, yan na? Ez ne tirsonek bûma jî ez weke wan ne jêhatî û şareza bûm. Bi dehan heval ji cem min çûbûn. Ji Amedê heya Qendîlê ez di nava van bîranînan de mabûm. Têrêj bi tenê li cem min mabû ew jî çû. Li ber min dirêjkirî bû, min nikaribû ne ez xwe xwar bikim li rûyê wî binêrim û ne jî rûyê xwe jê bidim aliyê din. Min ji xwe re wiha got: Ma di vê şeva tarî de wextê vê yekê bû? Ma hevaltî ev bû, di vê saetê de hevparê derd û kulên min anîbûn û li ber çavê min dirêj kiribûn. Gelek hevalên hêja di vî şerî de şehîd ketibûn. Rêhevalê min yê dawiyê jî bi rêwîtiya dawî ve çûbû. Wî nizanibû li pey çûna wî ezê bikevim çi halî. Belkî dizanibû û nedixwest biçe, lê guleyek bêbext û bê oxir hatibû û li ser singa wî ketibû. Li hemberî wê guleya bê oxir, gelekî li ber xwe dabû, lê gule li ser hev rêz bûbûn. Bi nîşana çavên xayin ji çeka qarnasê gule rêz bûbûn. Yek, dido û sisê.
Li ser singa wî şerîda guleyan rêz bûbû. Li wê derê, di şeva tarî de li ber stêrkên ezmên, li ser axa sar dirêj bûbû. Weke baz li dor xwe zivirîbû û herî dawî ketibû. Bê pirs û bê xatir çûbû. Min axaftina wî ya dawî negirtibû.
Tîrêj neyê destpêkê ne jî yê dawiyê bû. Belkî ev şehadet ne li cihekî wiha bûya minê xwe bigirta û ji dilê min axîn nedihatin. Ji aliyekî ve şer hebû û gelek heval şehîd ketibûn, ji aliyê din ve jî hevalê min yê bi kul şehîd ketibû. Minê çi bikira, hevalan cenazê wî anîbûn li ber min danîbûn. Ez ji hevalên ku Tîrêj anîn aciz bûm û xwîna di rayên singa min de cemidî. Ji aliyê din ve, ezê ji kî aciz bibûma? Wê kî bibûya melhema ser birînên min? Em tev weke hev bûn, em bi hev re ketibûn vê rê. Ti kesî nizanibû wê mirin ji kû ve bê. Ti kes nizanibû wê kî li kû û çawa şehîd bikeve. Di vê rê de ne lorîna dayikên me û ne jî reş girêdan para me bû. Ne kesekî dikaribû şîna me bigire, ne jî gorek para me diket. Qehremanên vî gelî bejna ciwan feda dikirin, lê li du xwe navnîşanek jî nedihiştin. Wek bazekê dihatin û wek kevokekê jî diçûn.
Hêdî hêdî min serê xwe ji vê xewjînê rakir û bi ser Tîrêj ve xwar kir.
Min got ezê cara dawî li rûyê hevalê xwe binêrim. Ji bo cara dawî ser û çavên wî bibînim. Min tevî hêza xwe li hev kom kir. Min destê xwe avêt kefiya pêçayî û da aliyê din. Rûyê gilover simêlên sor ku tim dirêj dibûn dîsa dirêj bûbûn. Ew çend meh bûn ku di nav şer de bû û wext nedîtibû rûyê xwe kur bike. Rûyê wî di nav xwînê de mabû. Xwîna sor kincên wî şil kiribû û heya serê wî hatibû. Di jiyanê de çawa bêdeng û dilpak bû, di nava kefiya pêçayî de jî wisa bêndeg bû. Li ser rêya çûn û nehatinê, di rêwîtiya dûr ya bi tenê de ma mirov ewqas bêdeng dima? Heval di nav xwe de diaxivîn û wiha digotin: ‘Ev heval gelek baş û dilnizim bû. Bi rastî jî hevalê Tîrêj hevalekî dilpak bû û ti caran xwe mezin nedidît. Kêm caran aciz dibû, karê mezin û piçûk cuda nedikirin. Em ewkasî bi hev re man, min nedît kesek derheqê wî de tiştekî nebaş bêje. Hevalan xemgîniya min ferq kirin û ji min pirsek wiha kirin:
"Te ev heval nas dikîr? Wer xuya dike ku tu wî nas dikî."

Ez gêj bûbûm û ji xwe çûbûm, min zimanê xwe wenda kiribû. Ji bedena min xwîn diherikî û li nav tevî bedena min belav dibû. Rondikên çavên min xwe berjêr dikirin û diherîkîn. Em li Amedê di rojên xweş û dijwar de bi hev re mabûn. Em ji çend kemînan derbas bûbûn, me çend operasyon derbas kiribûn. Em bi hev re birçî û tî mabûn. Em bi hev re çend caran ketibûn avê me soberî kiribû. Me çend caran ji çem masî girtibûn. Herî dawiyê em bi hev re ji Amedê ketibûn ser rê, heya Başûrê Kurdistanê hatibûn. Meşa me ya ewqas dirêj bi dawî bûbû û êdî ez bi tenê dimam. Ez ji her tiştî aciz bûbûm, li ser serê min fîzfîza bayê bû.
Li ser çiyayek bilind di şeva tarî de û li ber bayê, ez li ser linga bûm. Bê dil û bê hêvî, di cihê xwe de rawestiyabûm. Ez di rewşek bê hêvî de weke kesê her tiştê xwe wenda kiribe bûm. Min ji hevaltiya rast bawer dikir. Ji bo min hevaltiya rast hêjayî her tiştî bû. Em ji bo jiyanek wisa têdikoşiyan. Di vê rê de me bedelên giran didan. Ji bo azadiyê, ji bo jiyaneke bi rûmet me xwe dabû pêş. Em di eniya her tiştî de bûn. Bayê dijwar destpêkê bi ser me de dihat. Weke dara pelên wê bên weşandin, ez li holê mabûm. Yek bi yek pelên dara min hatibûn weşandin. Ava di ber dara min re derbas dibû çikiyabû. Min û Tîrêj me sozek dabû hev, emê bi hev re biçûna Amedê. Me sond xwaribû em rêya xwe venegerin. Me ev sond di dilê xwe de bi cih kiribû.
Emê rojekê bi hev re biçûna Amedê. Rojek ji rojan Serok Apo wê bihata Amedê. Li warê egîdan wê bi sedhezaran ji bo pêşwazîkirina Serok Apo kom bibûna. Ne bi sedhezaran belkî jî bimilyonan kom bibûna.
Em şervanên azadiyê, dema serok bihata Amedê meyê biparasta. Sonda me ev bû, me ev sond li Amedê xwaribû. Li ser çiyayên bilind yên li ber ezmên, li ber daran di dema bênvedanê de sonda me ev bû. Li ber ava geliyê Zorê, li Geliyê Kûviyan me çend caran ev sond dubare kiribû. Ev sond ne tenê di axaftinê de bû; di helbest, di kilam û di ruhê me de bi cih bûbû. Her gerîlayekî helbestek li ser Amedê nivîsîbû. Di wan helbestan de Amed û Serok hebûn. Ji bo min heval tev yek bûn. Lê rastiyek din jî hebû, ew jî rastiya me bi xwe bû. Jiyana gerîla ne weke ti jiyanî bû. Hin heval hebûn carnan mirov ji wan zêde hes dikir. Mirov zêdetir xwe nêzî wan dikir. Tîrêj jî ji bo min yek ji wan hevalan bû ku min ji bo wan hêstirên çavên xwe rijandibûn. Her wisa min quncikek ji nav dilê xwe dabû wan. Hevalan ji min pirsek kiribûn. Minê bersivek çawa bida wan. Min Tîrêj nas dikir an na? Min hê bersiv neda bû vê pirsê. Hevalan li halê min mêze dikirin. Min hêdî hêdî serê xwe bilind kir û wiha got:
"Na, ez nas nakim, min qet nedîtiye. Ez jî li Amedê mame, lê min nedîtiye."
Cîhan li ser min bûbû barekî giran. Min ne dikaribû ez ji ber birevim ne jî hêza min hebû hilgirim. Ez wisa di cihê xwe de mabûm. Çiya gav bi gav bi ser min de dihatin, lê min nikaribû ji ber wan baz bidim. Tîrêjê porsor û rihdirêj li ber min dirêjkirî bû. Min qet bawer nedikir, ez hevalê xwe di şevek wiha de li ser rêwîtiya dawî bibînim. Weke birîndarekî birînkûr, ez ji dilê bikul dêşiyam.
Ez ji vê xewjîna kûr bi dengê hevalan şiyar bûm. Dema ez hatim ser hişê xwe di ser xewjîna min de demek derbas bûbû. Di bedena min de xwîn kom bûbû û nava min dişewitand. Hevalan Tîrêj rakiribûn û nêzîkî deh mitroyan biribûn. Lê min ev yek ferq nekiribû. Ez wisa li ser çongan, li ber serê Tîrêj ketibûm xewjînê. Piştî ku çend caran heval bang li min dikin û deng ji min nayê, Tîrêj radikin diçin. Gav bi gav ji cem min dûr dibûn. Ev cara dawiyê bû ku min didît. Êdî minê qet ew nedîta.
Min ji dûr ve li hevalan mêze kir.Ji tîrêjên çavên min awir kêm dibûn.Ji bedena min ra qut dibûn.Ji rojên min roj direviyan, li temenê min sal zêde dibûn.

Di nav pora min de mûyên sipî bicih dibûn. Tîrêj jî çûbû cem Faîq, Celal, Rozerîn û Binevşê. Hevalan ji cem min dibirin û min temaşe dikir. Min got heya ji ber çavan wenda bibe ezê lê binêrim. Destê min jê nedibû. Ji aliyê din ve hevalên din jî bang li min dikirin. Ez di navbera du aliyan de mabûm. Ji aliyekî ve hevalên em bi hev re diçûn parastina yekîneya pêş û ji aliyê din ve jî hevalê min yê em bi salan bi hev re mayîn ji cem min dibirin. Min ne dikarî ez biçim, ne jî bisekinim. Ya ji dilê min dihat, min got bila her du ali ji min dûr bikevin, ez bi dilê xwe li vir, di vê şeva tarî de bigrîm. Ez dilê xwe rehet bikim. Bigrîm, bikim qîrîn û bikim hewar. Weke dayika li ber dergûşa zaroka xwe, lorînan bêjim. Weke evîndarê ji evîna xwe veqetayî reşê girê bidim û şînê bigrim. Bila dengê min bi ser çiyayê Qendîl û Mamendê bikeve. Biçe li çiyayê Zaxros, Sîpan, Gabar, Berbehîv û li Amedê li çiyayê Qurmikê bisekine.
Wê ev banga min, bibûya ewr bibûya mij û dûman, li çar aliyê Kurdistanê belav bibûya û hevalên li Amedê bianîna hewara min. Wê Faîq, Celal û Rozerîn bi hewara min ve bihatan. Lê em ji hev gelek dûr bûn. Min çi bikira dengê min nedigîhişt wan. Min ti car xwe ewqasî bi tenê û bê hêz nedîtibû. Ez ti car ewqasî aciz nebûbûm. Ezê ji kî re bigiriyam, wê kî dengê min bibîhîsta? Li van çiyayên bilind û asê kî ez didîtim?Cihê vê şevê di jiyana min de xwedî cihek çawa bû? Min kir û nekir, jê re nav nedît. Heya Tîrêj ji min dûr ket û wenda bû, ez bi rondikên çavan li cihê xwe sekinîm. Ez di rewşek pir giran de derbas dibûm. Ne min dikaribû xwe bidim haşkirin û ne jî dermanê êşa min hebû. Di vê kêliyê de soza ku me dabû hev hate bîra min. Li çiyayê Amedê me soz dabû hev ku em rojekê biçin nava bajarê Amedê. Emê bi awayekî azad heya nava bajêr biçûna. Lê êdî Tîrêj jî tine bû û ez bi tenê bûm. Minê çawa bersiv bida pirsên hevalan. Ezê bêyî Tîrêj çawa biçûma Amedê? Wê hevalan ji min re çi bigotan? Hevalê Wedat wê ji min re çi bigota? Hevalê Celal û Rozerîn wê ez efû bikiram? Gelo minê bersiva pirsa hevalê Faîq çawa bida. Min nikariya ez bersiva pirsa wî bidim. Li ser van pirsan min di dilê xwe de wiha got: Ez bawer nakim careke din ez biçim Amedê. Ji xwe di gelek zor û zehmetiyan de em hatibûn Başûr. Vegera Amedê ji min re bûbû xeyal.
Şeva di jiyana min de ya herî dijwar û bi êş ev şev bû. Ti şevên min ewqasî dijwar nebûn. Ti şev li ser dilê min ewqasî giran nebûbûn. Di ti şevî de li ser temenê min sal zêde nebûbûn. Heya hevalan bi hêrs bang li min kirin ez li şûna xwe sekinî bûm. Piştî ku Tîrêj ji min wenda bû û hevalên min jî ketin ser rê, ez jî hêdî hêdî meşiyam. Heya em gihiştin cem yekîneya hevalan, ez li dû hevalan meşiyam.
Dema em gihîştin yekîneya hevalan tev di rewşekî awarte de bûn. Hevalên vê yekîneyê di nava aloziyek mezin de bûn. Dilê wan dişewitî û bê deng bûn. Ewan jî weke min hevalên li cem xwe wenda kiribûn û di nav êşê de bûn. Ji vê yekîneyê taximekî heval ji çalakiyê nehatibû. Hin şehîd ketibûn û hinek jî birîndar bûbûn. Di vê yekîneyê de hejmarek kêm heval mabûn. Vê êşa me gelekî giran dikir. Dema me hevalên yekîneyê dîtin, xemgîniya me deh qat zêdetir bû. Her çiqas em ji bo alikariyê hatibûn jî tişta di dilê me de yek bû. Min ji hevalan re wiha got: Xewa min nayê ez di xwazim heya şeveqê nobetê bigrim. Ewqas bûyer li ser hev qewimîbûn, wê çawa xewa min bihata? Serê min ji êşê giran bûbû. Çavê min sor bûbûn. Min bixwesta jî xewa min nedihat. Hevalan ji ber ewlekariyê daxwaziya min ya nobetê qebûl nekirin. Ji xwe tim gule berî me didan. ærişek çêbûya pêwîst bû em amade bin. Di êrişê de destpêkê ev yekîne dibû hedef. Cihê ku me lê nobet digirt li jorî mangeyan li cihekî vekirî bû. Bayek gur û dijwar bi tevî hêza xwe bi ser me de dihat. Carna bi ser me de guleyên doçka û bîksî jî dihatin avêtin. Di vê şevê de min stêrkên ezmana, yek bi yek dijmartin, yek bi yek weke rêza morikan bi hev ve dikirin. Min li her moriyekê wateyek bar dikir. Di vê şeva tarî de min li ezmên bi

hezaran wêneyên Tîrêj çêkirin û danîn ser dilê xwe û li cihek kûr veşartin. Ji çavên min rondik li ser hev dibariyan.Min digot qey ev şeva dijwar û bi şewat wê qet bidawî nebe. Wê şevê min çiqas xwe di binê betaniyê de dipêça jî xewa min nedihat.
Dema dinya ronî bû, min destê xwe li ser rûyê xwe bir û anî. Min nedixwest bi vî halî bi rondikên çavan li Çiyayê Qendîl û Mamendê binêrim. Ev çiyayên ku ji min re bûbûn parastgeh niha jî bi ser min de dihatin û ez bê hêz dikirim. Min şerm dikir li çiyayê Zelê mêze bikim. Min nikaribû li her du aliyên Qendîlê li cihên qampên me, meydana top û veleybolê mêze bikim. Bi destpêka rêjê re dengê çekan jî kêm bû.
Ez ji nav mangeyê derketim û min li çiyayê Qendîl û Mamendê mêze kir. Çiyayên Qendîl û Mamend ji wê rojê fedî dikirin û li ser wan berfa sipî hatibû pêçan. Li serê çiyê li cihê bilind bayek dijwar berf li hev diqeliband û radikir hewa. Di wê şeva dijwar de berf bariyabû û her der seqemê girtibû. Xweza jî li hemberî wê wehşetê bêdeng nemabû û li çiyayê Qendîlê berf barandibû. Em çend rojan ji bo parastina yekîneyê li wir man. Piştî ku şer sekinî em careke din bi yekîneyên xwe ve vegeriyan. Dengê çek û bombeyan ji bo demekî ji herêmê kêm bûbû. Bi ser vî şerê giran re ziviztanek dijwar bi ser me de hat. Wê zivistanê berf gelekî bariya. Ji ber ku em di şer de bi ser ketibûn zivistanê dijmin êrişî me nekir. Em bi vî awayî ketin qampên zivistanê. Me xwe ji bo pêngava biharê re amade dikir. Tevahiya zivistanê me di dibistanan de perwerde didît. Em ji perwerde aciz bûbûn. Dema em kerdiketin serê çiyê û nîzamîyê me hinek bêhna xwe dida. Zivistana Qendîlê jî pir xweş bû. Me xwe dişemitand û bi berfê şer dikir. Carna yekîneya ku zu biçûya ber dibistanê kemîn datanî û bi hevalên dihatin re şer dest pê dikir. Hevalên dihatin jî beşdarî vî şerî dibûn. Carna 3 an jî 4 yekîne me bi berfê şer dikir.
Bihar hat û li her derî daran pel vekirin. Giya careke din şîn bûbû û erd xemilandibû. Bi hatina biharê re herêmê cil û bergên nû li xwe kiribûn. Wek li herêmê şer nebûbe cîhan careke din nû bûbû. Ava berfê ji çiyayên bilind dihat xwar. Gurgura ava newalan bû diherikî. Ava Dola Kokê di nav qampên me de derbas dibû. Li binê qampên me bi ava Zelê re dibû yek û ber bi Gola Ranyayê ve diçû. Mî û bizin li dor qampên me li ser giyayê biharê diçêriyan. Me zivistan bi dawî kir û em ji bo pêngava biharê amade bûn. Di nav vê pêngavê de wê gelek hêzên gerîla ber bi Bakûrê Kurdistanê ve biçûna. Piştî demek dirêj careke din belavbûn ket rojeva me. Ev hevoka ku ji bo min gelek dijwar bû careke din li pêşiya min bû. Li gor agahiyan wê çend komên hevalan biçûna Bakûrê Kurdistanê. Di nav van cihan de Amed, Dêrsim, Erzirom, Botan jî hebûn. Ez bi vê agahiyê dilşad bûm.Her hevalî dixwest biçe herêmên hundir. Ev pêvajo ji bo me wek eskerî bû, me eskeriya xwe bidawî kir û emê vegeriya herêmên xwe.
Min pêşniyara çûna Amedê kir. Ji xwe Amed ji dilê min qet derneketibû. Piştî ku Tîrêj jî şehîd ketî min nedixwest ez li Qendîlê bimînim. Goristana şehîdên Qendîlê li ber çavê me bû. Qendîlê ku despêkê em bi ken û şad hatibûnê, ez jê gelek aciz bûbûm. Piştî ku rêveberiya qampê pêşniyar nirxandin ya min hat qebûlkirin. Ev rêwîtî ji bo min ji yên berê gişan bi watetir bû. Ji aliyek ve bi vê biryarê ez gelek kêfxweş bûm, lê ji aliyê din ve jî ez xemgîn dibûm. Ji ber ku ezê careke din vegeriyama Amedê kêfxweş bûm. Minê careke din newal, gelî û çiyayên Amedê bidîtan. Ezê biçûma û minê hevalên xwe yên berê bidîtan. Lê ji aliyê din ve ji ber ku tevî hevalên ji Amedê em bi hev re hatîn li vir diman, ez xemgîn dibûm. Ezê careke din biçûma Amedê, lê ne Tîrêj û ne jî Kemal li cem min bûn. Ezê bê Tîrêj çawa biçûma Amedê? Wê dilê min ev yek rabikira. Di rêya ku ez tê de hatîm vê carê jî ezê vegeriyam. Ev rêwîtiya min ku qet bi dawî nedibû dîsa li pêşiya min bû.

Ne çîroka min bi dawî dibû û ne jî rêwîtiya min. Roja ku emê biketana ser rê hevalan ji me re torenek çêkirin. Nîvê rojê li meydana Şehîd Eşref bi dehan heval ji bo torenê li hev civiyan. Di van torenan de ku ji bo min tijî êş bûn, min xwe radest dikir.
Roja destpêkê ku em hatîn vê derê hat bîra min. Wê demê ev der vala û bêdeng bû. Kesekî bawer nedikir li vir wê ewqas tişt werin serê me. Salên dirêj û bûyerên bi êş li ser hev hatibûn. Di demek kin de gelek tişt li ser hev hatibûn. Her wisa ti kesî bawer nedikir ku wê rojek bê emê vegerin cihên berê. Ew roj hat û daxwaziya min bi cih hat. Ev hêviya ku ji rastiyê gelekî dûr bû pêk dihat. Vegera min ya Amedê yek ji van mucîzeyan bû ku tim li hemberî min bû û ez pê re rû birû dibûm. Careke din em li hemberî rêza hevalan bûn. Bi dehan heval rêz bûbûn û li bendî hatina me bûn. Em hatin û li ber tevahiya hevalan rawestiyan. Min çavê xwe li ser hevalan gerand û li sekna hevalan mêze kir. Berî me komek din ya hevalan çûbû Bakûrê Kurdistanê. Di torena wê demê de, me rondikên çavên xwe negirtibûn û em giriyabûn. Dema em ji bakûr dihatin başûr em weke çûna ji vir ne dilgerm bûn. Hatina ji bakûr rehet bû, lê careke din veger gelekî zehmet bû. Ji ber vê yekê komên ku diçûn bakûr çavê me di nava rondikan de dihiştin. Dor hatibû ser min, piştî ewqasî êşên giran rêya vegerê li pêşiya min bû. Ji ber ku ez bi hevalên xwe yên kevin re venedigeriyam, di nava min de valahiyek mezin hebû. Wek min tevî tiştên li ser xwe wenda kiribin, ez bi tenê bûm. Di vê komê de ti hevalên ku me hev berê nas dikir tine bûn. Me yek bi yek ji hevalên ketîn rêzê xatirê xwe xwestin. Me heval ji dil û can hemêz kirin. Tevî veqetînên min dijwar bûn. Ev veqetîn ji tevan dijwartir bû. Vê çûyînê ez bi rêya dûr ve dibirim. Me kevir danî ser dilê xwe yê ku di wê demê de bûbû weke agir. Dema em ji qampê bi çiyayê bilind ê Qendîlê ve hilkişiyan, li jor, min ji bo cara dawiyê li qampê û dor alî mêze kir.
Qempa ku em ewqas lê mabûn, ew mehên me yên havîn û zivistanê tev hatin ber çavê min. Dema çavê min çû ser dibistanê, rojên me yên bi perwerdê derbas bûyîn hatin bîra min. Zivistanê dema em dihatin ber dibistanê me bi berfê şer dikir. Ava Dola Kokê bi tevî xweşikiya xwe diherikî. Wer xuya dikir ku ev veqetîn û çûyîn wê ji bo min bibe encam û destpêkek nû. Min ji xwe re wiha got: Hevalê Tîrêj jî niha li vir bûya û bi me re bihata çi baş bû. Ez û Tîrêj weke cara berê ku ji Amedê heya başûr hatîn, dîsa em bi hev re biçûna çi baş bû. Lê mixabin êdî Tîrêj jî tine bû. Herî dawiyê ewî jî ez bi tenê hiştibûm û çûbû. Ez ji rojên borî û ji wan bîranînan bi tenê mabûm. Em gav bi gav ji qampê dûr dibûn. Li çiyayê jor ê qampê rojên me yên ku em dihatin serê çiyê hatin bîra min. Ji bo parastina qampê em dihatin vir û me qamp diparast. Rojên me yên li vir derbas dibûn pir xweş bûn. Li serê çiyê li cihê ku em lê diman, meydanek hebû. Em carna futbol carna jî valeybol dilîstin. Li vir giyayên xwarinê yên pir xweş hebûn, me rojê sê dan giya çêdikir û dixwar. Em di pişta çiyê de qelibîn û qamp ji ber çavê min wenda bû. Bi carekî tevî bîranîn û hevalên li qampê ji ber çavan wenda bûn. Wek bikevin nav valahiyê. ædî ne sehaya topê û ne jî newala avê ku em diketinê xuya nedikir. Havînê dema dinya germ dibû, em carek şeveqê û carek jî nîvro diketin avê. Bi vî awayî em rojê du car diketin avê.
Koma me ku nêzî taximek 12 kesan bû, em li pişta çiyayê Qendîlê qelibîn. Ji Qendîlê ji nava êş û keseran em ber bi bakûrê Kurdistanê ve dimeşiyan. Ji niha ve Amed li ber çavê min bû. Çiya, gelî, vewal, gundên tijî û yên vala li ber çavê min rêz bûbûn. Bi taybetî jî min gelekî bêriya gundên vala kiribû. Gundên ku me xwe li ber dengê ava newal û çûkan dirêj dikir. Di van gundan de em bi kûrahiya dirokê ve diçûn. Çîroka ku ez tê de bûm, gelekî dirêj û bi êş bû. Weke min berê gotî; em ketibûn nava çîrokekê ku ne şîrove lê dihat û ne jî mirov jê bawer dikir.

Di vê çîrokê de gelek kes hebûn. Gelek aliyên wê yên bi êş, kul, keder, xweşî û dilşadî hebûn. Di vê çîrokê de kesên fedaî hebûn û xwe ji bo doza Kurdî feda kiribûn. Dîsa di vê çîrokê de xiyanet,teslîmiyet û ji rastiyan rev hebû. Kalê min gelek caran wiha digot: "Lawo çîroka me ewqas dirêj û dijwar e ne destpêka wê heye û ne jî dawiya wê. Tê de êş û keder hene, derdê me giran e ti derman lê nayê. Çareserî jî gelekî zehmet e. Ya din jî pirsgirêka me Kurdan ya bingehîn jî ew e ku em Kurd li hev nakin, em ji hev fêm nakin, belkî em naxwazin ji hev fêm bikin. Ev pirsgirêkên me girantir dikin." Berî her tiştî divê em ji hev hes bikin. Bi kurtasî çîroka hevaltiya min û Tîrêj wiha bû. Çîroka me gelekî dirêj bû, ji gelek cihên cuda derbas dibû. Me di vê çîrokê de li hemberî şev û rojan li ber xwe dabû. Min di vê rêwîtiya xwe de dest bi gaveke din kiribû. Ez li ser rêwîtiya Amedê bûm. Ji niha ve hesreta Amedê di dilê min de şax da ye...